

**ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ  
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ  
MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**



**BINYATÊ VEGÊRANÊ DI ÇÎROKÊN KENÊ PARSEK (PÊKENÎNÎ  
GEDA) YÊN HESEN QIZILCÎ DA**



**LÎSANS A BİLİND**

**AMADEKAR**

HALİZ HASAN ISMAEL HAMZEDKI

**ŞÊWIRMEND**

DR. ÖĞR. ÜYESİ KENAN BULUT

**VAN – 2020**

**T.C.**  
**VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ**  
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**



**HESEN QIZILCÎ'NİN KENÊ PARSEK (PÊKENÎNÎ GEDA) ADLI ÖYKÜ**  
**KİTABINDA TEMEL ANLATIM ÖĞELERİ**



**YÜKSEK LİSANS**

**HAZIRLAYAN**

**HALİZ HASAN ISMAEL HAMZEDKI**

**DANIŞMAN**

**DR. ÖĞR. ÜYESİ KENAN BULUT**

**VAN - 2020**

**TEZ KABUL TUTANAĞI**  
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

Dr. Öğr. Üyesi Kenan BULUT danışmanlığında, Halız Hasan İsmael HAMZEDKİ tarafından hazırlanan “**BINYATÊ VEGÊRANÊ DI ÇİROKÊN KENÊ PARSEK (PÊKENÎ GEDA) YÊN HESEN QIZILCÎ DA**” adlı bu çalışma, 13/01/2020 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

**Başkan(Başkan)** : Doç. Dr. Bayram KANARYA

İmza: 

**ÜYE** : Dr. Öğr. Üyesi Kenan BULUT

İmza: 

**ÜYE** : Dr. Öğr. Üyesi Mazhar TUNÇ

İmza: 

**ÜYE** : .....

İmza: .....

**ÜYE** : .....

İmza: .....

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylıyorum.

  
Doç. Dr. Abdülhadîr Dîlî Fîrîş  
Enstitü Müdürü

(Lîsansa Bilind)

HALIZ HASAN ISMAEL HAMZEDKI

ZANÎNGEHA WAN YÛZÛNCÛ YILÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

Rêbendan - 2020

**(Binyatê Vegêranê Di Çîrokên Kenê Parsek (Pêkenînî Geda) Yên Hesên Qizilcî Da)**

### **KURTE**

Ev xebat ji bo destnîşankirina binyata vegêrana çîrokên Kenê Parsek (Pêkenînî Geda) ên Hesên Qizilcî li nav û nîşanên çîrokên Kenê Parsek rawestîyaye.

Ji bo dîyarkirina hûnandina bûyerên çîrokan rêya sereke vegezan e. Vegêr ji bo hûnandina bûyerên çîrokê peyvên sade û şêwazeke aşûpî yanî xeyalî bikartîne. Ewê ku peywendîya wan bi kesayetan û karê wan ve heye bi saya deqên vegezanê peyda dibin. Vegêr di navbera çîrokê û wergirî da dibe pirekê ji bo wergirî dişîne. Ev name çî zarekî be çî nivîskî be ferq nake, dibe bingeh ji bo dirûstbûna mijara

Her wisa vegêr wek yek ji tuxmên girîng ên çîrokê dibe pirek di navbera mijarê û wergirî de. Amadekirina vegêrî di nav pêvajoya vegêranê de aktîf û dîyar e, lewra ew bi karê afirandin, rêxistin û polînkirina mijarê ra mijûl e. Dibe ku ew di nav çîrokê de xudan kesayetekî taybet be, yan jî dibe ku kesayetek ne dîyar be lê kû navê wî hebe û bi rêya cînavêkî dengê wî peyda bibe. Bi vî awayî erka xwe ya vegêrana çîrokê ji bo wergirî dîyar bike ji ber vî jî hêjayî dîyarkirinê ye.

Gelek xebatên Hesên Qizilcî yên sîyasî, edebî û civakî hene. Lewre ew civaka xwe baş nas dike û di hemû çîrokên xwe da behsa civaka xwe dike. Ev nivîskar di netewa me da hêjayî îftîxar û şanazîyê ye. Wî, rêya edebyata civakî jêgirtîye ne rêya bavû kalên xwe.

Çîrokên Kenê Parsek yê Hesên Qizilcî bi giştî ji çardeh çîrokan pêk tê. Mijarên her çardehan jî ev in: Zulma pergala serdest ya li ser gundî, û neçaran; bêaqilîya mirovan; axatî û xulametî, paletî û cotkarî, îronîya jîyana zehmet, oldar û bazirganên sexte û hwd.

Me hewl daye ku vegêrana di nav çîrokan dîyar bikin û bidin zanîn ku çîrokên Kenê Parsek heta çi raddê pabendî binêmayên vegêranê bûye.

**Peyvên Sereke:** Vegêran, Hesên Qizilcî, Kenê Parsek, Çîrok, Vegêr.

**Hejmara Rupelan:** 153

**Şêwirmend:** Dr. Öğr. Üyesi Kenan BULUT

(Yüksek Lisans)

HALIZ HASAN ISMAEL HAMZEDKI

YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Ocak -2020

**(Hesen Qizilcî'nin Kenê Parsek (Pêkenî Geda) Adlı Öykü Kitabında Temel Anlatım Öğeleri)**

### ÖZET

Bu çalışmada Hesen Qizilcî'nin Kenê Parsek (Pêkenî Geda) adlı eserindeki anlatım öğeleri üzerinde durulmuştur.

Öykünün olay örgüsünü çözenin yolu anlatımı çözmekten geçer. Anlatıcı öykünün olay örgüsünü kurmak için sade bir dil ve kurmaca bir metot kullanır. Karakterler, onların rolleri, olay örgüsüyle ilişkileri anlatım öğeleri ile ortaya çıkar. Anlatıcı öykünün kahramanları ve okuyucu arasında bir köprü görevi görür. Anlatıcı okura bir mesaj gönderir ve sözlü ya da yazılı olarak anlatımın öğeleri için bir temel oluşturur.

Öykünün önemli unsurlarından olan anlatıcı, öykünün konusu ile okuyucu arasında bir köprü görevi görür. Anlatım aşamasında/sürecinde anlatıcı açık ve aktiftir. Çünkü anlatıcı konusunun kurgulanması, organizasyonu ve sınıflandırılmasıyla ilgilenir. Öyküde anlatıcı belirsiz olabileceği gibi öykü içindeki bir kahraman da olabilir ve anlatıcı rolüyle kendisini okura belli eder.

Hesen Qizilcî'nin siyasi, edebi ve toplumsal pek çok eseri bulunmaktadır. Çünkü o toplumunu çok iyi tanımaktadır ve öykülerinin tamamında kendi toplumundan bahsetmektedir. Bu yazar milletimiz için övülmeye değer biridir. O baba ve atalarının izlediği yoldan farklı olarak edebiyatla ilgili çalışmalar yapmıştır. Hesen Qizilcî'nin tercih ettiği edebiyat ise toplumsal edebiyattır.

Hesen Qizilcî'nin Kenê Parsek isimli öykü kitabı toplam on dört öyküden oluşuyor. Hikâyelerinin konusu genelde egemen sistemin köylü, fakir ve çaresiz insanların üzerindeki baskısı; insanların saflığı; ağalık ve kölelik; ırgatlık ve çiftçilik; çetin hayatın ironisi; dindar ve dolandırıcı tüccarlardır.

Bu çalışmada yazarın öykülerindeki anlatımı ortaya konulmaya çalışılmış ve Kenê Parsek adlı eserin anlatım öğelerine ne düzeyde sadık kaldığı belirlenmeye çalışılmıştır.

**Anahtar Kelimeler:** Anlatım, Hesen Qizilcî, Kenê Parsek, öykü, Anlatıcı.

**Sayfa Sayısı:** 153

**Tez Danışmanı:** Dr. Öğr. Üyesi Kenan Bulut

(M.Sc. /Ph. D. Thesis)

HALIZ HASAN ISMAEL HAMZEDKI

YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY

INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES

January - 2020

**(The foundation of narrating stories of Kenê Parsek by Hesên Qizilcî)**

### **ABSTRACT**

The title of this research is (the foundation of narrating stories of Kenê Parsek) by Hesên Qizilcî. It is an attempt for determining the foundation of narrating stories.

Narrating is the main way that narrator determines by what so ever happen in the story. Inside the story the narrator use simple words and mistrial style to connect the accidents which have a relationship with personalities and their tasks specially that can be found inside the context in narrating. Narrator is a dam between story personalities and recipients because narrative is a message which has been send from sender to receiver. This message becomes a foundation for making the subject of narrating either orally or in written.

Therefore, narrator as one of the significant element of story becomes a dam between subject and recipient. Availability of narrator in the process of narrating is active and prominent because he is responsible for writing, organizing and analyzing subject. It is worth to mention that narrator in story have a special personality or has his echo and it could be a hidden person and find by a voice pronoun and he is responsible to narrate the story for the narrator.

Hesên Qizilcî has many political, literary and social works. Because he knows his society very well and he talks about his own society in all his stories. This writer is worth praising for our nation. Unlike the way his father and his ancestors



followed, he worked on literature. The literature preferred by Hesen Qizilcî is social literature.

In general the stories of (Kenê Parsek) by Hesen Qizilcî include 14 stories. The subjects of all 14 stories are like oppression's system on village, poverty, foolish people, servant, worker, farmer, hard working, religious figures, fake traders etc.

We tried to determine the foundation of narrating inside the stories and stand for the all stories one by one to show that to which extend Kenê Parsek is involved the foundation of narrating.

**Key words:** Narrating, Hesen Qizilcî, Kenê Parsek, Narrative, Narrator.

**Quantity of page:** 153

**Supervisor:** Assist. Prof. Dr. Kenan Bulut

## NAVEROK

<b>KURTE</b> .....	<b>i</b>
<b>ÖZET</b> .....	<b>iii</b>
<b>ABSTRACT</b> .....	<b>v</b>
<b>NAVEROK</b> .....	<b>vii</b>
<b>PÊŞGOTIN</b> .....	<b>x</b>
<b>DESTPÊK</b> .....	<b>1</b>
<b>1. VEGÊRAN Û VEGÊR</b> .....	<b>3</b>
1.1. Vegêran .....	3
1.1.1. Zaravê Vegêranê .....	5
1.1.2. Pênaseyên Vegêranê .....	7
1.1.3. Girîngîya Vegêranê.....	13
1.1.4. Cureyên Vegêranê .....	15
1.1.4.1. Vegêrana Babetî/Heterodîgeetîk (Objektîve) .....	18
1.1.4.2. Vegêrana Navxweyî/Homodîgeetîk(subjektîve).....	20
1.1.5. Di Çîroka Kurdî da Vegêran.....	22
1.2. Vegêr .....	27
1.2.1. Pênaseyên Vegêrî.....	28
1.2.2. Cureyên Vegêrî.....	30
1.2.3. Erkên Vegêrî.....	35
1.2.3.1. Erkên Serekî.....	35
1.2.3.2. Erkên Lawekî .....	36
1.3. Bînyata Vegêranê .....	39
1.3.1. Hunerên Vegêranê .....	39
1.3.1.1. Wesif (Saloxdan) .....	39
1.3.1.2. Dîyalog.....	42
1.3.1.2.1. Dîyaloga Rastewxu .....	44
1.3.1.2.2. Dîyaloga Nerastewxu .....	44
1.3.1.3. Monolog.....	45
1.3.1.3.1. Monologa Rastewxu.....	46
1.3.1.3.2. Monologa Nerastewxu .....	47
1.3.2. Regezên Vegêranê .....	47

1.3.2.1. Kesayetî / Karekter .....	47
1.3.2.1.1. Cureya Kesayetîya Serekî .....	51
1.3.2.1.2. Cureya Kesayetîya Lawekî.....	51
1.3.2.2. Rûdan / Bûyer .....	54
1.3.2.2.1. Rûdanên Serekî .....	56
1.3.2.2.2. Rûdana Lawekî.....	56
1.3.2.3. Dem/Zeman.....	56
1.3.2.3.1. Cureyên Demê.....	59
1.3.2.3.2. Livîna Demê.....	60
1.3.2.4. Cih/Mekân.....	64
1.3.2.4.1. Cihê Ketwarî û Cihê Aşûpî .....	66
1.3.2.4.2. Cihê Aşna û Cihê Neaşna.....	67
1.3.2.4.3. Cihê Vekirî û Cihê Girtî .....	67
1.3.2.5. Deng.....	68
1.3.2.6. Zîq/Zîqbûn .....	68
1.3.2.6.1. Zîqbûna Sabît (Fixed Focalization),.....	69
1.3.2.6.2. Zîqbûna Guhêrbar (Variable Focalization), .....	69
1.3.2.6.3. Zîqbûna Piralî (Multiple Focalization),.....	69
1.3.2.6.4. Zîqbûna Hevpar (Collective Facolization),.....	69
1.3.2.7. Ziman .....	69
<b>2. PRAKTÎZEKIRINA BINYATÊ VEGÊRANÊ DI ÇÎROKÊN KENÊ</b>	
<b>PARSEK YÊN HESEN QÎZILCÎ .....</b>	<b>72</b>
2.1. Jiyana Wî.....	72
2.2. Berhemên Wî.....	73
2.2.1. Berhemên Wî Yen Çapkirî .....	73
2.2.2. Berhemên Wî Yen Çapnekirî.....	74
2.3. Kurtenêrînek Li Ser Pirtûka Kenê Parsek .....	75
2.4. Binyatê Vegêranê Di Çîrokên Kenê Parsek De.....	78
2.4.1. Kenê Parsek .....	78
2.4.2. Edetên Bazarê .....	82
2.4.3. Bîne Lê Bi Nav Neke.....	86
2.4.4. Tac û Textê Emer Axa.....	89

2.4.5. Ocaxa Axa Ronake .....	92
2.4.6. Xemla Pembû.....	95
2.4.7. Serfitre .....	98
2.4.8. Keşkola Efsûnî.....	100
2.4.9. Şehîdê Zilmê Ye Kefen û Şuştin Jê Re Navê .....	104
2.4.10. Nivişta Amîne Xan .....	108
2.4.11. Hêkên Hadî Xanî .....	111
2.4.12. Ji bedêla Peryên Bertîlê ve Xwendina Qur'anê.....	115
2.4.13. Ne Bi Dîtina Hecî Ne Bi Xewa Mizgeftê .....	118
2.4.14. Çaya Dîwanxanê.....	121
<b>3. ENCAM.....</b>	<b>125</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>129</b>

## PÊŞGOTIN

Her ji destpêkê mirovan ji bo veguhestina hizr û bîrên xwe yan serborîyên xwe rûdanên dewrûberên xwe mifa ji vegêranê wergirtîne û serederî ligel kirîne. Wek yek ji binemayên serekî yên veguhestina zanyarî, ezmûn, serborî, hizr û bîrên mirovan hatîye bikarînan. Karîye di vê rewşê da roleke serekî bibîne. Rengvedana wê di jîyana rojane da bi başî dîyare. Bi rengeke ku çêdibe veguhestina yekem serborên mirovê kevin, bi rêka vegêranê ve hatîye. Lê di vê demê ku piştî mirov ji nêçîrê dizivire serborîyên rojanên xwe ji bo endamên mala xwe vedigêra. Ev çende bi rengeke aşkera di nav folklorê de, ku rengvedana jîyan û felsefa mirovê kevn de xuya dibe. Rengeke ku di efsanê da vegêran weke hêvinê serekî ji bo gehandina peyam, hizr û bîr û yan jî rûdanan dihata bikarînan. Herwusa di nav çîrokên folklorî da ji bo çaresarîya arîşeyên di nav civakê da dihate bikarînan. Vegêranê roleke serekî didît û ev çareserkirine gelek caran di asta waqî'î da nebû lê wekî rêkekê bû bo razîkirina xelkê dihate bikarînan.

Ev teza li jêr, a ku bi navê “Binyata Vegêranê Di Çîrokên Kenê Parsek (Pêkenînî Geda) ya Hesên Qizilcî da” hatîye nivîsîn wekî bizavek ji bo nîyasîna vegêranê û dîyarkirina teknîkên wê di nav çîrokên navborî da. Piranîya serp êhatî û bûyerên çîrokên Hesên Qizilcî digel wan êş û azaran di guncin, ew ên ku di nav civaka kurdewarî da heyîn. Giringîya babetî di vê çendê da ye ku vegêran û teknîkên wê herwusa cur û taybetmendîyên vegêranê di wan çîrokan da tête dîyarkirin. Dîsan da ku bizanin çî cure teknîk di nav vegêranê da tèn bikaranîn û serdeste. Herwusa nivîskarî ji alîyê hunerî ve çawa serederî digel hunera vegêranê da kirîye.

Derbarê plan û nexşê lêkolîna me, ev lêkolîne li ser dû pişkan ve hatîye saz kirin. Beşa yekem ku beşeke teorî ye û derbarê vegêranê û bunyata vegêranê ye. Di vê beşê da behsê zarav û pênase û giringî ya vegêranê û cureyên vegêranê, vegêran di çîroka kurdî da, vegêr û cureyên vegêrî, erkên vegêrî, herwusa behsê çend rêgez û hunerên vegêranê hatîye kirin, wek dîyalog, monolog, zîqbûn, kesayetî, dem, cih, saloxdan. Beşa duyem jî, beşa praktîkê ye ku pêşîyê kurtîyek ji jîyana Hesên Qizilcî û berhemên wî, dîsan kurte nêrînîyek liser çîrokên wî da agahî hatine dayîn paşê binemayên vegêranê di hemu çîrokên wî da hatine dîyarkirin.

Ez dixwazm spasiyên xwe yên taybet pêşkêşî şiwirmendê xwe Dr. Kenan Bulut bikem ku ji despêka vê tezê heta xilaskirna wê rêberî û alîkarîyeke pir baş da min û di hemû astengiyan de rêya min vekir û hêsan kir. Dîsa ez spasiyên xwe pêşkêşî wan hevalan dikem ku ji alîyê dabîn kirna çavkanîyan ji bû min alîkarbûn. Her wiha ez spasiyên xwe li hemû nivîskar û Pispurên edebî û lekolînerên ku min ji berhemên wan sûd girtîne dikem.



## DESTPÊK

Di çîrokê de vegêran rêgezêk serekî ye û çîrok bê vegeran nabe. Vegêran berê di edebîyata cîhanê de hebû, di despêkê de wek serborîyane, paşê peyva çîrokê derketîye holê. Her yek ji wan xwedî şêwazeke serbixwe nin û di nav xwe de sînordar in. Cudahîyeke dîyar di dîroka serhildan û şêwaza neverokê de heye. Di serborîyê de vegêran girîngîyê dide hurgilîya bûyeran û bi vî awayî bala guhdaran dikşîne. Di çîrokê da derûnîya lehenga bvi hûrgulî wesif nake lê aliyê derûnî yek carê paşguh jî nake. Armanç û nîşanê serborîyê ji bo guhdaran dihêle. Di çîrokê de gelek tişt di dawiyê de eşkera dibin. Di çîrokê da xwendevan û nivîskar diçine nava dilê lehengî û hebûna xwe tê de dibînin lê serborîyan de ev taybetîyana nîn in.

Kurteçîrok serborîyeke di navbera xeyal û rastîyan de ye. Çîrok di navbera yek saetê yan jî sê saetan de tê xwendin û xweşî jê dihate sitendin. Ne girîng e sivik yan girane, mirovatî ye yan ne mirovatî ye, gere pirhizîrî be ku tesîreke wisa li ser mirovî bihêle ku mirov gelek hizir bike. Divê herikbar be û piştî xwendina wê ji bo çend kêlîyan xwe jibîr bike. Ya girîng ewe ku bikaribe di wextekê kêr de hişê xwendevanî ji serî bibe û wî girêdayê çîrokê bike da ku hestekê xweş û razîbûnek li cem xwendevanî çêke.

Di despêka vê xebatê da ew metodolojîya min bikarînay eve bu ku li pêşîyê min çend xebatek li ser vegêranê xwendin û min xwest bizanim girîngîya evê peyvê di nav berhemên edebî da bi çî qase, taybet di nav çîrokê da. Piştî min çîroknivîsek jêhatî ji Kurdistana rojhelat helbijart bi navê Hesên Qizilcî û çend pertuk û gutar li ser jîyan û berhemê wî xwandin bu min dîyar bu ku ev çîroknus bi berhemê xwe "Kenê Parsek" ya ku urcînala wê bi navê "Pêkenînî Geda" nasyare. Min ev çîroke helbijartin û min xwest ez bunyatê vegêranê di van çîrokan da dest nîşan bikem ka bi çî şêwe di nav da derbas dibin. Dîsan hejîye ez xuya bikem ku ev kesayetîye karîye civaka kurdan û êşû azarên kurdan di çend çîrokekan da dîyar bike.

Danasîna Xebatê: Di vê xebatê da me lêkolînek li ser çîrokan Hesên Qizilcî çêkirîye. Me pêşî mijara teza xwe kifş kir û me navê teza xwe wek (Binyata Vegêranê Di Çîrokên Kenê Parsek( Pêkenînî Geda) yên Hesên Qizilcî de ) danî. Paşê jî me sînore mijara teza xwe dîyar kirin û li gorî van sînoran me yek bi yek

çîrokên Hesên Qizilcî ku bi tevahî ji çardeh çîrokan pêk tê xwend û analîz kir. Me hemî binêmayên vegeerên yanî kesayeti, diyalog, monolog, zeman, mekân, zîqbûn û hwd... tê de diyar kirin. Me kurteya hemû çîrokan daye û me behsa vegeerî û cureyên wî tê da kirîye.

Di nav her du beşên vê tezê de beşa herî berfireh beşa piratîkê yan jî beşa duduyane. Navê wê beşê "Praktîzekirina Binyata Vegêranê Di Çîrokên Kenê Parsek Yê Hesên Qizilcî de" ye. Jixwe ev beş mijar û armanca nivîsandina tezê werdigire.

### **Armanca Xebatê**

Armanca hîlbijartina nav û nîşanên vê xebatê ji aliyekê ve ji ber girîngîya hunera vegeerên û nîşandana binyata vegeerên di çîrokan da werdigre û ji aliyê din jî ji ber daxwaza min li ser nemirkirina ilm û şîyanên mezin yê vî kesayetîya bilîmet kû bi rêya çend çîrokan di civaka me da bidim nasîn, û min xwestîye pirtûkxaneyê Kurdî bi taybetî jî ya kurmancî bi mijarekê pir girîng dewlemed bikim. Bi vî awayî jê fêdeyekê baş bigihînim xwendevanên Kurd. Di çîrok û romanên de heya niha gelek lêkolîn li ser vegêranê hatiye çêkirin lê bi awayeke têr û tesel û zanistî kêmasî hene. Hêvîya min ewe ku bikaribim xebateke fêdedar çêbikim.

### **Girîngîya Xebatê**

Li bakurê Kurdistanê heya niha li ser girîngîya çîrokên Hesên Qizilcî nehatiye rawestan û ti kesî xebateke têr û tijî li ser çîrokên wî nekirîye. Ev xebat muhîm e ji bo diyar kirina girîngîya Hesên Qizilcî di civaka Kurdan de û çawa bi rêya çîrokan êş û azarên milletê me Kurdan daye nasandin di vî xebatê da hatiye diyar kirin. Raste li Başûrê Kurdistanê heya niha çend gotar li ser çîrokên Hesên Qizilcî hatine nivîsîn wek gutara Heme Seîd Hesên ewa bi navê "Pêkenî Gedayî Hesên Qizilcî" û tezekê masterê li zankuya Selahedîn li ser aliyê wî yê civakî hatiye nivîsandin ji layê Nahîde Huseyîn Ebdulrehman bi navê "Layênê Sîyasî û Kumelayetî di Çîrokên Hesên Qizilcî" da lê vegêrana li ser çîrokên Hesên Qizilcî wek xebatekê akademîk nehatiye çêkirin min di vê xebatê da hewl daye ku vegêranê û binyata vegêranê di van çîrokan de diyar bikim. Keresteyên vegêranê dibe ku zêdetir bê dîtin di romanên da, lê divê neyî jibîr kirin ku çîrok jî ji van keresteyan bêpar nîne.



# 1. VEGÊRAN Û VEGÊR

## 1.1. Vegêran

Vegêran wekî proseseka axaftinê her ji destpêka peydabûna mirovî di nav civakên mirovayefiyê da peyda bûye, heta ku berî peydabûna zimanê axaftinê û nivîsînê. Vegêran bi zimanê hêma û nîşaneyan hatîye bikaranîn. Çi ku pirî jîyana mirovan serhatî û çîrok bûye. Ev kesê ku xwastîye wan serpehatî û serborîyan ji bo yê li beramberî wî ye behs bike û veguhêze. Helbet yek ji wan rêkên penabirinê bû ji bo veguhastina rûdanên borî vegêran bûye. Herwusa “Vegêran hunereke dêrîne û ji demên kevin da ji bo veguhastina rûdan û serhatîyên jîyanê hatîye bikaranîn.”<sup>1</sup> Di nav çîrokên folklorî da vegêran bû çareserîya arîşeyên di nav komelgehê da dihate bikaranîn û roleke serekî didît û ev çareserkirine gelek caran di asta weqî’î da nebû. Lê wekî rêkekê bû ji bo qanîhkirina xelkê dihate bikaranîn. Di nav wan çîrokan da komeleke rêgezên dihatin bikaranîn. Wekî kesayetî, dem, cih, rûdan û girê. Lê vegêran wekî komeleke serekî ya pêdivî dihate berçav. Ev rêgeze bi guherîna serdeman hindê guherînên teknîkî bi xwe ve dîtî. Lê wekî rêgezeke serekî ya pêdivî maye. Lewra em dikarin bibêjin vegêran pêdivîyek ji jîyana mirovî ye. Wek ‘Ebdulmelîk Murtaz di pirtûka xwe ya bi navê “*Nezerîyetul Rîwaye*” da dibêje “Çawa mirov neşet bê hêvî bibe yan bê xwin razê; wusa neşet bê vegêran bibe.”<sup>2</sup>

Vegêran wekî yek ji regezên serekî yê edebî jî karîye ku roleke baş û çalak bibîne. Çi ku gelek caran veguhastina serbûyerên edîbî bû xwendevanî di qalibê berhemeke edebî da dîyar dibe. Herçend vegêran di nav jîyana rojane û berhemên edebî da bi mebesta veguhastina ezmûnan tete bikaranîn lê hindê cudahî di navbera wan da tene dîtî. Vegêrana rojane pitir rengê rastewxu derdibîrnê ji hizr û bîran dike. Lê vegêran di nav berhemê edebî da zêde barî veguhastina zanyarîyane û layenên teknîkî jî bi xwe ve digire û cuwanîyekê dide vê berhemê<sup>3</sup>. Herwusa romannûs û helbestvanê Îskoçî Sîr Walter Skot di ciwanîya xwe da rexneyan li ser

---

<sup>1</sup> Nefîsa, Îsmâil (2005), *Teknîka Vegêranê di Kurteçîrokên Fazîl Umerî da*, Çapxaneyê Hawar, Çapa yekem, Dihok, r. 33.

<sup>2</sup> Ebdulmelîk, Murtaz (1998), *Fî'n-Nezerîyetu'l-Rîwaye Behs Fî't-Teqniyetu'l-Serd*, Metbe'etu'r-Rîsale, Kuwêr. r. 258.

<sup>3</sup> Îmad Weysî, Xalid (2013), *Teknîka Vegêranê Di Hozana Muayyed Teyîbî da*, Kovara Zankoya Dihokê, Berpenda 16, Hejmar 1, r. 2.

wê çendê dike ku baştirîn cudakirin di navbera vegêrana ketwarî û vegêrana hunerî da eve ye ku vegêrana ketwarî ji alîyê sedemên dur ên bûyerên vegêranê ve ya mijardar û aloze, lê vegêrana hunerî pişkek ji rêkxistina nivîserî ye ji bo rohnkirina mijaran.<sup>4</sup> Di kiryara vegêranê da me pêdivî bi sê regezan ve heye û ev jî "vegêr, vegêray ango çîrok yan jî mijar, û wergir ango xwîner û guhdar".<sup>5</sup>

Regezê yekem tête dîyarkirin ku vegêre. Ango em dişên bibêjin kiryara vegêranê li ser piştta vegêrî tête encam dan. Vegêr navbeynkare ku di navbera nivîskar û xwendevan de têkiliyekê datîne.<sup>6</sup> Bi karê veguhestina çîrokê ji bo wergirî radibe ango di navbera mijarê û wergirî da pireke. Amadebûna vegêrî di nav kiryara vegêranê da ya çalak û dîyare. Çi ku ev bi karê rêkxistin û polkirina mijarê radibe. Ev kesayetîye bi temamî cîyawaz e ji nivîskarê çîrokê ku kesayetîyeke rasteqînî ye û çêkerê vê cîhana aşûpî ye ku ev a çîroka wê jê pêk têt.

“Vegêr di çîrokê da bi du şeweyan ve dîyar dibe. Ev çende li ser zîrekîya çîroknusî û vê mebesta çîroknûsî divê ragihîne xwendevanê ku li bendê ye.”<sup>7</sup> Dibe ku vegêr, nivîskar bi xwe be yan jî kesêke dî be ji kesayetîyên çîrokê. Lê ne şerte ku nivîskar di çîrokê da dîyar be, belkû xwe di pişt maskê vegêrî vedişêre.

Rêgezê duyem di kiryara vegêranê da vegêrayî ye. Mebest jê ev mijar e ku ewa ji alîyê vegêrî ve tête dirustkirin û ev mijar ji komeke rûdanan û kesayetîyan ve pêk têt li cihekê û li demeke destnîşan kirî bi kar û kiryaran ve radibin. Çîrok û serhatî kakila mijara vegêranê ye<sup>8</sup>.

---

<sup>4</sup> Ustin, Warîn û Rînê, Wilik (2008), *Tîyorîya Wêjeyî, Wergêr*: Arif Hîtu, Çapxana Hawar, Çapa yekem, Dihok, r. 315.

<sup>5</sup> Ebdulmelik, Murtaz (1998), *Fî'n-Nezerîyetu'l-Rîwaye Behs Fî't-Teqniyetu'l-Serd*, Metbe'etu'r-Rîsale, Kuwêt. r. 155.

<sup>6</sup> Remezani, Alan (2015), *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebîyata Modern*, Çapxaneyê Peywend, Çapa Yekem, Stenbol, r. 171.

<sup>7</sup> Rêjîn Cemîl, Xelîl (2014), *Hunerê Çîroknivîsînê Li Cem Nuredîn Zaza*, Nama Masterê, Zankoya Dihokê, r. 76.

<sup>8</sup> Dildar Îbrahîm, Ehmed (2017), *Tîyur û Teknikên Vegêranê û Piraktîzekirin Li Ser Romana (Alê Dî Yê Pirê)*, Çapxaneyê Hîvî, Çapa yekem, Dihok, r. 37.

Rêgezê sêyem, di kiryara vegêranê da wergir e ango ev kese ku evê mijar ji bo wî têtê vegêran û têtê arestekirin.<sup>9</sup>

Prosesa vegêranê li ser wan her sê rêgezan dirust dibe û em dikarin bibêjin ku pêkhata vegêranê peyameke zimanî ye cîhana aşûpî ya rûdanan hildigire û ev avahîya çîrokê dirust dike ku her yek jî vegêrî jî wergirî jî ber bi xwe ve dikêşe. Eve jî dibe egerê komeke peywendîyên navxweyî dirust bibe ku çawanîya kar kirina her sê pêkhateyên serekî yên çîrokê rêk diêxe û bersivdana wan li ser pirsyara vegêrî ye, çî çêbû û çawa çêbû? Paşê çûna wî bi hîrkatî û hûrûgulîyên wan û kesayetî û peywendîyên wan yên çîrokê û dem û cih û cureyên wan.

Di dawîyê da em dikarin bibêjin ku vegêran ne tişteke destnîşan kirîye, belkî her yek li dû dîtin û şîrovekirin û arestayên xwe dikare dîyar bike. Her nivîvkarekê jî şêwazê xwe yê taybetîyê endîşeyî heye di gotina çîrokan da û guherîna wan ji bo dûrhêleke zimanî.

### 1.1.1. Zaravê Vegêranê

Zaravake kevn e û ji destpêka peydabûna mirovatîyê serhildaye. Wate mirovî destpêkê hez dikir wan serhatî û nêçîr girtinên xwe bi vegêre yan jî her çî kawdeneka tê da borî bi alavekî derdibire û ji vê alavê jî vegêran dihat gotin. Bi wî rengî ev kesê bi kiryara wan serhatîyan radibû wekî kesê vegêr dihat nasîn.

Zaravê vegêranê wek zaraveke edebî binyat û rih û rîşalên vê peyvê bû zaravê latînî (yewnanî – romanî) dizivire bi taybetî ji alîyê zimanî ve.<sup>10</sup> Çi ku edebîyatên yewnanî û romanî jêderên sereke ne ji bo dîyarkirina binyata hemî zaravayên zanistî, bi taybetî yên edebî.

Heke em ji alîyê zaravî û zimanî ve berê xwe bidene vegêranê dê bibînin ku vegêran (narrotology) girêdayî zaraveke kevnê ku ev jî şî'rîyet (poetics) ango

<sup>9</sup> Dildar Îbrahîm, Ehmed (2017), *Tîyur û Teknikên Vegêranê û Piraktîzekirin Li Ser Romana (Alê Dî Yê Pir)*, r. 37.

<sup>10</sup> Cîrald, Birêns(2003), *El-Mustelehu's-Serdî*, Trc: 'Abid Xeznedar, El-Meclisu'l-E'la Lî's-Seqafe, Çapa yekem, Qahîre. r. 148.

vegêran verêja zaravê "şî'rîyetê" ye û hêdî hêdî ji alîyê vekoler (lêkolîner) û rexnegiran ve hatîye pulînkirin heta ku ketîye ser rêyekê û cihê xwe di nav xanên tîyora edebî da cêgîrkirin û wekî regazekê reha dihêne vekolîn û behskirin.<sup>11</sup> Heke em berê xwe bidene zaravê vegêranê di çend zimanên din yên cîyawaz da, wekî ewropî dê dibînin ku arîşe li ser vê zaraveyê heye û ne yê cêgire û di her zimanekê da zaravekê taybet bi kar anîye û ev ji zaraveyê cuda ye ji ewan zaravên dî. Di zimanê inglîzî da zaravê vegêranê bi vî şêweyî ye (narrate + logy) ku peyveke hevdudanî ango lêkdayî ye. Ji du peyvan pêk têt, ev jî narrate û logy e, ku beşa yekê (narrate) bi ramana vegêranê têt; ku ew vegêran çî vegêrana axaftineka asayî be yan ji bo rûdanekê û serpehatîyekê be, yan jî ji bo çîrokekê û her tiştên dî be ku bikare bi rêya vegêranê ji xelkê ra bigihîne. Beşa duyê yanî (logy) jî ji alîyê bingehê ve peyveke yewnanî ye û di wateya zanistê yan jî vekolînê dide. Ev herdu peyv pêkve tên wateya zanista vegêranê an jî vegêrannasî yê.<sup>12</sup> Heke temaşeyî vê zaravê bikin di rexneya "anglo-saksonî" da zaravê (Telling\_Gotin) bi ramana ne amadebûna vegêrî ango rola vegêrî nebe di çîrokê da yan di prosesa vegêranê da, berovajî vê çendê li cem frensîyan dê bibînin ku zaravê (showing) têt bikaranîn ango amadebûna vegêrî disepîne ku rola wî hebe di prosesa vegêranê da.<sup>13</sup> Ji alîyê dî ve di zimanê erebî da di pirtûka "Me'cemu'l Edebî" da zaravê vegêranê hatîye ku axaftin û xwandineke vegêr paşê çûye bi şêwaz û rêyeke baş bi kar anîye.<sup>14</sup> Herwusa di ferhenga zimanê erebî da zarave hatîye bikaranîn li beramberî zaravê vegêranê (السرود) bi ramana zaraveke giştî yan vegêrana çîrokekê ye yan jî hewalekî ye; çî ji durhêlî be yan jî xeyala mirovî be.<sup>15</sup> Wate hindêk rûdan rasteqînî ne û hindêk jî di aşupî û xeyalî ne. Dîsan di kitêba Dîne Îslamê "Qur'an pîroz" da ev zarave di ayeta (ان اعمل سائغات و قدر) hatîye wateya "Me got gelî cîyan û gelî teyr û tewalan tesbîhê lê vegêrin."<sup>16</sup>

<sup>11</sup> Fetîme, Dîlmî (2014), *Teqniyetu's-Serd Fî'r-Rîwayetu'l (Qahîre'l Sexîre) Lî Emare Lexus*, Rîsalet Macistêr, Camîetu'l-Eerebî Bin Mihêdî, r. 18. Rebî'a, Bedrî (2015), *Elbunyet's-Serdîyetu' Fî'r-Rîwayet (Xitwat Fî't-Tîcahu'l Axir) Li'l Hefnawî'z- Zaxir*, Rîsalet Macistêr, Camîetu'l -Muhemed Xizir, r. 13.

<sup>12</sup> Hêmin Casim, Muhemed (2015), *Gêranewe Le Çîrokî Folklorî Kurdî da Çîrokî Mindalan Wek Nimune*, Nama masterê, Zankoya Selahedîn, Hewlêr Hunerî, r. 6.

<sup>13</sup> [www.kurdistnnet.org](http://www.kurdistnnet.org). Îşkalîyet Elmusteleh Elserdî 'inde Elxerb [www.uobabylon.edu.iq](http://www.uobabylon.edu.iq)

<sup>14</sup> Cîbur, Ebdulnur (1979), *Elme'cemu'l-Edebî*, Daru'l-Îlîm Lî'l-Melayîn, Çapa Yekem, Beyrut. r. 139.

<sup>15</sup> Mecdî, Wehbe û Kamil, Elmuhendis (1984), *Me'cemu'l-Mustelehatu'l-Edebîye Fî'l-Luxe We'l-Edeb*, Mektebet Lubnan, Çapa Duyem, Beyrut. r. 198.

<sup>16</sup> Îsmâî l, Sigêrî, *Tefsîra Jîyan*, Sureta Sebe, Ayeta 11.

Ku wate di Qur'ana Pîroz da jî ev zarave tê wateya vegêrana tişteke û amrazekê ji bo ragihandina peyamekê. Herwusa ev zarave di ferhenga " Lîsanul Ereb" da bi ramana tişteke berî tişteke dî bê û ev tişte jî bi rengê rekestî û pêkve girêdayî û lidîfekdahatî têt.<sup>17</sup> Dîsan di zimanê kurdî da di ferhenga " Henbane û Burîne "da ku ferhengeke kurdî û farisî ye bi vî rengî wateya zaravê vegêranê dîyar kirîye ku pêkhatîye ji behskirina axaftina vegêrayî ango hikayet vegêranê.<sup>18</sup> Ku bi tenê dema borî bi xwe ve digire, ne dema bê.

Di zimanê kurdî da beramberî zaravê vegêranê yan jî gêranewe hatîye bikaranîn û ev zarave di ferhenga " Estêre Geşê" da di wateya dubarekirin, retvekirin, vegerandin, hikayetkirinê da ye.<sup>19</sup> Ku bi tenê komeke peyvên cuda ne ji alîyê nivîsînê ve lê wek hev in ji alîyê wateyê ve. Di ferhenga " Spîrêz" da zaravê vegêranê bi ramana roman û li dû yêk gotin hatîye.<sup>20</sup> Di zaravê giştî da hatîye, vegêran vegotina rûdanekê ango çend rûdanek û çend hewalekan çê dibe ku binyata vê hewal û rewşê jî rastî be. Vegêran wek zarav û li dîf werara rêk û şeweyên wê ji alîyê gelek rexnegirên edebî ve hatîye pênasekirin ku veguhestina rûdana ne bi zimanî, wate veguhestina rûdanê wekî rûday, birêkawênê zimanî.<sup>21</sup> Di dawîyê da em dikarin bibêjin ku di her zimanî da zaravekê taybet ji bo vegêranê hatîye bikaranîn ku cuda ye ji ewên zaraveyên di zimanên dîtir da bi kar hatine û ev zarave di her zimanekê da çendîn ramana bi xwe ve girê dide. Bi kurtî zaravê vegêranê bi wateya li dû pêkhatina zincîreya serhatî û serborîya ku wergêr rolî di gehandina vê prosesê da dibîne.

### 1.1.2. Pênaseyên Vegêranê

Vegêran hunereke dêrîne û yek ji tuxmên serekî yên çîrok û roman û dramayê ye. Erk û roleke mezin di prosesa pêşvebirina bûyer û rûdanên wan da heye ku bi

<sup>17</sup> Îbn Menzur (1970), *Lîsanu'l-Ereb*, Îdad we Tesnîf Yusif Xeyat, Madetu's-Serd, Mûceled 2, Dar Lîsanu'l-Ereb, Beyrut, r. 130.

<sup>18</sup> Hejar (1381), *Henbane û Burîne, Ferhengî (Kurdî- Farisîye)*, Çapxaneyê Întîşarat Kurdistan, Çapa Heştê, Tehran, r. 741.

<sup>19</sup> Hafîz, Qazî (2005), *Ferhenga Qazî*, Dezgehê Spîrêz ya Çapû Weşanê, Çapa Duyem, Dihuk, r. 155. Fazil, Nîzamedîn (1989), *Ferhengî Eestêre Geşe*, Ferhengêk (î Kurdî-Erebîye), Wezaretê Perwerdê, Çapa Duyem, Îraq, r. 454.

<sup>20</sup> Muhemed Emîn, Duskî (2013), *Qamus Spîrêz*, Metbe'etu'l-Cim, Çapa Duyem, Turkîye, r. 477.

<sup>21</sup> Fayîq, Mustefâ û Ebdul Rîza, Alî (1989), *Fî'n-Neqdu'l Edebu'l-Hedîs Munteleqat Wet'-Tetbîqat*, Metbe'etu't-Te'lîmu'l-'Alî, Çapa Yekem, Camîatu'l-Musil r. 137-138.

dirêjahîya mêjûyî bû me torekê gelek dewlemend û zengîn ji hîkayet û serhatî û çîrokan ra hêlaye û ev çende bûye cihê serencrakêş û pîtepêdana rexnegir û turenivîsan. Dîroka peydabûna vê hunerê bû serdema peydabûna mirovatîyê li ser rûyê erdî vedigere. Bi taybetî piştî peydabûna komelgehên mirovî û cêgirbûna wan di nav da û xwe guncandin li gel kesên dewrûber, vê hunerê ciheke mezin û girîng di jîyana wan da girtîye. Çi ku mirovê berê çîrok û serhatîyên nêçîrê û çîrokên lehengîyên xwe ji bo xelkê vedigêran.<sup>22</sup> Ango mirovan herdem arezûya wê çendê hebû ku ew serhatî û rûdanên rojane yên di jîyana wan da diqewimîn ji bo dewrûberên xwe, bi taybetî serhatîyên rav û nêçîrê vibigêrin. Yanî vegêran rêyek bû ji bo vegêrana serhatî û rûdanên rojane yên jîyanê.<sup>23</sup> Bi gotineke dî mirov nikare bê vegêran wan serhatî û rûdanan ji kesên din ra veguhêzin. Ji ber vê çendê girîngîdana mirovan a bi vegêranê bûye sedema vê çendê ku pişkeke mezin ji edebîyata devkî (efsane, destan, çîrok) bû me bêne veguhastin. Gûman û şik tê da nîne ku her hunereke bi vî rengî dêrîn û kevnar da dê dîtin û boçûnên cuda cuda li ser hebin. Lewra vekoler û rexnegiran çendîn pênaseyên ji hev cuda ji bo vegêranê kirine. Bo nimûne vegêran ev çîrok û bûyer in ku ev ên bi rêya vegêrî tene rêzkirin.<sup>24</sup> Çi ku pêvajoya vegêranê rêya peywendîkirinê ye ku zincîra li dû pêkhatina rûdanên rûdayî pêşan dide yan jî ew ên ji aliyê kesan ve hatine encam dan.<sup>25</sup> Ango vegêran ji zincîra li dîf pêkhatina bûyerane û pêdivî bi kesayetîya dikin ta ku ev pêvajoye rola xwe bigêre û temam bike. Herwusa Celal Mustefa di gutareka xwe da li ser "Vegêran di Çîroka Kurdî" de boçuna Cîrald Birins î dîyar dike derbarey pênaseya vegêranê ku dibêje: Vegêrana rûdanekê yan pitir ya waqî'î yan jî aşupî ji aliyê vegêrekê yan ji vegêrekê zêdetir ve ji bo guhdarekê angu guhdarane.<sup>26</sup> Di vê pênaseyê da wusa dîyar dibe ku janrên edebî bi rêya vegêranê digihijin xwendevan û guhdarî. Ango vegêran amrazeke ji bo gihandina peyamekê ye di nav bera tekist û wergirî da.

<sup>22</sup> Nazdar'Arif, Birîndar (2012), *Jin û Hunerê Çîrokên Devera Behdînan (1990-200)*, Nama Masterê, Kolêja Adabê, Zankoya Dihok, r. 91.

<sup>23</sup> Îbrahîm Qadir, Mohemed (1970), *Lêkolînewey Kurteçîrokê Kurdî Le Kurdistanê Başûr da (1970-1980)*, Teza Doktorayê, Kolêja Adabê, Zankoya Selahedîn, Hewlêr, r. 164.

<sup>24</sup> Gill, Ricard (2006), *Mastering English Literature*, Palgrave Master Series, Third Edition, New York, r. 508.

<sup>25</sup> Yan, Manfirêdî (2011), *'Îlmu's-Serd Medxel Îla Nezerîyetu's-Serd*, Trc: Emanî Abu Rehme, Dar Neynewa, Çapa yekem, Dîmeşq, r. 12.

<sup>26</sup> Celal, Mustefa (2007), *Vegêran di Çîroka Kurdî da*, Kovara Peyv, Hejmar 40, r. 15.

Herdu nivîskarên ereb, Semîr El Merzuqî û Cemîl Şakir di pirtûka "*Medxel Île Nezerîyetu'l Qisse*" da wusa vegêranê pênase dikin ku, ew kiryare ewa vegêr pê radibe û metna çîrokê jê peyda dibe da ku vê gotara hizrî bigihîje xwendevanî û dest bi vegêrana rûdanan dike û cih û demên wan wêne dike û ji vê çendê jî tevna çîrokê peyda dibe heta ku ber bi dawîyê ve diçe.<sup>27</sup> Ji alîyêke dî ve Cêrmî Hurson di pirtûka "*Medxel Li Dîrasetul Rîwaye*" da taybetmendîya vegêranê di pêvajoya ragihandina peyama çîrokê da ron kirîye û dibêje: Her tiştê ku em di çîrokê da dixwînin bi rêka cure agahdarkirinekê digihîje me ku her çend nivîskar di teswîrkirina dîmenekê da bi şêweyêke dramî nagihîje radeya drama û şanogerîyê yan filmên sînemayê. Çi ku bi şêweyêke hestdar tête pêşandin û dîtîn. Belê ev kartekirin ji alîyê me ve dihête têkdan û ji encamê boçûna me peyda dibe, lewma wekî karê niwandinê nabe."<sup>28</sup>

Herwusa di pênaseyêke dîn da vegêran ji guherîn û veguhêstina rûdanan ji wêneya durhêlî ber bi wêneya zimanewanîyê ve pêk tê.<sup>29</sup> Ango vegêrana bûyerane û veguhêstina wan bi rêya zimanî yan jî wênekirinê ku ew bi rêya zimanî deng û wêne bêne dîyarkirin ku bibe pêkhatê vegêray, bibe parçeyek ji demî û kevalek ji bîyavekî ji bilî vê çendê ev karê ku vegêray aşupî be yan rasteqîne be.<sup>30</sup> Ji vê pênaseyê ve dîyar dibe ku kerestê vegêranê zimane, çîroknûs bi rê û şêweyêke taybet vî zimanî bi kar tîne ji bo veguheztina rûdanan. Ew rûdan çî aşupî bin yan jî rasteqînî bin zîrekî, şarezarî û serkeftîbûna nivîskarî di şêweya ragihandina wan rûdanan da ye.

Zimanzan jî bi rengeke dî behsa vegêranê dikin, wekî dîyardeyêke zimanzanî li vegêranê dinêrin ku bi komeke hevoka ye û yek bi yek li pey hev hatîne rêzkirin.<sup>31</sup> Ev dîtîn jî renge ji ber wan rûdanan be ewên bi şêweyêke rêzbendî yek bi yek li pey yekê da tîn û vegêr wan pêkve girê dide.

<sup>27</sup>Semîr Elmerzuqî, Cemîl Şakir(1986), *Medxel Îla Nezerîyetu'l-Qisse Tehlîlen We't-Tetbîqen*, Daru's-Ş'ûnu'l-Seqafîye'l-'Ame, Bexdad. r. 73-74.

<sup>28</sup>Cêrmî, Hurson (1996), *Medxel Li'd-Dîrasetu'r-Rîwaye*, Trc: Xazî Derwîş 'Etîye, Daru's-Ş'ûnu'l-Seqafîye'l-'Ame, Bexdad. r. 47.

<sup>29</sup>Izedîn, Îsma'îl (2013), *El-Edeb We Finunehu (Dîraset We'Neqd)*, Daru'l-Fikru'l- Erebi, Çapa Nehê, Qahîre. r. 104-105.

<sup>30</sup>Ebdulmelik, Murtaz (1998), *Fi'n-Nezerîyetu'l-Rîwaye Behs Fi't-Teqniyetu'l-Serd*, Metbe'etu'r-Rîsale, Kuwêt. r. 257.

<sup>31</sup>Perêz, Sabîr (2001), *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî Le Seretawe Ta Kutayî Cengê Duyemî Cihanî*, Çapxane Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa yekem, Silêmanî, r. 212.

Yanî piştî wan dîtin û boçûn û hewildanên pênasekirina vegêranê da em dişên bibêjin ku vegêran bizaveke, keresteyek e û cureyên edebî jî bi awayekê pê tete ristin ku berhemê ji bêgîyanîyê bi gîyan dixe, rih dide berhemê. Lewra çawanîya asta vegêranê dibe egerê çendatîya karîgerîya wê li ser derûnîya mirovan. Dîsa vegêran keresteyeke xave û berê bi naxê her berhemeke edebî ye. Di pênaseyêke dî da vegêran karê serekî yê çîrokê ye, di zimanê ramana axaftinê dide û keresteyên wê tîp û peyv û hevok in.<sup>32</sup> Herwiha di pênaseyêke dî da jî vegêran kerestê yekê ye di hunera çîrokê da ku wê ji hunerên wekî şano û hozana hozankî cuda dike.<sup>33</sup> Herçende di bîyavê hozanê da jî gelek caran hozanvan ji bo vehandina hozanê mifa ji hindê teknîkên vegêranê werdigire û li gor pêdivîya rûdanan tete bikaranîn ku di hozanê da ango helbestê da ev çend li gor pêdivîya helbestavanî tete bikaranîn.<sup>34</sup> Bi gotineke dî helbestvan li gor pêdivîya karê xwe û helbestê wê mifayê ji vegêranê werdigire.

Vegêran li cem Arîsto du şewazên lasaykirina helbestê hene. Yek ji wan eve beref nimayîş kirina rastewxu ya rûdanan diçe bi rêya zarvekeran ku dîyalogê û zarvekirinê li beramberî bîneran encam dide.<sup>35</sup> Ango Arîsto vegêranê dike yek ji terzên zarvekirinê (lasayîkirin) di helbestê da û vegêrane bi rêya zarvekeran dîyar dibe. Bi awayê dîyalogê digel yekûdu diaxivin û bi rengeke rastewxu zarvekirinê ji bo xelkê dikin. Ev çende li cem Arîsto bû, belê li cem Platonî vegêran bi terzeke dî tete pênasekirin. Li cem Platonî behskirina nûçe û bûyerên serdemên kevin yan di serdema niha û ya dahatî da rû dide.<sup>36</sup> Yanî Platon vegêranê dike daçekek, amrazek ji bo dîyarkirina hindê nûçe û bûyeran di serdemekê da di jîyana mirovan da rû dida, wêca ew êdî çî serdem be.

Herwekî ku di pênaseyên destpêkêda dîyar dike merc nîne her rûdaneke bi rêya janrên edebî digihije me rûdaneke rast be, belkû çê dibe mirov xeyalî jî bike û

<sup>32</sup> Celal, Mustefa (2004), *Bîyavê Xwandinê Çend Vekolînek Derbarey Çîroka Kurdî*, Çapxana Hawar, Çapa yekem, r. 57.

<sup>33</sup> Şuca 'Muslim, El'anî (1994), *El-Bîнау'l-Fenî Fî'r-Rîwaye'l-Erebîye Fî'l-Îraq*, Daru'ş-Ş'ûnu'l-Seqaffîye'l-'Ame, Çapa Yekem, Bexdad. r. 8.

<sup>34</sup> Îmad Weysî, Xalid (2013), *Teknîka Vegêranê Di Hozana Muayyed Teyibî da*, Kovara Zankoya, Dihokê, Berpenda 16, Hejmar 1, r. 1.

<sup>35</sup> Salih Muhemmed Hesên, Ardînî (2011), *Sunaiyetu's-Serd We'l-Îqa'*, Daru'l-Hîwar Lî't-Tîba'e We'n-Neşîr We't-Tewzî', Suriye, r. 11.

<sup>36</sup> Eflatun (1974) *Cumhuriyetu'l-Eflatun*, Trc: Fuad Zekerîya, Elhey'e l- mesrîye l- 'Ame- Lî'l-kîtab, Mîsir, r. 267.



vegêranê bike navendek ji bo ragihandina wê xeyalê. Herçend serekanîya behra pitir ya tekist û metna edebî ji rûdanên rast û dorhêla jîyana nivîskarî dizên û serfihildidin bi taybetî roman. Vegêran hunereke kevne û heta peydabûna qutabxanên nû yên edebî girîngîyeke mezin bi vê hunerê ve hatîye dayîn û ji aliyê kesên cuda û qutabxaneyên cuda li gor bîr û boçûnên wan her yekî pênaseyên cuda cuda kirine.<sup>37</sup>

Emê li vê derê hewl bidin ku çend pênaseyan weke mînak bidin ên ku ji aliyê herdu qutabxanên nû yên edebî ve hatine kirin ku ev jî "formalîstên rûsî" û "binyadgerên frencî" in.

Formalîstên rûsî bi dîtînen cuda berê xwe dayîne vegêranê û bi çend şeweyan pênase dayîne wê. Li gor hinan vegêran amraze ango daçeka ragihandina çîrokê ye ji bo guhdar û xwendevanî û vegêr dibe pirek di navbeyna karekterên çîrokê û wergirî da.<sup>38</sup> Yanî armanc ji vê pênaseyê ewe ku vegêran dibe rêbazek di ragihandina bûyerên çîrokê ji bo guhdarî ango xwendevanî. Çi ku çê dibe ku ev kesê çîrokê jê ra tê vegêran tenê guhdar be û tenê guhdarîya bûyeran bike, nek bi karê xwandina wan bûyeran radibe û ev çende bi rêka vegêrî tete encam dan. Yanî vegêr di nav çîrokê da bi karê veguhêstina babetî ji bo guhdar û xwendevanî radibe û bê hebûna vegêrî pêvajoya vegêranê nayê encam dan. Çi ku ew dibe egerê wê çendê karlêkirin di navbera babetê yan çîrokê û xwendevanî da peyda dibe.

Binyadgerên frencî jî çendîn pênase ji vegêranê ra kirine. Pul Rîkurd di pirtûka xwe ya bi navê " *Elwicud Wezeman Weserd filsefet- pul Rîkurd* " da dibêje: vegêran ji sê prensîb an ve pêkhatîye hebûna vegêrî û hebûna xwendevanî yan guhdarî ji bo tê gotin.<sup>39</sup> Yanî heta ku Pêvajoya vegêranê tê encam dan pêdivî bi sê prensîban ra heye: "çîrokê û mijar, vegêr, xwendekar û wergir". Heke ji wan hersê hêmayan yek jê kêm be pêvajoya vegêranê pêk nayê ango dê bibe sedema sistbûna sistema çîrokê. Çi ku pêdivî heye ku di destpêkê da hindêk bûyer hebin da bibin

---

<sup>37</sup> Dildar Îbrahîm, Ehmed (2017), *Tîyur û Teknikên Vegêranê Praktîzekirin Li Ser Romana (Alê Dî Yê Pirê)*, Çapxaneya Hîvî, Çapa yekem, Dihok, r. 17-18.

<sup>38</sup> Meysa Suleyman, Ibrahîm (2011) *Elbunyet's - Serdîye- Fî'l Kîtab'ul Elîmta'-welmuanesse Metbe'et- Wîzaretu'l-Seqafel-'Amel-Surîye- Lî'l-kîtab, Dîmeşq, r. 13.*

<sup>39</sup> Pul, Rîkurd (1999) ), *El-Wicud we'z-Zeman we's-Serd (Felsefet-Pul Rîkurd)*, Trc: Se'îd Elxanimî, El-Merkezu's-Seqafî'l-Erebî, Çapa yekem, Beyrut, r. 31

mijar ji bo çîrokê û pêdivî bi vegêrekê jî heye da wê çîrokê ji bo guhdar ango xwendevanî veguhêze.

Herwusa Cîrar Cînîtî vegêran bi vî rengî pênase kirîye; Nîşana rêzbandîya bûyerane, êca ev bûyer çî rasteqîne bin yan aşupî bin ku bi rêya keresteyekê bête derbirîn ev jî kerestê zimane, bi taybetî zimanê nivîsînê.<sup>40</sup> Wate dîyar dibe ku çîroknûs li vê derê azade ji bo vegêrana wan bûyerên di nav çîrokê da vegêre. Êdî ev bûyer rast bin yan xeyalî û aşupî bin ferq nake. Ya girîng ew e divê keresteyek hebe ku pê derbirînê jê bike û ew jî zimane.

Di pirtûka "*Alemu'r- Rîwaye*" da herdu nivîskar, Rolan Burnuf û Ruyal Uylîyî bi vî rengî vegêran pênase kirine ku vegêran romane ango bi gotineke di vegêran bi romanê daye nîyasîn ku çîrokeke behsê hindêk mêjûyî yên li pey hev hatî dikin her ji destpêkê heta dawîyê dîyar kirî.<sup>41</sup> Yanî vegêran bi romanê daye nasîn ku ewe jî tişteke siruştî ye. Çi ku roman her ji destpêkê heta dawîyê hemî vegêrane û di vegêranê da çîrokek heye behs û qala hin bûyeran dike û ji alîyê demê ve jî ev bûyer di demeke mêjûyî da rû daynîne. Wan rûdanan destpêkek dîyarkirî û dawîyek dîyarkirî yê heyî û rûdan tê da digihije encamekê û bi dawî dibe. Di navbera wan rûdanan da peywendyek heye. Ji wan boçûn û pênaseyan da dîyar dibe ku vegêran şîrovekirineke hişk ya ku dikare li ser hemî tekist û deqên edebî da bête sepandin nîne. Belkû ew amraz û rêyeke ji bo aşkerakirina kûrahîya rûdanekê û vegêran wê li dû şîyanên vegêrî yên dahênerane bête derbirîn. Ev çende hemî bi rêya zimanî tête derbirîn ku bi keresteyeke serekî di derbirîna her babetekê da tête danan ango pira ragihandin û vegêrana rûdanê ye ji alîyê vegêrî ji bo xwendevanî.<sup>42</sup>

Heta niha çî pênaseyên yekgirtî ji bo vegêranê nehatine kirin. Çi ku vegêran babeteke aloze û têkeli hemî cureyên edebî dibe. Eve ji alîyekê ve û ji alîyeke di ve piştî peydabûna qutabxanên nû yên edebî û girîngîdana wan a bi babeta vegêranê bûye egerê vê çendê ku lêkolîner û rexnegirên wan qutabxanan di nav pirtûk û

<sup>40</sup> Dildar Îbrahîm, Ehmed (2017), *Tîyur û Teknikên Vegêranê Praktîzekirin Li Ser Romana (Alê Dî Yê Pirê)*, Çapxaneya Hîvî, Çapa yekem, Dihok, r. 21.

<sup>41</sup> Rulan, Burnuf û Rîyal, Uylîyê (1991), *'Alemu'r-Rîwaye*, Trc: Nîhadu't-Tikrîlî, Daru'l-Ş'ûnul-Seqafîye l -'Ame, Çapa yekem, Bexdad, r. 21-22.

<sup>42</sup> Zuzan Sadiq, Tirwanişî (2008), *Çîroke Şî'ra Kurdî Edgarên Vegêranê Ast û Şêwe Qedrîcan (1972-1911) Wek Nimûne*, Çapxaneye Xanî, Çapa yekem, Dihok, r. 19.

lêkolînên xwe da pênasayên curbicur û cîyawaz ji bo vegêranê dîyar bikin. Em dê gelek caran bibînin ku yek nivîskarî çendîn pênasê ji bo vegêranê darêtiye û her pênasayek ji ya dîtir cîyawaze.<sup>43</sup>

Herî dawî em dikarin bibêjin ku di proses û pêvajoya vegêranê da komeke bûyeran pêkve girêdayî ye ku ev bûyer bi rêya vegêrekê têne arastekirin ji bo wergirango xwendevan û guhdarî. Êca ev bûyer çî bûyereke rasteqîne be û çî waqî'î bin yan aşupî û xeyalî bin. Vegêr van bûyer û rûdanan bi du şêweyan arasteyî guhdarîango wergirî dike çî bi şêweyê zarekî û devkî, çî bi şêweyê nivîskî be.

### 1.1.3. Girîngîya Vegêranê

Vegêran hunereke zor kevnare. Dikare di hemû qadên edebî da bibînin zaravekê toreyî ye û her ji destpêka civaka mirovatîyê serhildaye, mirovê bere çîrok û serhatîyên nêçîrê û çîrokên lehengîyên xwe ji bo xelkê vegêran heta gihiştê asta pîyadekirina efsane û çîvanokan.<sup>44</sup> Lewra hunerek jî bi vê kevnariya xwe ve di hinde qonax û guherînan da her berdewam be û şîyanên hebûna xwe biparêze bêguman ev hunereke berze, çî ku her rêgezeke edebî xwedan xasîyet û taybetmendîyên berz nebe, nikare xwe evqas berdewam bibe û evqas temendirêj bibe.

Divê em bizanin ku çî rojek ser me da nabihure ku em bibêjin vegêran tê da nebe ango em rojane di pîrûsa vegêranê da dijîn. Wêca vegêrana me çî weku axaftinekê yan rûdanekê yan çîrokekê be yan wekî wergir rola xwe bibînin. Cimîs cuyîs sebarê vê çendê dibêje pênc milyon rê hene ji bo vegêrana rûdanekê li dîf ev armanca em ji bo diçin.<sup>45</sup> Belê gelo çend ji wan rêyan hunerî ne û wusa dike ku em vê babetê bixwînin û guh bidenê? Li wir ji bo me dîyar dibe ku dema hizra vegêranê

<sup>43</sup> Dildar Îbrahîm, Ehmed (2017), *Tîyor û Teknikên Vegêranê Praktîzekirin Li Ser Romana (Alê Dî Yê Pirê)*, Çapxaneya Hîvî, Çapa yekem, Dihok, r. 22.

<sup>44</sup> Zuzan Sadiq, Tirwanîşî (2008), *Çîroke Şî'ra Kurdî Edgarên Vegêranê Ast û Şêwe Qedrîcan (1972-1911) Wek Nimûne*, Çapxaneye Xanî, Çapa yekem, Dihok, r. 17.

<sup>45</sup> Semer Ruhî, Feysel (2003), *E'r-Rîwayetu'l-Erebîye El-Bîna We'r-Ruya*, Menşûrat-Îtîhad-Kîtabu'l-Ereb, Dîmeşq. [www.auedam-org/03/study03/262-s-find-book03-sdoo1-htm](http://www.auedam-org/03/study03/262-s-find-book03-sdoo1-htm)

bi dilê me be ev çende çarçova wê jî ji bîra me nabe, çî ku rêya darêtina wê girîngîyeke mezin heye di razîkirina me da bi vê hizrê.<sup>46</sup>

Girîngîya vegêranê ji aliyê hindê rexnegiran ve digihije vê radeyê ku yekem binema û pîverê serekî danîn ji bo dirustbûn û cudakirina janrên edebî û cudakirina romanê ji janrên dî yên edebî bi taybetî.<sup>47</sup> Ji ber vê çendê Şuca Muslim Elanî di pertuka xwe da ewa bi navê " *Elbîнау'l -Fenî –Fî'r Rîwayetu'l -Erebîye- Fil Îraq*" boçuna Wîwrđ Forister dîyar dike ku vegêran ji hemî binemayên romanê kevintire, belê mezintirîn karê hevpişkê di navbera romanan da.<sup>48</sup> Hunera vegêranê heta wî radeyê girînge ku yeke wekî Burxisê çîroknivîs dibêje: hemî tişt hatine gotin, çî tişt nemaye bête gotin, wêca tiştê girîng çîrok nîne belkû ya girîng çawanîya nivêsinê ye.<sup>49</sup> Ke wate li vê derê çawanîya derbirîn û nivîsîna vê vegêranê ye, herwusa pêdivîye vegêrê kesê şareza be û bizane ka dê çawa kar li hemberî xwe bike û wusa bike tam û çêjekê lê bistîne ango vegêran ne ewe bi şeweyeke asayî û zimanek sakar rûdan bêne vegêran. Ji vê çendê derdikeve ku vegêran ne hunere, zaniste.<sup>50</sup>

Herwesa Nîhadu't Tîkrîlî di pertuka xwe da ewa bi navê " *Elrîwayet'ul – Firensîyetu'l-Cedîde*" boçuna Ruber Bincîye dîyar dike û dibêje: her t îşt ku ez bikarim bibêjim û derbirînê jê bikim li cem min ne girînge, belê ev tiştê dibe cihê girîngîyê li cem min rêya gotinê ye û çawanîya derbirînê ye.<sup>51</sup> Çî ku hemî rûdan yên hatine behskirin belê ev çende dibe heke ku berhemê edebî bixwînin û yekûyek li dîf rûdanên wê da biçin, çawanîya vegêranê û nivîsîna berhemîye, vegêran dibe yekane hokar ji bo serkeftina babetê yan jî sernekeftina wê weke Fireng Kirmud dibêje: Heke derbareyî hunera vegêranê di romanakê da bi başî biaxivin wateya wê

<sup>46</sup> Umer Muhemed, Eltalib (1971), *El-Îtîcahu'l-Waqî'î Fî'r-Rîwayetu'l-Îraqîye*, Darul-'Ewde, Çapa Yekem, Beyrut, r. 104.

<sup>47</sup> Şuca 'Muslimu'l, 'Anî (1994) *El-Bîнау'l-Fenî Fî'r-Rîwaye'l-Erebîye Fî'l-Îraq*, Daru's-Şû'nu'l Seqaffîye'l -'Ame, Çapa Yekem, r. 23.

<sup>48</sup> Şuca'Muslimu'l, 'Anî (1994), *El-Bîнау'l-Fenî Fî'r-Rîwaye'l-Erebîye Fî'l-Îraq*, r. 8.

<sup>49</sup> Nefisa, Îsmâil (2005), *Teknîka Vegêranê Di Kurteçîrokên Fazil Umerî da*, Çapxaneyê Hawar, Çapa yekem, Dihok, r. 40.

<sup>50</sup> Cîrar, Cînît û Wayîn, Bos (1989), *Nezerîyetu's-Serd Mîn Wichetu'n-Nezer Île'l- Teb'îr*, Trc: Nacî mustefa, Daru'l-Beyza, Çapa Yekem, r. 54.

<sup>51</sup> Nîhadu't-tîkrîlî, (1985), *Er-rîwayetu'l-Ferensîyetu'l-Cedîde*, Daru'l-Hurîye Lî't-Tîba'e, Elcizû'l-Ewel, Bexdad, r. 48.

çendê digihîne ku em derbarê hemî romanê da bi başî diaxivin.<sup>52</sup> Dîsan Alan Robgirîye bi derbirîneke dî piştgirîya boçûna Fireng Kirmudî dike dema ku dibêje: Çîroknûsê rastqîne ewe ku yê dizane çawa çîrok vegêrîne.<sup>53</sup> Ke wate çawanîya vegêranê dibe pîverê serkeftina karî, ji ber ku vegêran daçekeke karê hunandina têkelîya di navbera wan hemî rêbaz û prensîbên hunerî da dirust dike, ew ên metin li ser ava dibe, wate ev dibe binaxe ji avakirina çîrokê.<sup>54</sup> Ango ji vê çendê girîngîya vegêranê tam û karîgerîyê dide xwendevanê çîrokê ku çi cara ji tam û çêj û sêhra şî'rê ji ya mûsîqayê kêmtir nîne.<sup>55</sup> Bi gotineke dî xweşîya ku xwendevan ji teknîka vegêranê werdigire kêmtir nîne ji xweşîya mirov a ku ji şî'r û mûsîqayê werdigire.

Di dawîyê da em dikarin bibêjin ku vegêran û girîngîya vegêranê di hindê daye dirustkirina karîgerîyeke zor li ser derûnîya xwendevanî û saxkirina mijarê ye heta ku serenca xwendevanî ji bo rûdanên xwe rabikêşe. Lewra ev dîtîna û bûcûn hemî pêkve wê rastîyê dîyar dikin ku vegêran keresteyeke girînge di serkeftin û binyatdanana deqî da û alaveke serekî ye ji bo avakirina bingehe berhema edebî û dîyarkirina rûyê ciwanê berhemê û afirandina deqên nû û teknîkên serinc rakêş.

#### 1.1.4. Cureyên Vegêranê

Di pênasekirina vegêranê da gelek bîr û boçûnên cuda cuda hebûn ji aliyê zana û lêkolîner û rexnegiran ve, bi heman şeweyî derbarê cureyên vegêranê da jî gelek bîr û boçûnên cîyawaz hene ji aliyê lêkolîner û rexnegiran ve. Her ji serdemên kevin da heta vê serdemê çendîn dabeşkirin ji bo cureyên vegêranê dirust bûyîne, her vekolerekê bi dîtîna û bergeha xwe ya taybet dabeşkirinek daye vegêranê. Di vê serdemê da rêjeyeke kêmtir ji cureyên vegêranê hatine dîyarkirin, eve jî nîşa me dide ku mijara cureyên vegêranê çiqas berfirehe.

<sup>52</sup> Şuca' Muslimu'l 'Anî (1994), *El-Bînau'l-Fennî Fî'r-Rîwayetu'l-Erebîye Fî'l-Îraq*, Daru's-Şû'nu'l-Seqafîye'l-'Ame, Çapa Yekem, r. 23.

<sup>53</sup> Rulan, Burnuf û Rîyal, Uylîye (1989), *'Alemu'r-Rîwaye*, Trc: Nîhadu't-tikrîlî, Daru's-Şû'nu's-S eqafîye'l-'Ame, Çapa yekem, r. 23.

<sup>54</sup> Perêz, Sabîr (2001), *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî Le Seretawe Ta Kutayî Cengê Duyemî Cîhanî*, Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa yekem, Silêmanî, r. 216.

<sup>55</sup> Îbrahîm Qadir, Mohemed (1970), *Lêkolînewey Kurteçîrokê Kurdî Le Kurdistanê Başûr da (1970-1980)*, Teza Doktorayê, Kolêja Adabê, Zankoya Selahedîn, Hewlêr, r. 164.

Yan Manfirêd di pertuka xwe da ewa bi navê " *Îmul-Serd-Medxel-Îla Nezerîyetul-Serd*" boçuna rexnegirê frensî Roland Barthes dîyar dike ku gelek cureyên vegêranê hene, Rolan Barthes li ser vê mijarê wiha dibêje: "Di nav cîhanê da gelek cureyên vegêranê hene û me şîyana hijmartina wan hemû cureyan tune ye ji ber ku di destpêkê da curaw cureyeke mezin di nav cureyên edebî bi xwe da heye û gelek şax jê diçin û ev cure hemî dikarin bibin hilgirên çîrokeke mirovatîyê".<sup>56</sup>

Yanî ji gotina Roland Barthesî em fam dikin ku edebîyat bi xwe dabeşî çend cureyan dibe û ji her cureyeke wê jî çendîn şax û çiq dertên û vegêran têkelî wan hemîyan dibe. Vegêran di gelek janrên edebî da tê bikaranîn wekî kurteçîrok, çîrok, efsane, destan, roman, şano, helbestê da.

Kevintirîn dabeşkirin ji bo cureyên vegêranê li cem herdu feylesofên yewnanî Platon û Arîsto bû ku her yekê li gor dîtina xwe dabeşkirinek dabû cureyên vegêranê. Herçendî Arîsto qutabî, şagirtê Platonî ye lê dabeşkirina wî ji ya mamostayê wî cudatire. Platon di kumara xwe da di pirtûka sêyê da ji ev danûstandinên di navbera Sokrat û Edîmanusî da sê cureyên vegêranê dîyar dike. Ev jî wiha ne:

Vegêrana sade û vegêrana wênekirî û vegêrana destanî. Li cem Platonî giringî bêhtir bi vegêrana sade ve hatîye dayîn û li cem wî vegêrana sêyê vegêrana destanî nehatîye ret kirin û dibîne ku vegêrana dramî digel kumarî nagunce.<sup>57</sup> Piştî Arîsto tê û ev jî li gor feraset û têgihîştina xwe dabeşkirinekê dide cureyên vegêranê ku ji dabeşkirina mamosteyê xwe cîyawaztire. Arîsto şêweya destanî piştguh dike û giringî zêdetir daye vegêrana sade û di bin banê du serenavan da dabeş dike vegêranê.

1. Helbestvan bi cînava axaftinkerî bi zimanê wî diaxive û ev şêwaz zêdetir di helbesta strankî da dîyare.

---

<sup>56</sup> Yan, Manfirêd (2011) *'Îlmu's-Serd Medxel Îla Nezerîyetu's-Serd*, Trc: Emanî Abu Rehme, Dar-Neynewa, Çapa yekem, Dîmeşq, r. 55.

<sup>57</sup> Ebdu'r-Rehîm, Elkurdi (1996), *Er-rawî we Nesu'l-Qisesî*, Daru'n-Neşir Li'l-Camî'at, Çapa Duyem, r. 27-28.

2. Dema helbestvan li ser zarê yeke ji kesayetên diaxive. Belê digel vê çendê helbestvan ango hozanvan şêweya xwe ya xudî piştguh naêxe.<sup>58</sup>

Paşê çendîn dabeşkirin ji bo cureyên vegêranê dirust bûyîne ji aliyê lêkolîner û zanayên wekî Burîs Îxinbawim ku yek ji rexnegirên qutabxaneyê formalîstên rusî ye, vegêran li ser du cureyan dabeş dike; vegêrana axaftinê û vegêrana dîyarkirî.<sup>59</sup> Piştî wî Pol Rîkurd di pirtûka xwe ev a bi navê " *Ezeman- Weserd -Elteswîr -Fî Serdu'l Qisesî*" da du cureyan ji bo vegêranê dîyar dike; Vegêrana Aşupî û Vegêrana Mêjûyî.<sup>60</sup>

Li gor pirtûka Remezhan Alan a bi navê "*Zanista Edebîyata Modern*", Franz K. Stanzel vegêranê li ser sê cureyan dabeş dike ku ev jî vegêrana Îlahî ango vegêrana şexsê sêyem, vegêrana şexsê yekem û vegêrana figûrale.<sup>61</sup>

Rewşa vegêrana îlahî, ew vegêrane ku vegêr derheqê karakteran da xwedan gelek agahîyane û gelek çaran mudaxeyan dike. Xwedan otorîteyê berfirehe ku dinyaya vegêranê û têkilîya karakteran baş dizane. Qisetkîrî serdeste li wir.<sup>62</sup>

Rewşa vegêrana şexsê yekem, hem vegêre û hem jî lehengê çîrokê ye. Di vê cure vegêranê da ji qisetkîrinê bêhtir nîşandan heye.<sup>63</sup>

Rewşa vegêrana figûral, di navbera herdu vegêranan da wek sentezekê ye. Wek vegêrana îlahî bi devê şexsê sêyem qiset dike û wek vegêrana şexsê yekem jî bi çavê karakterekî bûyeran li ber me datîne. Dev ji mudaxele û otorîteya berfireh berdaye. Hebûna xwe veşartîye û di şûna wan da cihê xwe spartîye karakterekî.<sup>64</sup>

---

<sup>58</sup> Heyor, Delal (2006), *Bunyetu'n-Nesu's-Serdî Fî'm-Mearic Ibnu'l-Erebî*, Rîsalet Macistêr, Camî'et'um- Menturî, Elcezaîr, r. 54.

<sup>59</sup> Esmâ, Derbal (2014), *Zemenu's-Serd Fî'r-Rîwayat Fezîletu'l-Farûq*, Rîsalet Macistêr, Camî'etu'l-Hac -Xizir, Elcezaîr, r. 16.

<sup>60</sup> Pul, Rîkurd (2006), *E'z-Zeman We's-Serd (E't-Teswîr Fî's-Serdu'l-Qisesî)*, Trc: Felah Rehîm, Daru'l- Kîtabu'l – Cedîde, Çapa yekem, Terablus, r. 22.

<sup>61</sup> Remezhan, Alan (2015), *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebîyata Modern*, Çapxaneyê Peywend, Çapa Yekem, Stenbol, r. 122.

<sup>62</sup> Remezhan, Alan (2015), *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebîyata Modern*, Çapxaneyê Peywend, Çapa Yekem, Stenbol, r. 122.

<sup>63</sup> Remezhan, Alan (2015), *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebîyata Modern*, r. 122.

<sup>64</sup> Remezhan, Alan (2015), *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebîyata Modern*, r. 122.

Nivîskarên Ereb jî gelek dabeşkirin ji bo vegêranê danayne. Emê ji wan behsê polîkirina Ednan Bîn Rizîl bikin ku ewî sê cure danaye. Dabeşkirina wî wiha ye:

- Vegêran ji guşênêrîya axaftinkerî yan jî veguhêzerî
- Vegêran ji guşênêrîya wergirî ango wergirtina axaftina zimanî
- Vegêran ji guşênêrîya gotarê.<sup>65</sup>

Ez naxwazim li wir bi dirêjayî li ser van dabeşkirina rawestim, mebesta min ew bû ku balê bikşînim li ser mijara dabeşkirina cureyên vegêranê da çiqas nêrîn û polîkirinên cîyawaz hene. Ezê hewl bidim ku li ser dabeşkirina rexnegirê rûsî, Tumaşîvîskî rawestim. Çi ku di nav lêkolîner û rexnegirên edebîyatê da dabeşkirina herî zêde bal kêşandîye li ser xwe eve ye. Rexnegirê rûsî Tumaşîvîskî şewaza vegêranê li dû cureyên vegêranê dest nîşan dike û dibêje bi rengeke giştî du cureyên sereke di vegêranê da hene; vegêrana babetî (objective) û vegêrana Xudî ango navxwyî (subjective). Di vegêrana babetî da nivîskar hemû tiştan dizane û heta bîrên nihênîyên kesan jî dizane. Lê belê di vegêrana xudî da bi çavê vegêrî li dîf vegêranê dikeve.<sup>66</sup> Herwesa Usbenîskî jî şewazên vegêranê bi vî rengî dîyar kirîye û behs û qala wan herdu şewazan kirîye.<sup>67</sup>

#### 1.1.4.1. Vegêrana Babetî/Heterodîgeetîk (Objektive)

Vegêrana babetî ango vegêrana derekî (ji derveyî) û vegêrana heterodîgeetîk wek kevintirîn û navdartirîn cureya vegêranê tê zanîn. Hindek caran bi vegêrana rastewxu (yekser) û hindek caran jî bi vegêrana destan tê zanîn.<sup>68</sup> Di hemû lêkolînên Kurdî û Erebî da zaravê hemî tişt zan ji bo vegêrana babetî hatîye bikaranîn.<sup>69</sup> Ev

<sup>65</sup> Sara, Hesan (2016), *Ma Huwe's-Serd*, Malperê Mewcu'. <http://mawdoo3.com>

<sup>66</sup> Mecmû'e Mîne'l-Muellifin (1982), *Nezeriyetu'l-Menhecû's-Şeklî Nisusu's-Şeklanîyînu'l Erus*, Trc: Îbrahîmu'l-Xetîb, Mûessesetu'l-Ebhasu'l-Erebîye, Çapa yekem, Lubnan, r. 189. Hemîd, Elhemedanî (1991), *Bunyetu'n-Nessu's-Serdî Mîn Menzuru'n-Neqdu'l-Edebî*, Merkezu's-Seqafî'l-Erebî Lî't-Tîba'e We'n-Neşir We't-Tewzî', Çapa Yekem, Beyrut, r. 46.

<sup>67</sup> Sîza, Qasim (1985), *Bînau'r-Rîwaye, Dîrasetu'l-Muqarene Fî's-Sulasîyet, Necîb Mehîfuz*, Daru't-Tenwîr Lî't-Tîba'e We'n-Neşir, Çapa Yekem, r. 199.

<sup>68</sup> Perî Salih Hemîd, Muftî (2012), *Gêranewe Le Ku Çîrokekanî Ehmed Muhemed Îsmâil da (Lêkolîneweyekî Rexneyî Şikariye)*, Çapxaney Hacî Haşim, Çapa Yekem, Hewlêr, r. 16.

<sup>69</sup> Perî Salih Hemîd, Muftî (2012), *Gêranewe Le Ku Çîrokekanî Ehmed Muhemed Îsmâil da (Lêkolîneweyekî Rexneyî Şikariye)*, r.16.



cûre vegêran pişt bi vegêrê hemî tişt zan dibeste ku şahrezayek dirûst heye li ser kes û bûyeran ango yê agahdarê bi her bûyereke di nav çîrokê yê. Yanî hokareke gehînere di navbera karekter û xwendevanî da. Herwesa vegêrê hemî tişt zan ji derveyî rûdanan radiweste û bi rêka cînavê kesê sêyemê nedîyar, ewê vegêran pêk tê û rola wî di dirûstkirina karekterî da jî heye.<sup>70</sup> Eve jî dibe egerê hindê ku vegêr li dîf dîtina xwe ji kesan binêre û haydarîyeke tamam li ser jîyan û reftarên karekteran hebe. Herwusa gava vegêr kêmtîşt zan be jî cureya vegêranê dîsa vegêrana babetî ye.<sup>71</sup> Bi gotineke dî vegêr dikare herdu cureyan bi kar bîne belê vegêrê kêmtîşt zan pileyekê ji vegêrê hemî tişt zanî kêmtire.<sup>72</sup>30

Ev têkelî ye jî di demekê da tê encamdan ku vegêr di vegêrana babetî da li pey çarenivîsîna kesê dîyarkirî bigere, yanî vegêr mîna pirekê di navbera xwendevan û karekterî da, wate qehremanî hindek zanyarî hene ku vegêr nikare bigehitê lewra li ser zarê qehremanî di nav çîrokê çîrokeke dî dibêje ku çî bi mebesta zelalkirinê yan jî vegêrana serbor û serhatîya kesê çîrokê be.<sup>73</sup> Lê vegêran her di vegêrana babetî da dimîne. Herwusa dûrketina vegêrî ji rûdanên çîrokê û dîtina wî ya ji piştve dîyar dike ku vegêr ne lehenge, kesek jî çîrokê ye yan jî veguhêze.<sup>74</sup> Herwusa vegêr bi şeweyeke veşartî zanyarîyan kom dike bêyî ku dîyar bike û yê azad e di çawanîya zanîna zanyarîyan da û berhevbûna wan di hemû dem û cihekî da azadîyeke mutleq heye.<sup>75</sup> Belê gelek caran vegêrana babetî evqas nêzîkê waiq'î dibe, xwendevan wusa hizir dike ku tişteke rastî dixwîne. Ev çende jî hindek caran rewşeke neyînî dide li ser deqê ango metnê ku xwendevan bi vê tiştê hest dike ku raporteke derbareyî rûdanekê da dixwîne û ev jî xwendevanî ji çêja xwendina metneke edebî dîr diêxe û ev deq jî taybetmendîya xwe ya edebî winda dike li ba xwendevanî.

---

<sup>70</sup> Celal Enwer, Se'îd (2009), *Teknîkî Gêranewe Le Romanî (Êwarey Perwane) ya Bexatîyar Elî*, Çapxaneyê kemal, Suleymanî, r. 195.

<sup>71</sup> Perêz, Sabîr (2001), *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî Le Seretawe Ta Kutayî Cengê Duyemî Cîhanî*, Çapxane Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa yekem, Silêmanî, r. 242.

<sup>72</sup> Nefîsa, Îsmâil (2005), *Teknîka Vegêranê Di Kurteçîrokên Fazil Umerî da*, Çapxaneyê Hawar, Çapa yekem, Dihok, r. 71.

<sup>73</sup> Celal, Mustefa (2004), *Bîyavê Xwandinê (Çend Vekolînek Derbarey Çîroka Kurdî)*, Çapxaneyê Hawar, Çapa yekem, Dihok, r. 89-90.

<sup>74</sup> Nefîsa, Îsmâil (2005), *Teknîka Vegêranê Di Kurteçîrokên Fazil Umerî da*, Çapxaneyê Hawar, Çapa yekem, Dihok, r. 71.

<sup>75</sup> Rêzan 'Usman, Mustefa (2010), *Binyatî Curekanî Rudaw Le Romanî Kurdî Başurî Kurdistan da (1980-1990)*, Çapxaneyê Spîrêz, Çapa Yekem, Dihok, r. 157.

Di dawîyê da em dişên bibêjin ku ev cure vegêranê azadî û serbestîyeke tewaw heye û dikare bi şêweyeke azad rûdanan şîrove bike. Baştirîn mînak ji bo vê cure vegêranê romanên realîzmê û ketwarî ne.<sup>76</sup>

#### 1.1.4.2. Vegêrana Navxweyî/Homodîgeetîk(subjektive)

Di demekê da ku vegêrana babetî bi şêweyeke rastewxu û babetî dihat vegêran. Herwusa vegêr ji deqê û kesayetên deqê radiwestîya. Paşê cureyek dî ya vegêranê peyda bû ku vegêr di deq û çîrokê da wekî kesayetekê derdikeve pêşîya me û hindek caran bi vegêrana nawekî dihate nasîn ku ev cure vegêran berovajî vegêrana babetî (derekî) ye û ev cure vegêr bi rêya wesifkirinê vegêranê pêk tîne.<sup>77</sup> Herwekî Mîşal Butur dibêje: cînava nedîyar “ew” me ji derve dihêle lê cînava “min”ê jî me dibe jorve di nav metnê da.<sup>78</sup> Ango di vê cureyê vegêranê da cînavên axaftinê yên kesê yekem “ez” û “em”ê bi kar tînin û bi rêya van cînavan rûdan yekser ji xwedevanî ra tê veguhestin.<sup>79</sup> Herwusa siruştê wê peywendîya ku di navbera vegêr û kesayetîyên di nav deqê da tête guherîn. Çi ku di şêwaza vegêrana babetî da bi tenê vegêrî zanyarî hene derheqê karakteran da, belê di şêweya vegêrana navxweyî da karakter jî xwedan heman agahîya nin ev ên vegêr dizane. Çi ku vegêr di vê şêweyê da dibe ku hindek caran bibe vegêrê hemî tişt zan û karakterên metnê jî ji karakterên şêwaza babetî zêdetir xwedan azadîyekê ne.<sup>80</sup> Lewra vegêr jî wek kesayetek ji nav bûyerê da pişikdar bûye û ev tiştê jî tê wê wateyê ku azadîyeke pitir ji bo karakteran peyda dibe. Herwusa di vegêrana navxweyî da vegêr di nav rûdanan da karekterêke û bi zimanê lehengî bi xwe diaxive. Yanî vegêr û leheng yek in û cihê wî di nav çîrokê da dîyare. Lewra em li dîf vegêranê diçin bi rêya dîtina vegêrî. Çi ku heke em li dîf vegêrî neçin rûdan nayêne pêşkêşkirin. Ji ber ku vegêr bi xwe behsê rûdanan dike û

<sup>76</sup> Dildar Îbrahîm, Ehmed (2017), *Tîyor û Teknikên Vegêranê Praktîzekirin Li Ser Romana (Alê Dî Yê Pirê)*, Çapxaney Hîvî, Çapa yekem, Dihok, r. 31.

<sup>77</sup> Perî Salih Hemîd, Muftî (2012), *Gêranewe le Ku Çîrokekanî Ehmed Muhemed Îsmail da, Lêkolîneweyekî Rexneyî Şikariye*, Çapxaney Hacî Haşim, Çapa Yekem, Hewlêr, r. 28.

<sup>78</sup> Senger Qadir Şêx Muhammed, Hacî (2009), *Binyatî Gêranewe Le Dastanî(Mem û Zînî) Ehmedê Xanî û Romanî (Şarî Mûsîqare Spîyekanî) Bextiyar Elî da, Lêkolîneweyekî (Rexneyî-Piraktîkî Berawirdkarî) ye*, Çapxaney Xanî, Çapa Yekem, Dihok, r. 66.

<sup>79</sup> Aram Yusif, Îbrahîm (2015), *Vegêran û Giringtirîn Teknikên wê Dikumela Kurte Çîroka (Ez Wê Nakem) Ya Jaru Dihukî da, Kovara Zankoya Dihuk*, Hejmar 1, Berpenda 18, Dihok, r. 4.

<sup>80</sup> Celal Enwer, Se'îd (2009), *Teknikî Gêranewe Le Romanî (Êwarey Perwane) Ya Bextiyar Elî, Çapxaney kemal, Suleymanî, r.169.*

şîrovekirineke taybet dike û wê şîrovekirinê li ser xwendevanî disepîne û jê dixwaze ku bawerîyê pê bîne.<sup>81</sup>

Hindek caran jî vegêr ji cureyê vegêrê kêmtir zane. Bi gotineke di vegêrê kêmtir zan yek ji kesayetên metnê ye û beşdare di rûdanan da. Cihê wî di nav çîrokê da dîyare û peywendîya wî digel kesayetên di jî heye. Belê zanyarîyên wî, pêzanînen wî ji yên karakterên di kêmtir in.<sup>82</sup> Dîsa di vegêrana navxweyî da binyatê curawcur û firedengî ango dengên curawcur û firenîga, dîtinên cîyawaz diêxe di nav mêşkê karakterî da û rê li ber wan xweş dibe ku ligel xwendevanî rastewxu û rûbirû be û derbirînê ji naxê xwe bike.<sup>83</sup> Lewra xwîner hest bi êş û azarên leheng û karakterên di nav deqî da dike û beşdarî vegêranê dibe. Ev şêwaze ji bo derûnîya vexwînerî nêzîke û gelek caran ji egerê gelek nêzîkbûna vexwînerî û karakterî ku vexwîner wusa hest pê dike ku ew bixwe di nav rûdanan da dije. Her ji ber vê çendê em dikarin bibêjin ku vegêrana navxweyî pitir cihê bawerîya xwînerî ye û herwusa kesayetî bixwe wê bûyerê vedigugêze ya ku hatîye serê wî. Di vegêrana navxweyî da vegêr pêgîr nîne girîngîyê bi rûxsar û xuyetîya babetê çîrokê bide. Ango dema çîroknûs ji rûdanên çîrokê dûr bikeve ev dibe harîkar ku rastewxu têkelî çîrokê nebe û xwe nekete kesek ji kesayetîyên çîrokê. Belkû jî ji dûr ve temaşeyî çîrokê dike û dest bi çarçovekirina giştî ji bo çîrokê dike.<sup>84</sup> Dîsan ne şerte ku nivîskar yek şêwazê bi kar bîne di çîroknê xwe da. Hindek caran herdu şêwaz têkelê hevûdu dibin. Ew jî dema vegêr di vegêrana babetî da li pey çarenûsa kesayeteke destnîşankirî digere û rêyeke zincîreyî ji me ra dîyar dike. Aya ewî kesî çî kirîye û çî zanîye, paşî serenca me ji ewî kesî ji yeke di ra radikêşe heta ku ser ji nû ji bo me dîyar bike û bi rêyake zincîreyî ka ewî kesî çî kirîye û çî guh lê bûye û bi vê çendê leheng rênîşandar û rêberê vegêranê ye.<sup>85</sup>

<sup>81</sup> Nahîze, Setar (2003), *El-Bunyetu's-Serdîye Fî'l-Qisessi's-Soffîye'm-Mukewînat We'l-Wezaîf We't-Teqniyat*, Menşurat Îtîhadu'l-Kîtabu'l-Ereb, Dîmeşq, r. 82.

<sup>82</sup> Mu'tesem Ehmed Hemed, Emîn (2012), *Binyatî Tuxmekânî Gêranewe Le Çîrokekanî Şêzad Hesenda*, Namey Master, Zankoya kûye, r. 11.

<sup>83</sup> Ebdullah, Îbrahîm (1998), *El-Bînau'l-Fenî Lî'r-Rîwayetu'l-Herb Fî'l-Îraq*, Daru's-Ş'ûnu'l-Seqafîye'l-'Ame, Çapa Yekem, Bexdad, r. 196.

<sup>84</sup> Zuzan Sadiq, Tirwanîşî (2008), *Çîroke Şî'ra Kurdî Edgarên Vegêranê Ast û Şêwe Qedrîcan (1972-1911) Wek Nimûne*, Çapxaneyê Xanî, Çapa yekem, Dihok, r. 39-40.

<sup>85</sup> Rêjîn Cemîl, Xelîl (2014), *Hunerên Çîroknivêsinê Li Cem Nuerdîn Zaza*, Nama Masterê, Zankoya Dihok, r. 76.

Di dawîyê da em dikarin bibêjin ku nivîser bi zimanê axaftinkerî rûdanan tomar dike û xwe digel yeke di ji palewanên çîrokê dike yek kes.

### 1.1.5. Di Çîroka Kurdî da Vegêran

Çîrok her ji kevin da peyda bûye, dema mirovî hest bi tirsê û dudilîyê kiriba ji bo borandina dema xwe çîrok digotin û guhdarîya çîrokê dikirin. Çîrok di nav folklorê hemû milletan da dihête dîtin ango kevnatîya wê nikare mêjûya wê ya dirust dîyar bike. Dîsa hunera çîrok nivîsînê kareke bi sanahî nîne, pêdivî ye nivîskarî şarezarîyeke baş hebe ji bo hilbijartina şêwazên hunerî yên guncayî ji bo çîroka xwe. Çi ku pêdivî ye nivîskar pitir berê xwe bide siruşt û hesta derûnî ya kesayetîya lehengî û kesên dîtir.

Geryan di nav çîroka kurdî da her ji destpêkê heta niha ji bo destnîşan kirina şêwaza vegêranê, kareke bi sanahî nîne belkû eve tenê dibe mijara tezekê lê em dikarin çend xalekan destnîşan bikin û li ser wan rawestin. Bêguman çîroka kurdî wekî her karekî destpêka wê ya kiz û lawaz û sade û sakar bû ji hemû alîyan ve, paşê hêdî hêdî pêş ket û ji wê sadeya tê da qonax li dîf qonaxê derbas bû û ber bi geşebûnê ve çû. Heke em berê xwe bidine destpêka çîroka kurdî li gor dîtina Ferhad Pîrbalî "çîroka Mem û Zînê ya Mela Mehmûdê Beyazîdî ye ku bêguman çîrokek disa 1856ê hatibe nivîsîn ji aliyê terza vegêranê ve dê ya kevin û folklorî be", di vî warî da Ferhad Pîrbal dibêje: "Hewceye bizanin ku di sala 1856an da bi awayeke gelemperî alav û terza vegêranê di wêjeya hemî gelên di dinyayê da, di pile û aste ke bê reng da bûn hêj ne Guy de Maupassant û ne jî Anton Çehov peyda nebûbûn". Bayezîdî ji bo vegêrana çîroka Mem û Zînê pişt bi pirtûka Ehmedê Xanî bestîye belê di dema vegêranê da hindê guherîn êxistine naveroka çîrokê, Bayezîdî di vegêrana xwe da çî biha û girîngî bi layenên sîyasî û neteweyî nedaye, ji ber hindê em dikarin bibêjin şêwazeke di û vegêraneke cîyawaz û serbixwe ji ya Ehmedê Xanî bi kar îname. Eve bi taybetî ji layê peyrawkirina sîstema pexşan û bikarînan rêgezên vegêrana çîrokê da, dîyalog û monolog, dirustkirina girêyê, şêwaza vegêranê.<sup>86</sup>

---

<sup>86</sup> Ferhad, Pîrbal (2000), *Mela Mehmûdê Bazîdî (1799-1867) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsê Kurde*, Çapxana Wezareti Perwerde, Çapa yekem, Hewlêr, r. 32.

Dîsan heke berê xwe bidine çil hîkayetên Mela Mehmûdê Bayezîdî da dê bibînin ku binemayên vegêranê bi şeweyeke giştî di wan çil hîkayetan da tête dîtin wekî dîyar ku hindek caran bi şeweyeke sanahî tête dîtin û hindek caran jî bi şeweyeke zehmet tête dîtin, çî ku hîkayet kurt in. Vegêrana babetî ango objective di piranîya hikayetên Mela Mehmûdê Bayezîdî da bi aşkerayî û bi asanî têne dîtin. Yanî vegêr tê da yê dîyar û azad e di vegêrana babetî da. Belê di vegêrana navxweyî ango subjectîvê da di piranîya hikayetan da kême ango sanahî nayê dîtin. Çî ku rola vegêrî tê da dîyar nîne. Dîsan tuxmên vegêranê di nav hikayetan da hindek caran bi sanahî têne dîtin û hindek caran berovajî. Ji ber kurtîya wan hikayetan karîgerî di wê çendê da kirîye ku tuxmên vegêranê bi yek rêje nebin di hemî hikayetan da, di wan hikayetan da vegêran roleke berçav digêre bi aşkerayî di wan çil hikayetan da bi şewaz û terzên cuda tête dîtin, lê siruşt wan hikayetan kurt e û ji ber vê yekê hindek caran bi kêmî vegêran tête dîtin û gelek caran nivîskar di wan hikayetan da dibe vegêr û rolê vegêrî digêre. Di dawîyê da em dikarin bibêjin ku piranîya wan çîrokan bi peyvên neqil dike vedigêrin. Hikayet dikin, dest pê dikin, yanî alavê hikayeta folklorî pê ve dîyar e û ev alave ji bîrdanka xelkê hatîye wergirtin, ne verêja bîra dahênera çîroknûsî ye. Çî ku hemî kes, vegêr û çîrokbêjên millî dema çîrokekê vedigêrin bi vê destpêkê dest pê dikin, ev teknîke xasîyeteke şexsî ya çîroknûsî ye. Çîroka hevçerxa piranîya milletên misilman di qonaxa serhildanê da ji vê teknîkê di bê behir nîn in û li vê derê dîyare ku çîroknûsî nekarîye xwe ji vê şewazê rizgar bike.<sup>87</sup>

Çîroka "Şewêş"<sup>88</sup> ya Fuad Temoyî bi dîtina hin kesan ve wekî yekemîn çîroka kurdî ya modern tê hesabandin ku li derûdora zarokekê diqewime. Şewêş kurê şivaneke belengaze, şeweyê vegêrana wê asayî ye, vegêr ji derveyî çîrokê ye û hemû tiştzane, derbarey vê çîrokê Ferhad Pîrbal dibêje: "Ev çîroke ji aliyê hunerî ve dîyalog, monolog, girê û şîrovekirina hest û soz û xeyala lehengî tê daye, ji bilî wê

<sup>87</sup> Ferhad, Pîrbal (2000), *Mela Mehmûdê Bazîdî (1799-18679 Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsê Kurde*, Çapxana Wezareti Perwerde, Çapa yekem, Hewlêr, r. 80-81.

<sup>88</sup> *Di Sedsaliya Wê De Rojî Kurd* (1913), Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Di hejmara yekemîn da di, r. 121-122ê da ; beşa duyem jî di hejmara duyemîn da di, r. 155-156ê da.

berovajî hikayetên hebû nebû ye, dema niha di vegêrana rûdanên çîrokê da bi kar têt".<sup>89</sup>

Wusa diyarê ku teknîkên vegêranê gelek kêr hatine bikaranîn di destpêka çîroka kurdî da, belê hindek hewldan hene wekî “*Di Xew De*”<sup>90</sup> ya Cemîl Saîbî. Ku ev çîroke ji aliyê hunerî ve sade û hêsane û kêmasî tê da hene lê ewê çendê nagehîne ku nivîskarê vê çîrokê çî behrew û zîrekî nîne, belkû zîrekî û şarezayîya nivîskarî di hindek aliyê dî da diyar dibe. Nîşandan û karesata vê çîrokê di çarçoveya xewnekê derbas dibe, belê ji aliyê hunerî ve harîkarîyeke baş ya nivîskarî kirîye ku bikare bi şêweyeke hunerî çîrokeke wusa çê bike. Bi sedema xewnekê her çî mebest û nehînfîyên xwe hebûye karîye behs bike. Yanî nivîskar dikare mebest û wateyên xwe bi awayeke hunerî nîşan bide. Ji bilî hindê di vegêrana vê serhatîyê da heke di hindek cihan da mubalexe jî hebe pêdivîye lê negire. Çî ku di xewnekê da eve dibe kareke asayî.<sup>91</sup>

Çîroka hunerî ya kurdî di destpêka salên 30an da yanî bi rêka kovara Hawar cemawer berfirhek kom kir li derûdora xwe. Çîrok di vê serdemê da xwedan cemawer û xwîner bû. Ji aliyê hunerî ve ev çîrok wek şêwe, teknîk, ziman û şêwaza derbirîne di asteke tewaw û pêgihîştî da ye.<sup>92</sup>

Em dikarin bibêjin ku gelek teknîkên nû di nav çîrokên Hawarê da hatine bikaranîn ku eve tişteke nû bû ji bo wê serdemê. Ferhad Pîrbal dibêje: di nav çîrokên Hawarê da yekem car dibînin ku zimanê duyemîn ango cihnavê kesê duyê yê tak ji bo vegêrana çîrokan ji aliyê Kamiran Alî Bedirxanî ve hatîye bikaranîn. Bi taybetî di çîroka wî ya bi navê Lawikê Mîn da cihnava kesê duyem “tu” hatîye bikarînan ku eve teknîkeke nû ya vegêranê ye evî kesî bikarînaye di nav çîrokên kovara Hawarê

<sup>89</sup> Ferhad, Pîrbal (2000), *Mela Mehmûdê Bazîdî (1799-1867) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsê Kurd e*, Çapxana Wezareti Perwerde, Çapa yekem, Hewlêr, r. 171-172.

<sup>90</sup> Cemîl, Saîb (2009), *Di Xew Da*, Ji Soranî bo Kurmancî Werger: Ziya Avcî, Çapxana Avêsta, Çapa Yekem, Stenbol.

<sup>91</sup> Hussen, ‘Arif (2011), *Çîrokî Hunerî Kurdî (1925-1960)*, Çapxaneya Aras, Çapa yekem, Hewlêr, r. 22.

<sup>92</sup> Ferhad, Pîrbal (1997), *Çîrokekanî Kovarî Hîwa, Kovara Raman, Hejmar 14, r. 45.*

da.<sup>93</sup> Nimûne ji çîrokê "Şevkê tu pir dereng mayî û gava tu hatî mal, di destên te de tîfingêke nû û çend sed berik hebûn..."<sup>94</sup>

Herwusa di çîroka "*Ber Tevnê Mehfurê*"<sup>95</sup> ya Celadet Alî Bedirxanî da ku di sala 1925ê da hatîye nivîsîn. Ev çîroke, çîrokeke hunerî û gelek dirêje, cihê wê ji aliyê teknîkê ve dihêle ku wek çîrokeke zindî bimîne.<sup>96</sup>

Di serdema kovara Gelawêjê da çîroka kurdî pêngaveke mezin pêşve çû. Herçend çîrokên wê kovarê di qalibeke sakar da dijîyan û zêdetir ji çîrokên amujgarî, şîretî û folklorî nêzîk in û Elaeddîn Seccadî û Şakir Fettah jî çîroknûsên wê kovarê ne.<sup>97</sup> Yanî berhemên wê kovarê dirêjepêdana hikayet û babetên folklorî yên kurdî ne.

Derbarê teknîkên çîroka kovara Gelawêjê da şewaza vegêrana tê da bi asayî hatîye bikaranîn. Evca çî rastewxu bin ango çîroknûs li ser zimanê xwe serhatîyê bivegêre yan ne rastewxu be û bi rêka kesekî di nav çîrokê da rûdanan bivegêre.<sup>98</sup> Herwusa di çîrokên kovara Gelawêjê da girîngîyek mezin bi wergêrana çîroka bîyanî daye, ji ber vê çendê jî em dê bibînin ku teknîkeke hunerî ya nû tîkelî çîrokên wê serdemê bûye.

Di salên 50yan da bi taybetî di naverasta salên 50yan da çîroka kurdî bi qonaxa geşedan û çespondina çîroka kurdî tete hijmartin. Çendîn kovar derketin, wek Pêşkewtin, Şefeq, Bilîse û Hîwa ku bi rêka van kovaran dergeheke nû li ber nivîskaran vebû ji bo belavkirina berhemên wan.<sup>99</sup> Şewaza vegêrana çîrokên wan kovaran da bi vî rengî bû, bo nimûne di kovara Hîwayê da bi vî şeweyî bû ku piraniya çîrokên wê kovarê li ser şewazên vegêrana paşko dirust bûyîne. Wek çîroka

---

<sup>93</sup> Ferhad, Pîrbal (1997), Çîrokekanî Kovarî Hîwa, *Kovara Raman*, Hejmar 14, r. 44.

<sup>94</sup> Kamîran Alî, Bedirxan (2012), Lawkê min, *Kovara Hawar*, Çapxneya Belkî, Çapa Duyem, Hejmar 4, Stenbol, r. 61-62.

<sup>95</sup> Celadet Alî, Bedirxan (2012), *Ber Tevnê Mehfurê*, *Hawar*, Çapxaneya Belkî, Çapa Duyem, Hejmar 4, Stenbo 1, r. 51-54

<sup>96</sup> Enwer Muhemmed, Tahir (1998), Rolê Kovara Hawar Bo Pêşxistina Çîroka Kurdî ya Hunerî, *Kovara Metîn*, Hejmar 75, r. 41.

<sup>97</sup> Ferhad, Pîrbal (1997), Çîrokekanî Kovarî Hîwa, *Kovara Raman*, Hejmar 14, r. 47.

<sup>98</sup> Muhemmed Dilêr Emîn, Muhemmed (2004), *Rolê Kovara Gelawêjê Le Geşesendin û Pêşxistinî Edebî Kurdî*, Çapxane Wezaretê Rewşenbîrî, Çapa yekem, Silêmanî, r. 86

<sup>99</sup> 'Umer Me'rûf, Berzencî (1978), *Lêkolînewe û Biblografîyayî Çîrokî Kurdî (1925-1979)*, Çapxaneya Kurî Zanyarî Kurd, Bexda, r. 75.

"Şetil" û "Dilsozî Nemir" û gelekên dî.<sup>100</sup> Wusa ji bo me dîyar dibe ku çîroka kurdî di qonaxa 50an da bi vegêrana paşko dibeste. Vegêrana paşko" eve ku vegêr hindek rûdanan vedigêre ku ev rûdan berî dema vegêranê hatîye rûdan. Ango ji demên borî ne û bi şêweya rabirdû têne vegêran."<sup>101</sup>

Di salên 60an da çîroka kurdî pêngavên baş havêtin û rûdanên çîrokê hatine guherîn ji bo rûdanên şoreşa 61ê Îlonê û ev hevrikîya di navbera kurdan û dewleta merkezî Bexdayê da, wek di çîroka "*Kwêrereyekî Jîyan*" ya Sedreddîn Arif ku bi teknîkeke nû hatîye nivîsîn, di vegêrana wê da flaşbak hatîye bikaranîn ango dûmahîk anîye destpêkê. Piştî Sedreddîn Arifî, Kake Mem Botanî têt ku di biwarê nûkirina çîrokê da vî kesî mifa ji têkşikandina demê kirîye, ku eve xaleke girîng a karwana nûkirinê ye di çîroka kurdî da.<sup>102</sup>

Heke em berê xwe bidine çîroka kurdî ya li devera Behdînan bi kurtî mirov dişê bibêje ku salên 60an qonxa peydabûna navê çîrokê ye, çîroka hunerî li devera Behdînan. Çi ku heke em wan çîrokan bi rengeke giştî bixwînin, em dê bibînin ku hemû vegêranên sivik û sade ne û dagirtîne ji peyvên ku çîrokê ne livînin. Belkû li dû hunerên nû yên çîrokê pîrbêjîyek mişe û zor di nav da heye. Wan çîrokan jarî û debara xelkê sade d nav komelgeha sade da xuya û berçav kirîye û çîrok pitir di nav komelgeheke pêşkeftî da serê xwe hildide. Pitirîya rûdanên wan çîrokan kêşeyên komeletîyê ne ji bilî serhatîya Salih Ruş dî ku kêşeke raste sîyasî ye.<sup>103</sup> Şêweya vegêranê di nav vê serhatîyê da şêwaza babetî ye ku cihnavê kesê sêyê "ew/wî" bi kar hatîye. Yekemîn çîroka Behdîni ye vegêr tê da serhatîya girtîyekê vedigêre. Lewma vegêr ji derveyî çîrokê ye û hemî tiştan ji kesayetîyên çîrokê dizane. Dîsa ev cihname dema serhatîyên ku berî çend salane ji dema vegêranê cuda dike ku dema nivîsîna metne ye. Ev şêwê vegêranê yê belav bû di nav çîrokên devera Behdînan da ango şêwê vegêrana paşko dihate bikarînan.

<sup>100</sup> Hîmdad, Huseyîn (1997), *Naverok û Ziman û Teknîkî Hunerî Le çîrokekanî Kovarî Hîwa da (1957-1963)*, *Kovara Raman*, Hejmar 8, r. 13.

<sup>101</sup> Hîmdad, Huseyîn (1997), *Naverok û Ziman û Teknîkî Hunerî Le çîrokekanî Kovarî Hîwa da (1957-1963)*, r. 13.

<sup>102</sup> Îbrahîm Qadir, Muhemmed (1997), *Lekolînewey Kurte Çîrokî Kurdî Le Kurdistanî Başûr da (1970-1980)*, Teza Doktorayê, Koleja Adab, Zankuya Selahedîn, Hewlêr, r. 168-169.

<sup>103</sup> Xalid, Salih (2010), *Kurteçîroka Kurdî Li Devera Behdînan (1960-2005)*, Çapxaneyê Hawar, Çapa yekem, Dihok, r. 49.



Di salên 70an da edeb bi giştî û çîroka kurdî bi taybetî guherînên mezin li ser peyda bûn. Ev jî ji egerê ragihandina beyannameya 11ê Adarê ku tê da kawdan li deverê bi rengeke giştî hatine guhertin û çû di qonaxeke giring û mêjûyî da û ji hemî alîyan da ve ku yek ji wan jî layenê edebî û rewşenbîrî bû. <sup>104</sup> Çîroka kurdî ji aliyê naverok û rûxsarê ve guherîn bi ser da hatin ku berî wê şewazeke lawaz û folklorî bû, ango vegêran li ser zîncîra demê fizîkî bû, binemayên destpêk, naverast, dawî tê da dîyar bûn. <sup>105</sup> Herwusa di buhara salên 70yan da grupa Riwange peyda bû ku evê grupî roleke mezin hebû bo pêşexistina edeba kurdî bi giştî û çîrokê bi taybetî û hemî merama vê grupê ev bû ku çîroka kurdî ji sistîyê û dûbarebûnê rizgar biket, ango cîhaneka nû bû çîroka kurdî peyda bike, dîwarek di navbera çîroka kevin û nû da dirûst bike teknîkeka taze û bikaranîna dîyalok û monolukê û hembêz kirna vegêranê û bikar anîna şîyanên hizrî astê çîroka kurdî bilind kire ve. Ev grupe piştvan bû ku çîroka kurdî ji paşkeftinê û rawestîyanê rizgar bike û ber bi formên nû yê derbirînê bibe wek hizr û şewaz. Em dikarin bibêjin ku şeweyê vegêranê di çîroka kurdî da bi giştî her ji destpêkê heta dûmahîka salên 60an ya asayî bû, pêkhatî bû ji dirêjîpêdan û çareserîya serve serve bû babetan, rêbaza amojgarî, wênekirina kesan û rûdana ji derve bi tenê, herçend kit kitên çîrokan hebûn hindek şewazên nû tê da dihatne bikarînan, wek monlog, belê piştî salên heftêyan werar kefte çîroka kurdî û êdî çîroknûs ketne xema çawanîya vegêranê, lewma çendîn teknîkên nû peydabûn ji wan pêla hişyarîyê, montaja dem û cihî, monologa rastewxu û nerastewxu <sup>106</sup>

## 1.2. Vegêr

Ew şexse ewê bi" navbeynkar" tete nîyasîn. <sup>107</sup> Ango naveroka çîrokê yan rûdanên çîrokê ji bu me vediguheze, evca çî li ser zarê wî bixwebin ku deshelata navendî di destê wî daye, û çareserîya gişt arîşeyan dike li dîf taybetmendî û binemayên hizrî yê kesayetîya xwe çîrokê beref hîvî ûmedên felsefa taybeta xwe

<sup>104</sup> Xalid, Salih (2010), *Kurteçîroka Kurdî Li Devera Behdînan (1960-2005)*, Çapxaneyê Hawar, Çapa yekem, Dihok, r. 56.

<sup>105</sup> Zahîr, Roj Beyanî (1997), *Çîrokî Hunerî Kurdî Şêwe û Şewaz û Bunyad*, Çapxaneyê Wezaretê Rewşenbîrî, Hewlêr, r. 367.

<sup>106</sup> Nefisa, Îsmâil (2005), *Teknîka Vegêranê Di Kurteçîrokên Fazil Umerî da*, Çapxaneyê Hawar, Çapa yekem, Dihok, r. 53.

<sup>107</sup> Remezhan, Alan (2015), *Destpêkek Ji Bo Zanîstaya Edebîyata Modern*, Çapxaneyê Peywend, Çapa Yekem, Stenbol, r. 117.

dibe, ku em dikarin bibêjin vegêr dikare wesa qala kesên di nava çîrokê bike herwekî ji wan xerîbe anku bîyanîye. Dîsan vegêr dişê amajê bi hindek karekteran yan karekterekî bidet ku bivê amajekirnê zanîna vegêrî tenê dê di asta wan pêzanînan daye ku nivîser didetê, çunke ew kesayetî rolê xwe dinava berhemî yan çîrokê da di bîne, ji azadî û asta pêzanînen wî kêmbê. Di vî cureyê vegêranê da asta berhemî berz dibe. Dîsan peywest nake ew çîroka ji bu me dihête vegêrandin ya waqî yan aşupî bît, lê tenê peywest dike vegêr bizanît dê çawa buyeran dete pal cihnavan, çunke cihnava di vê pêvajoyê da giringîyeka zor heye.

### 1.2.1. Pênaseyên Vegêrî

Rexnegirên edebî li ser vê çendê rêkkestine ku vegêran li ser sê rêgezên tête avakirin. Ev jî; (nivîser û çîrok û xwendevan) yan (babet û vegêr û wergir). Wekî ku li jêr dîyar dike:

Babet - Vegêr - Wergir<sup>108</sup>

Çawa ku li jor jî dîyar dibe vegêr dibe pirek di navbera babet û wergirî da û amadebûna vegêrî di nav pêvajoya vegêranê da ye çalak û dîyare; çî ku ew bi karê rêkxistin û polînkirina babetî radibe.<sup>109</sup>

Vegêr wek yek jî rêgezên serekî yê pêvajoya vegêranê ye û her ji kevin da ciheke girîng û berçav di nav hîkayet û destanên li ser zarê folklorî hebû ye. Lewra digel hebûna nivîsîn û derkeftina tekist û janrên edebî bi taybetî çîrok û romanê da pêkhateyeke girîng bi laşe ya wê ve hatîye girêdan. Hemî serdavên tevna romanê bi wê ve hatine girêdan. Vegêr ew keresteya nivîser rûdanekê pê vedigire ku navê duyê ye nivîserî lê dana ye.<sup>110</sup> Helbet merc nîne hemî dema vegêr nivîser xwe bi xwe be, çî ku vegêr wekî hemî karakterên di di nav romanê da pêkhateyeke destkirde afirandîye ango “Vegêr bunewerêke jî peyvên dirust dikan, bi tenê di nav rûdanên

<sup>108</sup> Esmâ, Derbal (2014), *Zemenu's-Serd Fî'r-Rîwayat Feziletu'l-Farûq*, Rîsalet Macistêr, Camî'etu'l-Hac -Xizir, Elcezaîr, r. 17.

<sup>109</sup> Heyor, Delal (2006), *Bunyetu'n-Nesu's-Serdî Fî'm-Mearic Ibnu'l-Erebî*, Rîsalet Macistêr, Camî'etu'm- Menturî, Elcezaîr, r. 52.

<sup>110</sup> Necim Xalid Necmedîn, Elwenî (2004), *Bînayî Kat Le Sê Nimuney Romanî Kurdî Da (Janî Gel, Şar, Raz) Lêkolîneweyekî (Tîyurî û Piraktîkî û Rexneyî) ye*, Çap û Pexşî Serdem, Suleymanî, r. 36.

romanê da dijîn.<sup>111</sup> Lebelê dibe ku vegêr hindêk caran wek bînerekê bûyeran vegêre yan bareke vegêranê li ser pêkhatayên wê bin, wate nivîser deqê bi peywendîyeke aloz û bi nav yêk da çûyî û fireh dane û pêk ve têtê girêdan ev peywendîye jî bi çend rengan derdikeve.<sup>112</sup> Çawanîya vegêranê ya girêdayî wê peywendîyê ye ewa di navbera nivîserî û vegêrî da, lê pirsîyar ewe ku aya vegêr bi çi çav teferrûatên bûyerê vedigerîne? Herwusa vegêr bi rêka çi kenal bûyerê vedigerîne? Gelo vegêr wek çavê kamîra bûyerê vediguheze yan jî vegêr mayê xwe di bûyerê da dike?<sup>113</sup> Bersivandina van pirsan bûye cihê girîngîdan û berçav wergirtina rexnegir û vekoleran û çendîn dîtînan û boçûnên cuda cuda li ser vê babetî hene. Her yekî bi rexê xwe ve hewil daye cih û dîtînan û çawanîya wê peywendîyê destnîşan bike. Ev a vegêrî bi vegêranê ve heye, dîsan jî ber girîngîya vegêrî di pêvajoya vegêranê da bûye egerê ew ê çendê ku gelek jî vekoleran pênasayên cuda cuda jî bo vê kirine. Pênasekirina vegêrî kareke bi sanahî nîne, çi ku vekoleran dîtînan cîyawaz derbarê vegêrî hene. Hindêk vegêrî wek nivîserê çîrokê dibîne û hindêk jî van jî hevdu cuda dikin û hindêk jî dibêjin ku vegêr sîbera nivîserî ye di nav deqa çîrokê da.<sup>114</sup> Ji ber van boçûnan çendîn pênase jî bo vegêrî hatine darêtin. Bo nimûne hindêk dibêjin vegêr axîverê bi karê vegêrana çîrokê bû guhdarî radibe û ev axîver yan nivîsere yan vegêre.<sup>115</sup> Di vê pênaseyê da cext li ser wê çendê hatîye kirin ku dibe vegêr; nivîser bi xwe jî be yan keseke dî be. Wate ne nivîser bi xwe ye û erkê wî veguhestina babetê ango ya çîrokê ye jî bo guhdarî yan jî xwendevanî radigihîne û vedigêrîne.

Di dawîyê da em dikarin bibêjin ku nivîskar vegêrî dike amraz da bi karê vegêrana vê babetê rabe, divê vê mijarê bigihîne xwendevanî jî ber vê çendê jî ev hemî pênase girîngîyê dide li ser hebûna vegêrekî di pêvajoya vegêranê da. Lê belê

<sup>111</sup> Marî Barxas, Yusa (2013), *Resaî'l-Îla'r-Rîwayî's -Şab*, Trc: Salih Îlmanî, Daru'l- Meda, Çapa Duyem, r. 44.

<sup>112</sup> Perêz, Sabîr (2001), *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî Le Seretawe Ta Kutayî Cengê Duyemî Cîhanî*, Çapxane Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa yekem, Silêmanî, r. 213.

<sup>113</sup> Muhsin, Usman (2010), *Hizirkirin Di pirsên Rexnê da, Vekolîn Nivîsarên Raveyî û Piraktîkî Di Hêla Rexnê da*, Çapxaneyê Rewşenbîrî, Çapa Yekem, Hewlêr, r. 99.

<sup>114</sup> Necim Xalid, Elwenî (2015), *Deshelatî Hikayetxiwan Le Çîrok da Be Nimuney Ku Çîrokî (Kê Westa Kerîmî Kûşt) Le Nusînî Muhîn Çînî*, Çapxaneyê Zankoya Selahedîn, Hewlêr, r. 9.

<sup>115</sup> Sîham 'Elî Heza', Esirur (2010), Elsirur (2010), *El-Bînau'l-Fenî Fî'r-Rîwayatu's-Suhêl Îdrîs*, Rîsalet Macîstêr, Camîetu'l-Beyt, El-Urdin, r. 35.

ne merce ku ev vegêr bi tenê yek be, belkû hindek caran vegêr hene ku vegêranê ji bo gelek wergiran yan bi tenê ji bo wergirekî dikan.<sup>116</sup>

### 1.2.2. Cureyên Vegêrî

Li gor dîtîna û bîr û boçûnên lêkolîner û rexnegiran dabeşkirina cureyên vegêrî zehmettirîn û aloztirîn kare di vê mijarê da. Ji ber ku gelek lêkolîneran dîtîna û boçûnên cud a cuda hene di vê mijarê da û her yekî jî bi awayeke cuda dabeşkirinek daye cureyên vegêrî. Ev çende jî bûye egerê fireh vegêrîyê di vegêranê da û boçûnên cuda derketine holê.

Di demên kevin da platon û Arîsto girîngî dayîne li ser sê cureyên vegêrî û ev jî wiha ne:

Cureya yekê, axîver yan hozanvan yan jî her cure nivîserek ku dengê xwe bi kar bîne.

Cureya duyê, vegêr pêşbînîya dengê kesayetekê yan hindek kesayetan dike, bi dengê wan kesayetîyan diaxive, ne bi dengê xwe yê taybet diaxive.<sup>117</sup>

Cureya sêyê, di vê cureyê da vegêr bi têkelkirina dengê xwe ligel dengên kesayetîyên dîtir radibe.

Di çerxên nû da kesê girîngî bi cureyên vegêrî dayî Henrî Cîmis (1834-1916) bû ku ev nivîskar û rexnegirê emrîkî girîngîyeke baş bi cureyên vegêrî û guşenêrînyê daye. Belê ev çende nayê vê wateyê ku em bibêjin Henrî Cîmis kesê yekê ye ku di dewr û çerxa nû da behsa vegêrî kirîye. Nurman Firîd Man dîyar dike ku berî Henrî Cîmisî bi du salan vekolînek li ser vegêrî û guşenêrînyê hebû ya Sîldin Lwayît Kambî bi navê "*The Study Of The Novel*"ê hebû di sala 1905ê da.<sup>118</sup>

<sup>116</sup> Cîrald, Birins (2003), *Elmustelehu's- Serdî*, Trc: Abid Xeznedar, Elmeclisu'l-E'la-Lîs-Seqafe, Çapa Yekem, Qahîre, r. 158.

<sup>117</sup> Kewser Muhemed 'Elî, Cebare (2012), *Teb'îru'l-Fewa'îlu'l-Cem'îye Fi'r-Rîwaye*, Daru'l -Hîwar Li'n-Neşîr- wet-Tewzî', Çapa Yekem, Surîye, r. 131-132.

<sup>118</sup> Ebdulrehîm, El kurdî (1996), *Er-Rawî we'n-Nesu'l-Qisesî*, Daru'l- Neşîr -Lîcamî'at, Çapa Duyem, Mesîr, r. 31.

Paşê çendîn dabeşkirin ji bo vegêrî derketine ku her rexnegirekî li cem xwe dabeşkirinek daye vegêrî. Wekî mînak Kewser Muhemed Eli Cebare di pertuka xwe da "*Teb'îru'l- Fewa'îlu'l- Cem'îye -Fî' r- Rîwaye*" dabeşkirna Wayîn Bus î xuya dike ku vegêrî li ser sê cureyan dabeş dike:

Cureya yekê, nivîserê veşartî (Xudê nivîserê duyê), ev vegêr e di hemî cureyên çîrokê da dîyar e heke ji bilî vî vegêrî vegêreke li dijî hebe dibe ku mirov nebe. Her wekî Rulan Part dibêje dibe ku kesayetîya vegêrî ji kaxezê hatibe dirustkirin.<sup>119</sup>

Cureya duyê jî vegêrê nediyare. Ev cure vegêr digel nivîserî veşartî wekhev.<sup>120</sup>

Cureya sêyê jî vegêrê dîyare. Ew vegêre bi karê gotinê ve radibe û kesayetîya xwe dide dîyarkirin û bi cînavê kesê yekê tak (ez) yan bi cînavê kesê yekê kum (em) diaxive yan jî bi navê nivîserî bixwe diaxive dema ya veşartî be.<sup>121</sup>

Kewser Muhemed Eli Cebare û Şûca Muslim Elanî di pertukên xwda dibêjin ku Nurman Firîdman vegêrî dabeş dike ser heşt cureyan:

- 1- Vegêrê hemî tiştan dizane.
- 2- Vegêrê hemî tiştî dizane û bê terefe.
- 3- Vegêrê dîdevan (ez).
- 4- Kesayetîya serekî ango kesê yekem (ez).
- 5- Vegêrê her tiştî dizane û yê cura w cur û yê jêgirtî.
- 6- Vegêrê hemî tiştan dizane û yê jêgirtî.
- 7- Şeweya şanoyê (drama).
- 8- Çavkê kamîrê.<sup>122</sup>

<sup>119</sup> Kewser Muhemed 'Elî, Cebare (2012), *Teb'îru'l-Fewa'îlu'l-Cem'îye Fî'r-Rîwaye*, Daru'l -Hîwar Li'n-Neşir wet-Tewzî', Çapa Yekem, Suriye, r. 134-135.

<sup>120</sup> Kewser Muhemed 'Elî, Cebare (2012), *Teb'îru'l-Fewa'îlu'l-Cem'îye Fî'r-Rîwaye*, r. 134-135.

<sup>121</sup> Kewser Muhemed 'Elî, Cebare (2012), *Teb'îru'l-Fewa'îlu'l-Cem'îye Fî'r-Rîwaye*, r. 134-135.

<sup>122</sup> Kewser Muhemed 'Elî, Cebare (2012) *Teb'îru'l-Fewa'îlu'l-Cem'îye Fî'r-Rîwaye*, Daru'l -Hîwar-Li'n-Neşir- wet-Tewzî', Çapa Yekem, Suriye, r. 136-137. Şuca' Muslimu'l, 'Anî (1989), *Fî-Edebunal- Qisesil- Mu'asir*, Daru'l- Ş'ûnu'l -Seqafiyel- 'Ame, Çapa Yekem, r. 176.

Herwesa çendîn rexnegirên di cur û şêwazên (vegêrî – vegêran) dîyar kirine lê ewên zêdetir li ser vê babetî axiftin û curên wan destnîşan kirin her sê binyadger "Cîrar Gînît û Tizivitan Tuduruf û Can Buyîn" bûn ku her sê cureyên vegêran û vegêrî dîyar kirine li dîf curê dîtinê.<sup>123</sup>

1- Vegêrê mezintir û zanatir ji şakesî ku Can Buyînî bi (dîtin ji piştve) nav kirîye. Belê Gînîtî bi (çîrxala çine) nav dike.

2- Vegêrê yeksan bi şakesî ku Can Buyîn bi havê (dîtin digel) nav dike belê Gînît bi (çîrxala navekî) nav dike.

3- Vegêrê biçûktir kêma zanatir ji şakesî ku Can Buyîn bi (dîtin ji derve) nav dike û Gînît bi (çîrxala derekî) nav dike.<sup>124</sup>

Ji ber ku parvekirin û dabeşkirina her sê binyadgeran pîranîya rexnegiran li ser rekkeftîne herwusa ev polîkirin hemî curên dî jî bi xwe ve digire. Lewra bifer dibînin ku pişt bestinê le ser bikin û li dîf vê parvekirinê li ser curên vegêrî û peywendîya wî bi kesên di nav çîrokê da biaxivin.

Cureyê yekê, vegêrî hemî tiştî dizane ango vegêrê mezintir ji şakesî.

Cureyê duyê, vegêrê heman tiştî dizane ango vegêrê yeksan bi şakesî.

Cureyê sêyê jî vegêrê kêma tiştan dizane ango vegêrê biçûktir ji şakesî.

### 1. Vegêrê Hemî Tiştan Dizane

Ev vegêre wek vegêrê mezintir ji şakesî tête naskirin, çî ku ev desthilata vegêrî hey di zanîna zanyaran da pitire ji ya şakesî. Wate zanyarên vegêrî heyîn pitir in ji wan zanyarîyên karekter li ser jîyana xwe dizanin.<sup>125</sup> Di vê vegêranê da nivîskar

<sup>123</sup> Cîrar, Cînît û Wayîn, Bos (1989), *Nezerîyetu's-Serd Mîn Wichetu'n-Nezer Île'l- Teb'îr*, Trc: Nacî Mustefa, Daru'l-Beyza, Çapa Yekem, r. 155.

<sup>124</sup> Ebdulwehab, Elreqîq (1998), *Fî'l-Eserd, Dîrasa't-Tetbîqîye*, Dar- Muhemed Elî –Li'n-Neşir, Çapa Yekem, r. 104-105. Xalid Seher Mihî, Esa'idî (1978), *El-Bînau'l-Fennî Fî'r-Rîwayetu't-Tarîxîyetu'l-Erebîye (1870-1939)*, Rîsalet Macistêr, Eylul, r. 35.

<sup>125</sup> Umer, Eylan (2008), *Fî'm-Menahic Tehlîlu'l-Xîtabu's-Serdî*, Menşûrat-Îfîhad- Kîtabu'l-Erebî, Dîmeşq, r. 93.

li ser zarê cînavê kesê sêyemê nedîyar yanî li ser cînava “ew”ê encam dide.<sup>126</sup> Wate bikaranîna cînava kesê sêyem da dîyar dibe ku nivîskarî vegêran berî nivîsîna deqê ango metnê wergirtine, ke wate hemî tişt dizane lewra cihê wî di vegêranê da pişt rûdanê ye.<sup>127</sup> Herwesa ji saloxdanên wî vegêrî her wekî Filubîr dibîne ku pêdivî ye nivîser yan nivîskar rola Xudî bigire di karê xwe da, ramana wê ewe ku yê xudan şîyane û bi çavan nayê dîtin ku di hemî dem û cihan da mirov hest bi hebûna wî bikeve.<sup>128</sup> Wate nivîskar wekî kesê nedîyar ji derveyî metnê disekîne û bi çaveke bê cudahî û bê alî li kesên metnê dinêre. Dîsan bi yeksanî reftarê digel kesayetîyan dike her ji kesayetê yekem û sereke heta digihije kesayetîyên lawekî.<sup>129</sup> Herwesa çawanîya reftarekirin digel rûdanan jî divê bi hema şêweyî be. Çi ku yek ji saxletên vegêrê hemî tişt zan pê tete nîyasîn her wek roman nivîsê frensî Gustave Flaubertî bi ciwantirîn şêwe wênê vegêrê hemî tişt zan dikêşe û dibêje: pêwîste nivîser ji bo xwe nenivîse.<sup>130</sup> Wate nivîskar demê vegêrana xwe bi cînavê nedîyar encam dide serpêhatîyên xwe nakete di nav deqî da, belkû xwendevanî pişikdarî deq yan metnê dike ku xwe wek lehengê wê tekistê bibîne, û herwesa vegêr di komkirin û bi destveanîna zanyarîyan da li ser kesan û karakteran neçar nîne serçawey ewan hemî zanyarîyên ku dibêje bizane, lewra gelek çawan xwîner hest dike ku vegêrî şîyanên hindê hene ku dikare pişt dîwar û perdan ra bibîne û agah li mêşkê kesan heye ku çawa hizir dikin.<sup>131</sup> Ji ber vê jî dibe ku egerê navkirina vî vegêrî hemî tişt zan eve be.

## 2. Vegêrê Heman Tişt Zan

Vegêr di vî cure vegêranê da wek Vegêrê Heman Tişt Zan (Vegêrê yeksan bi şakesî) tê binavkirin ji ber ku vegêr jî her wan tiştan dizane evên ku karakterên çîrok

<sup>126</sup>Perêz, Sabîr (2001), *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî Le Seretawe ta Kutayî Cengê Duyemî Cihanî*, Çapxane Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa yekem, Silêmanî, r. 214.

<sup>127</sup>Ebdulmelik, Murtaz (1998), *Fi'n-Nezerîyetu'l-Rîwaye Behs Fi't-Teqniyetu'l-Serd*, Metbe'etu'r-Rîsale, Kuwêt, r. 178-179.

<sup>128</sup>Celal Enwer, Se'îd (2009), *Teknîkî Gêranewe Le Romanî (Êwarey Perwane) ya Bextîyar Elî*, Çapxaneya kemal, Suleymanî, r. 183.

<sup>129</sup>Xalid Seher Mihî, Elsa'idî (1978), *El-Bîнау'l-Fennî Fi'r-Rîwayetu't-Tarîxîyetu'l-'Erebîye (1870-1939)*, Rîsalet Macistêr, Eylul, r. 36.

<sup>130</sup>Perêz, Sabîr (2001), *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî Le Seretawe Ta Kutayî Cengê Duyemî Cihanî*, Çapxane Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa yekem, Silêmanî, r. 215.

<sup>131</sup>Perêz, Sabîr (2001), *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî Le Seretawe Ta Kutayî Cengê Duyemî Cihanî*, r. 215-216.

ango metnê dizanin.<sup>132</sup> Lewra vegêr di vê vegêranê da wekî çavê kamîra tête ber çavan, yanî vegêr rûdanê, bûyerê hema raste rast radigihîne. Vegêran bi cînavên karakterê “min, ez”ê ango bi cînava nedîyar “ew”ê tê vegêrandin.<sup>133</sup> Yan jî digel cînava “min”ê cînava nedîyar “ew”ê jî tê bikaranîn lê eve nabe egerê zêdebûna asta zanyarîyên vegêrî ji kesayetên di nav metnê da. Çi ku vegêr her di nav metnê da ye û nikare ji sînorên xwe derkeve ev sînorên ku di nav metnê da hatine dîyarkirin. Tê wê wateyê ku pabendbûna vegêrî jî bi wan sînoran ve dibe egerê ji dest dana serperîştîya reftar kirinê, dîsan vegêr li gor dîtin û bîr û boçûnên xwe vedigerîne wekî kesek ji nav kesayetên çîrokê da pişkdarîyeke yekser di rûdanê da heye. Herwusa ji aliyekê dî ve xwendevan yekser digel hizr û îdrak û têgihîştina vegêrî têdigihije.<sup>134</sup> Wate têgihîştina wergirî ango xwendevanî ji rûdanan, girêdayî wan şîrovekirina ye ewên vegêr pêşkêş dike. Herwusa vegêr beşdare di rûdanan da û bi xweşî vedigerîne hemî axaftinan ku çî rastî be yan ne nerast be jî hemîyan hildigire stûyê xwe.<sup>135</sup> Ev pişkdarkirina nivîserî di rûdanan da jî pitir dibe cihê bawerîya xwînerî. Ev peywendîya wekhev di navbera vegêrî û şakesî da wel "Tumaşîvîskî" kir ku navê Vegêrana Xudî le bidane, ku ya rast li vê derê vegêr wek hevalekê ye digel şakesî.<sup>136</sup>

### 3. Vegêrê Kêm Tişt Zan

Ev cure vegêr wek vegêrê biçûktir ji şakesî tê zanîn. Çi ku ji hemî kesên di nav metnê da kêmîtir dizane û nikare xwe dahêle nav kîratîya nax û mêşkê hîç karakterekê, herwusa nikare bi rengeke berfireh bikeve nava bûyeran da û têbigihije. Çi ku ev pêzanînen wî yên heyî kêmîtir in ji yên kesayetîyên heyî, lewra vegêr penayê dibe li ber rêka dîtin û bihîstinê ji bo pêşkêşkirina zanyarîyan.<sup>137</sup> Yanî tê wateyê ku vegêr tenê dikare wê çendê bizane û vegêrîne ji bo xwendevanî ya ku dibîne û guh lê

<sup>132</sup> Nefisa, Îsmâil (2005), *Teknîka Vegêranê Di Kurteçîrokên Fazil Umerî da*, Çapxaneyê Hawar, Çapa yekem, Dihok, r. 61.

<sup>133</sup> Xalid Seher Mihî, Elsa'idî (1978), *El-Bînau'l-Fennî Fî'r-Rîwayetu't-Tarîxîyetu'l-'Erebîye (1870-1939)*, Rîsalet Macistêr, Eylul, r. 36.

<sup>134</sup> Celal Enwer, Se'îd (2009), *Teknîkî Gêranewe Le Romanî (Êwarey Perwane) ya Bextîyar Elî*, Çapxaneyê kemal, Suleymanî, r. 186.

<sup>135</sup> Karzan Muhsin, Qadir (2009), *Sîmatazekanî Romanî Kurdî Le Nîwan Salanî (2000-1991)*, Nama Masterê, Zankoya Selahedîn, r. 182.

<sup>136</sup> Hemîd, Elhemedanî (1991), *Bunyetu'n-Nessu's-Serdî Mîn Menzuru'n-Neqdu'l-Edebî*, Merkezu's-Seqafî'l-Erebî Lî't-Tîba'e We'n-Neşîr We't-Tewzî', Çapa Yekem, Beyrut, r. 48.

<sup>137</sup> Nefisa, Îsmâil (2005), *Teknîka Vegêranê Di Kurteçîrokên Fazil Umerî da*, Çapxaneyê Hawar, Çapa yekem, Dihok, r. 63.



dibe, dibihîze. Çi ku ev her du hest ji hestên derekîne, lewra vegêr nikare wan bike derzî û tê da derbasî naxê kesan bibe yan çawanîya hizirkirina kesan bizane. Lewra bi vegêrekê derekî têtê qebûlkin. Ev cûre dîtin li sedê bîstê peyda bûye ji encamên hunera şano û sînemayê û ji alîyê bi kar anîne ve di buwarekê berteng da tê bikaranîn.<sup>138</sup> Di dawîya vê babetê û li dîf van dabeşkirin û parvekirinên rexnegir û lêkolîneran da encamdayîn û jê kirî dîyar dibe ku vegêr û curên vegêrî li cem çendatîya radê zanyarîyên wî û herwusa cihê wî di vegêranê da dîyar dibin û tene destnîşan kirin.

### 1.2.3. Erkên Vegêrî

Vegêr di deqên vegêranê da bi gelek erkan radibe û hindek ji wan erkan yên serekîne û hindek jî di lawekîne, lewra bi şêweyeke giştî erkên vegêrî wek erkên serekî û erkên lawekî hatîye dabeşkirin.

#### 1.2.3.1. Erkên Serekî

Erkên serekî ji navê xwe ve dîyare ku serekîne û nabe ku bi çî awayî bêne piştguhkirin di pêvajoya vegêranê da. Di nava xwe dabeşî dû binbeşan dibe.

#### A-Erkên Vegêranê

Heyor Delal di pertuka xwe de ewa bi navê " *Bunyetu'n- Nesu's- Serdî- Fî Me'aric- İbinu'l- Erebi*" boçuna Jaap Lintvelt (1981-1989) xuya dike ku wê erkê wek erkê niwandinê bi nav dike.<sup>139</sup> Ev erke girîngtirîn erkê hebûna vegêranê ye, amûrê yekemîne ku çîrok li ser tê avakirin. Çi ku erkê wê ragihandina çîrokê ye ji guhdarî angî xwendevanî ra. Ew jî bi rêka vegêrana çîrokê bû ewan û eve dibe xaleke girîng di hebûna vegêrî da li dîf pila amadebûna ewî di çîrokê de.<sup>140</sup>

<sup>138</sup> Perêz, Sabîr (2001), *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî Le Seretawe Ta Kutayî Cengê Duyemî Cihanî*, Çapxane Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa yekem, Silêmanî, r. 220.

<sup>139</sup> Mecmû'e Mîne'l-Muellifîn, Muhemed Elqazî, Ehmet Elsemawî (2010), *Me'cemu's-Serdîyat*, Daru'l-farabî, Çapa yekem, Tunis, r. 473.

<sup>140</sup> Heyor, Delal (2006), *Bunyetu'n-Nesu's-Serdî Fî'm-Mearic İbnu'l-Erebi*, Rîsalet Macistêr, Camî'etu'm-Menturî, Elcezaîr, r. 59.

## B-Erkên Rêkxistinê

Vegêr di vê erkê da bi karê rêkxistana pişkên navekîyên çîrokê radibe û erkên wî dîyarkirina xalên serekîne di çîrokê da û girêdanê di navbera pişkên wê da dirust dike û peywendîyan di navbera wan pişkan da bihêz dike. Çi ku cuwankariya çîroka vegêray û mukumkirina wê li ser vê çendê radiweste.<sup>141</sup>

### 1.2.3.2. Erkên Lawekî

Ev erke jî di nav xwe da dabeşî sê binbeşan dibe.

A-Erkên bi çîrokê ve girêdayî

B-Erkên bi gotarê ve girêdayî

C-Erkên girêdayî bi vegêran li ser vegêranê.<sup>142</sup>

Û ev binbeş jî di nav xwe da dabeşî çend erkên dîtir dibe.

A-Erkên Girêdayî Bi Çîrokê ve

1. Erka Şîrovekirinê û Tefsîrkirinê: Ku vegêr di vê erkê da bi karê pêşkêşkirin û şîrovekirina hindek regezên di çîrokê da mijûl e.<sup>143</sup>

2. Erka Aydîyolojî (Bawerî): Ev erke girêdayî gotareke dînî yan perwerdehiyê yan jî rewîştîyê ve ye, ewên vegêrî di hindek derbirîn û ristên xwe da bi kar neanî bi rêka vegêrana rûdanan û maytêkirina vegêrî bi şeweyekê rastewxu yan ne rastewxu bi gotineke dî yekser yan ne yekser tê da dîyar dibe.<sup>144</sup>

<sup>141</sup> Semîr Elmerzuqî, Cemîl Şakir (1986), *Medxel Îla Nezerîyetu'l-Qisse Tehlîlen We't-Tetbîqen*, Daru'ş-Ş'ûnu'l-Seqafîye'l-'Ame, Bexdad, r. 104.

<sup>142</sup> Kewser Muhemed 'Elî, Cebare (2012), *Teb'îru'l-Fewa'îlu'l-Cem'îye Fî'r-Rîwaye*, Daru'l -Hîwar-Li'n-Neşir- wet-Tewzî', Çapa Yekem, Surîye, r. 146-147.

<sup>143</sup> Ebdulrehîm, El kurdî (1996), *Er-Rawî we'n-Nesu'l-Qisesî*, Daru'n-Neşir Li'l-Camî'at, Çapa Duyem, Mesir, r. 62.

<sup>144</sup> Cîrar, Cînit û Wayîn, Bos (1989), *Nezerîyetu's-Serd Mîn Wichetu'n-Nezer Île'l- Teb'îr*, Trc: Nacî Mustefa, Daru'l -Beyza, Çapa Yekem, r. 101.

3. Erka Sozdarîyê (Helçûnê – Derbirînê): Vegêr di vê erkê da hest û ramanên xwe yên di encama kartêkirina çîrokê û ew peywendîya ligel heyî dîyar dike. Tumaşîviskî vê erkê wek Handana saykolocî bi nav dike.<sup>145</sup>

4. Erka Arastekirinê: Derbirînê ji pileya çespanîna vegêrî ji rastîya wan vedigêre dike. Eve jî girêdayî vegêrî ye di dema dibe vegêreke hestpêker, ne bi tenê dengeke axaftinkere. Vê erkê peywendîyeke bihêz bi erka vegêrê hestpêkirinê ve heye.<sup>146</sup>

### 5. Erka Belgehênanê

Ev erke berçav dibe li demê vegêr amaje dide wê jêderî ewê deng û basên xwe jê wergirtî, yan pila hûrbînîya bîrhatîyên wî yên taybet yan jî ev rûdanên hestê naxê ewî diazirînin. Dibe ev erke şeweyê dîkyoumentkirinê werdigirî li demê karê têhel kêşe di nav çîroka xwe da radibe û li jêrenotan amajê dide ewî jêderî pêzanîna jê wergirtî.<sup>147</sup>

### B- Erkên Girêdayî Bi Gotarê Ve

1. Erkê Huşdarîyê: Dûpatî li hebûna peywendîyê di navbera vegêrî û ewê bû têtê vegêran da dike û vegêr huşdarîya ewê bo têtê vegêran li ser hindêk rûdanan dike ku xwe jê dûr biêxe.

2. Erkê Karlêkirinê: Di vê derê da vegêr bizavê dike ewê ji bo têtê vegêran bibe di nav gîhana çîroka xwe da û razî bike li ser vê çendê ku rûdan bi dirûstî yên rûdayîne û ev çende bi şeweyeke berfireh di romanê da têtê dîtin.<sup>148</sup>

---

<sup>145</sup> Ebdulrehîm, Elkurdî (1996), *Er-Rawî we'n-Nesu'l-Qisesî*, Daru'n-Neşir Li'l-Camî'at, Çapa Duyem, Mesir, r. 65.

<sup>146</sup> Kewser Muhemed 'Elî, Cebare (2012), *Teb'îru'l- Fewa'îlu'l-Cem'îye-Fî'r-Rîwaye*, Daru'l -Hîwar Li'n-Neşir –wet-Tewzî', Çapa Yekem, Suriye, r. 147.

<sup>147</sup> Semîr, Elmerzuqî û Cemîl, Şakir (1991), *Medxel –Îla- Nezerîyetu'l-Qisse- Tehlîlen- Wet-Tatbîqen*, Daru'l- Ş'ûnul –Seqafîyel -'Ame, Bexdad, r. 105. 'Ayşe, Ze'rur û Su'ad, Zemur (2015), *Elbunye's-Serdîye, (Ez-zeman-Elmekân-Eş-Şexsîyat) Fî'r- Rîwayet (Benî'l 'Îsyan) lî Ehmîde'l 'Ebasî*, Camî'et Ebdû'r-Rehman mîre, r. 14.

<sup>148</sup> Semîr, Elmerzuqî û Cemîl, Şakir (1991), *Medxel- Îla- Nezerîyetu'l- Qisse- Tehlîlen-wet-Tatbîqen*, Daru'l-Ş'ûnul -Seqafîyel-'Ame, Bexdad, r. 105-106. Kewser Muhemed 'Elî, Cebare (2012), *Teb'îru'l- Fewa'îlu'l-Cem'îye-Fî'r- Rîwaye*, Daru'l- Hîwar- Lin-Neşir –wet-Tewzî', Çapa Yekem, Suriye, r. 147.

Remezhan Alan di pirtûka xwe ya bi navê "Zanista Edebiyata Modern" da sê gotarên vegêrî ji aliyê erk û şewazê ve destnîşan dike. Ev jî; gotara nerasterast, gotara rasterast û gotara serbest a nerasterast e.<sup>149</sup>

Gotara nerasterast (indirect discourse), di nav vegêranê da rewşa hişê karakteran qiset dike. psîko jî tê gotin.<sup>150</sup>

Gotara rasterast (direct discourse), gotin û ramanên karakteran rasterast qiset dike, yanî ji monologa karakter, jêgirtineke. Monologa jêgirtî jî jê ra tê gotin.<sup>151</sup>

Gotara serbest a nerasterast (free indirect discourse), temsîla yekser a gotin û ramanên karakterane ku ji çarçove û xuleseya vegêrekî azad bûye. Monologa vegêranî jî jê ra tê gotin.<sup>152</sup>

C-Erkên Girêdayî Bi Herdu Erkên berê ve bi navê vegêran li ser vegêranê

Hatîye zanîn ango dîtin û bîr û boçûnên vegêrî di wan çîrokên da ewên behs lê dike, çi girêdayî gotarê yan çîrokê û di şîyan daye dabeşkirineke dî ji bo wa erkan bête kirin û li dîf erkên dî bêne dîyarkirin.<sup>153</sup>

1.Erkê Edebî: Ev erke yê navxu ye û di metnê da tê bi cihanîn û erkê vegêrî tê da (vegêran-rekxistin-dîdevanî).

2.Aydîyolojî: Ev erke yê derekî ye ku bi rêka hevpeyvînê di navbera nivîser û xwendevanî da di yek çirke da derbas dibe zêdebarî di sax kirina metnê yan jî deqê da (têgihîştin-aydîyolojî-kartêkirin)<sup>154</sup>

---

<sup>149</sup> Remezhan, Alan (2015), *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebiyata Modern*, Çapxaneyê Peywend, Çapa Yekem, Stenbol, r. 128.

<sup>150</sup> Remezhan, Alan (2015), *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebiyata Modern*, r. 129.

<sup>151</sup> Remezhan, Alan (2015), *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebiyata Modern*, r. 129.

<sup>152</sup> Remezhan, Alan (2015), *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebiyata Modern*, r. 129.

<sup>153</sup> Kewser Muhemed 'Elî, Cebare (2012), *Teb'îru'l - Fewa'îlu'l - Cem'îye- Fi'-r Rîwaye*, Daru'l-Hîwar Li'n-Neşîr-wet-Tewzî', Çapa Yekem, Suriye, r. 146-147.

<sup>154</sup> Mecmû'e Mîne'l-Muellifîn, Muhemed Elqaz, Ehmed Elsemawî (2010), *Me'cemu's-Serdîyat*, Daru'l-Farabî, Çapa yekem, Tunis, r. 474.

### 1.3. Bînyata Vegêranê

#### 1.3.1. Hunerên Vegêranê

Di pêvajoya vegêranê da çendîn hunerên vegêranê ji bo vegêrana deqên edebî tîn bikaranîn. Ev cure hunere hemî xwedan taybetmendiyên cîyawaz in û hemî xwedan rol û erkên girîng û berçav in di binyata vegêranê da digêrin û çawanîya bi kar anîna wan huneran jî bi şêweyêke dirust serkeftina berhemê mîsoger dike. Ev ên li xwarê hin mînakên wan huneran in.

##### 1.3.1.1. Wesif (Saloxdan)

Yek ji wan teknîkên herî serkeftî û bineret e di vegêranê da. Peywendîyeke mukum û bihêz digel hemî tuxmên vegêranê da heye. Çi ku prosesa vegêranê bê saloxdan nayê encamdan, bi rêya vê hunerê vegêr dikare rûdan û cih û kesayetîyan bide nîyasîn û wêne bike bi şêweyêke ku kartêkirin di mêşkê xwendevanî da dirust bibe. Heman karîgerî jî ev a ji encama çawanîya wesifkirinê ve peyda dibe û dibe şansê serkeftina berhemê. Wesif rêyêke ji bo vegeryan û bercestekirina hemî layenên jîyanê, cih ji wan layenaye ku bi rêka wesifkirinê ciwantir û baştir tête destnîşan kirin, girîngîdan bi wesfê ji layê vegêrî bi wateya hindê ye ku bayexeke taybet bi karakter û cih û tiştî bête dan.<sup>155</sup> Ango hîç tuxmek di nav wesfê da nayê piştguh kirin, wesif bi teknîkeke girîng tête hejmartin di nav binyata edebî da û mil bi mil dîyalog û rûdanê beşdarê wênegirtin û geşkirina rûdanan da dikin û hewla dîyarkirna naxê karekerekî dikin.<sup>156</sup> Li wir dîyar dike ku hemî tuxm û hunerên vegêranê di nav saloxdanê da têne dîtin û erkê wesifkirinê ewe bi dirêjî wesfa karakter û cihî dike û kerestekê binerete vegêr nikare bi çi reng û şewazî destberdanê ji vê hunerê bike. Herwusa hunera saloxdanê ji bo çîrokê dergê çûna jorê ye li hember rûdan û kesayetî û cîhana çîrokê. Wesif wekî hunereke vegêranê harîkarîya vegêrî û nivîserê çîrokê dike da ku serûsîma, taybetmendî û helwîst û kiryarên kesayetîyên çîrokê pê

<sup>155</sup> 'Ebdulrehman, Munîf û Muhemed Abid, Elqewasîme (1998), *El-Bunyetu 'r-Rîwayîye Fi Rîwayet (Elîxdud Mudunu'l-Milih)*, Daru'l-Ye nabî' Lî'n-Neşir We't-Tewzî', Uman, r. 102.

<sup>156</sup> Ebdulmelik, Murtaz (1989), *Leyle we Leyle, Dîrasetî's-Sîmaîye Tefkîkîye Li'l-Hikayetu'l-Hemal Bexdad*, Daru'ş-Ş'ûnu'l-Seqafiye'l-'Ame, Bexdad, r. 109.

wêne bike.<sup>157</sup> Ango wesifkirin amrazeke harîkar e di destê nivîserî da ji bo serinc rakêşana xwendavanî ji bo rûdanên çîrokê.

Wesifkirin bi du şêweyan tête kirin. Ev jî yek wesfeke sade ji bo karakter û cih û tiştên dîtir û di heman demê da jî wesfeke hunerîyane bi rêka hunerên rewanbêjîyê tête kirin. Di çarçoveya çîrokê da çîroknûs girîngîyeke baş dête saloxdana tiştan, wesifkirineke vegêranê ye karîgere ji bo nêzîkkirina cîhana ji derve ligel cîhana çîrokê. Saloxdana tiştî saloxdana wî kesî ye ku ew ê tê da dije. Çi ku saloxdana tiştî derbirîne ji êş û janên kesî û dîrokek hevpişk wan pêk ve girê dide.,

Tiştan dîrokek hevpişk heye digel kesan. Çi ku mirov ji xwe bi tenê pêk nayê. Di pirtûka Necîb Mehfuî ya bi navê" *Elqissetu'l- Qesîre*" da ku Remezan Hecî Qadir di pertuka xwe da amaje pê kirye ku têda hatîye ke saloxdan di çîrokê da nayê kirin ji bo saloxdanê, belkû ji bo pêşveçûna rûdanên çîrokê wek amrazek harîkar bête bikaranîn.<sup>158</sup> Lewra çîroknûs dikare mifayê ji vê teknîkê werbigire da ku rûdan û kesayetîya pê bide nasîn.

Saloxdan hunereke kevn e; bi kevnatîya dîtina mirovî ji bo ser biwarên jîyanê hezeke xweristîye ji bo veguhêstina wê tiştê di derûnîyê da bi şêweya hest û sozan yan jî bi şêweyî wênan.<sup>159</sup> Yanî saloxdan şîrovekirine ku mirov pê digihije kûratîya hestên mirovan û hunereke dêrîn e û di hemî biwarên jîyanê da bi kar hatîye û rûyê tiştan pê wêne kirîye, lewra gelek nivîser wusa hizir dikin ku saloxdan digel wêneyê yek digirin û dibêjin bi tenê cudahîya wan ewe ku ew dîmena di wêneyê da bi çavan mirov dibîne, di siruştê da her ewe lê di wesfê da bere bere ev tişt aşkera dibe û dikeve ber çavan.<sup>160</sup> Gelek caran vegêran û wesif jî di têkelfî hev dibin, herdu pêkve wêneyekê pêk diînin û danana dîwarekî yan sînorekê bû jêk vavartina kareke bi zehmet e, herwekî Cîrar Cînit vê peywendîyê di navbera vegêranê û wesfê da behs dike û dibêje "Hebûna wesifkirina parçeyekê bêyî bikaranîna çî binemayên vegêranê

---

<sup>157</sup> Nî'metullah Hamid, nihêlî (2010), *Diravek ji Rexnê (Rexne û Vekolîn)*, Çapxana Hawar, Dihuk, r. 16.

<sup>158</sup> Remezan Hecî, Qadir (2006), *Cih Diromana Kûrdîya Devera Behdînan da (Geryan li Babê Berze û Dûzexa Spî) Wek Nimune*, Çapxana Hawar, Çapa Yekem, Dihuk, r.96.

<sup>159</sup> Remezan Hecî, Qadir (2006), *Cih Diromana Kûrdîya Devera Behdînan da (Geryan li Babê Berze û Dûzexa Spî) Wek Nimune*, r. 87.

<sup>160</sup> Remezan Hecî, Qadir (2006), *Cih Diromana Kûrdîya Devera Behdînan da (Geryan li Babê Berze û Dûzexa Spî) Wek Nimune*, r. 85.

bi sanahâtir e li pêçewana wê, çi ku sadetirîn destnîşan kirin ji bo her binemayekê û bavûdoxekî dikare bête kirin wek pêşekîyek ji bo destpêka wesif kirinê.<sup>161</sup> Herwusa Umer ' Eylan di pirtûka xwe ya bi navê "Fî'm -Menahic -Tehlîlu'l- Xîtabu's- Serdî" da vê rastîyê diselmîne dema dibêje: "Gelek bi zehmete em tekstekê bibînin ya bê wesif heta teksteke çend sade jî be; çi ku gelek caran em dikarin wesfê bikin bêyî ku vegêran tê da hebe, belê bi çi awayî em nikarin vegêranê bikin ku heke wesif tê da tunebe.<sup>162</sup> Heke erkê wesifkirinê di destpêkê da wesifkirina wî waqî'î be ku rûdan tê da qewimîye yan wesifkirina wî layenê derveyî yê kesayetîya be, îro li dû guherîn û şêwazên vegêranê wesif jî di behskirina tiştên asayî hatîye guherîn û çûn beref hîrhîrka û layenên kûr, layenê ser ve yê kesayetîya hêlaye û wesfa nax û hizra derûna kesan dike. Erkê wesifkirinê bi tenê wesifkirina tiştê bêgîyan nîne, herwekî di destpêkê da derkevtî, belkû pêşkeft û li dû geşesendin û pêşkevtina hunera vegêranê wusa kir ku şîyanên hindê hebin derbirinê ji hestên mirovî bike.<sup>163</sup> Yanî wesifkirin wekî yarîzaneke serekîye di nav yarîya teknîkên çîrokê da dileyze û çendîn erkan digire.

Sebarete peywendî û girîngîya di navbera saloxdanê û vegêranê da di nav lêkolînên rexneyî da bi borîna serdemê ve guherîn ser da hatine. Li berî sedê bîstê cudahî di navbera vegêran û saloxdanê da nebû.<sup>164</sup> Belê di sedê bîstê da ev herdu pêkhate li ser du nîvan dabeşbûn; li nîva yekem ji sedê bîstê vegêran regezeke zal û berbelav bû û saloxdan regezeke lawekî û dîvelankê vegêranê bû, zêdebarî bangawazîya rexnegiran bû zêde rûyî û merdînîyê di hunera saloxdanê bi mebesta nexşandin û xemilandinê.<sup>165</sup> Belê ev dabeşbûn û girîngîdana bi rêgezên vegêranê li nîva duyem jî ji sedê bîstê guherîn bi ser da hat û li pêşîya vegêranê ket û ciheke bilindtir ji vegêranê di çîrokê da hebû. Bi taybetî di vegêrana nû da, vegêran bibû

<sup>161</sup> Rulan, Bur nuf û Ruyal, Uylîyê (1991), *'Alemu'r-Rîwaye*, Trc: Nîhadu't-Tikrîlî, Daru'l- Şûnul-Seqaffiyel -'Ame, Çapa yekem, Bexdad, r. 98.

<sup>162</sup> ' Umer, Eylan (2008), *Fî'm-Menahic Tehlîlu'l-Xîtabu's-Serdî*, Menşûrat-Îtîhad- Kîtabu'l-Erebî, Dîmeşq, r. 121.

<sup>163</sup> Perêz, Sabîr (2001), *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî Leseretawe ta Kutayî Cengê Duyemî Cîhanî*, Çapxane Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa yekem, Silêmanî, r. 258.

<sup>164</sup> Kewser Muhemed 'Elî, Cebare (2012), *Teb'îru'l-Fewa'îlu'l-Cem'îye-Fî'r-Rîwaye*, Daru'l-Hîwar Li'n-Neşîr- wet-Tewzî', Çapa Yekem, Surîye, r. 207.

<sup>165</sup> Kewser Muhemed 'Elî, Cebare (2012), *Teb'îru'l- Fewa'îlu'l- Cem'îye- Fî'r- Rîwaye*, r. 208.

dîvelank ji bo hunera saloxdayînê, bi vê çendê zaravê saloxker ji alîyê rexnegiran ve li ser zaravê vegêrî hate zêdekirin di sedê bîstî da.

Gelempêrîya rexnegiran li ser wê çendê rêkeftine ku vegêran li pêşîya saloxdanê dikeve û di vê biwarî da Rulan Part dibêje “Yekeyên vegêranê erkên serekî ne, belê di saloxdanê da erkên lawekî jî dibîne.”<sup>166</sup> Babetên herduyan ji hev cuda ne, çî ku vegêran li dîf yekhatina dema rûdanan vedigêre, belê saloxdan wek babeteke hevdem û hevsûd di cihî da têtê qebûlkin. <sup>167</sup> Ango amrazeke wênê cihî pêk diîne dem di vegêranê da yê karaye û di saloxdanê da radiweste, vegêran jî beref bûyeran diçe û bi demên ewan bûyeran ve têtê girêdan bi zindîbûna ewan têtê boyaxkirin, belê saloxdan beref tiştê diçe ligel hişkbûn û ne livîna ewan pişikdarîyê dike. <sup>168</sup> Bi gotineke dî em dikarin bibêjin ku “Wênê vegêranê ji ewan tiştên livok nimayîş dike belê wênê saloxdanê ewe ya ku tiştan di rawestîyanê da nimayîş dike.”<sup>169</sup>

Di dawîyê da em dikarin bibêjin ku saloxdan ji vegêranê nayê cudakirin. Bêyî saloxdan rûdanên vegêranê bi rê ve naçin çî ku bi rêya saloxdanê siruşt û saloxetên kesayetîyan û cihê rûdanan vegêran têtê da rû dide û dîyar dibe.

### 1.3.1.2. Dîyalog

Ew pire ewa dibe xala pêkve girêdana karekteran û amrazê hevgihiştin û vegêran û berçav kirina rûdan û hizr û dîmenaye di çîrokê da. Herwusa sifetêke eqilî ye ya nasname hizr û derûnî ye û taybetmendî û xususîyan dide karekterî û ev nasname di nav metna edebî da karekterêke dî cuda dike. <sup>170</sup>

Dîyalog bi ramana hevpeyvîn û axaftin digel yekûdu û danûstandina hizr û bîrane ku di helbestê da, destanê da, şanonameyê da bi kar têtê. <sup>171</sup> Dîyalog ev axaftine

<sup>166</sup> Kewser Muhemed 'Elî, Cebare (2012), *Teb'îru'l- Fewa'îlu'l- Cem'îye- Fî'r- Rîwaye*, r. 207.

<sup>167</sup> Kewser Muhemed 'Elî, Cebare (2012), *Teb'îru'l- Fewa'îlu'l- Cem'îye- Fî'r- Rîwaye*, r. 207.

<sup>168</sup> Rulan, Burnuf û Ruyal, Uylîyê (1991), *'Alemu'r-Rîwaye*, Trc: Nîhadu't-Tikrîlî, Daru'l -Ş'ûn'ul Eseqafîyel- 'Ame, Çapa yekem, Bexdad, r. 98.

<sup>169</sup> Sîza, Qasim (1985), *Bîнау'r-Rîwaye*, *Dîrasetu'l-Muqarene Fî's-Sulasîyet*, *Necîb Mehîfuz*, Daru't-Tenwîr Lî't-Tîba'e We'n-Neşîr, Çapa Yekem, r. 83.

<sup>170</sup> Baqîr Cewad, Elzucacî (1980), *Er-rîwayetu'l-Îraqîye we Qezîyetu'r- Rîf*, Daru'l-Hurîye Lî't-Tîbae'l-'Ame, Bexdad, r. 167.

<sup>171</sup> Cemal Mîr, sadiqî (1376), *'Enasir Dastan*, Çapxaneya Behmin, Çap Sum, Tehran, r. 466.



ku di navbera du ango ji duyan zêdetir kesî da dihête encamdan ji bo lêkguhurîna hizran yan helwestan di navbera wan da. Ev axaftinên di navbera hindê kesan da di her kareke edebî da bihête encamdan bi goftûgo û gotûbêj tête binavkirin di çîrokên kurt û dirêj da. Dîrokzanan zimanê goftû goyê bi şêweyeke asayî û seruşnî di destan û şanonameyên xwe da bi kar diînan û di çawanîya goftûgoyê da her kes çawa diaxive.<sup>172</sup> Çi ku nivîser dikare bi rêya vê babetê çîrokê bi rê ve bibe û rûdanên wê ber bi dawîyê pêşve biêxe. Herwusa em dikarin lehengên çîrokê bi rêya axaftinên wan bi nasin û bi hêsanî li ser hêvî, daxwazî, êş û azarên wan helbîn. Dayana Dawbinfayir di pertuka xwe da ewa bi navê " Elrîwaye- Wesene'etuhu- Kîtabetul-Rîwaye" boçuna Entunî Tirulub dîyar dike û dibêje : dîyalog bi şêweyeke giştî ji hemî rêgezên dî pesendtîre di çîrokê da.<sup>173</sup> Divêt dîyalogên te bêne araste kirin ji bo peydakirina livîna çîrokê û destnîşan kirin û nîyasîna kesayetîyan. Gelek caran bi rêya dîyalogê xwendevan kesayetîyan ji hevûdu cuda dike çî ku her kesek xwedan ferheng û zimanek cuda ye. Ferhenga sîyasetmedarekê cuda ye ji ferhenga zimanê cotkarekê, çî ku her yekê wan li dû wê jîngeha ku tê da dike karîger bûye û ferhengeke cuda heye, ev çende jî para pitir di wan çîrokan da tê ber çavan ku kareketerê sereke yê îrokê çî zîlam be û çî jîneke gundî be.<sup>174</sup> Ev e jî bûye egerê hindê ku nivîser dîyalogê li dû kesayetîya karakterî encam dide heta ku axaftina her yekî digel kesayetîya wî da bigunce û curê serederî kirin û barê derûnî bête niwandin.<sup>175</sup> Ev çende jî deqî yan çîrokê dikêşe hindê ku zindîbûna pêşkêşî deqî dike û welê bike ku xwendevan bizane ku metneke realîstî waqî'î dixwîne.<sup>176</sup> Ango xwendevan wesa hizir bike ku ev dîyalog rûdaneke asayî ye çî dirustkirin û maytêkirina nivîserî tê da nîne. Di navbera dîyalog û rûdanê da peywendîyeke bihêz heye bi rengeke ku dikarin bêjin dîyalog temamkera vegêranê ye û bi wan tiştan ve

<sup>172</sup> Cemal Mîr, sadiqî (1376), *'Enasir Dastan*, r.47.

<sup>173</sup> Dayana, Dawbinfayir (1981), *Er-rîwaye we's-Sene'etuhu Kîtabetu'l-Rîwaye*, Trc: Samî Muhammed, Daru'l-Hurîye Lî't Tîba'e, Bexdad, r. 61.

<sup>174</sup> Perwîn, Ebdullah (2008), *Regezekanî Dirama Le şî'rî Lîrîkî Kurdî da Kirmancî Xîwarû 1980-Raperîn*, Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa Yekem, Suleymanî, r.74.

<sup>175</sup> Huseyîn, 'Arif (2002), *Nusînekanî Le Bîwarî Rexne û Lêkolîneweda le salanî (1955-1988)*, Çapa Yekem, Suleymanî, r. 19.

<sup>176</sup> Perwîn, Ebdullah (2008), *Regezekanî Dirama Le şî'rî Lîrîkî Kurdî da Kirmancî Xîwarû 1980-Raperîn*, Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa Yekem, Suleymanî, r. 78-79.

radibe ku ne karê vegêranê ye ango heke tişteke reneke dirust û ciwan bi rêya vegêranê neyê vegêran di vê demê da dîyalogê tete bikaranîn.<sup>177</sup>

Nivîser dîyalogê dinivîse û kesayetî wê dîyalogê encam dide û wergir hizr û rûdanên wê berhema vegêranê bi rêya dîyalogê werdigirin û li ser vê binaxey peywendîya nivîser û kesayetî û wergirî di dîyalogê da berceste dibin.<sup>178</sup> Ango dîyalog bi tenê goftûgo tete da nayê encamdan belkû naxê karakterî jî tete da tete dîyar kirin ku eve jî erkê vegêrî ye. Herwusa nivîser dîyalogê dike rêyek ku xwe jî pîrbêjîyê dîr bike. Çi ku axaftina zor dirêj û bê armanc xwendevanî bêzar dike. Ji ber vê çendê jî divê nivîser bi şeweyeke giştî xwe jê dîr bike. Herwusa pêdivîye ku nivîser di dîyalogê da dirêjberîyê bi kar neîne û kurtbirîya wî jî wusa kurt nebe ku i wateya neragihîne.<sup>179</sup>

Rexnegiran jî bo pitir ronkirina rol û girîngîya vê teknîka vegêranê çend cure destnîşan kirine ku ev jî dîyaloga rastewxu û dîyaloga nerastewxu.

#### **1.3.1.2.1. Dîyaloga Rastewxu**

Di vê cure dîyalogê da nivîser kesayetîya lehengê roman û çîrokê vedişere û hizr û bîr û boçûnên xwe bi zimanê wî pêşkêş dike ango bi rêya cînavê kesê yekê yê tak “min”ê gotara xwe pêşkêş dike.<sup>180</sup> Eve jî zêdetir di wan danûstandinan da dibe ku di dema niha ya vegêranê da tete encamdan.

#### **1.3.1.2.2. Dîyaloga Nerastewxu**

Wekî jî navê wê jî dîyar dibe ku bi şeweyeke nerastewxu derbirîn jê tete kirin û herwusa rûdana li ser zarê karakterî bi xwe ye. Ev pêvajoya vegêranê bi harîkarîya

<sup>177</sup> Xalid Seher Mihî, Elsa'idî (1978), *El-Bînaul-Fennî Fî'r-Rîwayetu't-Tarîxîyetu'l-'Erebîye (1870-1939)*, Bexdad, Eylul, r. 94.

<sup>178</sup> Aram Yusif, Îbrahîm (2012), *Binemayên Diramayê di Çil Hikayetên Mela Mehmudê Bayezîdîda da*, Çapxana Hawar, Dihuk, r.117.

<sup>179</sup> Perwîn, Ebdullah (2008), *Regezekanî Dirama Le şî'rî Lîrikî Kurdî da Kirmancî Xîwarû 1980-Raperîn*, Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa Yekem, Suleymanîye, r. 47.

<sup>180</sup> Emîn, Ebdulqadir (2010), *TîyoûTeknîkênŞirovekirnaRoman (Tîyor, Goşenêrînî, Muntac, Dîyalok)*, Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, r. 198.

cînavê kesê sêyê yê tak û kom têtê encamdan bi bikaranîna deste wajeyên gotî, gotin, pirsyar kir, dibêje û hwd û hin caran rastewxu amajê bi naxê karekterî têtê kirin.<sup>181</sup>

### 1.3.1.3. Monolog

Monolog yek ji wan teknîkên di bîwarê çîrokê da hatîye bikaranîn û xwedan roleke karîgere di prosesa vegêranê da û ji bo dîyarkirina xerîze û nestî kesayetîyan rêyeke. Ev tuxmê çîrokê yekcarî bihêz bû û belav bû piştî ku teorîyên Sîgmund Freudî xwe bi ser wan çîroknûsan da sepandî û yê divîya derûnîya mirovan bi rêya çîrokê şîrove bike.<sup>182</sup> Monolog hunereke girînge di çîrokê da, çî ku helçûn û cîhana navxweyîya kesayetan tê da berçav dibe û di derxistina cîhana veşartî ya kesayetane ku xwîner bi vê çendê şareza dibin.<sup>183</sup> Dîyar e ku ev hunere di prosesa vegêranê da bû û di berçavkirin û aşkerakirina nihênîyên veşartî yê derûna kesayetan da dihat bikarînan di wan deman de di çarçova cîhaneke navxweyî ya girtî da. Kesayetî bi tenê xwe bi xwe bêyî ku kesek guhdarîyê lê bike behsî kiryar, kêşe, arîşe, hevrikî û helwestên xwe dike ku ev monolog êcar çî di demeke asayî da be yan jî dema ev kesayetîye li jêr fişareke derûnî-civakî da be.<sup>184</sup> Di vê bîwarê da Rubert Himfirî di pirtûka xwe ya bi navê " Teyarul -We'î -Fîl Rîwayetul- Hedîse" da cextîyê li ser wê çendê dike ku monolog di çîrokê da bi mebesta pêşkêşkirina rewşa derûnî ya kesayetî ye û kiryarên wî yê derûnî têtê bikaranîn.<sup>185</sup>

Monolog nayê holê ku heke palewan nebin, çî ku monolog ji hizr û bîrên palewanî peyda dibe û bi rêya monologê em di naxê palewanî da digerin û ji cîhana wî agahdar dibin. Monolog para pitir di çîrok û destanên xeyalî da zêde tên bikaranîn. Di nav çîrokên dî da rola monologê ji dîyalogê kêmtir nîne, çî ku herdu jî kesayetîya karekteran derdixnin û bîr û boçûnên karekteran aşkera dikin.<sup>186</sup> Bêguman

<sup>181</sup> Rêzan 'Usman, Mustefa (2010), *Binyatî Curekanî Rûdaw le Romanî Kurdî Başurî Kurdistan Da* (1985-1990), Belawkirawekanî Ekdîmyay Kurdî, Çapa Yekem, Hewlêr, r. 198.

<sup>182</sup> Celal, Mustefa (2004), *Bîyavê Xwandîne (Çend Vekolînek Derbarey Çîroka Kurdî)*, Çapxaneya Hawar, Çapa yekem, Dihuk, r. 65.

<sup>183</sup> Nî'metullah Hamid, nihêlî (2010), *Diravek Ji Rexne (Rexne û Vekolîn)*, Çapxana Hawar, Dihuk, r. 18.

<sup>184</sup> Mes'ud Cemîl, Reşîd (2016), *Pexşan û Hunerên Wê*, Çapxana Hîvî, Çapa Yekem, r. 129-130.

<sup>185</sup> Rubert, Himfirî (1984), *Teyaru 'l-We'î Fî'r-Rîwaye 'l-Hedîse*, Trc: Mehmede'l-Erebî, Mektebetu'ş-şebab, Misir, r. 44.

<sup>186</sup> Perwîn, Ebdullah (2008), *Regezekanî Dirama Le şî'rî Lîrîkî Kurdî da Kirmancî Xîwarû 1980-Raperîn*, Dezzgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa Yekem, Suleymanî, r. 40.

monolog jî wekî dîyalogê teknîkeke ku di çîrokê da tê bikaranîn ji bo dîyarkirin û pêkhatina derûnîya kesayetên çîrokê. Monolog wekî dîyalogê dem û cihê rûdanê dîyar dike belê monolog bêhtir ji dîyalogê palewanî ji bo xwendevanî dide zanîn. Hunera monologê di wê demê da di nav prosesa vegêranê da peyda dibe dema ku dîyalog wekî hunereke vegêranê nikare rola xwe bigêre. Herwekî ku dîyar dibe xala cuda û cîyawaz di navbera monolog û dîyalogê da ewe ku axîver yek kes e, yanî ev kesê ku diaxive ligel xwe diaxive û şert nîne ku mirov lê guhdar bin; çî ku hindêk caran bi şêweya pistepistê yan hizirkirin yan jî bîr anînê der tê.<sup>187</sup> Dîsa di monologê da rûdan ber bi kûrahîya derûna kesayetîyan ve diçin û hizir û fikir ligel xwe diaxivin.<sup>188</sup> Ji ber vê çendê jî monolog bû rêyek di dîyarkirina naxê kesayetîyan û amrazek ji amrazên ber destê nivîserî ji bo vegêrana bûyer û rûdanan.<sup>189</sup>

Di dawîyê da em dikarin bibêjin ku monolog girîngtirîn hunera vegêranê ye û bi rêya vê hunerê dengên kesayetîyan û hez û hizrên wan yê veşartî ji bo xwendevanî têne aşkera kirin. Çî ku kesayetî bi rêya vê hunerê bi awayeke azadane derbirînê ji hizir û bîr û azarên xwe dikin.

Bi şêweyeke giştî Rubert Himfirî di pirtûka xwe ya bi navê "Teyarul- We'î-Fîl- Rîwayetul- Hedîse" da çar cureyên monologê destnîşan dike û ev jî monologa rastewxu, monologa nerastewxu, saloxdan bi rêya zanyarîyên berfireh û paranewe ango mûnacaat.<sup>190</sup> Lêbelê em dê li vir ji ch bidine du cureyan ji ber ku ev herdu cure girîngtir in ji yê dî.

### 1.3.1.3.1. Monologa Rastewxu

Teknîkeke girîng û ciwan e ji bo danana azadîya raderbirînê ji bo kesayetên di nav çîrokê da. Monologa rastewxu ev monolog e ku bê maytekirina nivîserî dihête

<sup>187</sup> Letîf, Zeytunî (2002), *Me'cemu'l-Mustelehatu'n-Neqdu'r-Rîwaye (Erebî-Îngilîzî-Firansî)*, Daru'n-Nehar Lî'n-Neşir, Çapa Yekem, r. 163.

<sup>188</sup> Nî'metullah Hamid, nihêlî (2010), *Diravek Ji Rexnê (Rexne û Vekolîn)*, Çapxana Hawar, Dihuk, r. 19.

<sup>189</sup> 'Ebdullah, Rehman (2014), *Binyatî Gêranewe Çend Lêkolîneweyekî Edebî Lebarey Çîrok û Romane Şî'ir, Çapxaney Mukrîyanî*, Çapa Yekem, Hewlêr, r. 274.

<sup>190</sup> Rubert, Himfirî (1984), *Teyaru'l-We'î Fî'r-Rîwaye'l-Hedîse*, Trc: Mehmude'l-Erebî, Mektebetu'ş-şebab, Misir, r. 42.

gotin ku di vê cureyê da cînavê kesê yekem, yanî ez û min tê bikaranîn.<sup>191</sup> Bi gotineke dî maytêkirina nivîserî û herwusa hebûna guhdarî li ber çav wernagêre. Palewan digel xwe diaxive bêyî ku hizra yekî bike diçe di nav cîhana xwe da. Bi vê çendê dema xwendevan vê çîrokê dixwîne hest bi hebûna nivîserî nake heçku nivîser dîyar nîne di nav vê axaftinê da.

### **1.3.1.3.2. Monologa Nerastewxu**

Ji saxletên vê teknîkê ev e ku hest bi hebûna nivîserî tê kirin li cem xwendevanî û cînava kesê nedîyar di şûna cînavê kesê axîver di monologa nerastewxu da bi kar têt.<sup>192</sup>

### **1.3.2. Regezên Vegêranê**

Vegêran di pêkhateya xwe da ji çendîn regezan ve pêk têt û wan regezan jî roleke serekî û berçav di avakirina prosesê vegêranê da heye û her regezek bi rol û erkeke cuda radibe di vegêranê da. Di bineret da hemî rêgezan peywendîyeke organîk bi hemî regezên dîtir ve heye. Ji ber vê çendê dê amaje bi çend regezan bideyîn ku ew ên roleke serekî di vê prosesê da digêrin û peywendîya wan digel vegêranê dîyar dikin.

#### **1.3.2.1. Kesayetî / Karakter**

Yek ji regezên çîrokê yê girîng têt jimartin û tuxmeke serekî û girîng e di binyata vegêranê da çî ku peywendî bi sercem tuxmên dî yê vegêranê wek cih, dem, rudan û hwd. ve heye. Em dikarin bi rehetî bibêjin ku kesayetî giringtirîn egerê kartêkirina edebî ye.<sup>193</sup> Hebûna kesayetîyê û hejmara wan girêdayî babeta çîrokê yan romanê ye û zêdebûn û kêmbûna kesayetîyan nabe egerê guhurîna bihayê kesayetîyê di binyata çîrokê yan ya deqa edebî da. Herwusa divêt kesayetî cîyawaz bin û serinc rakêş bin ango nabe ku hejmara wan zêde be yan sifetên wan nêzîkî yek bin, belkû ya

<sup>191</sup> Celal, Mustefa (2004), *Bîyavê Xwandinê (Çend Vekolînek Derbarey Çîroka Kurdî)*, Çapxaneyê Hawar, Çapa yekem, Dihuk, r. 66.

<sup>192</sup> Rubert, Himfirî (1984), *Teyaru'l-We'i Fî'r-Rîwaye'l-Hedîse*, Trc: Mehmede'l-Erebî, Mektebetu'ş-Şebab, Misir, r. 49.

<sup>193</sup> Xedîce Qelî, Zade(2011), *El-Qîsetu We'Enasiruha*, Rîsalet Macîstêr- Fî'l-Luxe'l-Erebîye, Camî'et-Azad-Fî'l-Kerec,

[http://www.diwanalArab.com/spip.php?page=article&id\\_article=29290](http://www.diwanalArab.com/spip.php?page=article&id_article=29290)

baş ewe ku her kesayetîyek xwedan taybetmendîyên xwe yê cîyawaz hebin da ku neyêne têkelkirin ji alîyê xwandevanî ve ango guhdarî ve.<sup>194</sup>

Kesayetî wek alavê serekî yê nivîskarî têtê dîtin ji bo berceste kirina dîtina xwe û derbirînên xwe ji durhêlî. Dîsa yek ji wan babetên ku gelek çir û aloz e û çendîn pênase ji bo kesayetîyê hatine kirin ji alîyê zana û lêkolîneran ve ku her yekî ji wan li gor têgihîştina xwe kesayetî pênase kirîye. Di vê mijarê da yekemîn kesê ku behsê kesayetîyê kirîye, Arîsto ye. Têgeha kesayetîyan di şî'rîyeta Arîsto da kareke lawekî ye û ew bi tamamî ketîye di bin têgeha kiryarê. Arîsto dibêje: çê dibe ku çîroka efsaneyî bê sîmayên kesayetîyê hebin belê çî sîmayên kesayetîyê bê çîroka efsaneyê nîn in.<sup>195</sup> Ango Arîsto cextê ji kesayetîyê bêhtir li ser rûdanê dike û li cem wî kesayetî pileya duyem da ne û kesayetî bi pêkhateyek lawekî di edebî da dide nasîn.

Her ji berê heta niha çî pênaseyên giştî û yekgirtî ji bo kesayetîyê nehatine kirin. Sedema wê jî ewe ku kesayetî xwe di nav hemî biwarên jîyanê da dibîne mîna biwarê edebî û zanistî. Her yek ji wan zana û pisporan jî ji alîyêkê ve pênaseya kesayetîyê kirîye. Warn di ferhenga derûnnasîyê da kesayetîyê ji alîyê derûnnasîyê ve pênase dike û dibêje: "Kesayetî rêkxistineke kamlane ya saxletên epîstemî, wijdanî, leşî û vîna takekesî ye ku wî ji kesên dî cuda dike."<sup>196</sup> Yanî kesên xwedan şîyan, behremend û şareza ev kes in ku ji alîyê saxlemîyê ve di kamlan û behreyeke taybet heye li cem wan ku şîyana afirandina berhemên edebî heye û ji kesên dî yê sade û tak cîyawaz dibin.

Di pênaseyeke kesayetîyê da hatîye ku kesayetî ji hebûna hindê kesên di berhemên edebî da heyî pêkhatîye ku hindê kar û egeran diafirînin û encam didin.<sup>197</sup> Dîsan vekolerê ereb Wadî Teha yê ku xwedîyê pirtûka " *Dîrasat- Fî'n-Neqîdu'r-Rîwaye*" da bi vî şeweyî pênase kesayetîyê dike "Kesayetî wek birbireya piştê ya serekî ye di çîrokê da û ev e jî regeza livîn û xweşîyê di nav rûdanê da peyda

<sup>194</sup> Ahmed, Necîb (1991), *Edebu'l-Elfal 'Ilim we fen*, Daru'l-fikru'l-'Erebî, el-Qahîre, r. 82

<sup>195</sup> Rulan, part (2002), *E'n-Neqdu'l-Bunyewî Lî'l-Hikaye*, Trc: Intîwan Ebu Zeyd, Menşûratu'l-'Uweydad, Çapa Dûyem, Heleb, r. 62.

<sup>196</sup> Arif, Hîtu (2010), *Kesayetî û Hesta Xwe Kêm Dîtinê*, *Kovara Metîn*, Hejmar 189, Dihuk, r.43.

<sup>197</sup> Şivan Qasim, Hesen (2011), *Rolê Dîyalokê Di Diramaya Kurdî da*, Çapxaneyê Rewşenbîrî, Hewlêr, r. 76.

dike.”<sup>198</sup> Ango bê ev tuxme avakirina çîrokê dê lawaz bibe yan bi hebûna xwe ve nabe yan jî dê hebûna xwe ji dest bide. Kesayetî pêwîstîyeke fere ji bo encamdana her kareke edebî çî ku bi rêjeka zora erk û karan radibe anga dibe bikerê hemû rûdanan. Rengvedana wan bar û duxên dewrûberî wî ye ku mebest jê civak e.

Nivîskar bi rêya kesayetîyên çîrokê boçûna xwe dîyar dikin û derbirînê ji hestên xwe beramberî waqî'î dike.<sup>199</sup> Ango kesayetî ji regezên herî girîng tête hijmartin ku bi rêya wê nivîskar dikare meram û hizrên xwe darêje û derbirînê ji wan helwest û rûdanan bike ew ên kartêkirin li ser wî kirine, lewra çîroknûs kesayetîya çîrokê dê ji waqî'ê jîyanê bîne ku di nav wê civakê da jîya be. Êca çî bike nav çarçoveyeke waqî'î ya rasteqînê da yan jî hindek caran tiştên xeyalî û xurafa be.<sup>200</sup> Meram ji vê çendê ewe ku kesayetî di çîrokê da wekî amûrekê ye di destên çîroknûsî da ku çawa dixwaze dê wûsa bi kar diîne. Şert nîne ku ew kesayetî di nav waqî'î da hebe. Hindek caran keseke rastî ye û hindek caran jî keseke xeyalî ye. Herwusa merc nîne ku mirov be, hindek caran gîyanewer jî roleke wek palewan di çîrokê da dibîne. Herwûsa hindek caran çîroknûs bi xwe jî di hindek cihan da dîyar dibe û dibe egerê peydakirina rûdanan, lê mebesta wî ya sereke ew bi xwe nîne.

Her ji berê da dîtînen cuda û gengeşeyên berdewam li ser vê babetê hebûyî ne. Li dîf borîna serdeman bi ser têgeha kesayetîyê hin guherîn hatine her ji serdema Arîsto û heta piştî hingê jî li cem kesên modern ên wekî Alan Rubgîreh, Curclokans, Guldman, Mixaîl Baxtîn.

Di dema Klasîkan da kesayetîya rasteqîne ji goşt û xwînê pêk dihat ku kesayetîyek bû bi bawerîyeke bihêz vegêrana waqî'ê mirovayetî û dewrûberî dikir. Belê çîroknûsên nû yên wek Rolan Part wûsa berê xwe didene kesayetîya çîrokê ku bi tenê ji rûpeleke kaxezê pêk têt.<sup>201</sup>

<sup>198</sup> Wadî, Tiha (1994), *Dîrasat Fî'n-Neqdu'r-Rîwaye*, Daru'l-Me'arif, Çapa Sêyem, r. 25.

<sup>199</sup> 'Amir, Elxerabîye (2011), *E'ş-Şexsîyetu'r-Rîwâiye*, Wezîfetuha We-Enwa'uha- We's-Sîmatuha, <https://maamri-ilm2010.yoo7.com/t2472-topic>

<sup>200</sup> Zuzan Sadiq, Tirwanişî (2008), *Çîroke Şî'ra Kurdî Edgarên Vegêranê Ast û Şêwe Qedrîcan (1972-1911) Wek Nimûne*, Çapxaneyê Xanî, Çapa yekem, Dihok, r. 18.

<sup>201</sup> Arezu Muhemed, Elî (2009), *Teknîk Le Romanekanî (Ebdullah Serac) Da*, Namey Master, Zankoya Selahedîn, Ziman û Edeba Kurdî, r. 12.

Di serdemên kevin da hizra efsaneyî û xurafî berbelav bû lewma dê bibîn ku kesayetîyên rûdanên girîng jî bi heman pîverê efsaneyî û xurafî bûn û gelek caran hindêk gîyandarên seyr û aşupî wekî gîyandareke du regez ku nîvek jin û nîvek mar yan nîvek mirov û nîvek jî masî berçavan dikevin.<sup>202</sup> Ango kesayetîyek be ji sînorê mirovê asayî derbas be û ber bi hêz û şîyanên xudawenda ve biçe û nêzikî wan bibe.

Guherîna mêjûya komelgehê bû egerê hindê ku takê kesayetîyê bête di nav çîrokê da û ev take ji gelek cîyawaz e digel palewanên edebîyatên serdemên kevin û ev take kesayetî ye takeke namo yan wekî xudawenda yan palewanên efsaneyî yan padîşah û mezinên sedê naverast yan jî kesayetîyên wekî dêwa nebûn, belkû takeke asayî ye ku di nav takên asayî yên dî jîyana xwe bi ser dibin.<sup>203</sup> Bi vê çendê pîverê helsenangîna şîyana hizrî ya nivîskarî çê kirin yan afirandina gîyanewerekê da nîne, belkû şîyana nivîserî di şîyandana ew kesê di hizra wî da bi ciwantirîn û baştirîn rêk da ku pitir nêzikê ketwarî bin.<sup>204</sup> Bi şeweyeke giştî em dikarin bibêjin ku kesayetî di nav çîrokên nû da kesê asayî ye û ji jîwarî tete wergirtin û çî nîşan û sîma û hêzên bilindtir ji mirovê asayî nîn in.

Alan Rubgirêh dibêje : "Kesayetî ne cînavê kesê sêyem ê nediyar û rût e, ne bikereke sade ye ku ji bo karekê hatîye rûdan."<sup>205</sup> Belkû girêdaneke muhîm di navbera kesayetîyê û bûyera da heye ku tete hijmartin wek du pêkhatên serekî yên vegêranê. Çi ku çî kesayetî ji derveyî bûyerê nîn in û herwekî çî bûyer bê kesyetî neyê.

Henrî Gîms girîngîyeke mezin dide kesayetîyê û siruşt û derûnîya wan û her vegêranek li cem wî saloxdana siruştê kesayetîyekê ye.<sup>206</sup>

---

<sup>202</sup> Emîn Ebdul Qadir, 'Umer (2008), *Şi'rîyet Di Romanên Sidqî Hirurî da*, Dezgehê Spîrêz, Dihuk, r.116.

<sup>203</sup> Ebdulrehman, Munîf (2006), *Tîşkêk Bû Ser Roman*, Wergêran: Şîrîn. k, Çapa Yekem, Suleymanî, r.16.

<sup>204</sup> Emîn Ebdul Qadir, 'Umer (2008), *Şi'rîyet di Romanên Sidqî Hirurî da*, Dezgehê Spîrêz, Dihuk, r. 116.

<sup>205</sup> Alan, Rubgirêh (1998), *Nehwel- Rîwayetu'l- Cedîde*, Trc: Mustefa Îbrahîm Mustefa, Dîrasat- Fîl- Edebul- Ecnebî, Daru'l- Me'arif- Bîmisir, Elqahîre, r. 35.

<sup>206</sup> Huseyîn, Elbehawî (1990), *Bunyetu 'l-Şekîlu 'r-Rîwayî*, (Elfeza-Ezemen-Eşexsiye), El-Merkezu's-Seqafî'l-Erebî, Darul- Beyza, r. 218.



Vegêranê roleke mezin û berbiçav di saloxdana kesayetîyan da heye û bi kumkirina ser û radibe sîmayên kesayetîyê û taybetmendîyên wî her ji destpêka metnê heta dawîya metnê.<sup>207</sup> Ji ber vê çendê vegêr bi kiriyara vegêranê radibe pêzanînên li dû nîyasîna kesayetîyên arasteyî guhdarî ango xwendevanî dike.<sup>208</sup>

Herî dawî em dikarin bibêjin ku kesayetî di metna vegêranê da gîyaneke ji peyvan li ser şeweyî mirovekî di jîyanê da hatîye çêkirin û ev pêkhate jî ji goşt û xwînê ye û çîroknûs bi rêka bikarînanana peyvan wêna kesayetîyê dikêşe û bi rengekê ji bo me pêşan dide ku ev e rastî ye.<sup>209</sup>

Perêz Sabîr di pirtûka xwe ya bi navê " *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî*" da cureyên kesayetîyê dîyar dike û dibêje kesayetîyên çîrokê bi giştî du cur in: Curek serekî û curek lawekî. Dabeşkirina kesên çîrokê ji bo kesên sereke û lawekî zêdetir dizivire bo wê kartêkirinê ewa ku di navbera kes û rûdanan ango ji bo regezê arîşe di çîrokê da.<sup>210</sup>

#### **1.3.2.1.1. Cureya Kesayetîya Serekî**

ku hemî rûdan li derûdora wê dizivirin û ji kesayetîyên dî pitir têne pêşandan û hemî kesayetîyên dî kar dikin ji bo aşkerakirina sîmayên wî û li dur da ev hizra nivîserî aşkera û dîyar bike.

#### **1.3.2.1.2. Cureya Kesayetîya Lawekî**

ew kesayetîye layenên veşartî û nedîyar ên kesayetîya serekî ron dike ku nihênîyên kesayetîya serekî ji bo wergirî aşkera dike.<sup>211</sup>

<sup>207</sup> Ehmed Muhemed 'Elî, Siwan (2011), *Mukewînatu's-Serd-Fî'l-Qisesu'l-Etfal, Fî's Suriye-Nimuzecen (1969-2000)*, Daru'l-Tekwîn, Darul- Tekwîn, Dîmeşq, r.180.

<sup>208</sup> Şewket Nebîl, Elmesrî (2015), *Tecelîyatu's-Serdî Fî'ş-Şi'irul-Erebi'l-Hedîs*, Elheye'l-Mesrîye'l-'Ame Lî'l-Kîtab, Mesir, r. 42.

<sup>209</sup> Saîr, Zeyînedîn (2011), ), *Fî'd-Dirubu's-Serd (Dîrasatu't-Tetbîqîye Fî'l-Qiss We'r-Rîwaye)*, E'n-Naye Lî'd-Dîrasat We'n-Neşir- We't-Tewzî', Çapa Yekem, Dîmeşq, r. 62.

<sup>210</sup> Perêz, Sabîr (2001), *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî Le Seretawe Ta Kutayî Cengê Duyemî Cihanî*, Çapxane Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa yekem, Silêmanî, r. 173.

<sup>211</sup> Ebdul Qadir, Ebu Şerîfe û Huseyîn Lafî, qiziq (2008), *Medxel Îla Tehlîlu'n-Nesu'l-Edebî, Daru'l-Fikir*, Çapa Çarê, 'Uman, r.135.

Ango em dikarin kesên serekî roleke dîyarkirî û berçav di rûdanan da dibîne û tewerê babetî pêk diîne û ne şerte ku ev kesê di waqî'ê jîyana rojane da berçav bibe. Dibe ku hindêk caran wan dabunerîtan û yasayên digel mentiq û lujîkî diguncin bişkîne û xwe lê derbas bike. Lê kesayetîya lawekî xwedan kesayetîyeke sade û aşkera ye sifet û siruşt a wî wekî keseke normal ku di waqî'î û jîyana rojane da çendîn cara berçavan dikeve bi şêweyeke binçîneyî beşdarîyê di avakirina kesên serekî da dike. Hindêk rexnegir jî ji bi vê mebestê ve zaravên cuda bi kar tînin. Wekî rexnegirê ereb Muhemed Xenîmî Hîlal di pirtûka xwe ya bi navê "*E'n- Neqîdu'l -Edebî'l - Hedîs*" da du zaravan ji bo cureyên kesayetîyê bi kar tîne ku ev jî kesayetîya xwedan yek ast û kesayetîya pêşketî.<sup>212</sup> Herwusa dibêje di her çîrokekê da kesayetîyek yan çend kesayetî rola sereke digêrin şan bi şanî wan hindêk kesayetîyên di rolekê yan jî çend rolên lawekî dibîne.<sup>213</sup> Ango dema çîroknûs erk û rolan dabeş dike li ser kesayetîyan her yekî bi şêweyekî rolê wî didê û hindêkên wan ji yên dîtir kêmtir rolê distînin û bi vê çendê her kesayetîyek bi cure erkekê radibe û cure pêkhatinek jî heye ku ji yên dîtir cuda dibe.

Herwusa vekolerê Erebi Ednan Xalid Ebdullah di pirtûka xwe ya bi navê "*E'n- Neqîdu'l -Tetbîqî t-Tehlîlî*" da kesayetîyê dabeşî du cureyan dike û du zaravên cuda bi kar tîne. Em dikarin kesayetîya di çîrokê da dabeş bikine li ser du cureyan; kesayetîya sade û kesayetîya bazineyî ku kesayetîya sade roleke lawekî di çîrokê da digêre û kesayetîya bazineyî anga kesayetîya zivirok jî ev kesayetîye ku çîroknûs hemî şîyanên xwe bikartîne ji bo wênekirina wî.<sup>214</sup> Her berdewamî dan bi axaftina xwe ev vekoler wusa dibêje : " Em dikarin ji kesayetîya bazineyî ra kesayetîya sade bibêjin û ji kesayetîya cêgir yan negur û bibêjin kesayetîya bazineyî kesayetîya dînamîkî".<sup>215</sup>

Ji bo piştgêrkirina Ednan Xalid Ebdullahî herdu vekolerên erebi, Ebdulqadir Ebu Şerîf û Huseyîn Lafî Qizîq di pirtûka "*Medxel -Îla Tehlîlu'n -Nesu'l- Edebî*" da

<sup>212</sup> Muhemed Xenîmî, Hîlal (1973), *E'n-Neqdu'l-Edebî'l-Hedîs, Daru's-Seqafe*, Beyrut, r. 529.

<sup>213</sup> Muhemed Xenîmî, Hîlal (1973), *E'n-Neqdu'l-Edebî'l-Hedîs, Daru's-Seqafe*, Beyrut, r. 522.

<sup>214</sup> Ednan Xalid, Ebdullah (1986), *E'n-Neqdu't-Tetbîqî't-Tehlîlî (Muqedîme Lî'd-Dîrasetu'l Edeb We 'Enasîruha Fî'z-Zewu'l-Menahicu'n-Neqdiye'l-Hedîse)*, Darul- Şûnul- Seqafiyel- 'Ame, Çapa Yekem, Bexdad, r. 67.

<sup>215</sup> Ednan Xalid, Ebdullah (1986), *E'n-Neqdu't-Tetbîqî't-Tehlîlî (Muqedîme Lî'd-Dîrasetu'l Edeb We 'Enasîruha Fî'z-Zewu'l-Menahicu'n-Neqdiye'l-Hedîse)*, Darul- Şûnul- Seqafiyel- 'Ame, , r. 68.

cureyên kesayetîyan bi du cûreyan ve dîyar kirîne û du zaravan ku ev jî kesayetîya çespaî û kesayetîya geşbûyî (baziney). Kesayetîya çespaî ev kesayetî ye ku qet gurankarîyek bi ser da nayê lê gurankarî bi tenê di peywendîyên wî da digel kesayetîyên dîtir peyda dibe lê reftarên wî herdem yek şewazê werdigire. Belê kesayetîya geşbûyî ev kesayetî ye ku li dû geşekirina çîrokê geş dibe û ji helwestekê ber bi helwesteke dî ve diçe. Yanî di her helwesteke nû û taze da ev jî helwesteke nû werdigire ku ji me ra hin alîyên dîtir yên kesayetîyê xuya dibin.<sup>216</sup>

Çîroknûs ji bo dirustkirina kesayetîyên çîrokê giringîyê bi hindêk rehendên wê kesayetîyê dide û hewl dide bi rêka dîyarkirina wan rehendan hemî alîyên girêdayî bi kesayetîyê ve wan kartêkirinê di reftar û kiryarên wî da dikin ji bo xwendevanî rohn û aşkera bike. Ew rehende di hindêk jêderan da bi vî rengî hatine dîyarkirin.

1. *Rehendê Laşî yan Fîzîkî*: Li vê derê nivîskar saloxetên leşî ku ew ên girêdayî bi kesayetîyê ve mîna; bilindahî, kurtî, qelewî, ze'îfî, ser û sîma, regez û temenê wî û hwd dest nîşan dike.<sup>217</sup> Yanî alîyên derekî yên kesayetîyê têne dîyarkirin.

2. *Rehendê Civakî*: Ku ev kesayetî ye bi çîneke civatê ve girêdayî ye wekî kar û cureyê karî û asta xwandina wî û hemî çalakîyên wî. Dîsa jîyana navxweyî xêzanê wekî jîyana hevjinî û darayî û hizrî û paşê ayîn û regezname têt paşî rewten sîyasî û arezû.<sup>218</sup> Ku van hemî egeran kartêkirin û bandor li ser jîyana kesayetîyê heye ji alîyê rehendê civakîyê ve.

---

<sup>216</sup> Ebdul Qadir, Ebu Şerîfe û Huseyîn Lafî, qiziq (2008), *Medxel Îla Tehlîlu'n-Nesu'l-Edebî, Daru'l-Fikir*, Çapa Çarê, 'Uman, r.134-135.

<sup>217</sup> Ranya Berekat, Elzewahîre û Şadî Ebdulkerîm, Elte'amîne (2006), *Fenu'l-Qisse'l-Qesîre*, Beytu'l-Karu'd-Dewlîye, 'Uman, r. 16.

<sup>218</sup> Muhemed Xenîmî, Hilal (1973), *E'n-Neqdu'l-Edebî'l-Hedis, Daru's-Seqafe*, Beyrut, Beyrut, r. 614. Ranya Berekat, Elzewahîre û Şadî Ebdulkerîm, Elte'amîne, (2006), *Fenu'l-Qisse'l-Qesîre*, Beytu'l-Karu'd-Dewlîye r.19.

3. *Rehendê Derûnî*: Ev rehende ku rewşa derûnî û reftarên ji encama wê rewşê peyda dibin rohn dike wekî hez û hêvî, nîyaz û hizrên kesayetîyê û herwusa gêwlê wî ji helçûn, aramî, gûşegerî û keyfxweşîyê dîyar dike.<sup>219</sup>

4. *Rehendê Hizrî û Aydîyolojî*: Ji hizr û bîrên kesayetîyê ve pêk têt, ka ev hizr û bîre ligel helwest û reftarên wî ve hev digirin yan ne.<sup>220</sup>

### 1.3.2.2. Rûdan / Bûyer

Di vegêranê da hokarek serekî ye û yek ji binemayên metna vegêranê dihête hijmartin. Çi ku rûdan hokareke serekî ye ji bo rûdana rûdanekê û heke rûdan rû nede bi navê çîrokê yan kurte-çîrokê janrek edebî peyda nabe.<sup>221</sup> Yanî em dikarin bibêjin ku rûdana çîrokê serçaweke siruştî ye û çûroknûs sererast dike da ku bigehijîne bala çîrokê di şêweyê edebî da ku xwendevanî bike di haletê wehmî da. Ev çende jî bi rêka endîşa nasik ya nivîserî. Şert nîne ku hemî rûdan di siruşt û waqî'î da bin di nav çîrokê da.

Bûyer hijmareke wan karan e yên ku lehengên çîrokê û alîkerên wan di jîyaneke tevlihev da pê radibin, paşê nivîskar dê bi şêweyê bi rêkûpêk bi hev ra girê bide da ku nêzî realîtê yanî rastîyê bibe.<sup>222</sup>

Pul Rîkurd di pirtûka xwe ya bi navê " *Elwîcud- Wez-Zeman -Weserd* " da dibêje: ku rûdan beşdarîyê di rewte vegêranê da dike herwekî ku çawa beşdarîya destpêkê û dumahîkê dike.<sup>223</sup> Di rûdanê da ya girîng ev e ku di binyata vegêranê da tuxmeke çalak hebe û ji hemî tuxmên di bêhtir rol û erkê bibîne. Bûyer di mêşkê feylesofan da bûye cihê livandina hizrê ku cara yekem yekî hest bi girîngîya vê binemayê kirî Arîsto bû. Rûdan ber bi jenga karê hunerî ye û janrên edebî, helbest û

<sup>219</sup> 'Ebdul Qadir, Ebu Şerîfe û Huseyîn Lafî, qiziq (2008), *Medxel Îla Tehlîlu 'n-Nesu 'l-Edebî, Daru 'l-Fikir*, Çapa Çarê, 'Uman, r. 133. Ranya Berekat, Elzewahîre û Şadî Ebdulkerîm, Elte'amîne, (2006), *Fenu 'l-Qisse 'l-Qesîre*, Beytu 'l-Karu 'd-Dewlîye r. 20.

<sup>220</sup> Perêz, Sabîr (2001), *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî Le Seretawe Ta Kutayî Cengê Duyemî Cihanî*, Çapxane Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa yekem, Silêmanî, r. 165.

<sup>221</sup> İbrahîm Qadir, Muhemmed (1997), *Lekolînewey Kurte Çîrokî Kurdî le Kurdistanî Başûr da* (1970-1980), Teza Doktorayê, Koleja Adab, Zankuya Selahedîn, Hewlêr, r. 24.

<sup>222</sup> Hîvî, Berwarî (2010), *Rêbazên Edebî*, Çapxana Hewar, Çapa Yekem, dihuk, r. 316-317.

<sup>223</sup> Pul, Rîkurd (1999), *El-Wîcud We 'z-Zeman We 's-Serd (Felsefet-Pul Rîkurd)*, Trc: Se'îde'-Xanimî, El-Merkezu's-Seqafî'l-Erebî, r. 41.

pexşan di pirtûka navdar" *Fenu'l-Şi'ir* " da hatîye behskirin li jêr navê kiryar, ku edebîyateke taybet bû bi navê trajedîya yê. Ji ber vê çendê Arîsto di pirtûka xwe da dibîne ku rûdan lasayîkirina kiryarê ye û kiryar jî divêt yekgirtî be, heke jê hate guherîn yan jê birîn rûdan dê hilweşe; çî ku her tiştêkî ku bêyî armanceke dîyarkirî bête zêdekirin bi pişkek ji giştî nayê hijmartin.<sup>224</sup> Ji ber ku rûdan wekî xala serekî ya serincrakêşan û wirjandina vexwînerî tete hijmartin ku pêdivî ye girîngî bi rûdanê ve bête dayîn. Rûdan hevrikîya kesayetîya ne ji encama helwest û helçûna digel xelkeke ku di cih û demêke dîyarkirî da, yanî kes û dem û cih bi rûdanê ve hatîne destnîşan kirin û herwesa kesayetî bi karên serekî yêr rûdanê ne û dem û cih ev çarçove ne ku ew ên rûdan tê da tete encam dan.<sup>225</sup> Yanî rûdan egerê serekî ye ji bo peydabûna vegêranê bi rêka kesayetîyan di çarçoveya dem û ciheke dîyarkirî da. Dîsa ji bo me dîyar dibe ku rûdanê girêdaneke aşkera bi her sê regezên vegêranê, dem, cih û kesayetîyê ve heye ku her yekî wan tamamkerê ya dî ye û hemî pêkve dibine egerê dirustbûna binyata vegêranê. Di bineret da peywendîyeke bihêz heye di navbera vegêranê û rûdanê da. Çî ku erkê vegêranê ewe ku di nav metna edebî da rûdanekê yan çendîn rûdanan vedigêrîne ku li ser serê karekterekê yan palewanekê da derbas bûyî. Ji bo ku vegêran hebe pêwîste rûdanek jî hebe, heke rûdan nebe vegêran dirust nabe û bi vê ve jî girêdayî metn yan tekist jî dernakeve holê, çî ku girîngtirîn tişt di nav metnê da vegêran e ku dê gehîne wê encamê ku tuxmê rûdanê di nav metnê da rol û erka wî qet kêr nîne ji tuxmên dî.<sup>226</sup> Herwusa rûdanê destpêk û naverast û dûmahîk hene. Di destpêkê da rûdan rû dide û di naverastê da rûdan digihije lutkeyê û di dûmahîkê da jî encama rûdanê aşkera dibe.<sup>227</sup>

Herî dawî em dikarin bibêjin ku rûdan dibe egerê hindê ku xwendevan bi vegêrana metnê ve bête girêdan û ji eva bihorî ji bo me dîyar bû girîngî û erka rûdanê

<sup>224</sup> Eristotalîs (1973), *Fenu'l-Şi'ir*, Trc: Ebdulrehmanu'l-Bedewî, Daru's-Seqafe, Çapa Dûyem, Beyrut, r. 26.

<sup>225</sup> Ednan Xalid, Ebdullah (1986), *E'n-Neqdu't-Tetbîqî't-Tehlîlî (Muqedîme Li'd-Dîrasetu'l Edeb We 'Enasîruha Fî'z-Zewu'l-Menahîcu'n-Neqdiye'l-Hedîse)*, Darul- Ş'ûnul- Seqafiyel- 'Ame, Çapa Yekem, Bexdad, r. 82.

<sup>226</sup> Senger Qadir Şêx Muhammed, Hacî (2009), *Binyatî Gêranewe Le Dastanî (Mem û Zînî Ehmedê Xanî) û Romanî (Şarî Mûsîqare Spîyekanî Bextîyar Eli) da*, Lêkolîneweyekî (Rexneyî-Piraktîkî Berawirdkarî) ye, Çapxaneyê Xanî, Çapa Yekem, Dihuk, r. 153.

<sup>227</sup> Karzan Muhsin, Qadir (2009), *Sîmatazekanî Romanî Kurdî Le Nîwan Salanî (2000-1991)*, Nama Masterê, Zankoya Selahedîn, r. 45.

di avahîya çîrokê da. Lewra rûdan bûye binaxê çîrok li ser bête avakirin û hemî regezên dî pê ve têne girêdan.

Di vekolînên rexneyî û zanistî da heta radeyeke baş pişbestîn li ser vê cureyê polkirin tete kirin. Çi ku ev polkirin cextê li ser girîngîya rûdanê û teknîka wê ya hunerî dike û ev cure polkirin rûdanê dike du cure ku ev jî rûdanên serekî û rûdanên lawekî ne.<sup>228</sup>

#### **1.3.2.2.1. Rûdanên Serekî**

Ji rûdanên ku li ser serê kesayetîyê sereke diqewime ve pêk têt. Ew rûdan in ku ev ên hebûna van ji bo derbirîna babetî gelek pêwîst û girîng e. Ew cureyên rûdanan hemî wek zincîreyekê di meşkê nivîskarî da pêk ve girêdayîne ku jê birna yekî ji wan rûdanan dê bibe egerê herifandina babetî.<sup>229</sup> Bi vê çendê ji bo me dîyar dibe ku rûdana serekî binyata serekî ya vegêranê pêk tîne.

#### **1.3.2.2.2. Rûdana Lawekî**

Ji rûdana ku dibe tamamkerê rûdana serekî ve pêk têt. Bi gotineke dî ev cure di bin xizmeta rûdana serekî da ne. Rûdanên lawekî ev rûdan in ku nivîskar bi harîkarîya wan derbirîna babetî berfirehtir lê dike û bi rêka van rûdanan derfeteke baştir ji bo rûdanên serekî tete dîtîn.<sup>230</sup> Yanî kesayetî çendîn rûdanên lawekî pêkve girê dide û rûdaneke serekî pê dirust dike. Herwusa hejmara rûdanên lawekî bi sînor nîne û hebûn û nebûna pêwîst nîne hem di destpêka rûdanê û hem jî di dûmahîka vegêranê da.

#### **1.3.2.3. Dem/Zeman**

Dem regezeke dî ya girîng e di çîrokê da û bikaranîna demê di nav çîrokê da bi rengeke ji rengan şarezayî û behremendîya çîroknûsî û desthilatdarîya wî ya li ser rûdanên çîrokê dîyar û aşkera dike. Guran Îbrahîm Gerdun di pertuka xwe da ewa bi

---

<sup>228</sup>Rêzan 'Usman, Mustefa (2010), *Binyatî Curekanî Rudaw le Romanî Kurdî Başurî Kurdistan da* (1980-1990), Çapxaneyê Spîrêz, Çapa Yekem, Dihok, r. 59-84.

<sup>229</sup>Meknun Muhemed Tahir, Mîqdad (2010), *Dîyalok di Diramaya Kurdî da(Deverz Behdînan) Wek Nimune*, Nama Masterê, Zankoya Dihok, r.67.

<sup>230</sup>Meknun Muhemed Tahir, Mîqdad (2010), *Dîyalok di Diramaya Kurdî da(Deverz Behdînan) Wek Nimune*, r.67.

navê "*Kat û Peydabuna Jîyanê*" buçuna Ûgîstîn Hîpo derbarê demê da wiha dîyar dike û dibêje, "Dem çî ye? Heke ku kes ji min nepirse ez dizanim ka dem çî ye lêbelê gava ku bixwazim ji kesêke dî ra behsê demê bikim ka çî ye, wê demê nizanim."<sup>231</sup> Li gor vê dîtinê dem mijareke aloz e û hemû kes dizanin ka çî ye lê çî kes nizane ku bi awayeke zanistî û feylesofî behsa dem bike.

Dem regezeke girînge di jîyanê da û bi taybetî di çîrokê da ango çîrok ji hemû cureyên edebî zêdetir bi demê ve girêdayîye.<sup>232</sup> Çi ku çîrok bercesteke jîyanê ye û dem egerê guherîna jîyanê ye. Helbet mirov di nav karwana demê da ji dayîk dibe, mezin dibe, pîr dibe û paşî jî dimire. Ev guherînên di gerdûn û siruştê da çedibin hemû bi rêka demê çêdibin. Ji ber ku çîrok rengvedan û sîtava jîyanê ye û ji ber vê çendê jî dem xwe di nav pêkhatiya çîrokê da diçespîne û girîngtirîn û bihêztirîn rêgeze di çîrokê da. Ebdul Melîk Murtaz di pirtûka xwe ya bi navê "*Nezerîyetul Rîwaye*" da demê wusa pênase dike ku dem daveke xeyalî û şêlû ye û li ser her boçûn, çalakî, dîtin û hizrekê zal dibe.<sup>233</sup> Ango dem nayê dîtin bi çavan, em hest bi şêwazên wê diken ku di bunewerên li derûdora me da berceste dibin.<sup>234</sup> Yanî dem hebûneke hestpêkirî ya nedîtî û kartêker e du ruxsara giştî buneweran da heye. Çi tişt bê dem tamam nabe. Bi gotineke dî çîrok nayê vegêran heke buşeyek ango bîyaveke demê ya dîyarkirî nebe.<sup>235</sup>

Di nava tekstên vegêranê da dem xwedanê roleke karîger û bi bandor heye û yek ji ev tuxmên serekî ye ku di prosesa vegêranê piştbestinê li ser dike bi şêweyeke wusa ku hebûna vê hêmanê di vegêranê da yek ji pêdivîyên vegêranê ye û çî vegêran

<sup>231</sup> Guran Îbrahîm, Gerdun (2013), *Kat û Peydabuna Jîyanê*, Çap û Pexşî Serdem, Suleymanî, r. 237.

<sup>232</sup> Sîza, Qasim (1985) *Bîнау'r-Rîwaye*, *Dîrasetu'l-Muqarene Fî's-Sulasîyet*, *Necîb Mehîfuz*, Daru't-Tenwîr Lî't-Tîba'e We'n-Neşîr, Çapa Yekem, r. 37. Edwîn, Muyîr (1965), *Bîнау'r-Rîwaye*, Trc: Îbrahîmu'l-Sîrfî, Elmuesesetu'l- Misrîye'l-'Ame Lî't-Telîf We'l-Ebna We'n-Neşîr, Elqahîre, r.33.

<sup>233</sup> Ebdulmelik, Murtaz (1998), *Fî'n-Nezerîyetu'l-Rîwaye Behs Fî't-Teqniyetu'l-Serd*, Metbe'etu'r-Rîsale,, Kuwêt, r. 202.

<sup>234</sup> Ebdulmelik, Murtaz (1998), *Fî'n-Nezerîyetu'l-Rîwaye Behs Fî't-Teqniyetu'l-Serd*, r. 199.

<sup>235</sup> Zuzan Sadiq, Tirwanişî (2008), *Çîroke Şî'ra Kurdî Edgarên Vegêranê Ast û Şêwe Qedrîcan (1972-1911) Wek Nimûne*, Çapxaneyê Xanî, Çapa yekem, Dihok, r. 56.

bê hêmana demê pêk nayê.<sup>236</sup> Li gor vê çendê em dikarin bibêjin ku dem keresteyeke helîyay û harîkar e di nava vegêranê da û her vegêranek demekê destnîşan dike.<sup>237</sup>

Vegêrana rûdanan bêyî destnîşankirina demeke dîyarkirî dê kareke ne cihî da be. Ango vegêrana me ji bo her tiştêkê divêt di demeke dîyarkirî da be, êcar ev dem çi borî be, çi neborî be yan jî dema niha be.<sup>238</sup> Li wir em jê digihijin ku dem berî binyata vegêranê tête danîn.

Sîza Qasim di pirtûka xwe ya bi navê "*Bînaul Rîwaye*" da dibêje ku dem çîrok e û dem rîtm e anga melodî ye.<sup>239</sup> Ango dem çîrokê beref pêşve dibe.

Letîf Zeytuny di pertuka xwe da ewa bi navê "*Me'cemu'l- Mutelehatu'n-Neqîdu'r- Rîwayî*" buçuna Cîrar Cînît xuya dike ku mirov dikare çîrokekê bêyî dîyarkirina cihê çîrokê vegêre lê bêyî ku dîyarkirina demê vegêran gelek zehmet e, çi ku vegêrana çîrokê bi demên borî, dahatî û niha ve tête encam dan.<sup>240</sup> Di her metneke wêjeyî da du cure dem hene; dema çîrokê û dema vegêranê.<sup>241</sup>

Ev cîyawazî di navbera van herdu deman da tê dîtîn ji aliyê rêxistina zincîreya rûdanan û lezatî û sistîya wan e. Yanî dema çîrokê pêgîvîye bi zincîreya rasteqînî ya rûdanan bike, ji dema borî destpê dike û beref dema niha ji bo dema dahatî ve diçe. Dema vegêranê ev dem e ku vegêr rûdanan tê da vekdiêxe û vedigêre.<sup>242</sup> Herwusa Cuzif Mîşal Şerîm di gotineke xwe da dibêje dema vegêranê ne dema bûyerên rasteqînî ye, belkû di destpêkê demeke cuwankarî û îstatîkî ye û paşê

---

<sup>236</sup> Huseyîn, Elbehawî (1990), *Bunyetu'l-Şekîlu'r-Rîwayî*, (*Elfeza-Ezemen-Eşexsîye*), El-Merkezu's-Seqafî'l-Erebî, Daru'l- Beyza, r. 117.

<sup>237</sup> Gulistan Bedel Muhemed, Hesên (2001), *Jîyan Namey Xweyî Wek Curekê Edebî* (*Nuredîn Zaza*) *Wek Nimune*, Çapxana Xanî, Çapa Yekem, r. 131.

<sup>238</sup> Perî Salih Hemîd, Muftî (2012), *Gêranewe Le Ku Çîrokekanî Ehmed Muhemed Îsmail da, Lêkolîneweyekî Rexneyî Şikariye*, Çapxaney Hacî Haşim, Çapa Yekem, Hewlêr, r. 62.

<sup>239</sup> Sîza, Qasim (1985), *Bînaul-r-Rîwaye, Dîrasetu'l-Muqarene Fî's-Sulasîyet, Necîb Mehfuuz*, Daru't-Tenwîr Lî't-Tîba'e We'n-Neşir, Çapa Yekem, r. 38.

<sup>240</sup> Letîf, Zeytunî (2002), *Me'cemu'l-Mustelehatu'n-Neqdu'r-Rîwaye* (*Erebî-Îngilîzî-Firansî*), Daru'n-Nehar Lî'n-Neşir, Çapa Yekem, r.103.

<sup>241</sup> Mecmû'e Mîne'l-Muellifîn (1982), *Nezerîyetu'l-Menhecu's-Şeklî Nisusu's-Şeklanîyînu'l Erus*, Trc: Îbrahîmu'l-Xefîb, Mûessesetu'l-Ebhasu'l-Erebîye, Çapa yekem, Lubnan, r. 192.

<sup>242</sup> Hemîd, Elhemedanî (1991), *Bunyetu'n-Nessu's-Serdî Mîn Menzuru'n-Neqdu'l-Edebî*, Merkezu's-Seqafî'l-Erebî Lî't-Tîba'e We'n-Neşir We't-Tewzî', Çapa Yekem, Beyrut, r. 73.



demek dilînî, sozdarî û wijdanî ye.<sup>243</sup> Yanî dema vegêranê dema wênekirinê ye, çî ku nûnerîtiya demeke rasteqînî dike û hilgir û bargirê hindek rûdanên rasteqînî ye, ev ê çendê jî teknîk divêt ji bo ku vegêr dema rasteqîne ber bi dema vegêranê ve veguhêze.<sup>244</sup>

Di kurte-çîrokan da rêkxistina dem bi şeweyî xetêke rast bi ser beşên çîrokê da derbas dibe ku nivîskar girêdayî hindê nîne ta ku bibêje rûdan ji sipêdê yan piştî nivro rûda ye, belkû kar di nav rûdanan da rastewxu deqê dest nîşan dike û mirov xwe digel vê demê diguncîne.<sup>245</sup> Rêkxistina demê di çîrokan da ji çîrokekê ber bi çîrokeke dî û ji serdemekê ber bi serdemêke dî li dû şewaza vegêranê û teknîkên ku nivîser bi kar tîne diguherin. Bo nimûne di çîrokên teqlidî da dem bi şeweyêke zincîreyî û pêkvegirêdayî tete rêkxistin ango rûdan li pey hev tèn rêzkirin.<sup>246</sup> Belê di çîrokên nû da dem di formeke tikel û şelû da ye ango nivîskar li dû pîverê rasteqîne yê demê di jîyanê da bi rê ve naçe. Belkû di her çîrokekê da li dû hindek pîverên hunerî yên taybet bi dem ve wekî pêkeftin vegêr yan... rûdanan rêk diêxe. Eve jî hêsanîyekê di çîrokê da peyda dike. Çî ku “Yarîkirin bi demê cuwanîyekê dide berhemê û kartêkirinê li ser hebûna rûdanan nake, belkû kartekirinê li ser rêk xistana ewan ji aliyê demê ve dike.”<sup>247</sup>

### 1.3.2.3.1. Cureyên Demê

Bi giştî her berhemêke edebî tevî çendîn cureyên deman dibe. Ev dem e di çîrokê da ji du cureyan ve pêk têt. Dema derekî (siruştî) û dema navekî.

#### 1. Dema Derekî:

<sup>243</sup> Cuzêf Mîşal, Şerîm (1984), *Delîlu'd-Dîrasatu'l-Îslubîye*, Elcamî'îye Lî'd-Dîrasat we'n-Neşir we't-Tewzî', Çapa Yekem, Beyrut, r. 18.

<sup>244</sup> Cuzêf Mîşal, Şerîm (1984), *Delîlu'd-Dîrasatu'l-Îslubîye*, Elcamî'îye Lî'd-Dîrasat we'n-Neşir we't-Tewzî', 18-19.

<sup>245</sup> Rêjîn Cemîl, Xelîl (2014), *Hunerên Çîroknivêsinê Li Cem (Nuerdîn Zaza)*, Vekolînek Wesfî Şirovekarîye, Nama Masterê, Zankoya Dihok, r. 66.

<sup>246</sup> Meha Huseyîn, Elqesrawî (2004), *Ezemen Fî'r-Rîwaye'l-Erebîye*, El-Muessese'l-Erebîye Lî'd-Dîrasat We'n-Neşir, Çapa Yekem, Beyrut, r. 45.

<sup>247</sup> Murîs, Ebu nazir (1979), *El-Elsîniyet We'n-Neqdu'l-Edebî Fî'n-Nezerîye We'l Mumarese*, Daru'n-Nehar, Beyrut, r. 58.

Dema vegêr û nivîskar û wergirî ye. Di şeweyeke giştî ev deme yê ku hebûn tê da dizivire. Yanî “Ev rûbare, ku ji kûratîya hebûnê da derdikeve û dikeve wexerê û di rêka xwe da dibe delîve, demjimêr, roj, heyv, sal... ew deme bi leza mîlê demjimêrê tete hijmartin.”<sup>248</sup> Bi vê çendê dîyar dibe ku dema derekî “Dema fîzîkî û mêjûyî ye ku ji demjimêran hatîye wergirtin û bîrdanka mirovan pêk tîne, ji yek kêlîyê ber bi paşerojê ve diçe, rastîya wê mirinê dubare dike ewa çarenivîsê her gîyandarekê pê ve girêdayî.”<sup>249</sup>

## 2. Dema Navekî:

Muhemed Ezam di pertuka xwe da ewa bi navê "*Mefahîm'us- Serdîye*" da buçuna Tzvetan Todorov dîyar dike ku vê cure demê dabeşî sê cureyan dike. Dema çîrokê ango dema taybet ya ku bi cîhana aşûpî ve, dema nivîsîn yan vegêranê ku bi kirîyara gotinê ve girêdayî û dema xwendinê yan ev dema ku di xwendina tekstê ve pêdivî jê heye.<sup>250</sup> Yanî demeke taybet e bi derûna kesayetîyan ve û hest û sozên wan ve ango dema tekstê ye ev dema delalî ye eva taybet bi cîhana aşûpî ve, yê girêdayî bi wextê evê rûdan tê da derbas dibin ango dema nivîsîn û xwendinê ye.<sup>251</sup>

### 1.3.2.3.2. Livîna Demê

Livîna demê di vegêranê da yek ji wan teknîkane ku em dişên di çend xalekan da destnîşan bikin.

#### 1. Kurtkirin û Borandina

Mebest ji vê teknîkê ewe ku çend rojek yan heyv û sal ji jîyana kesan bi çend rêzekan ve bête vegêran, herwusa dema çîroknûs bi rêka amajeyên kurt maweyeke destnîşan kirî ji rûdana jîyana kesan vedigêre, wekî piştî çend heftêyan, piştî borîna

<sup>248</sup> Muhemed Emîn, Duskî (1995), Dem û Dem Nasî li nik Milletê Kurd, *Kovara Vejîn*, Hejmara (1), r.74.

<sup>249</sup> Tizifitan, Tuduruf (2005), *Mefahîmu's-Serdîye*, Trc: 'Ebdu'r-Rehman Mizyan, Menşuratu'l-Îxtîlaf, Çapa Yekem, r. 110.

<sup>250</sup> Muhemed, Ezam (2005), *Şi'rîyetu'l-Xîtabu's-Serdî*, *Menşurat Îttîhadu'l-Kîtabu'l-Ereb*, Dîmeşq, r. 106.

<sup>251</sup> Muhemed, Ezam (2005), *Şi'rîyetu'l-Xîtabu's-Serdî*, r. 106.

deh salan.<sup>252</sup> Kurtkirin di vê demê da bi kar têt dema nivîskar hest dike pişkek ji jîyana kesayetîyan yan qonaxek ji qonaxên wê bûyer û serpêhatî û tişteke wusa tê da nîne ku cihê behs kirinê be. Herwusa lezandin ango kurtkirina demê gelek caran tête bikarînan ji bo bilezkirina prosesa vegêranê.<sup>253</sup>

Her ji ber hindê nivîser wan cure kurtkirinan bi kar tîne û herwusa bikarînana wan şêwaz û huneran metnê ji westîyan û lawazîyê diparêze.

## 2. Pêşbînî

Yek ji wan teknîkên vegêr di vegêranê da bi kar tîne ku xwîndevanî di germatîya rûdanekê da radiwestîne û pişk dar dike di xwendin û pêşbînkirina rûdanekê ku renge di ayîndeyê da bête rûdan. Yanî behs ji rûdaneke di nav deqê da tête kirin ku hêj nehatiye rûdan. Rûdana pêşbînkirinê dibe ku bête dîtin û herwusa dibe ku neyê dîtin jî.<sup>254</sup> Helbet hebûn û dirustbûna pêşbînîyan jî ji bo xwînerî vedigêre ji bo şarezarîya nivîskarî û çawanîya darêtin û rêzbendîya rûdanan. Çi ku dibe nivîskar bi rengeke wusa dîmen û rûdanan senaryo bike ku xwîner xwe bi xwe hest bi wê mebestê bike ne nivîser rastewxu handanê bû bike û aşkera bike.<sup>255</sup> Herwusa ev cure teknîke pêkvegirêdaneke di navbera wergir û metnê da dirust dike, ango heza li pey çûna rûdanan ji alîyê xwendevanî ve zêde dike. Ev e jî dibe egerek ji bo xwînerî pêşbînî, encamên ber wext di hizra xwe da ava bike û herwusa mifa jê tête dîtin ji bo serenckêşan û azirandina bîra xwendevanî û vegêran ji nihe ber bi dahatîyê.<sup>256</sup>

## 3. Vegêrana Flaşbakê

---

<sup>252</sup> Nefisa, Îsmail (2005), *Teknîka Vegêranê di Kurteçîrokên Fazil Umerî da*, Çapxaneya Hawar, Çapa yekem, Dihok, r. 100.

<sup>253</sup> Celal Enwer, Se'îd (2009), *Teknîkî Gêranewe le Romanî (Êwarey Perwane) Ya Bextîyar Elî*, Çapxaneya kemal, Suleymanî, r. 119.

<sup>254</sup> Zahir, roj Beyanî (1997), *Çîrokî Hunerî Kurdî Şêwe û Şêwaz û Bunyad*, Çapxaneya Wezareti Rewşenbîrî, Hewlêr, r. 158.

<sup>255</sup> Perwîn, Ebdullah (2008), *Regezekanî Dirama le Şi'ri Lîrikî Kurdî da Kirmancî Xiwaru 1980-Raperîn*, Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Suleymanî, r. 53.

<sup>256</sup> Nefisa, Îsmail (2005), *Teknîka Vegêranê di Kurteçîrokên Fazil Umerî da*, Çapxaneya Hawar, Çapa yekem, Dihok, r. 97.

Ev cure vegêran berovajî vegêrana pêşbînî kirinê ye. Ango vegêrane ji bo rabirdû û bîranîna hindê bûyeran ku di berê angoya dema borî da qewimîye. Vegêrane ji bo dema borî yanî bîrxistina wê ye.<sup>257</sup> Hindêk rûdanên jîyana borî ya kesî diîne nav metnê da.<sup>258</sup> Ev e jî ji egerê helçûneke yan rûdaneke karîger yan her xalek ku bibe egerê wirjandina nivîserê bo hindê bizivire serdemeke zû da ku hemî tiştên mêjûyî wek leqteyên sînemayê bête bîra wan.<sup>259</sup> Yan jî di jîyana xwe da ya nexweş û neseqamgirî da xwezîyan ji bo jîyana borî bixwaze û bêrîya serdema zarokîniyê bike. Bêguman ev bîranîn û vegeryan ji bo dema borî bê merem nîne. Belkû pêşkêşkirina çend zanyarîyekan derbarê demên borî binemayek ji binemayên çîrokê yan bîranîna wan rûdana ye ewên ku berî rûdanê qewimîn.<sup>260</sup> Herwusa bi merema pitir tê geheştin ji rûdanên di nav metnê bi xwe da, çî ku nivîser hindêk caran bi temamî bagrewandekê reng dîke lêbelê nivîsîna xwe her bi spî dihêle.<sup>261</sup> Yanî vegeryan bo wî bagrewandî û ew tem û mijîya di nav rûdanan da heyî rohn dibe, angoya dibe pirek ji bo pêkve girêdana wan rûdanên serekî ewên bi rêka vegêrana asayî tete vegêran. Ev çende jî gelek caran bi rêka zimanî û bikarînan hindêk têgehan xwîner di nihaya wê da ji bo borî û rabûra wî da vedigêrine mîna “li bîra te ye, di bîra min da ye, tete bîra te?”<sup>262</sup> Ango wan peyvên dîke rêkek, derazînek ji bo vegêryana wê tiştê merem jê, yanî nivîskar roleke polîsî digêre ew zanyarîyên di bagrawendî da bi destê xwe diêxe û dîke amrazek ji bo bidestxistin û tawanbar kirina egerê peydabûna rûdana serekî.

<sup>257</sup> Şukrîya, Resul (2005), *Teknîkî Gêraneweyê Le Çîrokekanî (Marîf Berzencî) da*, Çapxaney Wezareti Perwerde, Çapa Yekem, Hewlêr, r. 82.

<sup>258</sup> Nefîsa, Îsmail (2005), *Teknîka Vegêranê di Kurteçîrokên Fazîl Umerî da*, Çapxaney Hawar, Çapa yekem, Dihok, r. 94.

<sup>259</sup> Perwîn, Ebdullah (2008), *Regezekanî Dirama le Şî'îrî Lîrîkî Kurdî da Kirmancî Xîwaru 1980-Raperîn*, Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Suleymanî, r. 379.

<sup>260</sup> Perêz, Sabîr (2001), *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî Le Seretaweyê Ta Kutayî Cengê Duyemî Cîhanî*, Çapxane Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa yekem, Silêmanî, r. 360.

<sup>261</sup> Zahir, roj Beyanî (1997), *Çîrokî Hunerî Kurdî Şêwe û Şewaz û Bunyad*, Çapxaney Wezareti Rewşenbîr, Hewlêr, r.162.

<sup>262</sup> Îbrahîm Qadir, Mohemedm (1970), *Lêkolîneweyê Kurteçîrokê Kurdî Le Kurdistanê Başûr da (1970-1980)*, Teza Doktorayê, Kolêja Adabê, Zankoya Selahedîn, Hewlêr, r. 188.

#### 4. Rawestîyan / Bêhnvedan

Ev teknîke dirust dibe dema rûdana çîrokê têne rawestandî ku ev jî têtê encamdan dema “Vegêran ber bi wesifkirinê ve diçe”.<sup>263</sup> Ango saloxdan di çîrokê da demê radiwestîne wekî Ebdulrehman Bedewî di pertûka xwe da ya ku bi navê “Elzeman Elwicûd” da dibêje: Dem di çend haletan da radiweste, wek haletê qeleqê û neçarîyê da û berovajî di haletê keyfxweşîyan da jî dem kurt dibe.<sup>264</sup> Rawestîyan bi ewan birgeyan ve girêdayî ewên di nav da dema çîrokê radiweste û dema vegêranê berdewam û dirêj dibe.<sup>265</sup> Ku ji encama saloxdan yan jî rohnkirinên vegêrî peyda dibe.<sup>266</sup>

#### 5. Dîmen

Wênekirina rûdanan û ew kesên peywendî bi wan rûdanan ve heyî di demeke dîyarkirî da, bi rengeke ku hemî layenên dîmenê bi dirêjî têtê behskirin. Wêne pitir peywendî bi sifetê dîtinê û hest pê kirinê heye wekî rengê perde, balinde, destlêdana tiştî germî û sarî ku rengvedana hestê xwendevanî ye wêne jî heye çîroknûs yekser siruştê wêne dike. Belê bi şêweyêke hunerî û ne asayî diêxe li ber dîtinê. Bo nimûnê di cihê ku bibêje asîman şîn e, dinivîse asman şuşe merkebekî wenewşeyî mezin e.<sup>267</sup> Belê bikarînan dîmenê yê vegêranê rûdanên girîng bi hemû hûrhûrkên xwe ve xwe ve vedigêre.<sup>268</sup> Ev çende jî ango vegêran û girtina wan wêneyan bi vî şêweyî dibe egerê sistî û lawazîya vegêranê. Çi ku dîmen ji encamên pêdivîyekê ji pêdivîyan bi kar têt.<sup>269</sup> Ji ber hindê divêt nivîskar zana û şareza be ku dîmenê li kî derê û kengê û çi qas bi kar bînin? Çi ku zor dîmen di vegêranê da zor pesend nîne û dibe egerê

<sup>263</sup> Semîr, Elmerzuqî û Cemîl, Şakir (1991), *Medxel Îla Nezerîyetu'l-Qisse Tehlîlen We't-Tetbîqen*, Daru'ş-Ş'ûnu'l-Seqafîye'l-'Ame, Bexdad, r. 82.

<sup>264</sup> Ebdulrehman, Elbedewî (1973), *El-Zemenu'l-Wicudî*, Daru's- Seqafe, Beyrut, r. 22.

<sup>265</sup> Cîrar, Cîmît û Wayîn, Bos (1989), *Nezerîyetu's-Serd Mîn Wichetu'n-Nezer Île'l- Teb'îr*, Trc : Nacî mustefa, Daru'l- Beyza, Çapa Yekem, r. 127.

<sup>266</sup> Cîrald, Birins (2011), *Zaravên Vegêranê (Fehenga Zaravan)* Wergêran Bu Zimanê Erebi: Abid Xeznedar, Wergêran Bu Zimanê Kurdî: Celal Mustefa, Çapxana Wezaretê Rewşenbîrî, Çapa Yekem, r. 242.

<sup>267</sup> Ebdullah, Serac (1997), (Roman.. Pênase.. Binema.. Têbînî), *Kovara Raman*, Hejmara (108), r. 95.

<sup>268</sup> Nefisa, Îsmâil (2005), *Teknîka Vegêranê di Kurteçîrokên Fazil Umerî da*, Çapxaneyê Hawar, Çapa yekem, Dihok, r. 106.

<sup>269</sup> Perêz, Sabîr (2001), *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî Le Seretawe Ta Kutayî Cengê Duyemî Cihanî*, Çapxane Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa yekem, Silêmanî, r. 218.

dirustbûna realîsteke tomar kirî.<sup>270</sup> Herwusa gelek caran nivîskar dîmen sade bi wesif û vegêranên bi hest û soz ve wêne dike. Ev e jî da bigihije hest û sozên guhdar û xwendevanî.<sup>271</sup> Bi vî rengî nivîser wê peyama merem jê arasteyê wergirî dike ango wêne dibe amûreke hunerî ji bo veguhestina serborîyan.<sup>272</sup> Herwusa harîkar e ji bo serkeftina metnê lê heke bi şêweyek dirust û pêdivî bête bikarînan.

## 6. Ladan

Ev teknîke her wekî kurtkirinê rûdanên çîrokê bilez diêxe. Mebest pê jêbirin yan feramuşkirina maweyeke çrokê ku hemî ev rûdanên dikevîne di nav vê demê da. Vegêr di vê demê da ber bi ladanê ve diçe, dema rûdan ya girîng û pêdivî nebe ji bo çîrokê û têgihiştina wê.<sup>273</sup> Li wir cîyawazî di navbera kurtkirin û ladanê da ewe; ladan salan û heyvan ji rûdanê feramuş dike û jê dibe, lê di kurtkirinê da vegêr rûdanan feramuş nake, belkû kurt dike û bi tîr û teselî behs nake.<sup>274</sup>

### 1.3.2.4. Cih/Mekân

Cih di çîrokê da rêgezeke serekî ye û tuxmeke girîng û avakare di binyata vegêranê da. Cihî taybetmendîya xwe ya neteweyî heye û ev cewhera karê hunerî ye û hemî rêgezên dîtir bi xwe ve hembêz dike.<sup>275</sup> Her bûyera di çîrokê da rû dide cihekî bi xwe ve digire. Evca ev cih çî ciheke vekirî û berfireh be yan jî ciheke girtî be ku cih derbirînê ji armancê çîrokê dike. Mîna Gaston Bachelard dibêje her cihek bi min taybetmendiyên xwe yê netewî hene ku derbirînê ji dîtinekê dike.<sup>276</sup> Çi ku ev cih mohra neteweyetîyê dest nîşan dike ka ev bûyer e di nav çî miletî da rû dayîye. Çi ku

<sup>270</sup> Perêz, Sabîr (2001), *Binay Hunerî Çîrokî Kurdî Le Seretawe Ta Kutayî Cengê Duyemî Cihanî*, r. 218-219.

<sup>271</sup> Çinar Sedîq, Xazî (2008), *Arastên Teknîkê Di Şi'ra Nû Ya Kurdî da Devera Behdînan(Bedirxan Sindî) Wek Nimune*, Çapxaneyê Hacî Haşim, Çapa Yekem, Hewlêr, r. 92.

<sup>272</sup> Çinar Sedîq, Xazî (2008), *Arastên Teknîkê Di Şi'ra Nû Ya Kurdî da Devera Behdînan(Bedirxan Sindî) Wek Nimune*, r. 93.

<sup>273</sup> Letîf, Zeytunî (2002), *Me'cemu'l-Mustelehatu'n-Neqdu'r-Rîwaye (Erebî-Îngilîzî-Firansî)*, Daru'n-Nehar Lî'n-Neşir, Çapa Yekem, r. 103. Muhemed, Ezam (2005), *Şi'rîyetul- Xîtabul- Serdî, Menşurat Îtîhad- Kîtabul- Ereb, Dîmeşq*, r. 113.

<sup>274</sup> Nahîze, Setar (2003), *El-Bunyetu's-Serdîye Fî'l-Qisessi's-Soffîye'm-Mukewînat We'l-Wezaîf We't-Teqniyat*, Menşurat Îtîhadu'l-Kîtabu'l-Ereb, Dîmeşq, r.229.

<sup>275</sup> Yasirê, Hesenî (2004), *Wexerek di Nehênîyên Deqî da*, Çapxaneyê Hawar, Çapa Yekem, Dihuk, r. 111.

<sup>276</sup> Gaston, Bachelard (1984), *Cemaliyatul- Mekân*, Trc: Xalib Helsa, Elmuesesse -Elcamî'- Lîn-Neşir- wet-Tewzî', Çapa Duyem, Beyrut, r. 7.

çîrok bi aşkerakirina cihî dê dîyar bibe ka ev lehenge li çî welatî dije û ev serdema ev welat tê da. Bo nimûne heke çîroknûsî îşaret da ku leheng di nav çîyayan da dibihore dê nêzîk bin ku ev rûdanên çîrokê têne hizra me ku çîrok di nav mileteke çîyayî da ye. Ev peywendîya lehengê çîrokê digel cihî gelek peywendîyeke girîng e di çîrokê da. Vêca divê çîroknûs bî hişyarane muameletê digel bike. Çi ku mirov nikare ji derveyî çîrokê bijî, di kêm çîrokan da ev haleta rûdayîne. Ev jî utopya ango derveyî cihî ku di çîrokên fantazîyan da têne bikaranîn. Herwusa divêt çîroknûs bizane ku cih gelek kartêkirinê li ser lehengê çîrokê dike. Çi ku piranîya caran cih dibe nasnameya netewetîyê û her xwînerê dikare şarezarîyê peyda bike ka çîroknûs vê kilîlê dike destê mirovî da paşê çî dibêje.

Herwusa cihî peywendîyeke bihêz digel bûyerê da jî heye. George Bilan dibêje dema bûyer nebe cihî jî hebûna xwe nîne.<sup>277</sup> Li dû boçûna vî rexnegirî bûyer, cihî destnîşn dike. Ango cih û bûyer wekî du rûyên derveyî ne û jêk cuda nabin, ji ber vê yekê cih ne rêgezê zêde ye ku di çîrokê da. Ev gelek reng û wateyan xwe ve digire, dûr nîne ku di hindê caran di hemû karan da tenê cih mebest be.<sup>278</sup> Cih heta ku wî radeyî hatîye mezinkirin di karên edebî da renga bê wê çîrokê baha û tama xwe nabe.

Cih û demê jî peywendîyeke bihêz digel hevûdu heye, çî ku cihî bê dem hebûna xwe nîne û herwusa demî jî bê cih hebûna xwe nîne.<sup>279</sup> Derbarê vê çendê dem û cih du tuxmên gelek girîng in di prosesa vegêranê da; vegêranê bê cih û dem erkê xwe bi cih naîne.<sup>280</sup> Ê cih yek ji tuxmên kartêker têtê hijmartin di navbera hemî tuxmên dî yên vegêranê da, û têtê wesifkirinê wek amanek ku tê da bûyer û kesayetî û rêgezên dîtir ên vegêranê pêkve kom dike ango cih ev tuxme ku çî tiştê bêyî wê rû nade.<sup>281</sup> Ji ber hindê girîngîya wê di prosa vegêranê da heye û di her kareke vegêranê da feramuşkirina cihî dê bibe egerê ev berhem resenetîya xwe ji dest

<sup>277</sup> Huseyîn, Elbehawî (1990), *Bunyetu'l-Şekilu'r-Rîwayî*, (Elfeza-Ezemen-Eşexsîye), El-Merkezu's-Seqafî'l-Erebî, Darul-Beyza, r. 30.

<sup>278</sup> Huseyîn, Elbehawî, (1990), *Bunyetu'l-Şekilu'r-Rîwayî*, (Elfeza-Ezemen-Eşexsîye), r. 33.

<sup>279</sup> Sebah, Îsma'îl (2009), *Çemk û Îstatîkay Şiwên le Edeba*, Dezgay Araz Bu Çap û Belawkirdinewey, Hewlêr, r. 26.

<sup>280</sup> Îbrahîm Qadir, Muhemmed (1997), *Lekolînewey Kurte Çîrokî Kurdî Le Kurdistanî Başûr da (1970-1980)*, Teza Doktorayê, Koleja Adab, Zankuya Selahedîn, Hewlêr, r. 91.

<sup>281</sup> Tanya Es'ed Muhemed, Salih (2011), *Bînay Şiwên Le Dû Nimûney Romanî Kurdî da (Hêlane-Ejdeha)*, Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa Yekem, Suleymanî, r. 45.

bide.<sup>282</sup> Cih bê tuxm û regezên dî yên vegêranê najît û hindek têkelîyan peyda dike digel pêkhênerên dî yên vegêrana serhatîyên wek kesî, rûdan û hwd.<sup>283</sup> Ku dîyar dibe ku cihî peywendîyeke organîk bi hemî tuxmên dî yên vegêranê ve heye û tamamkerên hevûdu ne. Dîsan peywendîya di navbera vegêran û cihî da di vê çendê da dîyar dibe dema vegêr dest bi vegêrana rûdanê dike, bêguman ev bûyer û rûdan li cihekî rû dide, lewra pêdivîye di prosesa vegêranê da vegêr amajeyê bide cihî di rûdanan da û saloxetên vî cihê rûdan tê da dirust bûyî dîyar bike û serenca wergirî rakêşe û bibe egerê girêdana wergirî bi vê metnê ve.

Cih di berhemên edebî da li ser çendîn cureyan tête dabeşkirin. Her rexnegir û vekolerekê bi şêweyeke cuda li gor têgihîştina xwe herwusa li dû cur, naverok, rûdan, jîngeha metnê ev cure dabeş kirine.<sup>284</sup> Ku yek ji wan dabeşkirinên puxt û hûr bi vî rengî ne:

1. Li dûf hebûna cihî; Cihê ketwarî û cihê aşûpî.
2. Li dûf têgeha hogirîyê; Cihê hogir yan aşna û cihê ne hogir yan ne aşna.
3. Li dûf bikarînana cihî; Cihê vekirî û cihê girtî.<sup>285</sup>

#### **1.3.2.4.1. Cihê Ketwarî û Cihê Aşûpî**

##### **1. Cihê Ketwarî (Waqî'î)**

Ew cihe evên di nav jîyana rasteqînî da hebûna wan heye û çîroknûs wan derbasî nav çîroka xwe dike. Ango ev cihe ewê çîroknûs bi çaveke normal dibîne û navê wê diîne, û di wesifkirina wan cihan da bi şêwekî waqî'î li dû bilindî, nizmî,

<sup>282</sup> Gaston, Bachelard (1984), *Cemalîyatu'l- Mekân*, Trc: Xalib Helsa, Elmuesesse -Elcamî'- Lî'n- Neşir- wet-Tewzî', Çapa Duyem, Beyrut, r. 8.

<sup>283</sup> Remezhan Hecî, Qadir (2006), *Cih Diromana Kûrdîya Devera Behdînan da (Geryan li Babê Berze û Dûzexa Spî) Wek Nimune*, Çapxana Hawar, Çapa Yekem, Dihuk, r. 44.

<sup>284</sup> Semîr, Elmerzuqî û Cemîl, Şakîr (1986), *Medxel Îla Nezerîyetu'l-Qisse Tehlîlen We't-Tetbîqen*, Daru'ş-Ş'ûnu'l-Seqafîye'l-'Ame, Bexdad, r. 58-59.

<sup>285</sup> Tanya Es'ed Muhemed, Salih (2011), *Bînay Şiwên Le Dû Nimûney Romanî Kurdî da (Hêlane-Ejdeha)*, Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa Yekem, Suleymanî, r. 79.



cuwanî û kirêtîyê wesif dike.<sup>286</sup> Ango em dikarin bibêjin ku cihê ketwarîyê ev cih e, ew ê xwedan rehendên maddî û hebûneke coxrafîk û endazeyî heye.

## 2. Cihê Aşûpî (Xeyalî)

Ew cihe yê ji encamê aşûpîya çîroknivîsî ve hatîye dirustkirin, ev cih e evê hebûneke maddî û şênber nîne lê tenê hest bi hebûna wî di xeyala kesan da heye, wêneyeke girîmane heye ku çavkanîya wê xeyal e.<sup>287</sup>

### 1.3.2.4.2. Cihê Aşna û Cihê Neaşna

#### 1. Cihê Aşna (Cihê Heval)

Ew cihe yê ku digel mirovî peywendîyên baş heyîn.<sup>288</sup> Ango ev cih e yê mirov hest pê xweşî û bêhnfirehîyê lê dike û mirovî vîyaneke mezin bo vî cihî heye weku mal, bajêr, welat. Ango ev cihe yê mirov tê da mezin dibe û bîrhatinên xweş tê da dibihurîne.

#### 2. Cihê Neaşna (Cihê Neyar)

Ew cih e yê bêyî hezkirina xwe mirov lê bijît.<sup>289</sup> Ango ev cih e yê mirov hest pê bêhtengî û bêzarîyê dike, çî ku mirovî çî hevalîn û çavnasî digel vî cihî nîne lê ji egerê hindêk zirûfên neçarîyê mirov lê dije. Mîna zindan û girtîxaneyan.

### 1.3.2.4.3. Cihê Vekirî û Cihê Girtî

#### 1. Cihê Vekirî

Ew cihe ewê mirov tê da azad û serbest e, û bi heza dilê xwe hatin û çûnê bike. Wekî bajêr, cade, mizgeft û hwd. Ango ciheke giştî ye ku hemû kes dikare hatin û çûnê tê da bike.<sup>290</sup>

<sup>286</sup> Perî Salih Hemîd, Muft (2012), *Gêranewe le Ku Çîrokekanî Ehmed Muhemed Îsmail da*, Lêkolîneweyekî Rexneyî Şîkarîye, Çapxaney Hacî Haşim, Çapa Yekem, Hewlêr, r.160.

<sup>287</sup> Perî Salih Hemîd, Muft (2012), *Gêranewe le Ku Çîrokekanî Ehmed Muhemed Îsmail da*, Lêkolîneweyekî Rexneyî Şîkarîye, r. 165.

<sup>288</sup> Remezhan Hecî, Qadir (2006), *Cih Diromana Kûrdîya Devera Behdînan Da (Geryan li Babê Berze û Dûzexa Spî) Wek Nimune*, Çapxana Hawar, Çapa Yekem, Dihuk, r. 49.

<sup>289</sup> Remezhan Hecî, Qadir (2006), *Cih Diromana Kûrdîya Devera Behdînan Da (Geryan li Babê Berze û Dûzexa Spî)*, r. 49.

## 2. Cihê Girtî

Ew cihe ew ê taybet bi kesekî yan hindê kesan ve û sînor û rûbereke dîyarkirî yê coxrafîk heye ku hemû kes nikare bi serbestî tê da serederîyê bike. Wekî mal, jûr, hewş û hwd.<sup>291</sup>

### 1.3.2.5. Deng

Ji alîyê vegêrannasan ve vegêr, hem wek bikerê tevgerekê û hem jî wek biresera/objeya tevgera xwe hatîye dîtin û bi peyva deng (voice/ses) jî hatîye binavkirin.<sup>292</sup>

Li ser vê mijarê hin pênaseyên cur bi cur ên lêkolîneran hene lê em dê li wir tenê cih bidine pênaseya Mikhail Bakhtinî. Li gor wî, berhema edebî, çî roman çî çîrok be, ger tê da hemû deng bişibin hev û wek hevûdu bin navê vê taybetîyê yekdengî (monologism) ye. Yanî heke bikaranîna ziman a karakteran û ferhenga wan a peyvan nêzîkî hev be vê gavê di vê metnê da yekdengî heye. Lê na heke dengê karakteran ji hev cuda û cîyawaz bin, ji wê ra jî dibêjin pirdengî (dialogism) û ev e zêdetir di romanên da tîn dîtin. Herwesa heke di berhemekê da bikaranîna zimanekê di jî hebe, ew jî wek cureyek pirdengîyê tê hesabandin û ev berhem bi rêya zimanên dî (heteroglossia) dîyalojîktir dibe û wek mînak em dikarin 3 Gav û 3 Darek<sup>293</sup> a romana Jan Dost bidin ku tê da digel zimanê romanê, zimanek dî jî, ji bilî kurdî tirkî jî derdikeve pêşîya me.

### 1.3.2.6. Zîq/Zîqbûn

Deng, bi pirsra “kî diaxive?” re eleqeder bû, zîq bi pirsra “kî dibîne?” re eleqeder e.<sup>294</sup> Yanî em dê metnê û şîrovekirina derûnaê karakteran bi çavê kî bibînin. Pirsra sereke û bingehîn eve. Mirov zîqerê bi giştî dikare di bin banê çar serenavan da berhev bike.

---

<sup>290</sup> Sebah, Îsma'îl (2009), *Çemk û Îstatîkay Şiwên le Edeb da*, Dezgay Araz Bu Çap û Belawkirdinewey, Hewlêr, r. 55.

<sup>291</sup> Sebah, Îsma'îl (2009), *Çemk û Îstatîkay Şiwên le Edeb da*, r. 55.

<sup>292</sup> Remezani, Ala (2015), *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebîyata Modern*, Çapxaneya Peywend Çapa Yekem, Stenbol, r. 119-120.

<sup>293</sup> Remezani, Alan (2015), *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebîyata Modern*, r. 119-120.

<sup>294</sup> Remezani, Alan (2015), *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebîyata Modern*, r. 120-121.

#### **1.3.2.6.1. Zîqbûna Sabît (Fixed Focalization),**

ew zîqbûn e ku diyarde û rûdanên vegêranê ji aliyê bergeha “yek zîqerî” ve qiset dike.<sup>295</sup> Di edebîyata kurdî da omanên wek Şivanê Kurmanca, Kurdê Rêwî, Hawara Dîcleyê mînakên vî cure zîqbûnê ne.

#### **1.3.2.6.2. Zîqbûna Guhêrbar (Variable Focalization),**

bûyer ji aliyê gelek zîqeran ve tete ragihandin. Yanî her beş ji aliyê zîqerekê ve tete ragihandin û zîqbûnek e dînamîk e.<sup>296</sup> Romanên Bîra Qederê, Tofan mînakên vê cûreyê ne di edebîyata kurdî da.

#### **1.3.2.6.3. Zîqbûna Piralî (Multiple Focalization),**

Her carê ku mirov “heman bûyerê bi zîqerên cihê” qiset bike, li ber destan zîqbûna piralî heye.<sup>297</sup> Bi vê teknîkê em heman bûyerê bi çavê gelek kesan ra dibînin.

#### **1.3.2.6.4. Zîqbûna Hevpar (Collective Focalization),**

ev cure zîqbûne ku bi cînava em/me vegêranê pêşkêş dike.<sup>298</sup> Yanî di vê cure zîqbûnê da vegêran bi cînava em û me’yê derdikeve pêşîya me.

#### **1.3.2.7. Ziman**

Di jîyana me ya rojane da ziman ew kereste ye ewê mirov pê hest û bîrên xwe derdibire, belê zimanê me yê rojane cîyawaz e digel zimanê edebî, dîsa di jîyana me ya rojane da ziman weke keresteyeke têngihjîtinê tete bikaranîn ku dibe zimanek gelek sade û rewan be, ziman di edebî da binçîneyî berzkirina wî edebî ye. Bi taybetî zimanê hikayetan pêdivîye ku zimaneke sade û sakar be û hevokên wan dirêj û bêzarker nebin û ji dûrî her aloziyekê be bi vî rengî dê ev berhem zêdetir serencrakêş û çêj wergir be. Zanista vegêranê bizavê dike zimanê vegêranê bide nîyasîn, ziman

<sup>295</sup> Remezan, Alan (2015), *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebîyata Modern*, r. 120-121.

<sup>296</sup> Remezan, Alan (2015), *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebîyata Modern*, r. 120-121.

<sup>297</sup> Remezan, Alan (2015), *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebîyata Modern*, r. 120-121.

<sup>298</sup> Remezan, Alan (2015), *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebîyata Modern*, r. 120-121.

yek ji wan rêgeza ye ku girîngîyeke herî zor di dirustbûna metnê edebî da heyî, yanî “Ziman yekemîn tuxmê edebî ye.”<sup>299</sup>

Bê ziman tekistên edebî dirust nabin, herwusa ziman tuxmên dî yên vegêranê dirust dike. Çi ku bi zimanî derbirîn ji wan tête kirin û tête nîyasîn. Guman tê da nîne ku karek di edebî da heye û pêdivîye hebe layenê îstatîkîyeta wê ye û ev layene ji bo hindê ye ku xwendevan çêjê jê wergire, dirustkirina vê çêjê erka zimanî ye ne ya tuxmên dîtir, di zimanî da sîstemek heye û ziman li ser vî sîstemê pêk têt, serkeftin û dakeftina zimanî girêdayîye bi evê sîstemê ve, lê nivîskar û helbestvanên cîhanê bi yek şêweyî miamelê digel vê sîstemê nakin, belê heke wusa kirin jî eve dê bi rêyeke zor berhemên wan wekî yek be, belê eva bûye egerê vê cîyawazîyê ev e ku her nivîskarek xudan ziman û şêwezek taybet e.<sup>300</sup> Yanî şêwaz tişteke kesî yan şexsî ye û cîyawazîya şêwaza nivîskaran dizivire bo cîyawazîya têgihiştin û kesayetîya navxweyî ya nivîskaran.<sup>301</sup> Ango şêwaz roleke mezin dibîne di serkeftina nivîskarî da, çi ku her nivîskarekî şêwazeke cîyawaz heye ku li dû asta xwe ya rewşenbîrî derbirîne ji şêwaza xwe dike. Taybetmendîya nivîskar û helbestvanî di hîlbijartina peyv angî wuşê daye.<sup>302</sup> Dibe gelek caran dewrûber jî kartêkirina xwe hebe li ser wan hîlbijartina û divêt ev wuşe ya tête bikarînan digel naveroka çîrokê ve bigunce û derbirîne jê bike, çi ku hindî naveroka çîrokê ya bi hez be lê heke çi şêwaz û peyvên baş û jêhatî ji bo vê naverokê bi kar neanî di vê demê babet dê bihayê xwe dê ji dest bidet. Digel vê çendê dibe şêwaza yek çîroknûsî di hemî berhemên wî yên edebî da wek hev nebin, ev e girêdayî qonaxa pêşkeftina serdemî ye û gelek caran bi hatina rêbazekê yan belavbûna şepoleke hizrî û edebî nivîskar neçar dibe di berhemên xwe da li dû biçê, bi evî rengî mohreke taybet ya vê serdemê di berhema wî da dîyar dibe.

Herwusa pêdivî ye ku em amajê bidene vê çendê ku çîroknûs gelek caran bi şêweyeke yekser zimanê vegêranê ji ketwarî û realîteyê werdigire û çendîn vekoler û

---

<sup>299</sup> Senger Qadir Şêx Muhammed, Hacî (2009), *Binyatî Gêranewe Le Dastanî (Mem û Zînî Ehmedê Xanî) û Romanî (Şarî Mûsîqare Spîyekanî Bextîyar Elî) da, Lêkolîneweyek (î Rexneyî-Piraktîkî Berawirdkarî) ye*, Çapxaneya Dihok, Çapa Yekem, r. 83.

<sup>300</sup> Senger Qadir Şêx Muhammed, Hacî (2009), *Binyatî Gêranewe Le Dastanî (Mem û Zînî Ehmedê Xanî) û Romanî (Şarî Mûsîqare Spîyekanî Bextîyar Elî) da, Lêkolîneweyek (î Rexneyî-Piraktîkî Berawirdkarî) ye*, r. 83.

<sup>301</sup> Heme Kerîm, ‘Arîf (2007), *Derbareyî Roman û Çîrok*, Çapxaneya Arabxa, Kerkûk, r. 64.

<sup>302</sup> Muhemmed Sadiq, El’effî (1978), *E’n-Neqdu’t-Tetbiqî We’l-Muwazenat*, Muessesetu’l-Xancî, Elqahîre, r. 200.

rexnegiran palpiştî li ser vê boçûnê kirîye ku ya baş eve zimanê vegêranê ji ketwarê bête wergirtin û zimanê sade be da ku nêzikî zimanê xwendevanî be. ‘Izzedîn Îsma’îl di pirtûka xwe ya bi navê “El edeb we finunuha” palpiştîyê li ser wê boçûnê dike û dibêje vegêran rûdana ji wêneya wê ya ketwarî û waq’î bo wêneya zimanî vediguhêze.<sup>303</sup> Ango pêdivîye ev rûdanên di nav ketwarê da rû didin bi şewê zimanî û nivîsînê bête veguhestin, belê hindêk vekoler û nivîskarên di dijî vê boçûnê ne û dibêjin ku pêdivî ye zimanê vegêranê ji ketwarîyê dûr be û pitir zimanê hunerî bête bikarînan, anga nivîskar layenên ciwankarîyê berçav wedigire di demên bi kar înan zimanê vegêranê da, û xwe dûr dike ji zimanê ku em jîyana rojane da bi kar tînin, çî ku ev tiştên dibine huner pêdivîye layenên hunerî tê da berçavan bêne wergirtin. Roland Barthes di pirtûka xwe ya bi navê “Elneqîd Elbinyewî Lîlhikaye”yê da dîyar dike ku zimanê vegêranê ji hindêk hevokên mezin ve pêk tînin û xudan wateyên cuda ne ku pîranîya caran ev hevok e di rengeke aloz da ne<sup>304</sup> û ev hevok e di vegêranê da tenê bi erkê gihandinê narabin, belkû ji wê çendê derbas dibin da ku mebestên aloztir û zehmettir bi cih bînin, ev jî mebestên mecazî û rewanbêjî ne û piştbestinê li ser ladanê bi şeweyekê berçav dike û şîyanên cuwankarîyê yê jêk cuda û cur bi cur bi kar tîne.<sup>305</sup> Yanî em dikarin bibêjin ku zimanê vegêranê bi şeweyeke rastewxu peyama xwe nagehîne xwendevanan, belkû bi şeweyeke veşartî peyamê pêşkêşî xwendevanî dike, ev jî bikarînan peyvê rewanbêjîyê û berçav wergirtina layenên cuwankarî û zêdebarî ladanê û pêşî û paş êxistina zimanî ev e hemû ji bo darêtin û mebesteke cuwan bi kar têt.

<sup>303</sup> Izzedîn, Îsma’îl (1978), *El-Edeb weFinunehu (Dîraset we’Neqîd)*, Darul’r-Fikru’l-Erebî, Çapa Nehê, Qahîre 104 - 105.

<sup>304</sup> Rolan, Part (1988), *E’n-Neqdu’l-Bunyewî Li’l-Hikaye*, Trc: Intîwan Ebu Zeyd, Menşûrat’ul - l’Uweydad, Çapa yekem, Beyrût, r. 95.

<sup>305</sup> Sayîr, Zeyinedîn (2011), *Fî’d-Dirubu’s-Serd (Dîrasatu’t-Tetbîqîye Fî’l-Qiss We’r-Rîwaye), E’n-Naye Li’d-Dîrasat We’n-Neşir- We’t-Tewzî’*, Çapa yekem, Dîmeq, r. 73 - 74.

## 2. PRAKTÎZEKIRINA BINYATÊ VEGÊRANÊ DI ÇÎROKÊN KENÊ PARSEK YÊN HESEN QIZILCÎ

### 2.1. Jiyana Wî

Hesen Qizilcî kurê Mela Elî kurê Mele Hesen kurê Mela Elîyê kurê Mela Mihemedê Qizilcî ye. Di 15ê Îlona 1914an da di gundeke di navbera Bokan û Mehabadê da hatiye dinyayê.<sup>306</sup> Di nav malbatek zana de mezin bû. Li ber destê mamên xwe hînî farisî û erebî bû, lê melatî nekir. Piştî avakirina PDK bû endamê partiyê û bu endame Kumele Jîyanewe "JÎ-KAF"<sup>307</sup> ku rêkxiraweke nihînî azadîxwaz û şoreşgêrên Kurdistanê roj helate. Hesen Qizilcî di gel Ebdulrehman Zebîhî di asteke berz da rêberîya vê rêkxirawê dikir. Di 1946 an da bi avakirina Komara Mehabadê ra gelek kovar û rojnameyan dest bi weşanê kirin. Qizilcî sernivîskarê kovara Helale bû ku bi taybetî ji bo keçan derdiket û di kovara Kurdistanê de jî nivîsên wî derdiketin. Piştî hilweşîna Mehabadê derbasî Kurdistanê Iraqê bû<sup>308</sup>, ji wir jî çû derveyê welat û li Bulgaryayê dimêne û dibîte bêjer di radyoya "Peykî Îran" de ku hewalan bi zimanê kurdî dide. Bi ketina rejîma Şah ra, di 1979 an de vejeriya Îranê. Buye endamê hîzba Tudeh û berpîrsê rojnameya Namêyê Mardom ku bi zimanê kurdî derdikeft. Hesen Qizilcî di sala 1938 an da jîyana hevînyê pêk diînit di gel keça apê xwe Rezîye keça Muhemed Qizilcî ye, û dibîte bab bû sê keçan yek ji wan wefat kirye û du jî li Bokan dijîn<sup>309</sup> Di sibata 1983 an de hate girtin li Bendîxanê ku di temenê 70 ê salîyê da bû. Pişra bu mawê 10 mehan li jêr fişarê û eşkencê di girtîxanê ve li roja 28 meha Îlonê di sala 1985 an de bi egerekê nedîyar di girtîxanê ve dest ji jîyanê berda û wefat kir, li jêr çavadîrya hikumetê termê wî li guristana Beheştî Zaray Taran hate veşartin.<sup>310</sup>

<sup>306</sup> Cotyar, Tewfîq (2007), *Biblografiya Rojnamegerî Kurdî le Rojhelatî Kurdistan û Derewe da (1980 – 1988)*, Çapxana Şivan, Silêman, r. 96.

<sup>307</sup> Nahîde Huseyîn, 'Ebdulrehman (2010), *Layenê Sîyasî û Kumelayetî di Çîrokên (Hesen Qizilcî) da*, Nama Masterê, Kulîja Perwerdê, Zankuya Selahedîn, Hewlêr, r. 23.

<sup>308</sup> Cotyar, Tewfîq (2007), *Biblografiya Rojnamegerî Kurdî le Rojhelatî Kurdistan û Derewe da (1980 – 1988)*, Çapxana Şivan, Silêman, r. 100.

<sup>309</sup> Nahîde Huseyîn, 'Ebdulrehman (2010), *Layenê Sîyasî û Kumelayetî di Çîrokên (Hesen Qizilcî) da*, Nama Masterê, Kulîja Perwerdê, Zankuya Selahedîn, Hewlêr, r. 19.

<sup>310</sup> [https://ckb.wikipedia.org/wiki/%D8%AD%DB%95%D8%B3%DB%95%D9%86\\_%D9%82%D8%B2%DA%B5%D8%AC%DB%8C](https://ckb.wikipedia.org/wiki/%D8%AD%DB%95%D8%B3%DB%95%D9%86_%D9%82%D8%B2%DA%B5%D8%AC%DB%8C)

Gelek xebatên wî yên siyasî, civakî û ziman î çêbûne lewma jî civaka xwe baş nas dika û di çîrokên xwe da jî di nav wê civakê da ye. Hêmin Mukriyanî di pêşeka pirtûkê da bo Qizilcî wiha dibêje; ”Yek ji neviyekî têgihîştî ye ji vê malbata mezin ku cihê şanaziya neteweya me ye. Wî rêbaza bav û kalên xwe negirtiye û rêveke din hilbijartîye ji bedêla xizmeta ayînî ku rêya bav û kalên wî bû. Wî karê edebî hilbijartîye. Lê edebiyateke çawa? Edebiyateke bilind a civakî...”<sup>311</sup> Û herwusa Qazî Muhemmed derbarê Hesên Qizilcî da wiha dibêje; “Xwezî gelek kesên wek Hesên Qizilcî di nav me da hebûyana!.. Ger em ji bo xwe bin, wê gelekên wiha ji nav me rabin.”<sup>312</sup>

## 2.2. Berhemên Wî

Hesên Qizilcî di warê nivîsandina çîrokê de xwedî şêwazek taybete. Di nava çîrokên xweda rexne li kêmasîyên civakî digire ku ya pire ji bin destîyê û jîyana feodalîyê. Bi şêwazek pêkenok rexne li wî civakî digire, Xwe le sengerî bergirî de debîne ji bu çîna zilm lêkiryan, Lewra bi çîrok nivîsek rîyalist dête hijmartin.

### 2.2.1. Berhemên Wî Yen Çapkirî

1-Aştî xwazî ladêyî û peymanî dû layî : Ev berheme namîlkeyeke dû helbestên dirêj di nava xwe da helgirtîye, yek ji wan helbesta ya Hesên Qizilcî ye ya din jî 'E bdulrehman Zebîhî nivîsîye, li sala 1959ê de li çapxaneya elnecah li Bexdayê çapkirîye, Muhemed Tewfîq Werdî pêşekî bû nivîsîye.<sup>313</sup>

2-Pêkenî Geda(Kenê Parsek): kumeka çîrokane ku ji 14 Çîrokan pêk dêt li sala 1972 de li Bexdayê hatîye çapkirin û Hêminî pêşekî bu nivîsîye, li sala 1985de Muhemed Mela Kerîm ev berheme nû çapkirîye ve û pêşekîyeka kurt bu nivîsîye<sup>314</sup>,

<sup>311</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*,. 9.

<sup>312</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 9.

<sup>313</sup> Cotyar, Tewfîk (2007), *Biblografiya Rojnamegerî Kurdî le Rojhelatî Kurdistan û derewe da (1980 – 1988)*, Çapxana Şivan, Silêman, r. 113-114.

<sup>314</sup> Cotyar, Tewfîk (2007), *Biblografiya Rojnamegerî Kurdî le Rojhelatî Kurdistan û derewe da (1980 – 1988)*, r. 113-114.

dîsan li Sala 2014 hatîye wergêran ji soranî bo kirmancî ji Layê Şikriya Salih û Firat Kelehkî ve.<sup>315</sup>

3-Hindek zanyarî (Markisî-Lînînî) hatîne wergêran, Celal Debax sala 2002 li Suleymanîyê çapkiryê û belav Kirîye.<sup>316</sup>

4-Kumeleka gutar û vekolînên babetên edebî

a-Pêşekî bu Kitêbî (Memu zînî Xanî) hejar êxistîye ser şêwazê Mukrîyanî li Bexda 1960.

b-Pêşekî bu romanî (Pêşmerge)yê Rehîmî Qazî li Bexda 1961.

c-Pêşekî bu kitêbî( Karwanêk le Şehîdanî Kurdistanî Îran) Kerîm Hisamî ji belavkîrnên binkey Pêşewa ne, Bexda 1971.

d- Kumeka rexnew û gutar û vekolînên zimanewanî û kurte çîrok û babetên wergêray ji zimanê farisî û erebî û bulgarî, ku di rojnamew kovarên başurê kurdistanê da belavbibun wek (Hîwa, Beyan, Rewşenbîrî Niwê, Kurî zanyarî Kurd, Nuserî Kurd, Paşkuyî 'îraq, Kovarî Şoreşî Kîştukalî)

e-Belavkirna kumeka gutaru babetên cîyazwazên edebî û sîyasî yên wergêray ji rojname kurdistan dinavbera salên (1961-1970) li Ewropa derçû.

f-Belavkirna jimareka zor ya gutar û rexnew û babetên edebî yên wergêray ji rojname (Namey mirdm) û (Girşey taran) piştî şoreşa gelên îranê.<sup>317</sup>

### **2.2.2. Berhemên Wi Yen Çapnekirî**

1-Tîyorî edeb pertukeka ekadîmîye ji zimanê bulgarî wergêraye 500 rûpele.

2-Zaravên sîyasî û kumelayetî wergêraye.

<sup>315</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, Werger: Şikriya Salih û Firat Kelehkî, Avesta, Çapa Duyem, Stembol.

<sup>316</sup> Nahîde Huseyîn, 'Ebdulrehman (2010), *Layenê Sîyasî û Kumelayetî di Çîrokên (Hesên Qizilcî) da*, Nama Masterê, Kulîja Perwerdê, Zankuya Selahedîn, Hewlêr, r. 33.

<sup>317</sup> Nahîde Huseyîn, Ebdulrehman (2010), *Layenê Sîyasî û Kumelayetî di Çîrokên (Kenê Parsek) da*, r. 33-34.



3-Kurte çîrokên çîrok nivêse bulgarî (Engîl Karaliçîyaf) wergêraye ji bulgarî.

4-Piranîya kurte çîrokên (Êlîn Pêlîn) ku ji zimanê bulgarî wergêraye.

5-Wergêranî pertukî ferhengî sîyasî digel( 'Ebdulrehman Zebîhî) da.<sup>318</sup>

Ji hejî gutnê ye ku bêjîn Hesên Qizilcî hindek berhemên din jî yê ne çapkirî hebuwe li sala 1979 da dema vedgerîteve bû Îranê, hemyan di mala xwe da li bulgarya dihêlît, piştî mirna Qizilcî pertukxana Qizilcî û berhemên wî dikevne destê hizba (Tudew)û heta nuke berhemên wî dibê seruşînin.<sup>319</sup>

### 2.3. Kurtenêrînek Li Ser Pirtûka Kenê Parsek

Kenê Parsek ango bi navê xwe yê orjînal Pêkenînî Geda ya Hesên Qizilcî ji çardeh kurteçîrokan ve pêk têt. Di sala 1972ê de hatîye çapkirin û belavkirin. Hêmin Mukrîyanî pêşekî bo wê pirtûkê nivîsiye. Mêjûya nivîsîna çîrokan nehatîye destnîşan kirin. Wesa dihête zanîn ku di derûdora salên pêncîyan da hatîye nivîsîn.<sup>320</sup>

Ev kesê ku derbarê mêjûya çîroka kurdî da lêkolînan bike û hin tiştan bibêje, ne mumkîne ku behsê berhemên Hesên Qizilcî neke. Çîrokên Hesên Qizilcî jî dikevne dinav deryaya realîzmê da. Hesên Qizilcî ji sifirê dest pê nekirîye, belkî berî hingê çend rêkên di derbas kirîne. Ya girîng ewe ku Hesên Qizilcî şîyaye cîhanê ta bet ji bo xwe peyda bike, biafirîne û nav û dengîya xwe mayînde bihêle.<sup>321</sup>

Di seranserê Kurdistanê da Hesên Qizilcî di nav kerwana çîroka kurdî da wek keseke bernîyas û navûdeng tete nasîn. Belê di Kurdistana Rojhilat da digel Rehîmê Qazî weke du kesên jîr û jêhatî yê çîroka kurdî tene nasîn.<sup>322</sup>

Di çîrokên (*Kenê Parsek*) da bi gelemperî ev mijar derdikevine pêşîya me; jîyana civakên feodal, rewşa serdestî û bindestîyê, têkilîya axa û xulam û beg û

<sup>318</sup> Nahîde Huseyîn, Ebdulrehman) 2010), *Layenê Sîyasî û Kumelayetî di Çîrokên Kenê Parsek*) da, r. 34.

<sup>319</sup> Nahîde Huseyîn, Ebdulrehman) 2010), *Layenê Sîyasî û Kumelayetî di Çîrokên Kenê Parsek*) da, r. 34.

<sup>320</sup> Heme Se'îd, Hesên (2005), Pêkenînî Gedayî Hesên Qizilcî, gotar, [www.kurdistanet.org](http://www.kurdistanet.org).

<sup>321</sup> Heme Se'îd, Hesên (2005), Pêkenînî Gedayî Hesên Qizilcî, gotar, [www.kurdistanet.org](http://www.kurdistanet.org).

<sup>322</sup> Heme Se'îd, Hesên (2005), Pêkenînî Gedayî Hesên Qizilcî, gotar, [www.kurdistanet.org](http://www.kurdistanet.org).

karkeran, zilm û neheqîyên kesên dewlemen li ser gundîyên feqîr û belengaz da, bêaqilîya mirovan, îronîya jîyana zehmet, dîndar û bazirganên sextekar û xapînok û dîsan berawerdîya di navbera axa û palyan, karsaz û karkeran, arîşeyên ku dîndar û şêx û melayan di hişê mirovan da çê kirîye, Jîyanên ji yekûdu dur, gundî û bajarîyan, nezanîn û paşdemayîna gundîyan, şerên li ser bax û zevîyan û mijarên bi vî rengî berê me didine rastîyên civakê ve.

Derbarê van mijaran Hesên Qizilcî derd û nexweşî û arîşeyên civakê bi rêka lehengên xwe radixîne pêşîya me. Ji bo çareserkirina wan meseleyan jî em peyama Hesên Qizilcî bi awayeke rasterast nabînin di çîrokên wî da. Mesela Hesên Qizilcî aşkera nekirîye ku rizgarbûna ji vê rewşê çî ye û çawa ye û ka civat dê di çî rêkê da biçê ku xwe ji vê rewşa xirab rizgar bike. Lê tenê di çîroka bi navê *Hêkên Hadî Xanî* da di dawîya çîrokê da em rastî li peyameke bi vî rengî tînin.

Lehengên çîrokên Hesên Qizilcî qet yekî ji wan ji bo xwendevanên kurd xerîb û bîyanî nayên. Hemî jî ji çî û tebeqeyên civaka kurdan in. Karesatên jîyana wan bi kurdîyeke xwerû û bi zîmaneke wusa nivîsîye û şîrove kirîye ku kurdeke ne nexwendevan û cahil jî jê fam dike.

Weke navê pirtûkê gelek ji w an çîrokan bi ken in, kenên bi parseyî û bi rastîya girîyên civakê. Li ber dergehên êşê xwe bi serwerîya zilmê da kirîbûne pêkenok. Hêmin Mukrîyanî di pêşeka berhemê da îronîya di çîrokan da heyî wusa dîyar kirîye “Xwendevan piştî xwendina gelek ji van çîrokan, kenê wan tî. Lê kenekî çawa? Kenekî ji jaleyê taltir...”<sup>323</sup>

Di rastîyên civakan da weke êş û girî keyfxweşî û îronîyên civakî ji cihên xwe di nava berhemê da ku ji rastîyên mirovî dûr nakeve. Bi van rastîyan Hesên Qizilcî bi şêwazeke pêkenîkî rexneyê li civakê dike. Hesên Qizilcî şarezarîyeke baş hebû li ser hemû alîyên jîyana gundên Kurdistanê. Li paşerojê kesê ku bixwaze derbareyê qonaxa feodalî li Kurdistanê binivîse dikare çîrokên Hesên Qizilcî ji xwe ra bike çavkanîyên girîng û bi mifa. Heme Seîd di gotara xweda ewa binavê “*Pêkenîyên Gedayî Hesên Qizilcî*” gotina Georgiy Valentinoviç Plehanov

---

<sup>323</sup>Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, Werger: Şikriya Salih û Firat Kelehkî, Avesta, Çapa Duyem, Stembol, r. 12.

dîyar diket û dibêje: "Ewê mebesta wî ev be ku saykolojîya kirêkarên rûs têbigihije divêt bermenên Maksîm Gorkî bixwîne." Eve jî wusa ye. Kesê ku bixwaze derbarê derûn û bîr û boçûnên axa û cotkar û bazirganan bizane pêdivîye çîrokên Hesên Qizilcî bixwîne.<sup>324</sup>

Ji aliyê ziman û şewaza çîrokên Hesên Qizilcî da tiştê ku di wan çîrokan da bala mirovan bikşîne bikarîna peyvên kulturî û bêwêj û gotinane. Teswîrên balkêş car bi êş û car bi ken xwe li dil û rûyê mirovan ve diselitîne. Zimanê wî kurdîyek ciwan û rewane. Gotinên wî bi pêkenîkî û aşkerayî ne û li beramberî şaşîyan rexneyên xwe kêmtir nake. Zimanê xwe tûj û hişk dike. Herwusa Hesên Qizilcî şarezarîyek baş heye di bikarîna efsane û pendên pêşîyan da ku karîye bi awayeke serkeftî wan bi kar bîne. Çend biwêjên di nav çîrokan da derbas dibin:

-Gava ku agirê birçîtîyê gur bû û alav da, ter û hişk wek hev dişewitin.<sup>325</sup>

-Mişkê ser xezîneyê bi nav û deng e.<sup>326</sup>

-Ew jî weke Gayê Hakim ji terî dixwar û li hişkî radiza.<sup>327</sup>

-Ez li ezmanan lê digeriyam, li ser zeviyê kete destê min.<sup>328</sup>

-Ji ber çakûçê şeytan pekiyaye.<sup>329</sup>

-Şende ji mende ne kêmtir e.<sup>330</sup>

Di nav van gotin û teswîrên çîrokan da ne mumkûn e ku mirov Hesên Qizilcî di nav civatê da nebîne. Ev ne nivîskarekî ku li ser mêzeyan û li ber penceran difikire, temaşa dike û dinivîse. Belkû ev di nav mirovan da ye, derdê wan dikêşe û li sûk û bazaran digere, bi zimanê civakê diaxive û li ser adet û dabûnerîtên bab û kalên xwe difikire. Car diparêze û car jî rexneyan lê dike. Di hemû çîrokên Kenê Parsek

<sup>324</sup> Heme Se'îd, Hesên (2005), Pêkenîni Gedayî Hesên Qizilcî, gotar, [www.kurdistnet.org](http://www.kurdistnet.org).

<sup>325</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, Werger: Şikriya Salih û Firat Kelehkî, Avesta, Çapa Duyem, Stembol, r. 19.

<sup>326</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 24.

<sup>327</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 42.

<sup>328</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 42.

<sup>329</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 43.

<sup>330</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 104.

da du cemserên sereke dîyar dibin. Ev jî cemserê xêr û cemserê şerî ye. Herwusa di dema darijtin û vegêrana bûyerên serekî hest bi bîr û boçûn û kesayetîya çîroknûsî dikin ku herdem di barê xêrê da ye û li sengerê bergirîyê da ye ji bo çîna hejar û zilm lê kirîyan.

## **2.4. Binyatê Vegêranê Di Çîrokên Kenê Parsek De**

Me hewil daye di vê beşê da binyata vegêranê di van çarde çîrokan da yek bi yek dîyar bikeyîn bi xişte û bi ravekirin li ser hemu çîrokan, li dîf huner û regezên vegêranê, ka bi çi rade têda derbaz dibe.

### **2.4.1. Kenê Parsek**

#### **Kurte**

Çîrok bi Hemereş dest pê dike. Hemereş di gundê Tepereşê ku girêdayî Şarezorê ye di nav zevîyekê da ye li derve raza ye û ji serma diqerise û dixwaze tav zû derkeve da ku xwe bi tîna tavê germ bike. Tav derdikeve lê Hemereş hê jî bêkêf e. Sedema bêkêfîya wî jî eve: ew û jina xwe bi nexweşîya sêberoyê ketine. Nikarin ç i karî jî bikin ji ber vê nexweşîyê. Hecî Reşid ji Silêmanîyê hatîye û herdu gayên cotê di govê da di şûna deynê xwe birîye. Zaroka wan jî bi nexweşîya hewaleyê ketîye û mirîye. Jina wî jî ji êşa mirina zaroka xwe û ji birçîtîyê ew jî dimire û Hemereş tenê dimîne. Hemereş ji wir radibe diçe malê, lihêfa xwe li ser milê xwe dadike û dikeve rêkeke ku ew jî nizane. Piştî du rojan li Helepçeyê xûya dibe. Li wir di çend karan da dixebite lê ji ber lawazbûna xwe û ji bêqewetîya xwe herdem xwedîyê kar wî ji kar derdixin. Miemeleye parsektîyê lê dikin, herdem heqê nanekî didinê lê ew qebûl nake dev ji kar berdide û diçe. Di serî da her çi qas pere ji destê wan negire jî paşê ji birçîtîyê peran digire êdî dibe parsek. Bi roj li sûkê parsektîyê dike bi şev jî diçe cem Hêtûnger li hêtûna hemamê dimîne. Rojekê ji xew hişyar dibe ku tofan rabûye çi kes nikare derkeve derve. Hemereş ji birçîna derdikeve diçe li derîyê maleke dewlemend dide. Derîyê malê xûlama malê Se'e vedi ke. Hemereş jê nan dixwaze, Se'e jê re dibêje xanima malê ne li mal e çûye hemamê. Hemereş jî bi vê gotina Se'e, têra xwe dikene û çîrok bi vî awayî diqede. Navê çîrokê ji vir tê.

## Xiştê 1. Xiştê Binyatê Vegêranê di Çîroka Kenê Parsek

	Vegêran	Vegêr	Zeman	Mekân	Ziq/Ziqbûn	Deng	Saloxdan	Kesayefî
<b>Kenê Parsek</b>	Babetî Heterodiegetîk	Hemî tişt zan Şexsê sêyê	Zivistan Flaşbac Lezandin	Tepereş Halepçe Hêtûna hemamê	Ziqbuna sabit	Yekdengî	Leş u ciwanî û cilê Hemereş	Hemereş Hêtûnger Seê Zilamê Dewlemend Xwediyê Kar

### Vegêr

Vegêrê vê çîrokê vegêrekî pêbawere ku li gor normên metnê tevdigere. Di tevahîya çîrokê da jîyana parsekan çawa be ya karakterê wê/î jî her wisa ye. Her kes kêm zêde dizane ku jîyana parsekan çawa didome û rewşa wan çawa ye. Parsek, ê ji xelkê tika dike ku pare yan tiştêk din bidinê<sup>331</sup>. Parsek, cilên wan gemarî ne, her derên wan di nav toz û qirêjê da ne û herdem qetîyayî ne, laşê wan ji ber ku xwe naşon hemû lewitî ye. Cihekî ku lê razên çûnîn e, her roj li derên cuda cuda radizên û çî karî nakin şev û roj li derûdorê parsektîyê dikan. Lehengê vê çîrokê Hemereş jî eynî wisa ye. Her çî qas di serî da vegêr wî wek yekî şanaz nîşan bide jî paşê ji ber lazimîyên fîzyolojîk, siruştî dibe parsek. *“Hemereş di temenê xwe de mêrê jîyanê bû û bi hêza milên xwe jiyabû... Lê belê gava agirê birçîtiyê gur bû û alav da, ter û hişk weke hev dişewitîne. Dema fêr kir ku kes wî ji bo kar nagire bexşîş qebûl kir û çû du sê nan kirîn.”*<sup>332</sup>

Ji aliyê rewşa vegêranê ve bi dîtina min di tevahîya çîrokê da rewşa vegêrana vegêrana babetî ku bi devê şexsê sêyem hatîye qisetkirin serdest e. *“Ev gişt nîşana wê bûn ku dikete dilê wî lê bîr û hişê wî li cihekî din bû. Ew ne amade bû ku guhê xwe bide qada zêrîn a rojê ku ji kîjan alî ve û ji tenîştê kîjan çiyayî hilatiye. Bi bêhtengî û perîşanî dikeve nava gundê Tepereş. Ewê ku heya niha daxwaz û armaca wî tîna rojê bû sira ku şevê ji laşê wî derxe û hinekî wî germ bike.”*<sup>333</sup> Lê her çî qas rewşa vegêrana babetî hebe jî vegêr di hin deran da ji jîyan û fikrên lehengê xwe ne hayedar e. *“Kesî nedizanî berê xwe dide kû û dixwaze heta kû biçê... Piştî çend rojan*

<sup>331</sup> <https://ku.wiktionary.org/wiki/parsek> (WQ Ferheng, 22.08.2019, saet: 15: 16)

<sup>332</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 19.

<sup>333</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 17.

*Hemereş li Helepçeyê xuya kir.*<sup>334</sup> Lewra li vir em dikarin bibêjin ku vegêr hin tiştan dixwaze vêşêre. Li vir eşkere ye ku çîrok ji du gotaran ve pêk têt: gotara vegêr û gotara karakteran. Gotara karakteran ji monolog û dîyalogên wan ve pêk têt. Ji bo mînaka monologê em dikarin vê hevokê wek mînak bidin. Ger ev tişt monolog bibin jî ji aliyê cûreya monologê ve monologa rastewxu ye. *“Hemereş got: Ez îro nagihijim sûkê, ez nikarim her mal bi mal bigerim. Ya baş ew e ku ez herim mala dewlemendekî û daxwaza du nanan jê bikim, heta sibê Xwedê mezin e.”*<sup>335</sup> Di vê hevokê da monologa rasterast ango monologa rastewxu derbas dibe ku lehengê me bi cînava “ez”ê û xwe bi xwe diaxive. Ji bo mînaka dîyalogê jî em dikarin vê hevokê wek mînak bidin. *“- Lawo, ev çi agir e ku tu bê rawestan geş dikî ? Agirkeşker got: - Birayê min, ev hêtûna hemamê ye. Karê min ev e ku ez vê hêtûnê amade bikim.”*<sup>336</sup> Herwisa gava Hemereş diçe li ber derîyê mala dewlemend di navbera wî û xulamê malê û xwedanê malê da jî dîyalogek derbas dibe.

Vegêr ji ber ku gotin û ramanên karakterên xwe rasterast qiset dike gotara çîrokê gotareke rasterast e. Dîsa vegêr ji ber ku bi derûnîya karakteran dizane gotara nerasterast jî heye. Vegêrekî nedramatîzekirî ye di çîrokê da cih nagire lê hêbûna wî têt hîskirin.

### **Zeman û mekân**

Bûyer gelemperî bi awayekî kronolojîk hatine saz kirin. Tenê di du deran da vegêrê me serî li flashbak/paşveçûn û flashforward/pêşveçûnê daye. Vegêr bi rêya flaşbakê çûye demên Hemereş ên berê. Em wî wextî fêr dibin ku berê jineke Hemereş û zarokeke wan heye. Piştî mirina wan Hemereş dikeve vî halê xwe yî niha ku bûye parsek. Vegêr bi rêya flaşforwrdê jî qala xeyalên Hemereş ên pêşerojê dike. Mesela hemereş dixwaze karekê peyda bike ku pê derkeve biharê û paşê jî biçê gundekê çi şivantî be, çi gavantî be, çi paletî be karekê peyda bike û debara xwe pê bike.

<sup>334</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 19.

<sup>335</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 21.

<sup>336</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 20.

Ji alîyê maweyê ve maweya çîrokê em tam nikarin tespît bikin. Ji ber ku vegêr di hin deran da lezandîye (borandin ango jêbirin) û di hin deran da cangiran (rawestan) bûye. Dema çîrok destpê dîke dem sibeha rojê meha duyem a payîzê ye û tav derdikeve lê serma ye. Vegêr nêzîkî mehekê dilezîne û tê meheke zivistanê û berf dibare. Paşê jî vegêr çîrokê bi cangiranî ku bûyer û wext di rewşeke hêdî û bi giranî derbas dibin, tehlîl dîke.

Mekânên sereke gundê Tepereşê yê ku girêdayî Şarezorê ye û Halepçe ye. Mekân li gor rewşa Hemereşî ku tê daye xizmetî çîrokê dîkin. Mekânên ku Hemereş lê ne hemû mîna mekânên parsekan e. Mala Hemereş li gundê Tepereşê ye. Li wir jî bilî lihêfa ser milê wî tu tiştê wî çûnîn e. Dema diçe Halepçeyê jî mala wî çûnîn e lewra rojên pêşî yên Halepçeyê ne dîyar in û em nizanin li kû maye. Lê piştî hingê li hêtûna hemamê li cem Hêtûnger dimîne. Ew der jî hemû di nav dûkel û qirêjê da ye. Loma Hemereş jî ber wê dûkel û qirêja hemamê her derê wî dibe toz, dû kel û qirêj.

### **Zîq/Zîqbûn**

Zîqerê çîrokê jî serî heta dawî Hemereş e. Em dîyarde û rûdanên vegêranê bi bergeha Hemereş dibînin. Lewra di tevahîya çîrokê da zîqbûneke sabit heye.

### **Deng**

Hemû karakterên çîrokê û vegêr wek hevdu diaxivin û devoka yekî jî wan jî çûnîn e. Lewma di tevahîya çîrokê da yekdengî serdest e. Vegêr jî ber ku ne karakterekî çîrokê ye û çîrokê rewşa babetî şexsê sêyem qiset dîke. Lewma di çîrokê da heterodîegetîk/vegêrana derî metnê heye.

### **Saluxdan**

Vegêr di çîroka Kenê Parsek da zêdetir li ser salûxdana laş û ciwanî û cilên Hemereş rawestîyayî ye. Ji vî aliyê ve bi hûrgulî wêneyê Hemereş kêşandîye. Ka Hemereş di çi halî da ye? Rewşa wî çawa ye? Wisa nîşanî me dide: *"Vêca piyên xwe di ber xwe re dirêj kirin û destên xwe danîn erdê xwest bi hêza ku di destê wî de maye alîkariya lingên xwe bike. Hemereş hestiyên wî kirin qirçe qirçe heta ku rast bûn. Bi giranî meşîya û çû mal. Ji tiştên nav malê tenê lihêfek mabû. Bi du benikan*

*du aliyê lihêfê girêdabû û di rojên ku baran dibarî de diavête ser milê xwe, benikên wê bi dest girt û bi rê ket."* <sup>337</sup> Lê mixabin heman tiştî ji bo salûxdana xwezayê em nikarin bibêjin. Di vê derê da vêger pênûsa xwe bi paş ve kişandîye. Mesela behsa salûxdana der û dora Hemereş hema bibêje qet nekiriye. Tenê di cihê ku berf dibare da wêneyeke xweş di serê me de çê dike evqas. "... *Ba ew qas bi hêz divîziya ku berf weke boyaxa spî lê diçû. Fêde nedikir. Te digot ser û pê di nava qîrê de ne. Reşavek lê diçû û xêzeke reş li ser berfa spî dikişand. Lê wê demê kî hebû ku karibe wê xetê bixwîne û bi serpêhatiya wî b izane."* <sup>338</sup>

### **Kesayetî**

**Hemereş:** Lehengê sereke yê çîrokê ye. Çîrok li derûdora jîyana Hemereş derbas dibe. Hemereş yekî bêhêvî, lawaz, betilîyê jîyanê û têkçûyî ye. Li vê derê rehendê fîzîkî derbas dibe ku ji aliyê rûxsarî ve leheng tê pênasekirin. Di destpêka çîrokê da Hemereş her çi qas wek karakterekî dûz bibe jî paşê me şaş dike û dibe karakterekî gilover. Pêşî parsektîyê qebûl nake lê paşê qebûl dike û dibe parsek. Li gor îdeolojîya xwe. Li vê derê jî rehendê civakî derdikeve pêşîya me ku cih û karê wî yê di nav civatê da parsektî ye.

**Xwedîyê kar, Hêtûnger/Agirgeşker, Zilamê Dewlemend, Se'e:** Ev her çar karakter ji aliyê vegêr ve li gor rewşa Hemereş wek karakterên lawekî ango karekterên alîkar derdikevin pêşîya me.

### **2.4.2. Edetên Bazarê**

#### **Kurte**

Bûyerên çîrokê li Xana Evdilqadir Efendî derbas dibin. Evdilqadir Efendî xudanê xanê ye. Lehengê me ku navê wî di serê çîrokê da qet nehatîye gotin lê katibtîyê dike û navê wî Mîrza ye û ev û barkêş Zakir li cem hev dixebitin. Evdilqadir Efendî zilamekî gelek destgirtî û qels e. Hisabê yek filsî/kuruşî dike. Tiştan erzan dikire, bihayekî zêde difiroşe. Ji ber vê yekê ew û katib zêde pêk nakin. Lewra katibê wî ji

<sup>337</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 18-19.

<sup>338</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 21.



katibên din yên bazarê çend dinaran kêmtir li cem wî dixebite û hem wî ji kar dernaxe û hem jî dema ku şer dikin carinan jî be dilê wî xweş dike. Rojekê dîsa ji bo xanê hindek pêdivîyan dikirin. Mam Sadûn û hindek ticarên di ji Dihokê sîkotîn û hindek tiştên di tînin bo firofînê. Zakir wan dikêşe hundir, katib jî bihayên wan hesab dike. Evdîlqadir Efendî dixwaze bi xapan û hîleyan danûstandinê xilas bike lê katib û Mam Sadûn (xudanê lazimîyan) nahêlin ku bazar bi xap û hîleyan xilas bibe. Piştî ku bazar xilas dibe Mam Sadûn diçe, Evdîlqadir Efendî jî katibî ji kar derdixe ji ber ku katibî di dema bazarê da ew aciz kir û bû sedem ku pereyên wî zêde bi avê ve herin. Yanî ji ber ku Mîrzayê katib ne wek Evdîlqadir Efendî bû di bazarê da û ewî jî katib ji kar derxist. Çîrok bi vî awayî diqede.

## Xiştê 2. Xiştê Binyatê Vegêranê di Çîroka Edetên Bazara

	Vegêran	Vegêr	Zeman	Mekân	Zîq/Zîqbûn	Deng	Saloxdan	Kesayetî
Edetên Bazarê	Navxweyî Homodiegetîk	Kêm tişt zan, şexsê yekem	Dema nihaye Roja yekem Pazdey mehê	Xana Evdîlqadir Efendî	Zîqbuna sabit	Yekdengî	Rewşa bexdayê, cade, sikak	Katib, Evdîlqadir Eefendî, Zakir, Mam sedûn

### Vegêr

Vegêrê çîroka me lehengê çîrokê Mîrzayê katib e. "*Rojekê bi Zakir re çend saetekê me kîs ji hev diveqetandin, qirka me ji tozê tijî bibû, em ji têhna dihejiyan. Min got: 'Zakîr, here du pepsiyan ji me re bîne da ku em ji têhna nexeniqin.'* Zakîr ecebmayî ma, di rengê wî de wiha dihat xuyakirin ku di dîroka vê xanê de cara yekem e ku tiştêk wiha dibihîze."<sup>339</sup> Em ji bo vegêr dikarin bibêjin ku vegêrê me vegêrekî pênebawere ku li gor normên metnê tevnagere. Peyama metnê ya sereke ger tu ne wek me bibî û dîsa wek me bêdelet nebî hergav tu yê bê bînpêkirin. Katib jî herdem beravajî Evdîlqadir Efendî hesab dike û bihayan tomar dike. Hem jî vegêrekî dramatîzekirî ye ku di nav çîrokê da cih digire. Di hin deran da monologa nivîskarê zimmî heye (şîroveyan li ser Evdîlqadir Efendî dike). Ji aliyê rewşa vegêranê ve di çîrokê da rewşa vegêrana şexsê yekem serdest e. Bûyer ji aliyê karakterê çîrokê, yanî Mîrzayê katib ve tete neqilkin. Gotara çîrokê tenê ji gotara karakteran ve pêk têt.

<sup>339</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 26.

Vegêr gotinên karakteran rasterast vedibêje lewra gotara rasterast ango gotara rastewxu heye.

Ji aliyê monologê em dişên bibêjin ku monolog tê da çûnîn in. Di hin deran da gotinên vegêr her çiqas wek monologa rastewxu xuya bike jî ji ber ku leheng ê çîrokê Katib di heman demê da vegeerê çîrokê ye, ew gotinên ku vedibêje yan monolog in an nemonolog in em baş ténagehin. *"Heya wê rojê min bi hûrbînî li rûyê Efendî temaşe nekiribû, bi rastî mişkê ser xezîneyê hat bîra min. Serekî gilover, du çavên piçûk û zîq, bêvileke zirav, devekî dirêj, çermekî weke meşkên kevin... Li ser genepe dîk bûye û zû bi zû li min temaşe dikir, li genepe temaşe dikir û li dergehê jêr xanê. Car caran bi acizî li şûşeyên pepsîyan temaşe dikir, wiha tê gihîşherdem ku ew şûşe mîna jehrê wî diêşînin, min rahişt wan û ez çûm cem Zakîr.... "*<sup>340</sup>

### **Zeman û Mekân**

Dîroka çîrokê tam nedîyar e. Em nizanin ku bûyerên çîrokê di kîjan meh û salê diqewimin. Di çîrokê da dîrok wek roja yekem a heyvê, roja sêyem, dawîya heyvê, panzdehê heyvê bi vî awayî hatîye nîşankirin. Her çî qas dîrok tam ne dîyar be jî bûyer bi awayekî kronolojîk, zincîreyî didome. Dem, dema niha ye. Ji aliyê mekânê ve zêde tişteke çûnîn e em bibêjin. Lewra ji bo mekânê tenê em dikarin bibêjin xana Evdilqadir Efendî ye.

### **Zîq/Zîqbûn**

Bûyerên çîrokê em bi bergeha Katib dibînin. Lewma zîqerekî çîrokê heye û zîqbûn; zîqbûneke sabit e.

### **Deng**

Ji aliyê rêzimanê ve di çîrokê da yekdengî serdest e lewma lawaz e. Karakter çend heb hene lê ew jî tev wek hevdu diaxivin. Ji ber ku vegêrê çîrokê di heman demê da karakterê çîrokê ye û vegêrana nav metnê/homodiegetîk heye.

---

<sup>340</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 27.

## Salûxdan

Di çîroka Edetên Bazarê da vegêr ji salûxdanên lehengan zêdetir li ser salûxdana cihan û rewşa wan ku bi hurûgulî li ser sikak, cade rawestîya ye. weke *"Bexdad mîna qetên pîvazê ye. Ew li ber çavê qaşûla pîvazê ye şarazabûna wê asane. Cadeya li vî aliyê û wî aliyê firoşgeh in. Li ser firoşgehan cihê bijîşk, didansaz, parêzer û tiştên ji van babetan hene. Li ser dergêhên xwe tablo danîne weke xefka ji bo muşteriyên. Her yek ji wan gilokek nehênîyên xwe hene. Ev sîmaya Bexdadê yan jî qaşûlên ser ser pîvazê ne. Heger bikaribî di nav van qaşûlan re tu xwe bigihîni naveroka wê, tu tiştên gelek ecêb dibîni. Ne dûr e riya te bigihîje Xezîneya Elî Baba."*

341

## Kesayetî

**Katib:** Lehengê sereke ye û navê wî Mîrza ye. Bûyer li derûdora wî didomin. Katib yekî dilrehm, bi wijdan, bi edelet û dirist e. Karakterekî dûz e. Ji serî heta dawîya çîrokê li gor ideolojîya xwe tevdigere.

## Evdilqadir Efendî:

Ew jî lehengê sereke ye. Zilamekî destgirtî, bêwijdan, bêedelet, ji xapan/ hile û pereyan zehf hez dike. Pere zaafa wî ya herî mezin e. Karakterekî dûz e. Me qet şaş nake. Ê li wir rehendên laşî heye ku gava Mîrzayê katib Evdilqadir Efendî ji nêz ve dibîne û ser û sîmaya wî ji me ra radigihîne; "Serekî girover, du çavên piçûk û zîq, bêvileke zirav, devekî dirêj, çermekî weke meşkên kevin..."<sup>342</sup>

## Zakir

Karakterekî lawekî ango bi gotineke dî alîkare. Feqîre. Ji ber zilma Evdilqadir Efendî qet deng dernaxe ji tirsê bêkarmayîne.

## Mam Sadûn

<sup>341</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 24.

<sup>342</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 26-27.

Karakterekî alîkar e û ticar e ji Dihokê sikotîfînê tîne û difiroşe.

### 3.4.3. Bîne Lê Bi Nav Neke

#### Kurte

Mecîd Axa berê zilamekî dewlemend bû. Paşê hêdî hêdî feqîr dibe. Sedema feqîrîya wî em nizanin. Ji ber vê rewşê ew û jina xwe Zara Xanim her dem şer dikin. Hindî feqîr bûne her tiştê mala xwe firotine. Û di gundê wan da jî her roj maleke rênçberan bar dike û diçe, ji ber ku êdî Mecîd Axa nikare wan bi pereyan bide xebitandin. Û her diçe hejmara malên gund kêm dibin. Xanima Me cîd Axa, Zara Xanim ji mêtê xwe ra dibêje ku here mala Seyîdê Zenbîl da ku çareyekê ji halê wan ra peyda bike. Mecîd Beg û xulamê wî Ferecê Feraş dikevîne rêkê û diçine mala Seyîdê Zenbîl. Lê vê carê hatina Mecîd Axa bi qedr û qîmet nayê pêşwazî kirin ji ber ku ew bê xelat û dîyarî hatîye. Şevê tenê lihêfekê ji Mecîd Axa ra tînin da ku razê lê şev sar e û Mecîd Axa nikare razê. Lihêfê li dora xwe dipêçe û hewl dide ku razê. Di xew da rojên xwe yên bere dibîne. Lê ji ber sermayê serê xulekekê carekê ji xew hişyar dibe û ji xulamê xwe Ferecî tiştêkê dixwaze da ku pê dake. Ferec dibêje ji bilî cilikên hêstirê tu tişt nîne ku bi Mecîd Axa dake. Axa xeber û dijûnan lê dide û dîsa radizê. Ev rewş sê çar caran dewam dike. Cara paşî axa dîsa dipirse û vê carê Ferec dibêje Axa di vê şevê da ka kî dibîne ma çîye? Ezê cilên hêstirê bi te dakim. Axa jî dibêje baş e bîne lê bi nav neke. Çîrok bi vi awayî diqede.

#### Xiştê 3. Xiştê Binyatê Vegêranê di Çîroka Bîne Lê Bi Nav Neke

	Vegêran	Vegêr	Zeman	Mekân	Ziq/Ziqbûn	Deng	Saloxdan	Kesayefî
Bîne Lê bi Nav Neke	Fîgûral	Heman tişt zane, şexsê sêyem, şexsê yekem	Zivistane Flaşback	Koşka Mecîd Axa, Dîwanxane, Hêwan	Ziqbuna sabit	Yekdengî	Xweza, cih, tevgerên lehengan	Mecîd Axa, Zara xanim Ferec Metka Pîroz, Seydê Zenbî

#### Vegêr

Vegêrê çîrokê vegêrekî nedramatîzekiri ye. Her çi qas di nav çîrokê da cih nagire jî hebûna wî tê hîskirin. Em bûyeran bi vegêrana fîgûral dibînin. Her çi qas

bûyeran em ji devê vegêrana babetî şexsê sêyem dibihîsin jî di hin deran da exlebî di nav axaftinên Mecîd Axa û Zara Xanimê da vegêrana şexsê yekem ku bi çavê karakterekî li cem wan bûyeran e li ber me radixîne. *“Mecîd Beg çû mal, sifre bi sê piya leyan û yekê vala li wê bû. Dîsa xeyalên dîwanxaneyê hatinê. Got: 'Erê Xanim! Tu ji min re nabêjî ev sifre çima wilo ye?' Zara Xanim got: ' Çi bi sifreyê hatiye? Çawa ye?*

- *Keçê! Ev tu çi dibêjî? Temaşe bike hingî mezine, gêrê li ser bike. Li dîwanxaneyê min temaşe kir, nan jî bi zorê li enîşkekê xuya dikir. Dîwanxane jî tu dibêjî devehxane ye. Hingî mezin û bilind e sê darên mezin tê de ne.*

- *Vêca ma tu çima nabêjî, ew jî ji ber hev çûne.*

- *Belê belê, jixwe hemû tişt ji ber hev çûne, pêlavên min jî bi zorê di piyên min de disekin. Li xeftanê min meyzîne, tu dibêjî qey eba ye. Cihê duye min tê de heye.*

- *Kuro! Axaftinên baş bike. Wê hetka me here.*

- *Çawa bawer nakî, tu jî her wiha yî... ”* <sup>343</sup>

Di vê astê da vegêrî dev ji desthilatdarî û mudaxeleyan berdaye. Lewra vegêr, vegêrekî sergirtî ango vegêrekî hemî tişt zan û bêteref e. Gotara çîrokê ji du gotaran ve pêk têt. Gotara vegêr û gotara karakteran. Ê vegêr ji derûnîya karakteran hayedar e lewra gotara nerasterast heye. Di heman demê da gotara rasterast jî heye ji ber ku vegêr axaftinên lehengan rasterast vedibêje.

Em ji bo monolog û cûreyên wê nikarin tişteki zelal bibêjin. Çi ku vegêr fikr û ramanên lehêngên xwe wek axaftineke bi deng nîşanî me dide. Berî ku biaxivin hergav dibêje *“got, di ber xwe de dijimart...”* lewra di vê çîrokê da ji bo monologê ciheke aşkera û dîyar çûnî e. Vegêrê me mafên wê daye hêmanên din.

## **Zeman û Mekân**

---

<sup>343</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 31.

Dîrok tam ne dîyar e. Vegêr kê m be jî bi rêya flashbackan çûye demên berê. Bûyer ji serî heta dawîya çîrokê qala rojê Mecîd Axa dike û em dizanin meheke zivistanê ye. Mekân, mekânêkî xeyalî ye. Derheqê mekânê da vegêr çî neqil kiribe em wê dizanin.

Mekân koşka Mecîd Axa ye lê vegêr tenê qala dîwanxanê, hêwanê û koxê kirîye. Dîsa vegêr li ser van mekânan jî zêda nesekinîye, lezandîye. Lewra em nizanin ka li koşkê çend menzel hene. Dîsa em ji bilî doşek, balgî û ocaxê nizanin ka li diwanxanê çî cure tiştên malê hene.

### **Zîq/Zîqbûn**

Zîqbûneke sabit û zîqerekê çîrokê heye. Bûyeran em bi çavê şexsê sêyem dibînin.

### **Deng**

Di tevahîya çîrokê da yekdengî heye. Çîrokeke bi gelemperî vegêrana derveyî metnê heterodiegetîk hakime. Kêlîyeke biçûk jî be vegêrî cih daye vegêrana nava metnê, homodiegetîkê.

### **Salûxdan**

Di çîroka Binê lê bi nav neke da vegêr ji her aliyê ve li ser salûxdanê sekinîye; xweza, cih, tevgerên lehengan û her wekî din. Dema ku wesfa çîrokê li dar dixe zimanekî edebî bi kar tîne hem di vê çîrokê da hem jî di çîrokên dîtir da. " *Li hinek cihan sefîkên banan ketibûn xwar, li hinek cihan jî tewiyabûn. Te digot belkî Axayê Pîr li ber hestiyên paşxwer û bole bola bi salan bi rênçberan re diran di devan de yek yek mabûn; ewên ku mabûn jî xwar û xêç bûbûn. Ji zû de şirik herikîbûn û çayê pê çêkiribûn. Ava ser banan qeş xistibû dîwaran û devê xwe ji Gundê Serkêl re vekiribû. Te digot belkî bi qest wiha dibe ku ew çend malên rênçberan ku li gund mane, bi ga û ker û deştê ve newq bibin. Keviran serê xwe ji*

*nav sewaxe derxistibû û diranên xwe di bin ve biribûn. Xuya bû nêta wan ew e ku xwe ji navbera dîwaran rizgar bikin."*<sup>344</sup>

### **Kesayetî**

**Mecîd Axa:** Yekî pîr e û axayê gundekî ye. Dixwaze weke demên xwe yê berê, dewlemend bibe lê ji bo vê jî tu karî nake. Ji rewşa xwe ya niha ne memnûn e. Karakterekî dûz e. Me qet şaş nake.

**Zara Xanim:** Jina Mecid Axa ye. Ji rewşa xwe ne memnûn e. Herdem bi axa re şer dike.

**Ferec:** Xulamê ber destê Mecîd Axa ye.

**Metika Pîroz:** Jineke gundî ye.

**Seyîd Zenbîl:** Kesayeteke pîroz e ku xelkên derûdorê ji bo mirazên xwe diçine dergehê wî.

#### **2.4.4. Tac û Textê Emer Axa**

##### **Kurte**

Bûyer çend sal berî şerê Cihanê yê Duyem li Kurdistana Îranê diqewime. Dewlet ji bo pêdivîya suxreyan pêdivîyan tevan ji gel dide hevdû. Çi bi zorê çi bi dilxwazî lê herdem ji wan distîne. Teşqeleyek derdikeve û di nav çend kesan da pîrsgirêk derdikevin. Ji bo ku ev pîrsgirêk bêne çareserkirin li yekî digerin da ku rêken mala Emer Axa û meseleya nav xwe çareser bikin. Bi hev dişêwirin û biryar didin ku Ka Hisên bişînin cem wî. Ka Hisên û hevlekî xwe dikevîne rêya Qelereşê. Di rê da her nîv saatî carekê siwêsînin wan didine sekinandin û hin pîrsan ji wan dipîrsin û wan berdidin. Ev rewş bi vî awayî heta mala Emer Axa berdewam dike. Wextê ku di gihêne mala Emer Axa xulamê axa Pîrot wan dibe dixwe menzela ku Emer Axa lê ye. Çi bibînin! Li ser serê Emer Axa da sebetek bi eqdê ve girêdayî ye û Emer Axa li ser kursîyeke beredayî ye pêyeke xwe havêfîye ser yê din û wusa rûniştî

---

<sup>344</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 29.

ye. Emer Axa ji wan re dibêje; tac û textê axayê we hebe yê min jî ev in: ev sebet tacê min e û ev kursî jî textê min e. Min bi vî rengî pêşwazîya we kir da ku hûn baş têbigihjin ku gava Siwêsînîyek têtê li cem we hûn wê miameleyê jê ra dikin. Paşê wan dibin menzeleke din û li wir xwarina xwe dixwin û berê xwe didine Mehabadê. Ka Hisên û efserê digel wî paşê radibin û diçin sedema şer ji axayê xwe re dibêjin û çîrok xelas dibe.

#### Xiştê 4. Xiştê Binyatê Vegêranê di Çîroka Tac û Textî Emer Axa

	Vegêran	Vegêr	Zeman	Mekân	Zîq/Zîqbûn	Deng	Saloxdan	Kesayetî
Tac û Textê Emer Axa	Figûral	Heman tişt zane, şexsê sêyem, şexsê yekem	Berî şerê cihanîyê duyeme heta 1941 Lezandin	Mehabad, Qelereş, Mala Emer Axa	Zîqbuna hevpare	Yekdengî	Rewşa mala Emer Axa	Emer Axa, Heyder Elî xan, Ka Hisên

#### Vegêr

Du vegêrê me hene yek rewşa vegêrana babetî şexsê sêyem ango vegêrana babetî, yê din jî Ka Hisêne. Lewra ji vî aliyê ve rewşa vegêrana figûral di nav da heye. Vegêrê şexsê sêyem bûyerên ku li Mehabadê qewimîne bi awayeke çîroksazî neqil dike.. " *Xelkê gelekî dixwest leşkerên dewletê nemîne. Van dilê xwe bi zêdekirina kuştina leşkeran dianîn der û bi vî rengî dilê xwe xweş dikirin. Lê her rastiyekek di axaftinên wan de hebû. Ji ber ku leşkerên dewletê yên li Serdeştê, nikaribûn qet tiştêkî bikin.*" <sup>345</sup> Ka Hisên jî bûyerên ku dibîne vedibêje. " *Fermandarê Serdeştê li pêş me zilam rê kiribû cem Emer Axa, wê ji bo dan û standinê du kes ji aliyê dewletê ve werin. Emer Axa qebûl kiribû. Li ser wê peyamê em ketin rê. Dema em ji Serdeştê derketin û ketin nav zinar, du zilamên Siwêsînî rût, ji nav deviyekê derketin....*" <sup>346</sup> Ka Hisên jî bûyerên ku dibîne vedigêre. Lewra vegêr hem vegêrekî dramâtîzekirî ye ji ber ku di çîrokê da bi qasî karakterekî zindî ye. Hem jî vegêrekî nedramâtîzekirî ye di nav çîrokê da cih nagire lê hebûna wî tê hîskirin. Du gotar hene. Gotara vegêr û gotara karakteran e. Vegêr ji derûnîya karakterên xwe hayedar

<sup>345</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 36.

<sup>346</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 37.



e. Dizane ku ka çi difikirin û çi nafikirin? Ji bo çi xemgîn in û hemî hizrên wan dizane ji bo çi ye? Lewra gotara nerasterast heye. Û dîsa ji ber ku dîyalog û monologên karakteran rasterast vedibêje; hem gotara rasterast hem jî gotara serbest a nerasterast heye. Vegêr bi peyama sebetê û kursîyê kevn otorîteya xwe dixwe dewrê. Lewra ne vegêrekî objektîf e. Ev çîrok jî weke çîroka *Binê lê bi nav neke* ji aliyê monologê ve bê par maye.

### **Zeman û Mekân**

Dem çend sal berî Şerê Cîhanê yê Duyem derbas dibe heta sala 1941'ê sê sal e kû Şerê Cîhanê yê Duyem dest pê kirîye. Lê vegêrî bûyer li gor pêvajoya zincîreyî ya dîrokê neqil nekirîye, nêzikî bîst-sî salî lezandîye, borandîye.

Mekân, mekânêkî çêkiri ye. Vegêr çi xwestîye ji me re bibêje derheqê mekânê da em tenê wê dizanin. Cih Mehabad û Qelereş (mala Emer Axa).

### **Zîq/Zîqbûn**

Bûyerên çîrokê pêşî em bi çavê vegêrê şexsê sêyem dibînin ku zîqbûna wî zîqbûneke sabit e. Paşê bi çavê Ka Hisên û hevalê wî dibînin. Lewra zîqbûna wan jî zîqbûneke hevpar e. Lewra dema Ka Hisên çîrokê vedibêje cînava em/me bi kar tîne.

### **Deng**

Ji aliyê rêzimanê ve ji ber ku hemû leheng dîsa wek hevdû dipeyivin ev lawazîya deng nîşan dide. Lewra yekdengî di vê çîrokê da jî serdese.

### **Saluxdan**

Tac û textê Emer Axa, vegêr di vê çîrokê da li ser saluxdanê zêde nesekinîye. Bûyeran heta cihê ku Ka Hisên vedibêje saluxan vegotîye. Ji wir paşda saluxdanek heye lê ne rêk û pêk e. Heta digihîjin mala Emer Axa saluxdanek weke hevokekê vedibêje Ka Hisên. Dema ku digihîjin mala Emer Axa ha hingê saluxdanekî baş li ber me rast dibe. "... *Odayeke axî, dîwar ji dûkelê reş bûbûn, eqd qurmavî bûbû. Li aliyê hêwanê pencereyêke piçûk tê de bû, cama wê ji dûkelê reş bûbû, tiştêkî raxistî nebû. Di nîvê odeyê de kursiyek -zivistanan dema li ser tenûrê dideynin, lihêfê pê*

*dadikin û li ber rûdinin- danîbûn. Emer Axa li ser kursî rûniştibû, çimek avêtibû ser çimekî, di ser serê wî re bi ben sebetek bi eqdê ve girêdayî bû. Emer Axa serê xwe xistibû bin sebetê. Emer Axa ne temaşeyî me kir û ne jî bersiv da me. Pîrot qelûnek tije kir û da dest Emer Axa. Emer Axa li pencereyê temaşe dikir û car caran mij li qelûna xwe didan....*<sup>347</sup>

### **Kesayetî**

Ji aliyê karakterên alîkar ve gelek dewlemend e. Lê vegêrî karakterên alîkar ango lawekî tenê bi navê wan ve derbas dike. Derheqê wan da zêde agahîyan nade. Tu diyalogên wan nîn in.

**Emer Axa:** Emer Axa, axayê Qelereşê ye. Yekî bi aqil û jîr e. Derheqê wî da vegêr agahîyan zêde nade lê di çîrokê da tê famkirin ku di nav xelkê da ciheke girîng digire û lehengê serekî yê çîrokê ye.

**Heyder Elî Xan:** Efserê Fermandarî Beşa Şestîrê ye. Li hember dewletê di nav hewldana serî rakirinê ye. Navê vî û tevgera vî zêde derbas nabe wekî dî. Karakterek lawekî ango alîkar e.

**Ka Hisên:** Zilamekî şareza, wêrek, cansivik e û di nav xelkê da bi qedr û qîmet e. Ji aliyê şer ve gelekî jîr e. Bûyeran bi mantiqî difikire û çareser dike. Di şerê Cîhanê yê Yekem û di gelek şerên din da şûrê xwe rakirîye. Lewra şêrvanekî wêrek û bihêz e. Karaktereke serekî ye. **Pîrot:** keayetîyek lawekîye û xulamê Emer Axa ye.

### **2.4.5. Ocaxa Axa Ronake**

#### **Kurte**

Bi navê Reşîd, axayek ciwan û cahêl heye ku di temeneke biçûk da di şûna babê xwe, Marif Axa da dibe axa. Bi navê Tawis jî tajîyek wî heye ku ev tajî ji babê wî ve weke mîrat bo wî maye. Reşîd Axa ji nêçîrê gelek hez dike û herwisa zimanê

<sup>347</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 38-39.

tajîyan jî dizane. Reşîd Axa û xulamên wî li dîwanxaneyê rûniştine û bi hev ra giftûgoyê dikin. Reşîd Axa û Koxe Evdile li ser mesela nêçîrê dikevîne şertî. Reşîd Axa ji Koxe Evdila ra dibêje: ger tu sibê heta wextê taştê temalekê bibînî ez dê du ribê genim bidime te. Koxe Evdila pêşî dibêje: hêj ne wextê temala ye, hinekî raweste. Lê Reşîd Axa dibêje: na divê tu bînî. Ew jî dibêje: bila, ez dê bînim Sibê radibin piştî taştê diçine nêçîrê û Koxê Evdile di kozîkekê da temalekê nîşanî axa dide. Tawisê tajî temalê ji kozîkê da derdixîne û Koxe Evdila kîvroşkê ji devê tajî distîne û bi piştî xwe ve girê dide û wusa diçe li cem Reşîd Axa. Paşê pêkve diçine malê. Weke ku Reşîd Axa soz dabû du ribê genim û desteke şel û şepikan dide Koxe Evdile ji ber ku bi şev jî goştê kîvroşkê dixwun. Paşê Koxe Evdile radibe ku here mala xwe li ber dergehî Birahîmê Şelî dibîne ku ew kîvroşka ku Tawis girtibû ya wî bû yanî xwedanê kîvroşkê dibîne. Ji Birahîm Şel ra dibêje ger tu behsa kîvroşka xwe ya berzebûyî bikî welleh ez dê te bikujim. Çîrok bi vî şiklî diqede.

#### Xiştê 5. Xiştê Binyatê Vegêranê di Çîroka Ocaxa Axa Ronake

	Vegêran	Vegêr	Zeman	Mekân	Zîq/Zîqbûn	Deng	Saloxdan	Kesayefî
<b>Ocaxa Axa Ronake</b>	Babetî Heterodiegetik	Hemî tişt zan, şexsê sêyem	Dema nihaye Flaşbac	Mala Reşîd Axa, cihê nêçîrêye	Zîqbuna guherbar	Yekdengî	Rewşa Reşîd Axa	Reşîd Axa, Koxê Evdile, Bayiz, Mam Selîm, Birahîmê şel

#### Vegêr

Vegêrekî sergirtî ye ango vegêrekî hemî tişt zan û bêteref e. Mudaxeleyî fikrên karakterên xwe nake. Dev ji otorîteyan berdaye û otorîteya karakteran daye axaftin. Lewra vegêreke objectîv e. Vegêr çîrokê wek metneke şanoyî vedibêje. Rêzebûyereke bi hev girêdayî çûnîn e. Dîyalog wek herîkîna hişê karakteran devam kirîye. Vegêr, vegêrekî nedramatîzekirî ye. Her çiqas di nav çîrokê da cih nagire jî hebûna wî ji serî heta dawî tê hîskirin. Wekî karakterekî çîrokê ye lê tu kes pê re naaxive. Lê her tişt li ber çavên wî diqewimin. Rewşa vegêrana babetî, şexsê sêyem serdest e. *"Koxe Evdile, her çi qas ne bavê xulamên bû, weke Mam Selîm çavê wî bi paş xwe re Axayê rehmetî re nevbûbû. Lê te digot ji ber çakûçê şeytan pekiyaye. Di*

*fen û fêlên axatî û xulaman de hoste bû, dizanîbû aqilê Axa bi heyra ku diçe...*"<sup>348</sup> Ji du gotaran ve pêk têt; gotara vegêr û gotara karakteran. Weke mînak em ji bo gotara karakteran ku ji dîyalogan ve pêk têt em dikarin vê mînakê bidin. *Reşîd Axa "De here temalê bibîne."* *Koxe Evdila "Axa hinekî raweste heyra hinek berf bikeve. Êdî bizane du ribê genim helal dikim yan na."*

Wekî din çîrok ji ber ku bi awayekî şanoyî didome em qet rastî monolog û cûreyên wê nabin.

### **Zeman û Mekân**

Dîroka çîrokê nedîyar e lê em dizanin ku dem, dema niha ye. Vegêr demê weke sibê û bi şev nîşan dide. Vegêr hin agahîyên berê bi rêya flashbackan di nav dîyalogên lehengan da qiset kirîye.

Derheqê mekânê da em zêde tiştêkî nizanin. Vegêr çi xwestibe bibêje em wê dizanin. Lewra mekân, mekânêkî çê kirîye. Mekân mala Reşîd Axa û cihê nêçîrê ye.

### **Zîq/Zîqbûn**

Bûyerên çîrokê em pêşî bi çavê şexsê sêyem dibînin. Lê zîqerê çîrokê du kes in; yek Reşîd Axa yê din jî Koxe Evdile ye. Lewra zîqbûneke guhêrbar heye.

### **Deng**

Ev çîrok jî ji aliyê rêzimana lehengan ve lawaz e. Hemû leheng bi giştî dîsa hevdû diaxivin. Lewma yekdengî hakim e di çîrokê de.

### **Saluxdan**

Di çîroka Ocaxa Axa ronak e da vegêr tenê li ser saluxdana lehengan rawestîyayî ye. Ka mirovîni çawa ne? *"Reşîd Axa di temenê ciwanî de bû..... Tawis, weke cendirmeyekî ku nû çend kurd girtibûn û sipasiyek wergirtibe û efsere*

---

<sup>348</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 43.

wî bangî bike yan weke jineke pale di nav dar û direhan re bi pey çêleka xwe ya windayî de baz bide, zû û bi rev diçû ber bi Reşîd Axa ve.... " <sup>349</sup>

### **Kesayetî**

**Reşîd Axa:** Reşîd Axa ji nêçîre û ji segê xwe Tawis gelekî zor hez dike. Bi zimanê tajî dizane lewra bi Tawis re bi zimanê tajî diaxive. Reşîd Axa ji kêf û şahîyê zor hez dike. Jê re herdem û daîm şahî be ne xema wî ye. Ji şert û mercên henekî hez dike û bi xulam û dostê xwe re li ser tiştan dikeve şertî.

**Koxê Evdile:** Yekî şareza, hişyar û aqilmend e. Nakeve bin xefka derûdora xwe. Ji hileyên hez dike. Di pêşbirk şertan da bi fêl û fendî û hileyên bi ser dikeve.

Karakterên din jî wek karakterê alîkar û lawekî di nav çîrokê da diaxivin. Ev karakterên alîkar: Bayîz, Cafer, Mam Selîm, Mîrza Simaîl, Xulam û Birahîmê Şel.

### **2.4.6. Xemla Pembû**

#### **Kurte**

Havîna sala 1956ê de. Şêx, Sofî Qadirê Hewramî ku karê mizgeftê dike û rojê pencaran banga nimêjê dide û Mela Celal ew jî ji bo ku li pêşîya cemaatê nimêj bike hatibû kirêkirin li hewşa mizgeftê rûniştibûn. Li benda nimêja nîvro bûn. Sofî Namiq tê cem Şêx û gilîyê Zorav Beg dike. Zorav Beg hemû pembûyê Sofî Namiqî jê dixwaze di şûna deynê xwe de. Sofî Namiq jî ger tevî pembûyê bide Zorav Beg dê ew û zarokên wî dê di vê çileyê da birsî bimînin. Lewra hatîye cem Şêx da ku çarenûsekê bibîne. Şêx, sofiyê xwe Sofî Reşîd dişîne li cem Zorav Beg. Sofî Reşîd diçe û wextê tê çî tiştê ku Zorav Beg gotibe ji Şêx re dibêje. Şêx piştî axaftinên Zorav Begî ku Zorav Begî gotibû Şêx gelek rû dide wan gundî û xulaman, bila guhê xwe nedete wan, yekser diguhere û ji Sofî Namiq ra dibêje em çî bikin qedera Xwedê ye. Vî tiştî qebûl bike û xemla pembûyê Zorav Beg bideyê. Her çiqas Sofî Namiq ji vê rewşê ne razî be, dîsa jî vedigere û dibêje ez xemla pembûyê nadime Zorav Begî û diçe malê. Çîrok bi vî şiklî diqede

---

<sup>349</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 41.

## Xişte 6. Xišta Binyatê Vegêranê di Çîroka Xemla Pembû

	Vegêran	Vegêr	Zeman	Mekân	Zîq/Zîqbûn	Deng	Saloxdan	Kesayefî
<b>Xemla Pembû</b>	Babetî Heterodîegîtîk	Hemî tişt zan, şexsê sêyem	Havîn 1956 Flaşbac	Mizgeft	Zîqbuna sabit	Yekdengî	Tevgerên lehangen	Şêx, Sofî Qadir, Mela Celal, Sofî Namiq, Sofî Reşîd, Zorav Beg

### Vegêr

Vegêrê çîrokê, rewşa vegêrana şexsê sêyem ango vegêrana babetî ye. Lewra vegêrana derveyî metnê/heterodîegîtîk tê da heye. "*Şêx berî nivro û êvaran heya nêzikî bangdanê yan ki hewşa mizge ftê hatûçû dikir, yan jî li hêwana mizgeftê, li ser kursiyê ku bi taybetî jê re danîbûn rûdinişt û bi tizbiya xwe dileyist. Xuya bû dahatiyên (hatin) payîza par dianî bîra xwe, bê ma çiqas bû û wê îsal çiqas be.*"<sup>350</sup> Çîrokê pêşî şexsê sêyem qiset dike heta cihê "tu fermo em mîyaw mîyaw" vê meselê Sofî Namiq vedibêje. Hem gotara rasterast heye di çîrokê da hem jî gotara nerasterast heye. Gotara rasterast heye loma vegêr gotin û ramanên karakteran rasterast qiset dike. Gotara nerasterast heye ji ber ku vegêr rewşa hişê karakteran qiset dike. Tê da otorîteya vegêr heye. Derheqê karakteran da her tiştî dizane. Lewra vegêrekî vekirî ye. Vegêr, vegêrekî nediramatîzekirî ye.

Di vê çîrokê da jî em rastî monolog û cûreyên wê nabin.

### Zeman û Mekân

Dîrok ji aliyê salê ve dîyar e, sal 1956 lê ji aliyê mehê ve ne dîyar e lê demsal havîn e. Bûyer bi awayekî kronolojîk, bi gotineke dî zincîreyî didome. Qala rojeke Şêx hatîye kirin. Teknîka flaşbakê di vê çîrokê da jî derdikeve pêşîya me, mesela gava Sofî Namiq ji Şêxî ra meseleya "*tu fermo em mîyaw mîyaw*"ê vedibêje.

Mekân mizgeft e. Ji bilî mizgeftê qala tu mekânî ne hatîye kirin.

### Zîq/Zîqbûn

<sup>350</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 47.

Zîqerê çîrokê vegêr bi xwe ye. Lewra zîqbûneke sabit heye.

### **Deng**

Vegêr her çiqas qala devokên din yên kurdî kiribe jî çî karakterên xwe bi wan devokên ku qala wan dike nedaye axaftin. Herdem bi kurdîya kurmancî daye axaftin, lewra ji alîyê rêzimana karakteran ve yekdengî serdest e.

### **Saluxdan**

Di çîroka Xemla Pembû da vegêr tenê li ser saluxdana tevgerên lehengan rawestîyayî ye lê ew jî ne bi awaeyeke têr û tije. *"Rojekê Sofî Qadir berî nîvro hewş û hêwan paqij û avreşandî kiribû. Kursiyê Şêx jî paqij kiribû. Rawestiyabû û milê xwe dabû enîşka dergehê mala Şêx."*<sup>351</sup>

### **Kesayetî**

**Şêx:** Şêxekî pîr e lewra nikare li pêşîya cemaatê nimêj bike. Karakterê serekî ye û dûz e.

**Sofî Qadir:** Xizmeta mizgeftê dike, bang dide û li ber destê Şêx diçe û tê.

**Mela Celal:** Ji alîyê peran ve yekî zêde çavbirçî ye. Lewra ji bo çend dînanan bi kirêkî li pêşîya cemaatê nimêj dike. Yekî dûz e.

**Sofî Namiq:** Yekî mexdûr e. Dixwaze rewşa xwe bi alîkarîya Şêx biguhêrîne lê nabe. Yekî dûz û ji rêzê ye.

**Sofî Reşîd:** Tenê ji bo çûyîna cem Zorav Beg hatîye afirandin. Lewra karakterekî alîkar e û dûz e.

**Zorav Beg:** Dewlemend e. Di nav çîrokê da tenê qala wî tê kirin. Di şûna deynê xwe ji Saofî Namiqî pembûya wî hemîyê dixwaze. Karakterekî lawekî ye.

---

<sup>351</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 48.

## 2.4.7. Serfitre

### Kurte

Hecî Elî yekî bazirgan e. Mîrza Salih mirovê wî ye û li cem wî dişûxile. Di meha Remezanê da ne. Lewra jina wî Fatê, di rojên dawî yên Remezanê da ji Hecî ra dibêje divê serfitrêyên wan bide hin kesên feqîr. Lê Hecî dibêje ez dê bidime Mîrza Salih. Roja din radibe diçe dikanê ji Mîrza Salih ra dibêje ez dê serfitreyên xwe bidime te. Kêfa Mîrza Salih zehf tê lê ev rewş zêde nadome. Ji ber ku Hecî çî dabe Mîrza Salih tevan di ber serfitreyê da hesab dike û tenê çarîkek dinar dide Mîrza Salih. Mîrza Salih bi kenekî nîveroyî dibêje vêca çima tu vê çarika dinar jî nakî pêşekîya serfitreya saleke din? Hecî Elî jî dibêje vê jî sala bê em dê hesab bikin û ma çê dibe ku ez te niha destxalî rê bikime malê? Çirok wusa xelas dibe.

### Xiştê 7. Xiştê Binyatê Vegêranê di Çîroka Serfitre

	Vegêran	Vegêr	Zeman	Mekân	Zîq/Zîqbûn	Deng	Saloxdan	Kesayetî
Serfitre	Babetî Heterodîegetîk	Hemî tişt zane, şexsê sêyem	28 Meha Remezanê	Mala Hecî Elî Dukana wî	Zîqbuna sabit	Yekdengî	Rewşa lehangana	Hecî Elî, Fatê, Mîrza Salih, Evrehman, Hecî fetileyê Pêncewîn

### Vegêr

Vegêr, rewşa vegêrana babetî, şexsê sêyem e. Lewra vegêrana derveyî metnê-heterodîegetîk heye.. "*Şeveqê Mîrza Salih, wek ku xelkê bazarê dibêjin, mehelê xwe vekir. Ew der maliştin, defter û tiştên xwe amade kirin û rûnişt. Piştî kêliyê Hecî xuya kir.*"<sup>352</sup> Vegêr derheqê karakteran da her tiştî dizane. Hem gotara rasterast heye di çîrokê da hem jî gotara nerasterast heye. Gotara rasterast heye loma vegêr gotin û ramanên karakteran rasterast qiset dike. Gotara nerasterast heye ji ber ku vegêr rewşa hişê karakteran qiset dike. Ji ber ku vegêr ne karakterekî çîrokê ye vegêr. vegêrekî nedramatîzekirî ye. Ji du gotaran ve pêk tê; gotara vegêr û gotara karakteran. Vegêr, vegêrekî sergirtî ye. Ji mudaxleyê hez nake. Dest ji otorîteya xwe berdaye. Otorîteya karakteran daye axaftin.

<sup>352</sup>Hesen, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 56.



Ev çîrok jî ji alîyê mononlogan ve bêpar maye.

### **Zeman Mekân**

Ji alîyê salê û demsalê ve dîrok tam ne dîyar e lê meh dîyar e. Meh, bîst û heştê meha Remezanê ye. Bûyer bi tevahî di nav du, sê rojan da bi awayekî kronolojîk, zincîreyî derbas dibe.

Vegêrî ji bo mekânê xwe zêde aciz nekirîye lewra taswîra mekânên xwe zêde nekirîye. Mekân, mala Hecî Elî û dikana wî ye.

### **Zîq/Zîqbûn**

Ji alîyê zîqeran ve em dikarin bibêjin ku zîqerê vê çîrokê vegêr bi xwe ye. Yanî şexsê sêyem e. Bûyer bi awayekî objektîf ji alîyê şexsê sêyem ve hatine vegotin. Lewra zîqbûneke sabit heye.

### **Deng**

Ji alîyê rêzimanê ve ev çîrok jî weke çîrokên din lawaz e. Fonetîka hemû karakteran dîsa wekî hev e. Yanî yekdengî di vir da jî serdest e.

### **Saluxdan**

Di çîroka Serfitre da vegêr dîsa li ser saluxdana derûdorê nesekinîye lê li ser ya lehengan sekiniye. Ka çawa tevdigerin? "*Weke sinnetê ket ber rêza beqleweyan, tevî şerbetê bi nîvgezî diqurpand, sê-çar qet di qirka wî de man û bêhna wî nema derket. Qirika xwe bi qedehek dew şûşt û kuxikek peyda kir. Rê ji bo xwarina din bi tevahî hate vekirin, rahişt sêniya birincê, bi hebûna bamya û goşt, baştir xuya dikir, bi xweşî di navbera reh û simbêlên wî re xwe dixist devê Hecî û diçû xwarê.*"<sup>353</sup>

---

<sup>353</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 54.

## **Kesayetî**

**Hecî Elî:** Kesayetîya serekî ye. Her çiqas wek zilamekî oldar bê xuyakirin jî ji alîyê pereyan ve yekî xapînok e. Hisabê yek filsî jî dike. Çend sal berê bi xêrxwazî jî be çî dabe yekî bi deyn hesab dike û çî carî ji bîr nake. Xêra ku dike jî dîsa ji wan bi awayekî disitîne. Di serî da wek kesekî oldar hatibe xuyakirin jî dawîyê da yekî xapînok derdikeve. Lewra yekî gilover e û me şaş dike.

**Fatê:** Jina Hecî Elî ye. Jineke rastgo ye. Karaktereke dûz e.

**Mîrza Salih:** Yekî feqîr û dirist e. Li cem Hecî kar dike. Karakterekî dûz e.

**Evheman:** Kurê Hecî Elî yê mezin e. Karaktereke lawekî ye.

**Hecî Fetileyê Pencewînî:** Bazirgan e û karaktereke lawekî ye.

### **2.4.8. Keşkola Efsûnî**

#### **Kurte**

Du bira hene Yare û Pîrot û ji yekûdu gelekî hez dikin û her tiştê wan di nav yêk da ye. Pezê wan, mala wan her tiştên wan. Pezên xwe di zevîya Ferîdun Beg da diçêrandin. Karê wan karê koçeran bû. Bi navê Weyse kureke Yare û bi navê Naskol jî kiçikek Pîrotî heye. Bi hev re radibin û rûdinin. Her cure karî bi hev re dikin. Piştî ku mezin dibin babên wan biryar didin ku wan bidine yekûdu. Wan dizewicînin. Du, sê sal derbas dibe û nexweşîyek dikeve nava pezê wan û pezê wan dimirin. Hinekên ku di ber mirinê xilas bûn jî ji bo nan û vexwarina xwe firotin. Di destê wan da tiştek namîne. Êdî bi rênçberî û xulamtîyê xwe xudan dikin. Li cem Axa û Koxeyê Axa dest bi kar dikin. Rojekê Koxe ji bo kar têt û bangî Pîrot dike lê Yare nahêle ku birayê wî ye mezin û pîr biçê. Ji şûna wî Yare xwe amade dike û diçe rênçberîyê. Li rênçberîye Yare ji westîyan û ji derdên dî dilê xwe da gelek aciz dibe. Ji nişkê ve erd ji bin lingê wî tê kişandin û Yare bêhiş dikeve. Piştî wî dişkê. Çend rojan bi vî şiklî dijît û paşê li ber rehma Xwedê diçe, dimire. Piştî mirina wî gelek ser da naçe Pîrot jî dimire. Weyse dibêje bi vî şiklî nabe divê ez karekî din bibînim ku jina xwe, dayîka xwe û xwesûya xwe xudan bikim. Ev kar me xudan nake. Diçe ji Ferîdun Axa destûr dixwaze û di daristana wî da benîştan xir bike û wan li sûkê bifiroşe. Çend rojan diçe

û pereyêke baş jî berhev dike. Rojekê dîsa li nav daristanê ye ji bo berhevkirina benîştan. Zilamekî pîr û rih spî li wir dibîne. Bi zilam ra diaxve. Tiştên ku ji ser serê derbas bûye hemûyê jê re dibêje. Mamê Pîr ji nav tûrikê xwe keşkolekê derdixîne û dide Weysê. Jê re dibêje tu çi dixwazî xeyal bike bes. Weyse wusa dike û ji kêfa hindik maye ku bifire. Bi bazdan dikeve rêka malê. Dema digihêje gund, Ferîdun Axa di şibakê da wî dibîne û ji bazdan û kêfa wî dikeve şikê. Bangî dike da ku were cem wî. Xulamên Axa diçin Weyse dibin cem Axa. Axa keşkola Weyse jê distîne û wî wusa destvala rê dike malê. Weyse bi dilekî şikestî diçe malê û hem karê xwe yê berê didomîne hem jî li daristanê Mamê Pîr digere. Lê mixabin dike û nake neşê bibîne. Rojekê dîsa benîştan tîne bajêr. Benîştên xwe hemûyan difiroşe û hesab xwe yê salê dike. Hisaba wî bi hev dernakeve, dikeve rê ku biçe malê. Li qiraxa bajêr xanîyêke ku nû çê dikin dibîne û diçe wir û dibêje belkî ez li wir karekê peyda bikim. Dema diçe li wir zilamek gazî diket. Diçe, zilam wî nas dike lê Weyse wî nas nake. Zilam xwe pê dide naskirin. Dibêje ez Mamê Pîr im. Weyse tiştên ku hatine serê wî ji Hoste re dibêje ew jî diçe keşkola xwe ya din jî dide Weyse. Weyse radije keşkolê bi kêf bazdide mal. Axa dîsa di şibakê da Weyse dibîne û xulam diçin Weysê dibine li cem Axa. Axa wê keşkolê jî ji Weyse distîne. Vê care di şûna ku daxwazên Axa, du destên mezin di nav keşkolê derdikevin û ev herdu dest Axa didene li ber zîle û şeşan. Axa herdu keşkola jî dide Weyse û wî azad dike. Weyse bi van keşkolan dibe yekî dewlemend û çîrok wisa xelas dibe.

### Xiştê 8. Xiştê Binyatê Vegêranê di Çîroka Keşkola Efsûnî

	Vegêran	Vegêr	Zeman	Mekân	Zîq/Zîqbûn	Deng	Saloxdan	Kesayetî
<b>Keşkola Efsûnî</b>	Babetî Heterodiegetîk	Hemî tişt zan, şexsê sêyem	Dem ne dîyare Lezandin	Mala Weyse, mala Axa, erdê Koxe, daristan, bajêr	Zîqbuna sabit	Yekdengî	Wesfên tebîetî	Weyse, Mamê Pîr, Ferîdun Axa, Yare, Pîrot, Naskol, Koxe

### Vegêr

Rewşa vegêrana şexsê sêyem hakime. Lewra çîrok vegêrana babetî ye. " *Pîrot got: 'Yare, ez qet nabim direhê Mem û Zînê û gunehê Weyse û Naskol ji xwe re*

*nayînim. Bira, ez jî dizanim parî ji dev bikeve ji bo dawiyê baş e....* <sup>354</sup> Vegêr ji derûnîya karakteran hayedar e. Dizane ku karakter çî difikirin, çî nafikirin, ji bo çî xemgîn in û herwesa dizane ku karakter çî xeyal dikin. Lewra gotara nerasterast heye. Dîsa ji ber ku gotinên karakteran rasterast qiset dike gotara rasterast jî heye. Vegêrekî vekirî ye. Ji mudaxeleyan hez dike. Di hin deran da bi kesayeta xwe ya nivîskarê zimmî şîretan li xwendekaran dike. Ji du gotaran ve pêk têt; gotara vegêr û gotara karakteran.

Ji aliyê monologê ve ji ber ku vegêrê me ne lehengê çîrokê ye monologa nerastewxu heye. "*... Hemû genc û zarok in, dilê wî pê şewitî û di dilê xwe de wilo li hev dida: ' Heger bêqidoşiyê berê xwe nedabayê û hejar nebûya, yan bêş didan, yan jî karîbûn Weyse bişînin. Her çawa be ketine hevraz û berê xwe dane kemacarê Ferîdun Beg. '... "* <sup>355</sup>

### **Zeman Mekân**

Dem tam ne dîyar e. Vegêr li ser rojên zarokatîya Weyse û Naskol nesekinîye zêde, lezandîye ango borandîye. Dîsa wextê tê ser ciwanîya wan piştî şahîya wan dîsa sê-çar salan lêzandîye. Li ser zeman zêde nerawestîyayî ye. Lê gava behsê bûyeran dike bi awayeke berfireh behs dike û bûyeran bi hûrgûlî radigihîne.

Mekân jî her wek zeman e. Bi hûrgûlî li ser nesekinîye, lewra mekânêkî çêkirîye û vegêr çî xwestibe bêje em ji wê pêştir çî tiştî nizanin. Cihên sereke mala Weyse, mala Axa, erdê Koxe, daristan, bajêr, xanîyê nû çê dikin in.

### **Zîq/Zîqbûn**

Zîqbûneke sabit heye, ji ber ku em hemû tiştî bi bergêha Weysê dibînin. Lewra zîqerê çîrokê jî her ew e.

### **Deng**

Di vê çîrokê da jî yekdengî serdest e.

---

<sup>354</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 61.

<sup>355</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 61.

## Saluxdan

Çîroka Keşkola Efsûnî da vegêrê me saluxdanek baş derxistîye holê. Ji her aliyê ve saluxdan têr û tije ye. Bi awayekî edebî wêneyekê di serê me da diafirîne. *"Di nav zinaran de gelek devî, darên stûr û kevin ên mezin hebûn. Di şêwlekî de pûng û zel û giram xuya kir. Bi ber û ber û dar û darve çû heya gihîşt nêzîk. Temaşe kir ku aveke kême ji ser ve tê xwar. Zanîbû nêzîk yan dûr kaniyek li van deran heye. Berjor çû heya gihîşt dareke berûyan a stûr û kevin. Şax û pelên wê sibereke mezin li derdora xwe çêkiribû. Cihê çûn û hatina xelkê ya bi salan bû û kuwarek ketibû nava wê. Kaniyeke piçûk li binê dara berûyê bû, lê heya tu bibêjî bes, ava wê zelal û sar bû.... "*<sup>356</sup>

## Kesayetî

**Weyse:** Karakterekî serekî ye û newêrek e. Dema ku Axa keşkolê jê distîne zêde newêre biaxive. Lê dirist e. Yekî jêhatî ye. Bi aqil e, lê di hin deran da nizane aqlê xwe bi kar bîne. Dema têk diçe ji Mamê Pîr hêvî digire. Karakterekî ji rêze û dûz e.

**Mamê Pîr/ Hoste:** Zilamekî efsûnî ye. Li daristanê wek zilamekî pîr derdikeve pêşberî me. Li qiraxa bajêr di avakirina xaniyê mezin ê nû da wek hosteyekî ciwan derdikeve pêşîya me. Lewra yekî têra xwe tije raz e. Ji ber vê yekê jî karakterekî gilover e. Ger mirov be mirovekî baş e. Alîkarîya desttengên weke Weyse dike. Ji bo wî em dikarin bibêjin karakterekî fantastîk, qencên Xwedê, efsûnî û her wekî din.

**Ferîdun Axa:** Çi fen û fêl tu bixwazî li cem wî heye. Bêdelet e. Bi mirov û xulamên xwe ra ne dirist e. Birçiyê pera ye. Ew jî me şaş nake karakterekî dûz e.

**Yare:** Bavê Weyse ye. Zilamekî dirist e. Bi karê xwe, mala xwe xudan dike. Karakterekî dûz e.

**Pîrot:** Bavê Naskol e. Ew jî yekî dirist e. Karakterekî dûz e.

---

<sup>356</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 62.

**Naskol:** Vegêr li ser kesayeta Naskol qet nesekinî ye. Der heqê wê da em tenê dizanin ku keça Pîrot û jina Weyse ye. Karakterekê dûz e. Karaktereke lawekî ye.

**Koxe:** Xulamê Axa ye yan jî serkarê Axa ye û li wir karaktereke lawekî ye, alîkar e.

Du karakter hene ku di çîrokê da vegêr qet behsa wan nekirîye. Dayîka Weyse û dayîka Naskolê. Ev herdu jin di jîyana wan da hene lê vegêrê me qet behsê wan nekirîye. Tenê wek dayîk nîşan daye. Çi dîyalogên wan çûnîn in. Wek kesayetên xeyalî ne. Di çîrokê da cih digirin lê qet naaxivin. Dibe ku vegêrê me ev tişt bi zanebûnî kiribe. Û dibe ku vegêrê me ew di nav çîrokê da ji bîr kirîbin. Yan jî erk û rola wan di vê çîrokê da tenê dayîktî be. Ji ber vê çendê ev herdu dayîk em dikarin bibêjin ku karakterên lawekî ango karakterên alîkar in.

#### **2.4.9. Şehîdê Zilmê Ye Kefen û Şuştin Jê Re Navê**

##### **Kurte**

Salek e dijwar li navçeya Jawero serî radike. Dêwekî neman li ser piştta wan dibe perîşanî, şepirzetî. Ji wan şepirzeyan yek jî Cotkar bû ku dikir û nedikir neşîyabû rêka xilasîya ji vê bedbextîyê bibîne. Hem suxreyan nedihêlan ku bifikire û hem jî neşareza û nezan bû. Ji ber vê perîşanîyê derdor tije termê cotkaran bû. Ji bilî termê mirovan çî tişt erzan nebû. Ebasê Cotkar ji ber vê rebenî û reziltîyê dest ji mal û zarokan berdide û diçe ku karekê peyda bike û debara xwe û ya mala xwe pê bike. Bi awayekî bedbext, nexweş xwe digihêne bajarê Germên. Li wir xwe bi xwe dibêje îro roja ewilî ye û bila hin xêrxwaz nanekî bidine min roja din ez dê rabim dest bi kar bikim. A dijwar roja pêşî ye. Ez vê rojê bi xêr derbas bikim êdî Xwedê mezin e dê alîkarîya min bi ke. Pereyan berhev bikim û ji bo malê rê bikim. Piştî ku ez li vir tam bi cih bibim ez dê wan jî bînim cem xwe. Ebasê Cotkar di nav van xeyalan da xwe berdide nav bajêr diçe li hewşa mizgeftê rûdine da ku xêrxwazek nanekê bidetê. Lê ji mizgeftê Piske/Micewir tê cem û dibê here ji vir tu bîyanî yî û cenderme te li vir bibînin dê te bavêjne zindanê û dê îşikencê li te bikin û paşê dê te bişînin welatê te. Bi bihîstina van gotinan Cotkar zêde ditirse, lewra rojên wî yên berê tene ber

çavên wî. Radibe diçe û di rêkê da jîyana xwe ji dest dide. Bi gotinên xwe Micewir zehf poşman dibe û li Cotkar digere da ku wî bine mizgeftê bila xêrxwazek nanekê bidetê. Piştî lêgerîneke dirêj Cotkarê belengaz li rexê bajêr di hal mirî da dibîne. Micewir ji bo defnkirina wî diçe dikana Mam Hecî yê bazirgan. Jê re dibêje hal û mesele eve. Tu ji Cotkar re kefen çê bike. Şûştin û veşartin jî li min. Hecî gotinên nexweş dibêje û dibêje ma reşek mirîye çi ji min re? Paşê dibêje Micewir lê em dikarin bazarê bikin ez dê kefen çêbikim. Lê Micewir jê aciz dibe û ji wir derdikeve. Diçe û Cotkar bêşûştin û bêkefen vedişêre û dibêje: şehîdê zilmê ye kefen û şûştin jê re navê. Çîrok wusa xelas dibe.

**Xiştê 9.** Xiştê Binyatê Vegêranê di Çîroka Şehîdê Zilmê ye Kefen û Şûştin Jê re Navê

	Vegêran	Vegêr	Zeman	Mekân	Zîq/Zîqbûn	Deng	Saloxdan	Kesayetî
Şehîdê Zilmê ye Kefen û Şûştin Jê re Navê	Babetî Heterodîgeetik	Hemî tişt zan, şexsê sêyem	Dem bûriye Flaşbac Lezandin Pêşbînî	Jawero, mizgefta bajêrê Germên, dikana mam Hecî	Zîqbuna guherbae	Yekdengî	Rewşa leheng û Xwezayê	Cotkar Micewir/Piske, Mam Hecî

**Vegêr**

Vegêrekî vekirî çîrokê ji me ra radigîne. Yekî subjektîf e, ideolojîya xwe li her derê çîrokê belav kirîye. Desthilatdarîya vegêr di vê çîrokê da zêde zêde tê hîskirin. Herdem û daîm mudaxeyî axaftinên Ebasê Cotkar dike. Cotkar yekî nezan û neşareza ye lê axaftinên ku dike yên kesên zana û şareza ne. Lewra nivîskar di vir da bi teknîka nivîskarê zimmî ku kesayeta wî ya duyem e ku fikr û ramanên xwe ji me re vedibêje. Di hin deran da şîretan li me dike. "... Dema ku nehatinê û nemanê berê xwe da alîyekî, alîyê din divê çavê xwe negire û alîkarîyê bike!"<sup>357</sup> Vegêr ji derûnîya karakteran ra hayedar e. Ji bo çi xemgîn in, çi difikirin, çi nafikirin, ji çi aciz dibin? Ji her tiştê wan ra hayedar e. Lewra gotara nerasterast heye. Ê dîsa ji ber ku vegêr axaftinên karakteran rasterast vegotîye gotara rasterast jî heye. Çîrok ji gotara vegêr û ji ya karakteran ve pêk têt. Vegêr ji ber ku ne karakterê çîrokê ye

<sup>357</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 70.

vegêrê nedramatîzekirî ye û vegêrana babetî tê da derbas dibe. Monologa vegêranî heye. Ji alîyê vegêranê ve rewşa vegêrana îlahî/babetî vegêrana şexsê sêyem e. "Cotkar ew qasî serê xwe bir û anî, ji xwe re bîr kir û fikirî, nikaribû riyeke çareseriyê ji xwe re bibîne da ku xwe ji bedbextiyê rizgar bike.... " <sup>358</sup>

### **Zeman Mekân**

Dem tam ne dîyar e. Vegêr demê wek sibê, rojek nîşan daye. Jixwe ji vî alîyî ve vegêr xulaseya demê zêde nekirîye. Vegêrê me di nav monologên Cotkar da bi rêya flashbackan diçe demên berê û flashforwardê jî di nav xeyalan da bi kar tîne. Derheqa mekânê çîrokê da herwekî çîrokên dî li wir jî agahîyên zêde û zelal nîn in. Mekân tenê wek nav derbas dibin. Em dikarin bibêjin ku bajarê Cotkar Jawero û mizgefta bajarê Germên û dikana Mam Hecî ev mekân in ku çîrok lê derbas dibin.

### **Zîq/Zîqbûn**

Zîqbûneke guherbar heye. Heta mirina Cotkar em bûyeran bi bergêha wî dibînin û paşê em bûyeran bi çav û bergehê Micewirî ra dibînin. Lewra du zîqerê me hene; Ebasê Cotkar û Micewir.

### **Deng**

Ji alîyê rêzimana karakteran ve yekdengî heye ku her sê karakter jî bi heman devokê diaxivin. Vegêrana derveyî metnê/heterodiegetîk heye. Vegêr ne karakterekî çîrokê ye.

### **Saluxdan**

Di çîroka Şehîdê zilmê ye kefen û şuştin jê re navê da vegêr saluxdana Cotkarê feqîr, lawaz, birçî û têkçûyî bi awayeke serkeftî radixîne li ber çavan. Wek ku me got Cotkar ji aliyê fîzyolojîk ve her dikeve. Lewra hêza birêveçûnê bi zora kotekê pê re heye. Vegêr vê yekê wilo ji me re nîşan daye. *"Bi bêhêzî û şeşê ketê rê da ku li cihê çareseriyê ji xwe re bike. Bi çalepk û nehperûşk û çimê lerizî, bi ser çend gir, zinar, çiya û hevrazî de hilkişiya. Di çend şêwl û newal û serberjêran re*

---

<sup>358</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 69.



*hat xwar, çend çem û robar derbas kirin. Bi her çi nexweşiyekê be xwe gihand bajarekî ji bajarên nêzîk li Germên.... "* <sup>359</sup>

Wekî din bi dîtina me vegêr li ser saluxdana xwezayê wilo wek paragrafek serbixwe neskinîye. Vê yekê di nav monologa nerastewxu ya Cotkar de bi şiklekî gilîkar vegotiye. Ev mînaka ku em dê binivîsin de hem monologa nerastewxu heye hem jî saluxdanek xwezayê heye. "... *Min nizanîbû Kurdistan wiha ye; cihên bi berhem û bereket weke vê derê tê de hene. Ya Xweda, ev xelkê ha çiqas têr û pir in, çiqas cil û bergên wan ciwan in û bi hêz û geş in, çiqas xweşik û bejinzirav in, çiqas rengsar û mijûl û karbidest in. Heger Kurdistan wiha ava ye, erê çima li ba me xamoş û berdolan, kavil û wêran e? Dema ku nehatinê û nemanê berê xwe da aliyekî, aliyê din divê çavê xwe negire û alîkariyê bike! Dîsa her baş e, emê bîn li vir bijîn heya ku ji salên reş û nehatî rizgar bibin.... "* <sup>360</sup>

### **Kesayetî**

**Cotkar:** Karakterê serekî yê çîrokê ye. Yekî neşareza û nezan e. Rençberî û xulamtîyê dike. Bedbextî û perîşanî dest jê naberde. Ji bo ku debara xwe û ya mala xwe bike dixebite lê dike nake bi ser nakeve. Herdem birçî ne. Her çiqas yekî nezan be jî bi axaftinên xwe me şaş dike. Tu dibê qey wan axaftinan yekî zana dibêje. Lewra karakterekî gilover e.

**Micewir/Pîske:** Ev jî karaktereke serekî ye. Kesekî hejar e. Zilamekî pîs û çavbeqe. Di destpêkê da naxwaze nanê xwe bi Cotkar ra parvebike lewra ji wî re dibêje here dê cenderme te bigirin. Paşê poşman dibe û diçe ku wî bîne. Lewra ew jî li gor fikrên xwe tevnagere û karakterekî gilover e.

**Mam Hecî:** Yekî ne başe. Qencîya wî jî bi pera ye. Karaktereke lawekî, alîkare.

---

<sup>359</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 70.

<sup>360</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 70.

#### 2.4.10. Nivišta Amîne Xan

##### Kurte

Amîne Xan keça Şêx Ehmedê Kanîpane. Şêx Ehmed ji bo her cure nexweşîyê niviştan çê dike. Her kes ji bo başkirina nexweşîya xwe, bêşansî mala xwe diçû cem Şêx. Her yekî ku diçû qet destê vala nedîçû. Herdem destê wan tijebû. Hinekan hêk tînan, hinekan genim û hinekan jî ar û tiştên wusa tînan. Şêxî ji bilî çêkirina niviştan çî karî dî ne dikir. Bi van dîyarîyên ku jê re dihatin di nava çend sala da bibû xwedan mal. Hema ji ku çî bixwesta dihat, qet kêr nedibû. Bûbû dewlemendê gund. Piştî mirina wî zarokên wî mal û milkê wî di nav xwe da parve kirin. Her kes bû xwedîyê mala xwe di nav mal û milkê bavê xweda şeş û bêş lêdan. Û bi wan pereyan xwe xudan kirin. Lê piştî demekê pereyên wan ber bi xelasbûnê ve çû. Amîne Xan, dayîka wê û birayê wê yê biçûk jî li ser mala babê xwe dimînin. Piştî xelasbûna pereyan Amîne Xan derbara xwe bi çêkirina nivişt û diayan dike. Mekteb nexwendibû lê dîsa jî zanibû niviştan çêbike. Ji ber ku biçûkatîya xwe da li ber destê bavê xwe diçû dihat û bi vî rengî nivisîna her cure niviştê fêr bûbû. Her kesê ku ji bo nivişt û diayan diçû cem, qet destê vala nedîçû cem. Bi vî şiklî hêdî hêdî weke berê derbara xwe dikirin. Lê birayên wê ji çavnebarî çûn û nav li pey xwişka xwe xistin. Amine Xanê jî weke birayên xwe kir û wê jî ew di nav xelkê da biçûk dixist û bi hin gotinên wekî ew nexwende ne, nezanin, çawa ku dîyarî ji min re tên ew jî bi nanê xelkê xwe xwedî dikin û hwd digot û birayên xwe di nav xelkê da biçûk diêxist. Bi van gotinên wan êdî çî kesî bawerîya xwe nedida wan herdu alîyan û ji bo niviştan nedîçû cem wan. Hêdî hêdî xwarina Amine Xanê wan xelas dibû. Amine Xanê ji bo ku debara xwe bike karekî nû ji xwe re peyda kir. Bi nave dexlîkirinê diçû benderan û ji xelkê re nivişt çê dikir û dia dikir. Rojekê dîsa kera xwe amade kir û çû ser benderên nêzîkî gundê Qacir. Li ser benderêke wir Reşîdî dibîne. Reşîd kurê Mam Ebasê dewlemendê gundê Qacir bû. Reşîd ji Amine Xanê ji bo keçîka ku bersiva jêhezîkirinê bidetê nivişteke dixwaze. Amîne Xan jî ji Reşîdî dîyarîyekê dixwaze di serî da û paşê kaxezêke pîs û pênuşekê ji berîka xwe da derdixîne û li ser kaxezê çend xetan çê dike û wê kaxezê li hev dipêçe û dide Reşîd. Jê re dibêje niviştê têxe dawa keçîkê dê keçîk bersiva te bide û dê ji te ra bibite yar. Lewra bandora vê niviştê gelekî zêde ye. Tu wê niviştê bikî dawa pîreke weke min jî dê bibe dildara te. Reşîd

jî kaxezê digire û dikete dawa Amine Xanê. Amine Xan niviştê ji dawa xwe derdixe û dide Reşîd. Jê re dibêje ma te bawer kir ku niha têsîra wê heye. Baş hilgire bila ji bo hemû cara kêrî te bê. Reşîd dîyarîya wê genim didetê û çîrok xelas dibe. Bunyatê Vegêran.

### **Xiştê 10.** Xiştê Binyatê Vegêranê di Çîroka Niviştê Amîne Xan

	<b>Vegêran</b>	<b>Vegêr</b>	<b>Zeman</b>	<b>Mekân</b>	<b>Zîq/Zîqbûn</b>	<b>Deng</b>	<b>Saloxdan</b>	<b>Kesayefî</b>
Niviştê Amîne Xan	Babetî. Niviştê Amîne Xan	Hemî tişt zan, şexsê sêyeme	Havîne Flaşbac	Gundê Qacir û Kanîpankê, mala Amine Xan, çemê Tetehû û benderên derdorê.	Zîqbuna sabit	Yekdengî	Rewşa Amîne Xan	Amîne Xan, Reşîd, Şêx Ehmed

### **Vegêr**

Vegêr ji mudaxele û otorîtayê gelek hez nekirîye û xwe bi paş ve kişandîye. Lewra vegêrekî sergirtî ango vegêreke hemî tişt zan û bê teref li ber me ye. Her çiqas sergirtî be jî ji derûnîya karakterên xwe da agahdar e lewma gotara nerasterast heye. Dîsa ji ber ku axaftinên karakteran rasterast qiset dike gotara rasterast jî tê da heye. Bi rewşa vegêrana şexsê sêyem vegêr çîrokê qiset dike.. "... *Gelek tê neçû gihîşte nêzik, temaşe kir Reşîdê Mam Ebas ku bavê wî dewlemendê herî mezin ê Qacir e, bi tenê li wir e û bi bêhnfirehî didêre, çend benderên mezin sor kirine ji genim.*<sup>361</sup> Ji ber ku ne karakter e, vegêrekî nedramatîzekirî ye. Ji gotara vegêr û ji gotara karakteran pêk tê. Vegêrana babetî li wir derdikeve pêşîya me.

Ji aliyê monologa ve vegêrî qet cih nedaye monologa lehengan. Ne monologa rastewxu tê da heye ne jî ya nerastewxu. Vegêrî fikr û ramanên lehengên xwe bi rêya diyalogên wan vegotîye.

### **Zeman û Mekân**

Dem, dema niha ye. Bi rîya flashbackan diçe dema Şêx Ehmed. Em ji daneheva genim tê derdixin ku demsal havîn e. Vegêr ji bo qisetkirina zeman, xwe

<sup>361</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 80.

gelek neêşandîye. Lê bûyer bi awayekî kronolojî û zincîreyî hatine qisetkirin. Pêşîyê bi rêya flaşbakê qala paşerojê kirîye û paşê hatîye ser dema niha.

Mekânêkî çêkirî li ber me ye. Di vir da jî vegêr çî xwestibe em bi wê dizanin. Mekân wek bêndereke gundê Qacir, gundê Qacir û Kanîpankê, mala Amine Xan, çemê Teteû û benderên derdorê ne.

### **Zîq/Zîqbûn**

Zîqbûneke sabit heye. Bûyeran em bi bergeha Amine Xanê dibînin. Lewra yek zîqera me heye.

### **Deng**

Ji alîyê rêzimana karakteran yekdengî heye hemû karakter jî bi devokekê diaxivin. Vegêrana derveyî metnê/heterodîgetîk heye. Vegêr ne karakterekî çîrokê ye.

### **Saluxdan**

Çîroka Nivîştî Amîne Xan da vegêrî ji aliyê saluxdan ve gelek mînakên serkeftî daye. *"Her çend, gelek sal û heyv di ser re çûbûn têsîr li dimêna wê kiribû û hinarkên wê sîs, memikên wê fiş, çena wê qermiçî, mûyên spî ketibûn serî û didanên wê reş bûbûn. Lê weke tiriye Nerabê heya ku xwe bi xwe taltir dibe, ev jî nava wê zêde germ bûbû û agir ketibû dilê wê...."* <sup>362</sup> *"Kurtanê kera xwe lê kir û lê siwar bû. Çû bi ber benderên Gundê Qacir ve. Dema bi hevrazê Kanîpankeyê ve hilkişiya, di deştê de -gelek nemabû ji Çemê Teteû re- benderê mezî dît. Bi dilekî xweş û hêviyekemezî ker ajot ber bi benderê ve."* <sup>363</sup>

### **Kesayetî**

**Amine Xan:** Karaktera serekî ye û keça Şêx Ehmed e û qet ne zewicîye. Yeka nexwende ye lê bi aqil e. Bi mantiqî tevdiqere. Ji henekan hez dike. Jêhatî ye. Zimanê wê xweş e. Herdem diayan ji xelkê re dike.

<sup>362</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 78.

<sup>363</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 79.

**Reşîd:** Xortekî gund e û ev jî kesayeteke serekî ye. Em ji axaftinên wî tê derdixin ku bawerîya wî bi niviştan zehf heye. Evîndarekî nîvco ye.

**Şêx Ehmed:** Bi çêkirina niviştan pêştir bi çî karî ve mijûl nîne. Nexwende ye. Lê ji ber ku şêx e her kes jê bawer dike.

Hin karakter hene ku tene bi navê xwe di çîrokê da cih digirin yanî karakterên lawekî ne. Vegêrê me ew nedayîne axaftin. Tenê di du-sê deran da jê re lazim bûne. Di wan deran da jî qet cih nedaye axaftinên wan. Ew karakter birayên Amîne Xanê û dayîka Amine Xanê ye. Û herwusa navê Xecê jî di çîrokê da derbas dibe ku xwîşka Reşîd e.

#### **2.4.11. Hêkên Hadî Xanî**

##### **Kurte**

Lehengê me ji rejîma dîktator û kevneperest direve. Lewra destpêka çîrokê bi vî şiklî ye. Hevaleke wî, lehengê me dispêre zilamekî baş ku wî bi rê bike. Dikevine rê, piştî çend xulekan cenderme wan rawestînin. Lehengê me gelek ditirse. Dibêje qey hatine wî bigirin. Lê ne wusa ye. Cenderme daxwaza pereyan ji wan dikin. Her kes perê xwe derdixe dide cendermeyan ji bilî xortekê. Ev xort dike qîre qîr. Pare li cem wî çûnîn in ku bidete wan lewra di şûna wî da hevalê lehengê pera dide. Cenderme perayan digire û cardin dikevine rê. Digihêne çayxane ya (...) ku ew çayxane ya hevalê wî ye. Lehengê ji vêrê pê ve ji wî hevalê xwe ve jêkve dibin û berê xwe ber bi çîya ve dide. Êdî ji bo ku xwe veşêre li çîya dimîne. Bi roj ji bo ku cenderme, polis wî negirin diçe baxên ji avahîyê dûr. Piştî çend rojan pismamekî jina wî ku zilam yekî Sîneyî ye tê cem wî. Ew jî ji rejîma dîktator û kevneperest revîyayî ye û yekî xwendevane. Bi hev re li çîya dimînin. Li wir xortek bi navê Evrehman heye ku li baxên wan daran dinêre. Dema ew diçe bajar lehengê me perayan didetê da ku ji wan re jî hind tiştan û hêkan bikire û bîne bide wan. Dema nanê wan tîne ji wan re dibêje min ji we re çî hêk anîne, eyn wek hêkên Hadî Xanî ne. Meselê jê dipirsin ka ev hêkên Hadî Xanî çî ne? Evrehman jî behsa vê meselê dike. Hadî Xan axayê gunde. Ji hemû gundîyan tişt û miştan dixwaze. Her kes tişteki dibe. Ji kesê feqîr jî hêkan dixwaze. Ew jî ji wî ra hêkan dibin. Lê Hadî Xanî çûye textek qul

kirîye û hêkan di wir ra derbas dike. Hêkên ku derbas nabin werdigire yên ku derbas dibin wernagire. Ji hingê ve ji hêkên mezin ra dibêjin hêkên Hadî Xan. Rojekê dayîka Evrehman jî ji bo Axa hêkan dibe. Dema hemû hêk di qulê ra derbas dibin, xulamê Axa wan hêkan tevan di serê dayîka wî da dişkîne ji ber ku hêk biçûk in. Wextê Evrehman vê dibihîze, diçe ku li Axa bixe lê ji ber ku ew ne li wêrê ye ev jî xulamê wî dixê. Paşê birina hêkan xelas dibe heta ku desthilatdarîya Dr. Misedîq. Wextê desthilatdarîya wî xilas dibe Hadî Xan dîsa dest bi komkirina hêkan dike û zilma xwe zêde dike. Ji bajêr cendermeyan tîne da ku Evrehman bigirin. Evrehman direve û şûna wî da birayê wî digirin. Evrehman jî ji gund direve tê wir û dest bi karê baxevantîyê dike. Çîrok bi axaftinên ji bo çareserkirina van meseleyan xilas dibe.

### Xiştê 11. Xiştê Binyatê Vegêranê di Çîroka Hêkên Hadî Xanî de

	Vegêran	Vegêr	Zeman	Mekân	Ziq/Ziqbûn	Deng	Saloxdan	Kesayetî
<b>Hêkên Hadî Xanî</b>	Navxweyî Homodiegetîk	kêm tişt zane, şexsê yekeme	Meha Ranemezê, Flaşbak lezandin cangiranî	Kirmanşa, gundê Nişur, çemê Gavero, çîya, bax, tîrembêl e	Ziqbuna hevpar	Yekdengî	Wesfa tebiyet	Leheng, Hevalê leheng Evrehman, Xortê Sîneyî

### Vegêr

Vegêr çîroka xwe bi şewazekî dengbêjkî û bi şeweya ceribandîne vegotîye. Herdu şewe bi hev ra bi kar anîye. Weke ku em li cem wî ne û ji me re vedibêje. Lewra herdem cînava te û tu yanî cînava kesê duyem bi kar anîye. Me mudaxillî çîrokê dike ka em çîrokê bi mantiqî dixwînin an na? Weke tê xuyakirin vegêrê me vegêrana şexsê yekeme. Yanî leheng di heman demê da vegêr e. " *Ez serê te neêşînim, ez bi xwe jî nizamî cara çendan e ji destê rejîma dîktator û kevneperest min bazdida. Hevalekî min ê baş li Kirmanşahê ez spartim zilamekî heja da ku min bi rê bike....* " Lewra vegêrekî dramatzekiri ku karakterekî çîrokê ye li ber me ye. Û dîsa hem ji ber vê yekê hem jî ji ber ku vegêr ji derûnîya karakterên din ne agahdar e, gotara nerasterast tê da çûnîn e. Lê gotara rasterast heye. Dîyalogên karakteran rasterast vegotîye. Vegêrekî vekirî ye. Mudaxele yî fikra çareserkirina rejîma dîktator dike di dawîya çîrokê da. Û bi zanîn hin tişt veşartîye. Cihê navê wan sê (...) xal

danîye. Wek navê bajar, gund, çem... lê navê hin deran neveşartîye ji me ra gotîye. Herwusa di vê çîrokê da jî wesif ango saloxdan jî derbas dibe.

Monolog tê da gelek nehatine bikaranîn. Bi tevahî em bidine berhev bi zorê du, sê cihî da monolog hatibine bikaranîn. Ji ber ku vegêrê çîrokê şexsê yekem e monologa rastewxu li ber me heye. "... Min di ber xwe de got: ' Ya Rebî xêr be, em ji agir rizgar bûn bi ser maran de ketin. " <sup>364</sup> Ha monologên ku di çîrokê da cih digirin eyn di vî rengî da ne.

### **Zeman Mekân**

Dema çîrokê tam ne dîyar e. Em nizanin sala çenda ye. Lê em dizanin ku meha Remezanê ye. Roj jî ne dîyar in. Wek rojek, êvar, sibê... hatîye gotin. Bûyer bi awayekî zincîreyî derbas dibin. Tenê ji bo mesela Hêkên Hadî Xan serî li falşbakê dixê vegêrêm me. Nivîskarî herdem lezandî û borandîye, tevger derxistîye pêş. Tenê di tirembêlê da vegêrê me li çîyayan cangiran bûye, li ser wesifkirina wan rawestîyayî ye û xwe bi hin balkêşîyan re mijûl kirîye.

Mekân li gor mebesta vegêr wek dekorekê kêlîyekê hatîye dîyarkirin. Mekân; Kirmanşah, gundê Nişur, çemê Gavero, çîya, bax, tirembêl e.

### **Zîq/Zîqbûn**

Di hin deran da şopa zîqbûna sabit hebe jî bi gelemperî zîqbûneke hevpar heye. Lewra vegêr vê yekê bi cînava em û me'yê dîyar dike. Dema vegotina mesela hêkên Hadî Xan em bûyeran bi bergea Evrehman dibînin, lewra em dikarin bibêjin zîqbûneke guherbar jî tê da heye. Lewra du zîqerên me hene. Leheng ku di heman demê da vegêr e û Evrehman e.

---

<sup>364</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 84.

## Deng

Bikaranîna zimanê karakteran, ferhanga wan a peyvan wekî yêk e. Lewra yekdengî heye. Vegêr di heman demê da karaktereke çîrokê ye, lewra homodîfegetîk e ango bi gotineke dî vegêrana subjectîv e.

## Saluxdan

Di çîroka Hêkên Hadî Xanî da vegêr di hin derên çîrokê da saluxdana xwezayê bi awayekî edebî û bi leyîstika peyvan xemilandîye. " *Em di newalekê re hilkişiyên. Bêhna gul û gulzaran miriv mest dikir. Ji teniştê newalê û bi heya serê gir bax û bistan bûn. Dar û devî weke dostên bi emek û hevbîr serê xwd gihandibûn hev, te digot qey bi hev dişewirin. Xweşik bûn û ciwaniya pelên şîn, bi xuşîna ba re bi ser hev de hilkişiyên, weke muzîka xuşe xuşa avê ya ku ji serê çiya dihat xwarê; mîna dewlemend û Xwedêdayan, li ser şanoya kubaran te digot qey sema dîkin û agahiya wan ji derd û mirina kesî nin e.*<sup>365</sup>

## Kesayetî

**Leheng:** Navê wî di çîrokê da qet derbas nabe. Yekî şoreşger e û lehengê serekî ye. Li ber rejîma kevneperest serî natewîne. Lewra heke bê girtin an dê bête kuştin an dê şikence lê bête kirin. Ji ber vê jî xwe vedişêre. Karakterekî dûz e, li gor ideolojî û hizr û bîrên xwe tevdigere.

**Hevalê leheng:** Yekî oldar tê naskirin lê me şaş dike. Mesela meha Remezane ye lê ew rojî nîne. Lewra me şaş dike hinekî. Alîkarîya lehengê me dike ji bo ku bireve. Li gor oldarên wê demê tevnagere lewra gilover e.

**Evrehman:** Ew ji ber zilma cendermeyan navê xwe vedişêre. Li ber zilmê serî radike. Alîkarîya leheng dike. Karakterekî dûz e.

**Xortê Sîneyî:** Ew jî ji ber rejîmê direve. Yekî xwenda û şareza ye. Di çîrokê da wek karaktereke lawekî, alîkar derdikeve pêşîya me.

---

<sup>365</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 86.



### 3.4.12. Ji bedêla Pereyên Bertîlê ve Xwendina Qur'anê

#### Kurte

Rezaî serokê cendermeyan e ji bo dewletê perayan berhev dike. Wê mehê jî divê pênsed tumenî bide hev û bide dewletê. Dike nake bi ser nakeve. Bi gel da jî çûnîne. Ji ber ku berhemên wan ên vê salê hêj neketîye destê wan. Bangî Hiseyn Qulî dike. Herdu ji hev dişêwirin û biryara li nav gundan gerandinê didin. Hiseyn Qulî çend cendermeyan dide gel xwe û dikeve rê. Pereyan ji xelkê distîne. Dibe êvar diçine li gundê Daregirdeleyê li mala Mam Elî dimînin. Şeveqê ji bo dest û rûyê xwe bişo diçe ser kanîyê. Ji malekê dengê Qur'anê têt. Hiseyn Qulî dibêje ka ez herim ev kes an mela ye yan hecî, seyîd tiştêkî wusa ye. Dibe ku şewqe jî li serê wî nebe lewra belkî hin pere têkevîne destê wî. Ji ber ku di qanûna dewletê da şewqe tiştêk mecbûrî ye û heke şewqe nebe ciza didin. Diçe hundur li benda Mela Kerîm dimîne da Qur'anê xelas bike. Jê re dibêje zû rabe em dê herin qereqolê. Sedema wê jî dibêje ku çima tu bê şewqe yî, bê çaket û bê pantelon î. Lewra divê tu bêy û em biçine qereqolê. Hemê Şerîf cîranê Mela Kerîm tête cem wan. Ji Hiseyn Qulî re dibêje şûna wî em pera bidin çê dibe. Hiseyn Qulî qebl dike û ji wan penc tumenan dixwaze. Lê pere wan li hev dernakeve. Du tumen kê in. Hiseyn Qulî dibê tiştêk nabe ji bedêla wan herdu tumenan jî bila Mela Kerîm ji dayîka min a ku mirîye Qur'anê bixwîne. Çîrok wusa xilas dibe.

#### Xiştê 12. Xiştê Binyatê Vegêranê di Çîroka Ji bedêla pereyên bertîlê ve xwendina Qur'anê

	Vegêran	Vegêr	Zeman	Mekân	Zîq/Zîqbûn	Deng	Saloxdan	Kesayetî
Ji bedêla pereyên bertîlêve xwendina Qur'anê	Babetî, Heterodîegtik	Hemî tişt zan, Şexse seyê	Berî cihanîyê duyem, cangirani şerê	qereqola Cendermeyan a Bokanê, gundê Hecîkent, Kanîtomar, Daregirdele, Turcan, Yeltemir, Yextecî, Behê, Mehabad, mala Mam Elî, mala Mele Kerîm.	Zîqbuna piralî	Yekdengî	wesfa lehenga	Giruhban Rezaî, Hiseyn Qulî, Mele Kerîm,

## Vegêr

Vegêr rewşa vegêrana babetî û şexsê sêyem e. "*Bîrkirina wî bi reng û tevgerên cendermeyan rast bû. Ji ber ku dewletê qanûnek derxistibû ku divabû hemû kes çakêt û pantelon li ber be û şivqe jî li serê wî be. Cil û bergên kurdî ku bergên neteweyî yên kurdan bûn, qedexe bû. Her yekî ku li ber ba li gor wê qanûnê tûşî gelek astengiyan dibû.*" <sup>366</sup>Vegêrekî sergirtî ye ango hemî tişt zan û bê teref e. Mudaxeleyî fikr û ramanên karakteran nekirîye. Di nav vegêranê da otorîteya wî xuya nake. Dest ji her tiştî berdaye û bûyer li gor axaftin û rewşa lehengan hatîye qisetkirin. Bi derûnîya karakteran dizane lewra gotara nerasterast heye. Dîsa ji ber ku dîyalogên karakteran rasterast qiset dike gotara rasterast jî heye. Vegêrekî nedramatîzekirî ye, di nav çîrokê da cih nagire lê hebûna wî tê hîskirin. Ji du gotaran ve pêk tê; gotara karakteran û gotara vegêr.

Em di vê çîrokê da zêde rastî li monologan nabin. Monolog kê hatine bikaranîn. Monologa ku heye jî ji aliyê cûreyê ve monologa nerastewxu ye. "... Fikirî û di dilê xwe de got: ' Ev her kî be yan mela ye yan hecî ye, seyîd e, tişteki wiha ye. Dibe ku şivqe jî li serê wî nebe. Ku wilo bê tişteki jê bi dest dikeve.' " <sup>367</sup>

## Zeman û Mekân

Çîrok berî Şerê Cîhanê yê Duyem rojekê saet heştê sibehê da dest pê dike. Vegêr ji serî heta dawî vegêranê bi cangiranî û bi awayeke rawestîyayî qiset dike ji bo ku bi hin balkêşîyan re xwe mijûl bike. Bi awayekî eşkere ji ser pirsgirêkên gundîyan nesekinîye. Lê ji ber ku zêde li ser armanca Rezaî û Hiseyn Qulî disekine bi xêra wê em derd û kûlên gundîyan fêr dibin. Bûyer bi awayekî kronolojîk û zincîreyî hatine qisetkirin.

Mekân li gor mebesta vegêr wek dekoreke kêliyêkê hatîye dîyarkirin. Mekân; Qereqola Cendermeyan a Bokanê, gundê Hecîkent, Kanîtomar, Daregirdele, Turcan, Yeltemir, Yextecî, Behê, Mehabad, mala Mam Elî, mala Mele Kerîm.

<sup>366</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 95.

<sup>367</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 95.

## Zîq/Zîqbûn

Em bûyeran pêşîyê bi bergeha Rezaî, paşê jî bi bergeha Hiseyn Qulî dibînin. Di nav bergeha Hiseyn Qulî da em rast li bergeha Hesên Axayê Hecîkent û ya Heme Şerîfê ciranê Mela Kerîm tîn. Lewra zîqbûneke guherbar heye. Ji ber ku heman bûyer bi zîqerên cuda cuda ve hatîye qisetkirin. Li ber destê me zîqbûneke pîralî heye.

## Deng

Bikaranîna zimanê karakteran, ferhanga wan a peyvan eynî ye lewra yekdengî heye. Vegêr ji ber ku ne karakterekî çîrokê ye, vegêrana derveyî metnê yanî vegêrana heterodîgeetîk heye.

## Saluxdan

Di çîroka Ji bedêla pereyên bertîlê ve xwedîndina Qur'anê da vegêr ji destpêka çîrokê heta cihê axaftina Rezaî saluxdaneke baş li ber me raxistîye. "... *Giruhban Rezaî, serokê Qereqola Cendermeyan a Bokanê, hate dayîreyê û çû odeya xwe, li pişt maswya xwe rûnişt. Cigareya xwe pêxist û bawîşkiya. Destekî xwe dabû ber çena xwe, bi destê din jî car caran cigareya xwe dixist nav lêvên xwe û mijeke tund lê dida, devê xwe vedikir, dûkel di pey hev re ji devê wî dibû rêz. Ji ser maseyê bi heya aqdê xetek weke pêçana mar kişiyabû. Te digot qey parçeyekî sersotê ye, şewitiye di nav menqelê zivistana mala feqîrekî de û dûkel dike.*" <sup>368</sup>

## Kesayetî

**Giruhban Rezaî:** Karaktereke serekî ye. Cenderme ye. Li ber zilma dewletê ji bo gelê xwe çî tiştî nake lewra zalim e. Dewlet çî karî bidete dike. Dilreş e. Ji canê xwe hez dike.

---

<sup>368</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 91.

**Hiseyn Qulî:** Karakterê serekî ye. Yaverê Rezaî ye. Ew hêj ji Rezaî jî zalimtir e. Ji fen û finasan hez dike lewra hîleyan li Rezaî jî dike. Keda gelê xwe zêde dixwe yanî yekî kedxwar e.

Ew kesên din Receb, Mele Kerîm, Metika Menîca, Seyd Hesên, Heme Şerîf, Mam Elî, Hesên Axa û Mîrza ev hemû karakterên alîkar û lawekî ne. Wextê ku dora wan hatîye ew jî derketine meydanê, rola xwe dîtine û paşê jî derketine.

#### **2.4.13. Ne Bi Dîtina Hecî Ne Bi Xewa Mizgeftê**

##### **Kurte**

Bayîz xortekî jîrek û li ser xwe ye. Li ber destê axa û koxeyan rencberîyê dike. Ji vî karî gelek acize. Sibê heta êvarî kar dike lê pareyên wî çûnîn in. Biryarê dide ku ev û jiyana xwe Xezal biçîne Seblaxê û li wir ji xwe re bixebitin belkî destê wan li wir bigihîje devê wan û pîçekê rehet û aram bibin. Û ew û jina wî radibin diçîne Seblaxê û Bayîz dest bi kar dike. Çi qas diçe karê wî baştir û mezin dibe. Tişt û miştan berhev dike û dibe gundan difiroşe. Bi vî şiklî dikanekê jî ji xwe ra vedike. Ji ber ku bi xelkê re rastgo ye her kes diçe cem wî pedivîyên xwe dikire. Li taxa Quleqeburan xanîyêkî dibîne û dikire. Li wir bi mirovên dîndar ra radibe û rûdine, lewra dest bi çûna mizgeftê dike. Li wir Hecî Rehîmî nas dike. Pê re dibe heval. Rojekê Hecî ji Bayîz ra dibê wa ye tu dewlemendî ma çima tu ji xwe ra jineke din nayînî? Hem dê alîkarîya jina te jî bike hem dê li ber zarokan û mêvanan be. Hûn wusa gelek nawestî jî. Bayîz di serî da qebûl nake lê paşê ya wî dike û keça pismamekî Hecî Zeba ji xwe tîne. Bianîna Zeba kar û barê Xezalê girantir dibe û Zeba gelek qîje qîjê li ser Bayîz û Xezalê dike. Êdî her roj li malê şer û pevçûn heye. Lewra Bayîz radibe diçe mizgeftê ji bo razanê. Di mizgeftê da dibîne ku Hecî Rehîm jî li wir e. Hecî ji halê wî fem dike ku ji pite pita jinên xwe hatîye mizgeftê. Hecî bi rûyeke nîvkenî dibê ma wusa dibe ku ez her roj tenê li vir bim û li wir razem. Xwedê qebul nake vê yekê, divê hevaleyê min jî hebe. Bayîz hindî ku ji Hecî Rehîmî aciz bûye bêdeng dibe. Lê Hecî Rehîm dîsa digel wî diaxive û jê ra dibêje niha razê sibê em dê bi axivîn. Bayîz jî dibêje eger îşev li min bibe sibe, ne bi dîtina Hecî ne jî bi xewa mizgeftê û çîrok wusa xelas dibe.

### Xište 13. Xišta Binyatê Vegêranê di Çîroka Ne bi dîtina Hecî ne bi xewa mizgeftê

	Vegêran	Vegêr	Zeman	Mekân	Zîq/Zîqbûn	Deng	Saloxdan	Kesayetî
Ne bi dîtina Hecî ne bi xewa mizgeftê	Babetî, Heterodiegтік	Hemî tişt zan, şexsê sêyem	Dem ne diyare, lezandiye	Mala Bayîzî, gundê Gêçawa, Berdeşaqon, Seblax, gundê Şarewêran, mala wan a li taxa Quleqebanê û mizgeft e.	Zîqbuna sabit	Yekdengi	Rewşa lehengan	Bayîz, Xezal, Zêba, Hecî Rehîm,

#### Vegêr

Vegêrekî sergirtî, hemî tişt zan û bê teref li ber me ye. Qet mudaxeleyê li lehengan û bûyeran nake. Otoriteya xwe dihêle li derveyî çîrokê. Çîrokê bi rewşa vegêrana şexsê sêyem qiset dike ango vegêrana babetî ye.. " *Xezalê jê re dagirt. Te digot belkî Bayîz rojiya xwe dişkîne, cigareyeke din pêça, pêxist, weke ku di bîrkirina xwe de gihîştibe biryara dawî, hilmekê din bi tundî li cigareya xwe da, bi pêkenîneke sar got:...* " <sup>369</sup> Lewra vegêrekî nedramatîzekirî ye. Vegêr her çiqas xwe dabe alî jî ji derûnîya karakterên xwe hayedar e, lewra gotara nerasterast heye. Û dîsa ji ber ku gotinên wan rasterast gotîye gotara rasterast jî tê da heye. Gotara serbest a nerasterast bi navekî din monologa vegêranê heye. Ji ber ku gotin û ramanên karakteran ji çarçove û xulaseya vegêr azad e. Ji gotara vegêr û ji gotara karakteran ve pêk têt.

Ji aliyê monologê ve monologa nerastewxu heye. "... Xezal carekê di dilê digot: ' Dibe ku berpîrsê wî pêv çûbe.' Carna jî digot: ' Bi van rojên dirêj karê heriyê kiriye, bêhêz û hêlak bûye.' Dilê wê hebû jê bipirse, lê poşman bû, got her çibe bila bibe ez neyînim bîra wî çêtir e. " <sup>370</sup>

#### Zeman Mekân

Dema çîrokê tam ne dîyar e. Vegêr wextê ku feqîrî û hatina Bayîzî ya Seblaxê qiset dike û dilezîne, wan deman zû diborîne û bi zanîn gelek li ser wan rojan

<sup>369</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 98.

<sup>370</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 98.

namîne. Li ser rojên wî yên dewlemend bi cangiranî bûyeran bi awayekî zincîreyî qiset dike.

Mekân li gor mebesta vegêr wek dekorekê kêlîyekê hatîye dîyarkirin. Mekân; mala Bayîzî, gundê Gêçawa, Berdeşaqon, Seblax, gundê Şarewêran, mala wan a li taxa Quleqebzanê û mizgefte.

### **Zîq/Zîqbûn**

Em bûyeran bi bergeha Bayîz dibînin lewra zîqerekî me û zîqbûneke sabît heye.

### **Deng**

Bikaranîna ziman a karakteran, ferhanga wan a peyvan wek hev in lewra yekdengî heye. Vegêr ji ber ku ne karakterekî çîrokê ye, vegêrana derveyî metnê yanî vegêrana heterodîfegetîk heye.

### **saluxdan**

Di çîroka Ne bi dîtina hecî ne bi xewa mizgeftê da saluxdanek xweş hatine kirin. Hem li ser lehengan hem jî li ser derûdorê û li ser tevgerên lehengan sekinîye. "*Xezala jina wî şorba bi hêk çêkiribû, jê re rûkir. Bayîz du-sê nan hûrkir şorbê. Heya Xezal agir kir û bi çayê ve mijûl bû. Bayîz ji nêza bi xwe jî nizanîbû çawa ew pillor xwar.*"<sup>371</sup>

### **Kesayetî**

**Bayîz:** Karakterê serekî ye. Xorteke jîr û jêhatî ye. Yekî xweragir e. Çi têxe serê xwe dibe serî. Heta derekê me şaş nake lê bi anîna jina duduyan me şaş dike lewra gilover e.

---

<sup>371</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 97.

**Xezal:** Jina Bayîz e. Jineke dilsoz, dilrehm û sernerm e. Karakterekê dûz û lawekî ye.

**Zêba:** Jineke serhişk û zalim e. Herdem û daîm zilmê li Xezalê dike û bi ser Bayîz da jî herdem dirdirê dike. Karaktereke dûz û lawekî ye.

**Hecî Rehîm:** Ev jî karaktereke serekî ye. Di serî da yekî dîndar tê xuyakirin ji ber ku her şeweq berî her kesî li mizgeftê ye. Di dawîyê da em fêr dibin ku ji ber ku du jinên wî hene û çî xweşîyê ji destê wan nabîne û ji ber vê çendê zû tete mizgeftê. Karakterekê dûz e.

#### **2.4.14. Çaya Dîwanxanê**

##### **Kurte**

Mîrza Rehman Axa berê bazirganeke ku qumaşan difiroşe. Ji devla deynê xwe ji Heme Salih Xan Gundê Qacir distîne. Dibe axayê wir lê tu kes wî wek axa nahesibîne. Ew jî dixwaze wekî her axayî bila pesindayîna wî jî hebe, bila xelk jê re hurmetkar bin. Lewra diçe ji xwe re diwanxaneyekê çêdike. Êdî her kes têt lalê wî. Serî jê bernedan. Herdem û daîm çaya wî hazir e ji mêvanan re. Çî feqîr çî dewlemend ji her kesî re çay amadeye. Rojekê ew û jina xwe hesab dikin ku mesrefa wan gelek diçe. Ji du heftîyan carekê çay û şekirê dikirin. Bi vî şiklî çênabe divê destê xwe li parên xwe bigirin. Lewra Axa diçite diwanxaneya xwe û bi xulamê xwe Resu ra diaxive. Dibêje wextê ku min got çayê bîne, tu zû bi zû çayê neyîne. Car caran were bibêje axa şekir nemaye ez dê biçime malê şekirê bînim, çay xelas bûye, av hêj nekelîya ye û hwd. Ew jî dibêje tamam. Bi vî awayî çay û şekirê xwe di destê xwe da dihêlin. Rojekê cenderme tene gund. Axa diçe xêrhatinê li wan dike û wan tîne dîwanxaneya xwe. Gazî Resu dike ku ji wan ra çayê bîne. Resu dibe şekir çûnîn e, dem çûnîn e, av nekelîya ye û hwd. Ew çî qas dibêje çayê bîne Resu van tiştan dibêje. Axa ji tirsî cendermeyan ew maye ku bimire. Radibe diçe cem Resu dibêje kuro zû çayê bîne bi dîn û îman ez rast dibêjim zû çayê dagire û bîne. Û çîrok bi vî rengî xilas dibe.

**Xiştê 14.** Xiştê Binyatê Vegêranê di Çîroka Çaya Dîwanxanê de

	Vegêran	Vegêr	Zeman	Mekân	Zîq/Zîqbûn	Deng	Saloxdan	Kesayetî
Çaya Dîwanxanê	Babetî, Heterodîegtik	Hemî tişt zan, şexsê sêyem	Dem ne diyare	Gundê Qacir, mala Mîrza Rehman Axa, dîwanxa, Mehabad û Seblax e.	Zîqbuna sabit	Yekdengî	Xweza û tevgerên lehengan	Mîrza Rehman Axa, Resu, Xanim

## Vegêr

Vegêrekî sergirtî ango hemî tişt zan û bê teref li ber me ye. Mudaxeyê li lehengan û bûyerê nake. Otoriteya xwe li derveyî çîrokê dihêle. Çîrokê bi rewşa vegêrana şexsê sêyem, vegêrana babetî ve qîset dike. "... *Êdî wî çaxî bi pereyên sê-sal qend û çayê çar jî rizgar nabe. Weke ku mar bi Mîrza Rehman Axa vede, yekser bazda hêwanê û bi sebir got:...*"<sup>372</sup> Lewra vegêrekî nedramatîzekirî ye. Vegêr her çiqas xwe dabe alîyekê jî ji derûnîya karakterên xwe hayedare, lewra gotara nerasterast heye. Ê dîsa ji ber ku gotinên wan bi awayeke rasterast gotîye, gotara rasterast heye. Gotara serbest a nerasterast/monologa vegêranî heye. Ji ber ku gotin û ramanên karakteran ji çarçove û xulaseya vegêr azade. Ji gotara vegêr û ji gotara karakteran ve pêk têt.

Ji alîyê monologê ve monologa nerastewxu heye. "... *di dilê xwe de digot: 'Şendê ji mendê ne kêmtir e, çiqas ez berê Mehabadî û qumaşfiroş jî bim, niha ez derebegekî tamam im. Ji şeş beşên vî gundî berpirsiyar im û kesek ji min mezintir nîne. Ya herî baş ewe dîwanxaneyekw min hebe da ku malên hejar ji min bitirsin û axa û beg jî henekên xwe bi min nekin.*"<sup>373</sup>

## Zeman Mekân

Dema çîrokê ne dîyar e. Em nizanin kîjan sal e, kîjan demsal e? Em di kîjan mehê da nin û çendê rojê ye? Ji vî alîyî ve vegêr me agahdar nekirîye. Lê bûyeran bi awayekî kronolojîk vedibêje. Vegêr bi zanîn li ser rojên axatîya dîwanxaneyê rawestîyayî ye.

<sup>372</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 109.

<sup>373</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, r. 104.



Mekân çî cudahîya wan çûnîn e. Mekân wek dekora kêliyêkê hatîye çêkirin. Mekân; Gundê Qacir, mala Mîrza Rehman Axa, dîwanxaneyê wî, Mehabad û Seblax e.

### **Zîq/Zîqbûn**

Em bûyeran bi bergeha Mîrza Rehman Axa dibînin, lewra zîqerekî me û zîqbûneke me ya sabît heye.

### **Deng**

Bikaranîna zimanê karakteran û ferhanga wan a peyvan eynî ye lewra yekdengî heye. Vegêr ji ber ku ne karakterekî çîrokê ye, vegêrana derveyî metnê yanî vegêrana heterodîgeetîk heye.

### **Saluxdan**

Di çîroka Çaya Dîwanxanê da ji aliyê saluxdana xweza û derûdorê li gor çîrokên dî ne tîje ye. Di vê çîrokê da vegêr bi giştî li ser girêya tevgerên lehengan rawestîyayîye. " *Çayêcî, çayê dadigirt, piyaleya çayê didanî ser sêniyê û çend qend didanî ber. Yekî ji nokeran radihiştîyê û dibir hundir. Ji aliyê serî ve dest pê dikir û li ber mêvanekî didanî. Dîsa dihat piyaleyêke din dibir.*"<sup>374</sup>

### **Kesayetî**

**Mîrza Rehman Axa:** Kesayetê serekî ye. Pêşî yekî bazirgan e paşê dibe axa. Dema bazirgane yekî rastgo ye lê piştî ku dibe axa dibe yekî derewîn. Lewra me şaş dike karakterekî gilover e.

**Resu:** Ev jî karakterek serekî ye. Çaycîyê Axa ye. Ji bo wî çawa baş be wilo tevdigere.

---

<sup>374</sup> Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parek*, r. 104.

**Xanim:** Jina axa ye. Der heqê wêdaem zêde tiştekî nizanin lê ji ber axaftinên bi mêrê xwe re dike em dikarin bibêjin ku jineke destgirtî ye. Karaktereke duze.



### 3. ENCAM

Di dawîya lêkolîn û encama vê tezê da mirov dikare bi kurtî li ser layenê teorîk û praktîkîyên vê tezê bisekine û encamên vê tezê em dikarin bi vî qaydey destnîşanbikêyîn.

Di pênasandina vegêranê de pênasêyêke taybet, hevpar û destnîşankirî nîne. Dibe ku çendin pênasêyên cur bi cur bi dîtin û nêrînên taybet ên rêbaz û pirtûkxanên edebî hatibe çêkirin lê her yek bi nêrin û pisporîya xwe pênasêyêkê çêdike. Di encamê de ez ghiştime vê qenaatê ku vegêran rêxistina çîrokê ye. Her wisa zaravaye vegêranê bi wateya li dûv hatina serhatî û serborîyan e ku vegêr rolî di gihandina vê pêvajoyê de dibîne. Dîsa vegêran kerestêyêke girîng û serkeftî ye di bingeha deqî de. Vegêran ji bo avakirina berhemên edebî, dîyarkirina rûyê ciwanê berhemî, afirandina deqên taze û teknîkên serpehatîyan alaveke girîng û serekî ye.

Dîsa derheqê curên vegêran û dabeşkirina wan weke rewteke dîrokî û serdemên kevin heya niha tu senifandinek destnîşankirî ji bo cureyên vegêranê ji aliyê zana û lêkolîneran ve nehatîye çêkirin. Tenê hinekan ji aliyê pêkhatî, demî xûdî û babetî ve dîyar kirine.

Vegêrên hemû çîrokan ne vegêrekî ku ji otorîtey an hez dike ye. Her çiqas di hin çîrokan da otorîteya wî dîyar bike jî ne wusa gelege. Otorîteya xwe di dawîya çîrokan da daye axaftin û evqas. Vegêrekî ne gelek vekirî ye. Xwestîye xwe veşêre û rola vegêrê sergirtî bigire lê dîsa jî di peyama çîrokan da xwe daye dest. Trajedîyên di nav civakê da heyî car caran bi awayekî subjektîf car caran jî bi awayekî objektîf vegotîye. Em kîjan çîrokê bixwînin li rastî êşa dilê civakê, birçîbûna wan dibin. Ji her aliyê ve civak dikeve, rewşa wan herdem ne başe, xirabe. Ji ber vê çendê ye ku vegêr herdem mudaxeleiyê peyama çîrokê kirîye. Li gor îdeolojî û hizr û bîra xwe peyam vegotîye.

Dema rewşa vegêrana babetî şexsê sêyem ku derheqê lehengan da her tiştî dizane; leheng çima xemgîne, ji bo çi hin tiştan vedîşêre naxwaze bibêje, ji çi hez dike, ji çi hez nake, li çi difikire, li çi nafikire, îdeolojîya wî/ê çi ye? Hema tu bibêjî çi her tiştî dizane. Lewra ji vî aliyê ve gotara nerasterast li ber me heye. Dîsa di vê

vegêranê da ji bilî du-sê çîrokên vegêrî mudaxele-yî dîyalogên karakteran nekirîye. Wan çî gotibe rasterast neqil kirîye, lewra gotara rasterast jî tê da heye. Rewşa vegêrana şexsê yekem ango vegêrana subjectîv da vegêr me kêmtîştî dizane. Ew jî wek me ji bilî derûnîya dilê xwe derûnîya karakterên dî nizane. Kî û kê çî bibêje wê dizane. Yanî vegêrekî kêmtîştî zane. Vegêrê ku bi heman tiştî dizane bûyeran bi bergehê çend karakteran vedibêje. Cînavê em/me bi kar tîne. Wek em çûn, me dît, ji me re gotin. Lewra zîqbûneke hevpar e. Karakterên me çî dizanin ew jî wê dizane. Ne kêmtîştî ne zêde her du alî jî heman tiştî dizanin. Monologên karakteran wek gotara serbesta nerasterast bi navekî din bi monologa vegêranî vegotîye. Mînak di çîroka *Kenê Parsek* da zêde cih daye vê cûre monologê. Bûyeran bi awayekî kronolojî vedibêje. Bi rêka flashback/paşveçûnê qala demê bûyerên berê dike. Dîsa bi rêka flashforward/pêşveçûnê behsê dema rojên bihên/bê dike. Lê weke ku serî li flaşbakê daye kêmtîştî cih daye flashforwardê. Çî ku ji bo vegêr meselên berê girîng in. Ji ber ku êşa niha bi birîna berê ve girêdayî ye. Vegêr dibê em birîna berê baş nekin êşa me ya niha çî carî rehet nabe. Lewra bi hûrûgulî li ser van mijaran sekinîye. Taswîrên berfireh kirîye ji bo van birînan. Lê mijarê ku bi vê birînê ra ne alaqedar in, vegêr serê xwe bi wan meselên biçûk neşandîye û lezandîye ango borandîye. Bi canê sivik ji ser wan ra derbas bûye. Ji bo vegêr dîroka deman gelek ne girîng in, qet serê xwe pê neşandîye. Kengî li ser dîrokê sekinîye? Wextê ku dîrok ji bo mijarê girîng dibe ew jî qala dîrokê dike. Wek berî Şerê Cîhanê yê Duyem, Şerê Cîhanê yê Yekem, sala 1941.

Ji alîyê bikaranîna ziman ve ferhenga peyva ya hemû lehengan nêzî hev e yan jî eyn wek hev in. Lewra di hemû çîrokên da yekdengî serdest bû. Bi dîtina min çîrok ji vî alîyê ve lawaz mayîne. Çî ku metneke pirdengî ji ya yekdengî dewlemendtir û ji alîyê figûr û hêmanên edebî ve têr û tijetir e. Ev kêmasîyeke çîrokên bû. Vegêranê bi cûreyên vegêrana derveyî metnê/heterodîgeetîk û vegêrana nav metnê/homodîgeetîk vegotîye. Trajedîyên nav civakê bi zimenekî edebî vehandîye. Hetta di hin çîrokên da rewşa civaka bîndest, hevî şikestî bi awayekî pêkenokî li ber me raxistîye. Zimanê ku karakteran bi kar anîye bi gelemperî di erka ku karakteran tevbigere hatîye bikaranîn. Çî ku karakterê ku axaftîye ji yê hemberî xwe ra rêka axaftinê vekirîye. Lewra tevgera axaftinê bi vî şiklî devam kirîye. Dema ku dor tê peyama çîrokê vegêr bi zimaneke edebî peyama çîrokên li nav hevokên lehengan belav dike. Peyama

tevahîya çîrokan; axa, koxe, cenderme ev kes hemû nokerên dewletê ne. Xayîne welatê xwe ne. Ji bilî xwe çî kesî nafikirin. Pare ji bo wan ji her tiştî girîngtir û hêjatir e. Ji bo pareyan dişên namûsa xwe jî bifiroşin. Ew kesên ku dewlemend in jî xayîn in wek bazirganan. Ew jî sibê heta êvarî difikirin ka em çawa bikin û bi hîleyan malê xwe zêde bikin? Fen û finas, fêl hemû li dora wan digere. Çî kesê ji wan bidelet û biwijdan kar nake û hemû ji xwe ra nin. Xebera wan ji cîranê wan yê nîn e. Lê wextê tê ser xeberdanê/gotinê ji wan misilmantir, ji wan welatparêztir çî kes jî çûnîn e li gor wan! Vegêr vê yekê gelekî xweş anîye ziman. Peyam madem em xwişk û bira ne, em yê hev in! Çîma parçeyekî Kurdistanê birçî, lawaz, nezan e? Çîma alîyê dî têt, şareza û li pêşe? Ma biratî eve? Ma qey em jî ne kurd in? Em jî ne li Kurdistanê ne qey? Ma cihê wan tenê ye Kurdistan? Welatê wan Kurdistan be, welatê me çîye? Ew jî parçeyekî Kurdistanê ye. Qey em neynûk bûn ku me jê kirin û avêtin. Peyama sereke ya hemû çîrokan eve. Karakterên hemû çîrokan ji rêzê ne. Hemû kesên têkçûyî ne. Hêvîşikestî ne. Ji bo pêşeroja xwe di nav endîşeyê da nin lê çî tişt ji destê wan nayê. Êşa hemûyan birçîbûna welate. Di welatê xwe da jîyana dîyasporayê dijîn. Di welatê xwe da ne lê sirgûnê welatê xwe ne. Ji her alîyê ve sirgûn in. Ji alîyê psikolojîk, fizîkî bi her awayî sirgûn û dilbirîn in. Di dilê xwe de çiqas vê jîyanê qebul nekin jî ji alîyê fîzyolojîk beyî destûra dilê xwe qebûl kirine.

Em dikarin ji bo çîrokên Hesên Qizilcî bibêjin ku ji alîyê xwendinê ve xwendevan/xwener acizîyê nakişînin. Dema mirov dest bi xwendina pirtûkê dike piştî du, sê xulakan çîrokên Hesên Qizilcî wan dixê bin bandora xwe û xwîner naxwaze dest ji van çîrokan berde. Zimanê wî zimanekî sade û herikbar e. Ji alîyê rêzebûyerê ve vegêr me di nav hemû çîroka da bi cih dike. Te digot qey ew bûyerên ku di çîrokan da diqewimin li ber çavên me diqewimin. Êşa her lehengî dibû êşa me loma. Dema ew xemgîn bûn, em jî dilêşî dibûn. Dema dikenîyan, ku ev yek gelek hindik be jî, em jî dikenîyan. Bûyer bi zimanekî edebî, bêasteng bi hev ve hatine girêdan. Her bûyera ku qewimîye bi xwe ra sedema xwe û beramberî vê sedemê bûyerên nû afirandine. Mînak ger di çîroka *Kenê Parsek* da tofan nerabûba û berf jî nebarîba dê Hemereş neçûba mala wî dewlemendî. Herwusa di çîroka *şehîdê zilmê ye kefen û şuştin jê re navê* da ger Piskê ji Cotkar re negotiba here belkî xêrxwazek nanekê bidete te, belkî Cotkar neçûba ber rehma Xwedê. Yanî bi kurtasî hemû bûyer wek zincîrekê bi hevra girêdayî ne. Yek ji wan zincîran kêmbibe dê kêmasîyek

derketiba holê. Lewra ji bo bûyeran em dikarin bibêjin her bûyer dewama xwe tîne holê û weke gilokeke berfê her mezin dibe, qet kêr nabe. Bûyer jî her wusa nin. Ji derve zelal in lê dema mirov dikeve nav wan tiştên cuda cuda fêr dibe. Ma derya jî ne wusa ye? Dema em ji derve lê berê xwe didenê, tenê aveke bê ser û ber xuya dike. Lê wextê ku em xwe berdidine nava dilê wê zindîyên gelek cuda dibînin: masî, gîya, marmasî û her wekî din. Lewra ji bo mirov hinê naveroka bûyeran bibe divêt pêşîyê xwe berde nava dilê wan.



## ÇAVKANÎ

- Ahmed, Necîb (1991), *Edebu'l-Etfa' l'Ilm we fen*, Daru'l-fikru'l-'Erebî, el-Qahîre
- Arezu Muhemed, Elî (2009), *Teknîk Le Romanekanî (Ebdullah Serac)Da*, Namey Master, Zankoya Selahedîn, Ziman û Edeba Kurdî.
- Aram Yusif, Îbrahîm (2012), *Binemayên Diramayê di Çil Hikayetên Mela Mehmudê Bayezîdîda da*, Çapxana Hawar, Dihuk.
- Arif, Hîtu (2010), *Kesayetî û Hesta Xwe Kêm Dîtinê*, Kovara *Metîn*, Hejmar 189, Dihuk.
- Aram Yusif, Îbrahîm (2015), *Vegêran û Giringtirîn Teknîkên wê Dikumela Kurte Çîroka (Ez wê Nakem) Ya Jaru Dihukî da*, Kovara *Zankoya Dihuk*, Hejmar 1, Berpenda 18, Dihuk.
- 'Ayşe Ze'rur û Su'ad Zemur (*Elbunye's-Serdîye* (2015), (*Ez-zeman-Elmekân-Eş-Şexsîyat*) *Fî'r- Rîwayet (Benî'l 'İsyân) lî Ehmîde'l 'Ebasî*, Camî'et Ebdu'r-Rehman Mîre.
- Baqir Cewad, Elzucacî (1980), *Er-rîwayetu'l-Îraqîye we Qezîyetu'r- Rîf*, Daru'l-Hurîye Lî't-Tîbae'l-'Ame, Bexdad.
- Cemal, Mîr Sadiqî (1376), *'Enasir Dastan*, Çapxaneyê Behmin, Çap Sum, Tehran.
- Cîrald, Birêns(2003), *El-Mustelehu's-Serdî*, Trc: 'Abid Xeznedar, El-Meclisu'l-E'la Lî's-Seqafe, Çapa yekem, Qahîre.
- Cibur, Ebdulnur (1979), *Elme'cemu'l-Edebî*, Daru'l-Îlîm Lî'l-Melayîn, Çapa Yekem, Beyrut.
- Celal, Mustefa (2007), *Vegêran Di Çîroka Kurdî da*, Kovara *Peyv*, Hejmar 40.
- Cêrmî, Hurson (1996), *Medxel Lî'd-Dîrasetu'r-Rîwaye*, Trc: Xazî Derwîş 'Etiye, Daru'ş-Ş'ûnu'l-Seqafiye'l-'Ame, Bexdad.

- Cîrald, Birins (2011), *Zaravên Vegêranê (Ferhenga Zaravan)* Wergêran Bu Zimanê Erebi: Abid Xeznedar, Wergêran Bu Zimanê Kurdî: Celal Mustefa, Çapxana Wezareta Rewşenbîrî, Çapa Yekem.
- Çinar Sedîq, Xazî (2008), *Arastên Teknîkê Di Şi'ra Nû Ya Kurdî da Devera Behdînan(Bedirxan Sindî) Wek Nimune*, Çapxaneyê Hacî Haşim, Çapa Yekem, Hewlêr.
- Celal Enwer, Se'îd (2009), *Teknîkê Gêranewê Le Romanî (Êwarey Perwane) ya Bextîyar Elî*, Çapxaneyê kemal, Suleymanî.
- Cotyar, Tewfîk (2007), *Biblografiya Rojnamegerî Kurdî le Rojhelatî Kurdistan û Derewe da (1980 – 1988)*, Çapxana Şivan, Silêman.
- Celal, Mustefa (2004), *Bîyavê Xwandinê( Çend Vekolînek Derbarey Çîroka Kurdî)*, Çapxaneyê Hawar, Çapa yekem, Dihok.
- Cuzêf Mîşal, Şerîm (1984), *Delîlu'd-Dîrasatu'l-Îslubiye*, Elcamî'îye Lî'd-Dîrasat we'n-Neşir we't-Tewzî', Çapa Yekem, Beyrut.
- Cîrar Cînît, Wayîn Bos (1989), *Nezerîyetu's-Serd Mîn Wichetu'n-Nezer Île'l- Teb'îr*, Trc: Nacî Mustefa, Daru'l-Beyza, Çapa Yekem.
- Celadet Alî, Bedirxan(2012), *BerTevnê Mehfurê*, Hawar, Çapxaneyê Belkî, Çapa Duyem, Hejmar4, Stenbol
- Cemîl, Saîb(2009), *Di Xew Da*, Ji Soranî bo Kurmancî Werger:Ziya Avci, Çapxana Avêsta, Çapa Yekem, Stenbol.
- Dildar Îbrahîm, Ehmed (2017), *Tîyur û Teknîkên Vegêranê Praktîzekirin Li Ser Romana( Alê Dî Yê Pirê)*, Çapxaneyê Hîvî, Çapa yekem, Dihok.
- Dayana, Dawbinfayir (1981), *Er-rîwaye we's-Sene'etuhu Kîtabetu'l-Rîwaye*, Trc: Samî Muhammed, Daru'l-Hurîye Lî't Tîba'e, Bexdad.
- Di Sedsaliya Wê de *Rojî Kurd 1913*(2013), Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.



- Ebdulmelik, Murtaz (1998), *Fî'n-Nezerîyetu'l-Rîwaye Behs Fî't-Teqnîyetu'l-Serd*, Metbe'etu'r-Rîsale, Kuwêt.
- Ebdulrehîm, El kurdî (1996), *Er-Rawî we'n-Nesu'l-Qisesî*, Daru'n-Neşir Li'l-Camî'at, Çapa Duyem, Mesir.
- Ebdullah, Îbrahîm (1998), *El-Bîнау'l-Fenî Li'r-Rîwayetu'l-Herb Fî'l-Îraq*, Daru's-Ş'ûnu'l-Seqafiye'l-'Ame, Çapa Yekem, Bexdad.
- Ebdulwehab, Elreqîq (1998), *Fî'l-Eserd, Dîrasa't-Tetbîqiye*, Dar -Muhemed Elî-Lîneşir, Çapa Yekem.
- Emîn Ebdul Qadir, 'Umer (2008), *Şi'rîyet Di Romanên Sidqî Hirurî Da*, Dezgehê Spîrêz, Dihuk.
- Ebdulrehman, Munîf (2006), *Tîşkêk Bû Ser Roman*, Wergêran Şîrîn. k, Çapa Yekem, Suleymanî.
- Ehmed Muhemed 'Elî, Siwan (2011), *Mukewînatu's-Serd –Fî'l-Qisesu'l-Etfal, Fî's Surîye-Nimuzecen (1969-2000)*, Daru'l-Tekwîn, Dîmeşq.
- 'Ebdulrehman Munîf, Muhemed Abid Elqewasîme (1998), *El-Bunyetu'r-Rîwayiye Fî Rîwayet ( Elîxdud Mudunu'l-Milih)*, Daru'l-Ye nabî' Lî'n-Neşir We't-Tewzî', Uman.
- Ebdulmelik, Murtaz (1989), *Elif Leyle we Leyle, Dîraseti's-Sîmaîye Tefkîkiye Li'l-Hikayetu'l-Hemal Bexdad*, Daru's-Ş'ûnu'l-Seqafiye'l-'Ame, Bexdad.
- 'Ebdul Qadir, Ebu Şerîfe u Huseyîn Lafî, Qiziq (2008 ), *Medxel Îla Tehlîlu'n-Nesu'l-Edebî*, Daru'l-Fikir, Çapa Çarê,'Uman.
- Esmâ, Derbal (2014), *Zemenu's-Serd Fî'r-Rîwayat Fezîletu'l-Farûq*, Rîsalet Macistêr, Camî'etu'l-Hac Xizir, Elcezaîr.
- Edwîn, Muyîr (1965), *Bîнау'r-Rîwaye*, Trc.: Îbrahîmu'l-Sirfî, Elmuesesetu'L-Misriye'l-'Ame Lî't-Telîf We'l-Ebna We'n-Neşir, Elqahîre.

- 'Ebdulrehman, Elbedewî (1973), *El-Zemenu 'l-Wicudî*, Darul- Seqafe, Beyrut.
- 'Ebdullah, Serac (1997), (Roman, Pênase, Binema, Têbînî), Kovara *Raman*, Hejmara 108.
- Eflatun (1974), Cumhuriyetu'l-Eflatun, Trc: Fuad Zekerîya, Elheye'l-Mesrîye'l-'Ame Lî'l-Kîtab, Misir.
- 'Ebdullah, Rehman(2014), *Binyatî Gêranewe Çend Lêkolîneweyekî Edebî Lebarey Çîrok û Romane Şi'ir*, Çapxaney Mukrîyanî, Çapa Yekem, Hewlêr.
- Emîn, Ebdulqadir(2010), *Tîyor û Teknikên Şirovekirna Romanê (Tîyor, Goşenêrînî, Muntac, Dîyalok)*, Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr.
- Eristutalîs (1973), *Fenu 'l-Şi'ir*, Trc: Ebdulrehmanu'l-Bedewî, Daru's-Seqafe, Çapa Dûyem, Beyrut.
- 'Ednan Xalid, *Ebdullah*, (1986), *E'n-Neqdu't-Tetbîqî't-Tehlîlî (Muqedîme Lî'd-Dîrasetu'l Edeb We 'Enasîruha Fî'z-Zewu'l-Menahicu'n-Neqdîye'l-Hedîse)*, Darul- Ş'ûnul- Seqafiyel- 'Ame, Çapa Yekem, Bexdad.
- Ferhad, Pîrbal (2000), *Mela Mehmûdê Bazîdî ( 1799-1867)Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsê Kurd e*, Çapxana Wezaretî Perwerde, Çapa yekem, Hewlêr.
- Ferhad, Pîrbal (1997), Çîrokekanî Kovarî Hîwa, Kovara *Raman*, Hejmar 14.
- Fayîq, Mustefa û Ebdul Rîza, Alî (1989), *Fî'n-Neqdu'l Edebu'l-Hedîs Munteleqat Wet'-Tetbîqat*, Metbe'etu't-Te'lîmu'l-'Alî, Çapa Yekem, Camîatu'l-Musil.
- Fetîme, Dîlmî (2014), *Teqniyetu's-Serd Fî'r-Rîwayetu'l-Qahîre'l-Sexîre Lî Emare Lexus*, Rîsalet Macistêr, Camîetu'l-Erebî Bin Mihêdî.
- Fazil, Nîzamedîn (1989), *Ferhengî Eestêre Geşe, Ferhengêk (î Kurdî-Erebîye)*, Wezareta Perwerdê, Çapa Duyem, Îraq.
- Guran Îbrahîm, Gerdun (2013), *Kat û Peydabuna Jîyanê*, Çap û Pexşî Serdem, Suleyman.

- Gill, Ricard(2006), *Mastering English Literature*, Palgrave Master Series, Third Edition, New York.
- Gulistan Bedel Muhemed, Hesên (2001), *Jîyan Namey Xweyî Wek Curekê Edebî (Nuredîn Zaza) Wek Nimune*, Çapxana Xanî, Çapa Yekem.
- Gaston, Bachelard(1984), *Cemalîyatu'l-Mekân*, Trc: Xalib Helsa, Elmuessese'l-Camî' Lî'n-Neşir We't-Tewzî', Çapa Duyem, Beyrut.
- Heme Kerîm, 'Arif (2007), *Derbarey Roman û Çîrok*, Çapxaney Arabxa, Çapa Yekem, Kerkuk.
- Huseyîn, Elbehrawî (1990), *Bunyetu'l-Şekilu'r-Rîwayî*, (Elfeza-Ezemen-Eşexsiye), El-Merkezu's-Seqafi'l-Erebî, Darul- Beyza.
- Huseyîn, 'Arif(2002), *Nusînekanî Le Biwarî Rexne û Lêkolîneweda le salanî (1955-1988)*, Çapa Yekem, Suleymanî.
- Hîvî, Berwarî (2010), *Rêbazên Edebî*, Çapxana Hewar, Çapa Yekem, dihuk,
- Hesên, Qizilcî (2014), *Kenê Parsek*, Werger: Şikrîya Salih û Fîrat Kelehkî, Avesta, Çapa Duyem, Stembol.
- Hemîd, Elhemedanî (1991), *Bunyetu'n-Nessu's-Serdî Mîn Menzuru'n-Neqdu'l-Edebî*, Merkezu's-Seqafi'l-Erebî Lî't-Tîba'e We'n-Neşir We't-Tewzî', Çapa Yekem, Beyrut.
- Hêmin Casim, Muhemed (2015), *Hunerî Gêranewe Le Çîrokî Folklorî Kurdî da Çîrokî Mindalan Wek Nimune*, Nama masterê, Zankoya Selahedîn, Hewlêr.
- Hejar (1381), *Henbane û Burîne*, Ferhengî (Kurdî- Farisîye), Çapxaneya Întîşarat Kurdistan, Çapa Heştê, Tehran.
- Hafîz, Qazî (2005), *Ferhenga Qazî*, Dezgehê Spîrêz ya Çapû Weşanê, Çapa Duyem, Dihuk.

- Hussen, 'Arif (2011), *Çîrokî Hunerî Kurdî( 1925-1960)*, Çapxaneyaya Aras, Çapa yekem, Hewlêr.
- Hîmdad, Huseyîn (1997), Naverok û Ziman û Teknîkî Hunerî Le çîrokekanî Kovarî Hîwa da (1957-1963), Kovara *Raman*, Hejmar 8.
- Heyor, Delal (2006), Bunyetu'n-Nesu's-Serdî Fî'm-Mearic Îbnu'l-Erebî, Rîsalet Macistêr, Camî'etu'm-Menturî, Elcezaîr.
- Îbrahîm Qadir, Mohemed (1970), *Lêkolînewey Kurteçîrokê Kurdî Le Kurdistanê Başûr da (1970-1980)*, Teza Doktorayê, Kolêja Adabê, Zankoya Selahedîn, Hewlêr.
- 'Izedîn, Îsma'îl (2013), El-Edeb We Finunehu (Dîraset We'Neqd), Daru'l-Fikru'l-Erebî, Çapa Nehê, Qahîre.
- Îmad Weysî, Xalid (2013), Teknîka Vegêranê Di Hozana Muayed Teyîbî da, Kovara *Zankoya Dihokê*, Berpenda 16, Hejmar 1.
- Îsmâîl, Sigêrî (2001), *Tefsîra Jîyan*, Sureta Sebe, Ayeta 11.
- Îbn Menzur (1970), *Lîsanu'l-Ereb*, Î'dad we Tesnîf Yusif Xeyat, Madetu's-Serd, Mûceled 2, Dar Lîsanu'l-Ereb, Beyrut.
- Kamîran Alî, Bedirxan (2012), Lawkê min, Kovara *Hawar*, Çapxaneyaya Belkî, Çapa Duyem, Hejmar 4, Stenbol.
- Karzan Muhsin, Qadir (2009), *Sîmatazekanî Romanî Kurdî Le Nîwan Salanî (2000-1991)*, Nama Masterê, Zankoya Selahedîn.
- Kewser Muhemed 'Elî, Cebare (2012), *Teb'îru'l-Fewa'îlu'l-Cem'îye Fî'r-Rîwaye*, Daru'l-Hîwar Li'n-Neşir We't-Tewzî', Çapa Yekem, Suriye.
- Letîf, Zeytunî (2002), *Me'cemu'l-Mustelehatu'n-Neqdu'r-Rîwaye (Erebî-Îngilîzî-Firansî)*, Daru'n-Nehar Lî'n-Neşir, Çapa Yekem.

- Mecdî, Wehbe û Kamil, Elmuhendis (1984), *Me'cemu'l-Mustelehatu'l-Edebîye Fî'l-Luxe We'l-Edeb*, Mektebet Lubnan, Çapa Duyem, Beyrut.
- Muhemed Emîn, Duskî (2013), *Qamus Spîrêz*, Metbe'et Cim, Çapa Duyem, Turkîye.
- Meknun Muhemed Tahir, Mîqdad (2010), *Dîyalok di Diramaya Kurdî da (Deverz Behdînan) Wek Nimune*, Nama Masterê, Zankoya Dihok.
- Meha Huseyîn, Elqesrawî (2004), *Ezemen Fî'r-Rîwaye'l-Erebîye*, El-Muessese'l-Erebîye Lî'd-Dîrasat We'n-Neşir, Çapa Yekem, Beyrut.
- Murîs, Ebu nazir (1979), *El-Elsînîyet We'n-Neqdu'l-Edebî Fî'n-Nezerîye We'l Mumarese*, Daru'n-Nehar, Beyrut.
- Muhemed Emîn, Duskî (1995), *Dem û Dem Nasî li nik Milletê Kurd*, Kovara *Vejin*, Hejmar 1.
- Muhemed, Ezam (2005), *Şi'rîyetu'l-Xîtabu's-Serdî, Menşurat Îttîhadu'l-Kîtabu'l-Ereb*, Dîmeşq.
- Muhemmed Sadiq, El'efîfî (1978), *E'n-Neqdu't-Tetbîqî We'l-Muwazenat*, Muessesetu'l-Xancî, Elqahîre.
- Mecmû'e Mîne'l-Muellifîn (1982), *Nezerîyetu'l-Menhecû's-Şeklî Nisusu's-Şeklanîyînu'l Erus*, Trc: Îbrahîmu'l-Xetîb, Mûessesetu'l-Ebhasu'l-Erebîye, Çapa yekem, Lubnan.
- Mu'tesem Ehmed Hemed, Emîn (2012), *Binyatî Tuxmekânî Gêranewe Le Çîrokekanî Şêrzad Hesên da*, Namey Master, Zankoya kûye.
- Marî Barxas, Yusa (2013), *Resâ'l-Îla'r-Rîwayî's-Şab*, Trc: Salih Îlmanî, Elneşir Daru'l-Meda, Çapa Duyem.
- Muhsin, Usman (2010), *Hizirkirin Di pirsên Rexnê da*, Vekolîn Nivîsarên Raveyî û Piraktîkî Di Hêla Rexnê da, Çapxaneyê Rewşenbîrî, Çapa Yekem, Hewlêr.

- Mecmû'e Mîne'l-Muellifîn, Muhemed Elqazî, Ehmet Elsemawî (2010), *Me'cemu's-Serdîyat*, Daru'l-Farabî, Çapa yekem, Tunis.
- Muhemmed Dilêr Emîn, Muhemmed (2004), *Rolê Kovara Gelawêj Le Geşesendin û Pêşxistinî Edebî Kurdî*, Çapxane Wezareta Rewşenbîrî, Çapa yekem, Silêmanî.
- Mes'ud Cemîl, Reşîd (2016), *Pexşan û Hunerên Wê*, Çapxana Hîvî, Çapa Yekem.
- Muhemed Xenîmî, Hîlal (1973), *E'n-Neqdu'l-Edebî'l-Hedîs*, Daru's-Seqafe, Beyrut.
- Nî'metallah Hamid, Nihêlî (2010), *Diravek ji Rexnê (Rexne û Vekolîn)*, Çapxana Hawar, Dihuk.
- Necim Xalid Necmedîn, Elwenî (2015), *Deshelatî Hikayetxiwan Le Çîrok da Be Nimuney Ku Çîrokî (Kê Westa Kerîmî Kûşt) Le Nusînî Muhîn Çînî*, Çapxaneya Zankoya Selahedîn, Hewlêr.
- Nahîde huseyîn, 'Ebdulrehman (2010), *Layenê Sîyasî û Kumelayetî di çîrokên (Hesen Qizilcî)da*, Nama Masterê, Kulîja Perwerdê, Zankuya Selahedîn, Hewlêr.
- Nefîsa, Îsmâîl (2005), *Teknîka Vegêranê Di Kurteçîrokên Fazil Umerî da*, Çapxaneya Hawar, Çapa yekem, Dihok.
- Necim Xalid Necmedîn, Elwenî (2004), *Bînayî Kat Le Sé Nimuney Romanî Kurdî da (Janî Gel, Şar, Raz) Lêkolîneweyek (î Tîyurî û Piraktîkî û Rexneyî) ye*, Çap û Pexşî Serdem, Suleymanî.
- Nazdar'Arif, Birîndar (2012), *Jin û Hunerê Çîrokên Devera Behdînan (1990-200)*, Nama Masterê, Kolêja Adabê, Zankoya Dihok.
- Nahîze, Setar (2003), *El-Bunyetu's-Serdîye Fî'l-Qisessî's-Soffîye'm-Mukewînat We'l-Wezaîf We't-Teqniyat*, Menşurat Îtîhadu'l-Kîtabu'l-Ereb, Dîmeşq.
- Nîhadu't-Tikrîlî (1985), *Er-Rîwayetul-Ferensîyetu'l-Cedîde*, Daru'l-Hurîye Lî't-Tîba'e, Elcizû'l-Ewel, Bexdad.

- Pul, Rîkurd (2006), *E'z-Zeman We's-Serd (E't-Teswîr Fî's-Serdu'l-Qisessî)*, Trc: Felah Rehîm, Daru'l-Kîtabu'l-Cedîde, Çapa yekem, Terabl.
- Perî Salih Hemîd, Muftî (2012), *Gêranewe Le Ku Çîrokekanî Ehmed Muhemed Îsmâil da (Lêkolîneweyekî Rexneyî Şîkarîye)*, Çapxaney Hacî Haşim, Çapa Yekem, Hewlêr.
- Perwîn, Ebdullah (2008), *Regezekanî Dirama Le şî'rî Lîrîkî Kurdî da Kirmancî Xiwarû 1980-Raperîn*, Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa Yekem, Suleymanî.
- Perêz, Sabîr (2001), *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî Le Seretawe Ta Kutayî Cengê Duyemî Cîhanî*, Çapxane Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapa yekem, Silêmanî.
- Pul, Rîkurd (1999), *El-Wicud We'z-Zeman We's-Serd (Felsefet-Pul Rîkurd)*, Trc: Se'îde'-Xanimî, El-Merkezu's-Seqaffî'l-Erebî, Çapa yekem, Beyrut.
- Rulan Burnuf, Rîyal Uylîye(1989), *'Alemu'r-Rîwaye*, Trc: Nîhadu't-Tikrîlî, Daru'l-Ş'ûnul- Seqaffiyel '-Ame, Çapa yekem, Bexdad.
- Rubert, Himfîrî (1984), *Teyaru'l-We'î Fî'r-Rîwaye'l-Hedîse*, Trc: Mehmude'l-Erebî, Mektebetu'ş-Şebab, Misir.
- Rolan, Part (1988), *E'n-Neqdu'l-Bunyewî Lî'l-Hikaye*, Trc: Intîwan Ebu Zeyd, Menşûratu'l-'Uweydad, Çapa yekem, Beyrût.
- Remezani, Alan (2015), *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebîyata Modern*, Çapxaney Peywend, Çapa Yekem, Stenbol.
- Rêzan 'Usman, Mustefa (2010), *Binyatî Curekanî Rudaw Le Romanî Kurdî Başurî Kurdistan da (1980-1990)*, Çapxaney Spîrêz, Çapa Yekem, Dihuk.
- Rulan, part(2002), *Medxel Île't-Tehlîlu'l-Bunyewî Lî'l-Qisse*, Trc: Munzir Eyaş, Daru'ş-Şecere Lî'n-Neşir We't-Tewzî', Çapa Dûyem, Heleb.
- Rebî'a, Bedrî (2015), *Elbunyetu's-Serdîyetu Fî'r-Rîwayet (Xitwat Fî't-Tîcahu'l-Axir) Li'l-Hefnawî'z-Zaxir*, Rîsalet Macistêr, Camî'etu'l-Muhemed Xizir.

- Rêjîn Cemîl, Xelîl (2014), *Hunerên Çîroknivêsinê Li Cem Nuerdîn Zaza*, Nama Masterê, Zankoya Dihok.
- Remezhan Hecî, Qadir (2006), *Cih Diromana Kûrdîya Devera Behdînan da (Geryan li Babê Berze û Dûzexa Spî) Wek Nimune*, Çapxana Hawar, Çapa Yekem, Dihok.
- Ranya Berekat, E'z-Zewahîre û Şadî Ebdulkerîm, Elte'amîne (2006), *Fenu'l- Qisse'l-Qesîre*, Beytu'l-Karu'd-Dewlîye, 'Uman.
- Şuca 'Muslim, El'anî (1994), *El-Bîнау'l-Fenî Fî'r-Rîwaye'l-Erebîye Fî'l-Îraq*, Daru'ş-Ş'ûnu'l-Seqafiye'l-'Ame, Çapa Yekem, Bexdad.
- Sîham 'Elî Heza', Elsirur (2010), *El-Bîнау'l-Fenî Fî'r-Rîwayatu's-Suhêl Îdrîs*, Rîsalet Macistêr, Camîetu'l-Beyît, El-Urdin.
- Şivan Qasim, Hesên (2011), *Rolê Dîyalokê Di Diramaya Kurdî da*, Çapxaneyê Rewşenbîrî, Hewlêr.
- Şewket Nebîl, El-Mesrî (2015), *Tecelîyatu's-Serdî Fî'ş-Şi'irul-Erebî'l-Hedîs*, Elheye'l-Mesrîye'l-'Ame Lî'l-Kîtab, Mesir.
- Sebah, Îsma'îl (2009), *Çemk û Îstatîkay Şiwên le Edebda*, Dezgay Araz Bu Çap û Belawkirdinewey, Hewlêr.
- Şukrîya, Resul (2005), *Teknîkî Gêranewe Le Çîrokekanî (Marîf Berzencî) da*, Çapxaneyê Wezaretî Perwerde, Çapa Yekem, Hewlêr.
- Salih Muhammed Hesên, Ardînî (2011), *Sunaîyetu's-Serd We'l-Îqa'*, Daru'l-Hîwar Lî't-Tîba'e We'n-Neşir We't-Tewzî', Surîye.
- Saîr, Zeyînedîn (2011), *Fî'd-Dirubu's-Serd (Dîrasatu't-Tetbîqîye Fî'l-Qiss We'r-Rîwaye)*, *E'n-Naye Li'd-Dîrasat We'n-Neşir- We't-Tewzî'*, Çapa Yekem, Dîmeşq.
- Sîza, Qasim (1985), *Bîнау'r-Rîwaye, Dîrasetu'l-Muqarene Fî's-Sulasîyet, Necîb Mehfuз*, Daru't-Tenwîr Lî't-Tîba'e We'n-Neşir, Çapa Yekem.



- Semîr Elmerzuqî, Cemîl Şakir(1986), *Medxel Îla Nezerîyetu'l-Qisse Tehlîlen We't-Tetbîqen*, Daru's-Ş'ûnu'l-Seqafiye'l-'Ame, Bexdad.
- Senger Qadir Şêx Muhammed, Hacî (2009), *Gêranewe Le Dastanî( Mem û Zînî) Ehmedê Xanî û Romanî (Şarî Mûsîqare Spîyekanî) Bextîyar Elî da, Lêkolîneweyekî( Rexneyî-Piraktîkî Berawirdkarî) ye, Çapxaneyaya Xanî, Çapa Yekem, Dihuk.*
- Tizifîtan, Tuduruf (2005), *Mefahîmu's-Serdîye*, Trc: 'Ebdu'r-Rehman Mizyan, Menşuratu'l-Îxtîlaf, Çapa Yekem.
- Tanya Es'ed Muhemed, Salih (2011), *Bînay Şiwên Le Dû Nimûney Romanî Kurdî da (Hêlane-Ejdeha)*, Dezgay Çap Ê Pexşî Serdem, Çapa Yekem, Suleymanî.
- 'Umer Muhemed, Eltalib (1971), *El-Îtîcahu'l-Waqî'î Fî'r-Rîwayetu'l-Îraqîye*, Dar-El'ewde, Çapa Yekem, Beyrut.
- Ustin, Warîn û Rînê, Wîlik (2008), *Tîyorîya Wêjeyî*, Wergêr: Arif Hîtu, Çapxana Hawar, Çapa yekem, Dihok.
- ' Umer, Eylan (2008), *Fî'm-Menahic Tehlîlu'l-Xîtabu's-Serdî*, Menşûrat-Îtîhad-Kîtabu'l-Erebî, Dîmeşq.
- 'Umer Me'rûf, Berzencî (1978), *Lêkolînewe û Bîblografîyayî Çîrokî Kurdî( 1925-1979)*, Çapxaneyaya Kurî Zanyarî Kurd, Bexda.
- Wadî, Tiha(1994), *Dîrasat Fî'n-Neqdu'r-Rîwaye*, Daru'l-Me'arif, Çapa Sêyem.
- Xalid, Salih (2010), *Kurteçîroka Kurdî Li Devera Behdînan (1960-2005)*, Çapxaneyaya Hawar, Çapa yekem, Dihok.
- Xalid Seher Mihî, Elsa'idî (1978), *El-Bîнау'l-Fennî Fî'r-Rîwayetu't-Tarîxîyetu'l-Erebîye (1870-1939)*, Rîsalet Macistêr, Eylul.
- Yan, Manfirêdî (2011), *Îlmu's-Serd Medxel Îla Nezerîyetu's-Serd*, Trc: Emanî Abu Rehme, Dar Neynewa, Çapa yekem, Dîmeşq.

Yasirê, Hesenî (2004), *Wexerek di Nehênîyên Deqî da*, Çapx aneya Hawar, Çapa Yekem, Dihuk.

Zuzan Sadiq, Tirwanişî (2008), *Çîroke Şî'ra Kurdî Edgarên Vegêranê Ast û Şêwe Qedrîcan (1972-1911) Wek Nimûne*, Çapxaneyê Xanî, Çapa yekem, Dihok.

Zahîr, Roj Beyanî (1997), *Çîrokî Hunerî Kurdî Şêwe û Şêwaz û Bunyad*, Çapxaneyê Wezaretê Rewşenbîrî, Hewlêr.

### **Malperên Entirnêtê.**

'Amir, Elxerabîye (2011), *E'ş-Şexsîyetu'r-Rîwaîye*, Wezîfetuha We-Enwa'uha- We's-Sîmatuha, <https://maamri-ilm2010.yoo7.com/t2472-topic>

Heme Se'îd, Hesen (2005), *Pêkenîni Gedayî Hesenê Qizilcî*, gotar, [www.kurdistanet.org](http://www.kurdistanet.org). Îşkalîyet Elmusteleh Elserdî 'înde Elxerb [www.uobabylon.edu.iq](http://www.uobabylon.edu.iq)

Semer Ruhî, Feysel (2003 ), *E'r-Rîwayetu'l-Erebîye El-Bîna We'r-Ruya*, Menşûrat-Îtîhad-Kîtabu'l-Ereb, Dîmeşq. [www.auedam-org/03/study03/262-s-find-book03-sdoo1-htm](http://www.auedam-org/03/study03/262-s-find-book03-sdoo1-htm)

Sara, Hesan (2016), *Ma Huwe's-Serd*, Malperê Mewcu'. <http://mawdoo3.com>

WQ Ferheng (2019), Parsek. <https://ku.wiktionary.org/wiki/parsek>.

Xedîce Qelî, Zade(2011), *El-Qîsetu We'Enasiruha*, Rîsalet Macistêr- Fî'l-Luxe'l-Erebîye, Camî'et-Azad-Fî'l-Kerec, [http://www.diwanal-arab.com/spip.php?page=article&id\\_article=29290](http://www.diwanal-arab.com/spip.php?page=article&id_article=29290)

Qizilcî, Hessen,

[https://ckb.wikipedia.org/wiki/%D8%AD%DB%95%D8%B3%DB%95%D9%86\\_%D9%82%D8%B2%DA%B5%D8%AC%DB%8C](https://ckb.wikipedia.org/wiki/%D8%AD%DB%95%D8%B3%DB%95%D9%86_%D9%82%D8%B2%DA%B5%D8%AC%DB%8C)